



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

Kovara Dumehane
Sal: 8 Hejmar - 39
Kewçêr-Sermawez 2011

Xwedî û Berpirsiyariya Nivîsaran
Mehmet Aydın ALÖKMEN

Edîtor
Elixan LORAN

Redaksiyon
Feratê DENGİZİ-Serwet DENİZ

Mizanpaj û Berg:
Elixan LORAN

Wêneyê Bergê
Xefûr Husên

Şêwirmendê Hiqûqê
M. Nuri DENİZ

Çapxane: Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan
Kalem Sk. No: 32/4 Huzurevleri
Kayapınar/DİYARBAKIR

Tel & Faks: +90 412 237 43 16

E-Mail
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

ISSN: 1309-1476

Şertên Abonetiyê
Nava Welat, salek: 30 TL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Nimroya Hesabê IBAN'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakır

TL: TR190006400000183002114889

EURO: TR420006400000283000737070

USD: TR520006400000283000737084

Nimroya Hesabê PTT'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
590 24 36

- Ji edîtor / 2
- Jiyanekê bi rûmet - **Bahadîn ROBAR** / 3
- Hej/mar/net - **Gulistan BARAN** / 5
- Hêviyekê nû - **A.Selam BARAN** / 6
- Hey lawik - **Rêdûr DÎJLE** / 9
- Wêjeya jinan - **Xelat EHMED** / 10
- Bihar - **Kerem BÎLEN** / 11
- Nan - **Feratê DENGİZÎ** / 12
- Winda me - **Huseyîn MISTO** / 13
- Siya şevê teliqî - **ar-da JANXWAR** / 14
- Li çirûsînên şîn bilûse - **Xecê OMERÎ** / 16
- Carl Sandburg - Wergêr: **Lenya DILA** / 17
- Kitêba "sadi"yanê bê guneh - **Ehmed BELEK** / 18
- Rojdiz - **Mihemed AVŞAR** / 19
- Em zarok in - **Rênas FARQÎNÎ** / 19
- Vagona duyem - **Şivan ZEREN** / 20
- Celaledîn MELEKŞAH - Ji farsî: **Dêrsim OREMAR** / 21
- Axx û ax - **Şadiye MANAP** / 22
- Ma ez ji bîr dikim - **Kawa ŞÊXÊ** / 24
- Çiroknûsên li ser riya trêne - xewnek - **Oguz ATAY** / 27
- Çavê min rê dikişîne - **Hêvî RONÎ** / 31
- Vê pêlê - **Sîdîq GORÎCAN** / 32
- Li welatê xerîbiyê "ez û yên din" - **Kenanê NADO** / 33
- Dosye - **Tu ji bo çi û ji bo kê dinivîsî** / 34
- Di çend qonaxan de peyv-karî - **Bajar MÎRZEMAN** / 35
- Hey teacher's! leave it writing alone! - **Elixan LORAN** / 36
- Nivîsa kurdî - **Çiya MAZÎ** / 37
- Çi çima - **Hasîp YANLIÇ** / 39
- Çima nivîs - **Gulgeş DERYASPÎ** / 40
- Dinivîsim - **Huseyîn GUÇLU** / 41
- Mirov çima dinivîsin? - **Şerefxan CIZÎRÎ** / 43
- Nivîsandin xîret e - **Îsmail DÎNDAR** / 45
- Ez ji bo şoreşê dinivîsim - **Mistefa TUNCYUZLU** / 47
- Çima nivîs - **Înan EROGLU** / 48
- Serketin - **Osman PLATÎN** / 51
- Tavên stêrîn - **A. KARABAX** / 52
- Wê şevê - **Yaşar AKSU** / 54
- Sond- **Îlhamî OZER** / 55
- Wate - **Azade KESKÎN** / 55
- Miqersiya bi şeva payîzê re - **Rêzan NAS** / 56
- Pêşaneya wêneyan - **Nesrîn NAVDAR** / 57
- Diyarê hezkirinên destanî: Cizîra Botan - **Ekrem BATMAZ** / 58
- Albuma kuştîyekî - **Hoşeng OSÊ** / 61
- Şîrîn Elemihûlû - **Kamran Simo HEDİLÎ** / 62
- Xatirxwestin - **Kemal DEMÎRBAŞ** / 63
- Metropol - **Berfo BARÎ** / 63
- Lawiko - **Mem FERAT** / 64
- Hevpeyvîn bi Çîdem Baranê re - **Fatma SAVCI** / 65
- Şev e - **Dilşêr BÊWAR** / 66
- Zivanê apêdayene - **Sinan SUTPAK** / 67
- Helbesta biharê - **Selamî ESEN** / 69
- Her tişt di nav navê te de bihurî - **Orhan ALÎCÎ** / 70
- Kêr - **Şevger ÇIYA** / 72
- Kurtedosye - **Herî zêde kîjan romana**
bi kurdî hatiye nivîsandin bandor li ser te hişt / 78
- Akrostîşa kuştarekê - **HELBESTKORO** / 79
- Xaçpîrsa romana kurdî - **Omer Faruk BARAN** / 80

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin, li xwediyên wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji editor

Montaigne dibêje, **“Ez xwe weke xwe şanî didim.”** Gelo em çiqasî wisa ne! Ev pergala zorkar û bêîman çiqasî derfetê dide ku em xwe rast û wek xwe û weke rastiya dilê xwe derxîn holê û li gorî wê bijîn. An jî bera jiyana me ya me ye? Yan jî bi rastî em dijîn! Bera ev jiyana me ye! Û pirsên dûvdirêj î bêbersiv...

Dîsa ev peyvên wî yên helbestî çiqasî li bejna dema me tê û serdest ji notiya hêrsa dilê xwe tu wateyê nadinê;

“Ku paqij nebûbe dilê wê/î, çi dipê mirov / Bêheq çi şerî bi xwe re dike / Şik û gumanên dil-peritîn ên di navika azwerîn / Çi kurmê tirsê dixwin dilê mere! / Xurûr, şehwet çawa bêhal dixe / Hêrs, sistî û tiralî!”

Belê, di van şert û mercên ku em dixwazin bi vîna xwe bijîn û li jiyana xwe bibin xwedî, bavo çi tê serê me... Wê ziman û mêjiyê me û tew dilê me çawa ewqas bimbeyî ragire. Cîhana xwedê-giravî demokrat, ma hûn xwîna **Solîna** biçûçik nabînin a ku bi bimbeyên herî modern û pêşketî ruh daye û bûye diloan?! Bi bimbeyên we yên moderîn û pêşketî! Ev e, heq, hiqûq, wekhevî, biratî, pêşverûtî û nizanîm çi..!

Dîsa bi pey parvekirina ked û xwîna gelan ketine serdestên cîhanê û xof û belengazî jî para bindestan û serhildêriya kurdên qedîm e hêviya xurt î pêşeng, li ser vê xaka qedîm î efsane. Zêde qehrê dide mere payva **“Xwe bêdebe neke esker hat te!”** **“Belayê dernexin û Romên xwe-dêgiravî bawermend hersdar nekin, wele guh nadin rojî û mojî û cejnê! Wê me biqelînin! Hiş-bin ha...”** û bêdengî û bêbextiya rewşenbîr, şair, mafparêz, nivîskar û pêşketiyan helbesteke şairekî tirk ku navê wî nayê bîra min diçingîne guhên kesên ku her û her qala **Sartre** û **E.Seîd** dikin, lê bala wan ne li ser **M.Metînerê Tarafê E. Altan e;**

“Baweriya min bi wî Xwedayî ye ku / Xîzan naxuliqîne mirov! / Xîzanê di nav pîneyên çil-wesle de / Birîndar dike dilê min! / Min berde ku biqîrim! / Ku ez hiş bim tu şîne bigire / Lewra milletê ku şairên wê neqîrin / Mîna zarokeke/î (Solîneke) sêwî ye / Ku tevayên hezkinê xwe wendakiriye.”

Ê ma ku mirov li hemberî asteng, zordarî û birînen jiyane nenivîse, mirov kîngê binivîse?

Û çima mere nenivîse vê birîna xedarî bielem î ya herikîna êş û eleman...

Nizanîm gelo ew şair vîna ji bonî reşîkê vî welatî jî difikire!

Aloziya demê tovê afirîna hevî, aştî û azadiyê ye...

Di nîqaşên wêjeyî de mafê axaftinê her dem bûye yê weşanger, kovarger û nivîskaran. Lê bi raya me yek ji dînamîk û dînamîta bingeîn a wêjeyan xwendevan e. Em jî ji bo ku van qalibên ku xwendevan nakevin dewsa mirovan û wekî ku karê wan tenê xwendin û huşbûn e bişikînin, mijara dosyeya me ya bê **“Bi çavên xwendevanan wêjeya kurdî be”**. Nivîs dikare li ser jî naveroka berhemên bigire, heta bikaranîna devokên herêmî, ji bikaranîna hêmayên sar û tevlihev bigire heta bikaranîna kurdiya resen, ji çîrokên kurt bigire heta romanên dirêj, ji zimanê rijî bigire heta teknîkên postmodern, ji panelên wêjeyî bigire heta kovarên kurdî, ji bernameyên wêjeyî bigire heta kafeyên wêjehezan, ji sîdwerhirtina ji wêjeya klasîk bigire heta klasîkên cîhanê, ji zimanê mêrane bigire heta helwestên femînen, ji zêdenivîsandina helbestan bigire heta romanên dubare û gelek tiştên mîna van tiştan be.

Her kesê ku dibêje ez xwendevanê kurdî me dikare beşdarî vê dosyeyê bibe.

Divê di warê edîtoryayê de jî em guherînekê bi we re par ve bikin. Ji niha û şûn ve dê edîtorên kovarê Feratê Dengizî û Omer Fîdan bin.

Serhildêrî, berxwedêrî jî pîvana wê...

Bimînin di hêviyê!

Jiyana bi rûmet

Bahadîn ROBAR

Sal, 1985 û demsal ji demsala zivistana reş û bê-bext bû. Rojeke ji rojên meha reşemiyê yê serma, berf û bi bahoz bû. Texrîben dehê mehê bû. Demjimêr nêzikî nîvro dibûn û Rênas û malbata xwe ji amadekariya êmdayîna sewalên xwe dikirin. Ew hefteyek bû berf dibariya û bejna berfê nêzikî du metreyan bilind bûbû. Ne mirovan ne ji sewalan nedikarîn serê xwe ji hundir derxin. Gundê Rênasî li pêşberî Çiyayê Herekolê li ber robarê Çemêkarê di devereke rast û tekûz de bû. Haya Rênasî ji tu tiştî tunebû. Weke her car li bendê bûn ku ew zivistana reş biqedê. Jixwe ew meha reş ango reşemî meha dawîn a zivistanê bû lê belê zivistanên vê herêma heta dawiya meha adarê ji dom dikirin. Erd ji berfê mişt û asîman ji ji barandina berfê betilî bû. Te digot qey li vî gundî tu zindî najîn. Bêdengiya qiyametê hakimê erd û sema bû lê ji nişka ve dengê balafiran li asîmanên Çemêkarê olan da. Tu kes ne li bendê bûn ku di rojeke wiha de gur ji ji kuna xwe derkeve. Li ser vî dengê bi tirs û xof gundiyan ji xwe avêtin ber derî û paceyan, bê ka çi qewimiye û wê çi biqewime. Ji ber berfê tenê serê banên xaniyan ên bi rojan e gundiyan xwe ji xewan dikirin da ku berfa li ser wan paqij bikin dixebitîn, reş bûn. Balafira Roma Reş li ser banê gova Rênasî danî. Hema bi singu û çekan êrîş birin ser mala Rênasî. Bavê Rênas ne li mal bû. Bi dehan leşker bi hev re ketin hundirê mala Rênas û ew derxistin derve. Hin leşker man di hundirê malê de, yê din Rênas ber bi gova pezi birin. Yekî ku di nava leşkeran de bû bi zimanê kurdî got, Rênas ka cihê çekan nişanî me bide. Rênas matmayî ma û got tu kî yî? Wî got; zêde dirêj neke û lez bike tiştê min got bike. Rênas bi xwînsarî got; ez cihê tu çek û mekan nizamim û bela xwe ji min vekin. Yekî qapûtê wî heta çokan dirêj (weke fermanbaran diaxivî) got; getirin buraya. (bînin vir). Li ser vê daxwaza fermanbar du leşkeran bi çengên wî girtin û ew birin ber piyên fermanbar. Fermanbar bi pehîn û kulman danî zik û rûyê Rênas û got; tu cihê çekan û apociyan dibêji yan na? Ger tu bibêji em ê vê carê ji te bibexişînin, lê ger tu neaxivî em dizanin te bi axivînin. Va ye tu û va ye terciha te. Rênas bi dengê nizamim, ma tiştê ku mirov nizane mirov dê çawa vebêje? Bi vê bersivdayîne re qomûtên heta jê hatî pehîna xwe li navrana Rênasî xist û Rênas gerrî erdê bû. Jixwe hewayeke sar û qeşayî hebû, bi van gef û êşkenceyan ji Rênas dilerizand. Qomûtên ferman da û du, sê leşkeran, li wir, pêş

çavên hevjin, xwîşk, bira, dê, gundî û cîranên wî ve ew tazî kirin û li ser berfê gevizandin. Rênas weke livina di nava avê de dilerizî. Ji ber ku hovên bi cil ew bê cil kiribûn, ji xwe ji malbata xwe û herî zêde ji ji mirovbûna xwe şerm dikir. Ji bo cihê tiştên qaso veşartî ne ji bin berfê derxe bêtî ku tevir an ji merê bidinê bi destên vala ew berfa hişk bi wî didan kolandin. Hem tazî hem ji bê tevir û berfa li ber sermayê bûyî weke kevir bi destên qerisî vala kolîn ne karê mirovan bû. Dema Rênas digot ez di bextê we de me ger hûn dê min bikujin hûn min niha bikujin lê bes e ez hew debar dikim. Bi wan gotinan re ew didan ber pehînan û di nava berfê de digevizandin. Rîyên diçin nava govan û malê ji ber malîna berfê weke aloleyên labîrentan teng û bilind ji berfê bûbûn dîwar. Ev dîwar ji bi bahoz û sermayê bûbûn weke dîwarên kelehên mîrekên kurdan. Qomûtên bi dehan caran serê Rênasî li wan dîwaran dida, dev û dimaxê Rênas di nav xwîne de mabû. Bi saetan Rênas li ser berfê gerandin û êşkence lê kirin heta Rênas ji hişê xwe çû û bû termek li erdê dirêj bû. Li ser vê yekê ew birin kirin govê û pez û dewarên wî ji govê derxistin derve. Heta piçekî Rênas bi ser xwe ve hat. Dîsa doza çek û cihê apociyan dikirin. Her çi qas Rênasî digot haya min ji wan tiştên hûn dibêjin nîn e ji bawer nedikirin, hê zêdetir êşkence lê dikirin. Leşkerekî Rênas avêt erdê û çoka xwe xiste zikê wî û gotê; ev şensa te ya dawiyê ye, tu dixwazî bibêje, tu naxwazî ez ê pozê te jêbikim, ez ê te serjêkim, ez ê guhê te jê bikim. Rênas digot; ez nizamim ma hûn çima bawer nakin? Ger hûn ji min bawer nakin kerem bikin min bikujin va ye we ji deh deveran zêdetir kola û bi min dan kolan ger tişteke hebûya min negota ji jixwe we dê bidîtana. Qomûtên li ser van gotinên Rênas got; Na em te nakujin, em ê tenê çavên te derxin. Her diçe Rênas ji hêz dikeve û dilerize. Mirovek di nava berfê û seqemê de encex dikare ew qas xwe ragire. Qomûtanî qezetûreya xwe ji kalanê wê derxist û bi destê guhekî Rênasî girt û destê din ji qezetûr bi piştê guhê wî ve bir û anî xwîn bû şirik û rijîya xwarê. Bêtî ku qomûtan ji Xwedê yan ji ji hinekan bitirse û wijdana wî biêşe guhê Rênasî qelaşt. Piştî guhê wî qelaşt wî di dilê xwe de digot teqez ew hovên hanê dê min bikujin. Dîsa kirin û nekirin Rênas tişteke ku ew pê qayil bibin negot. Leşkeran gotin; ka tu bisekine em dizanin tu ji kîjan zimanî fêm dikî. Bi rastî ji Rênas ji zimanê wan hindik fêm dikir. Ev dibû sedema hêrsbûna wan û dîsa bi qezetûreya xwe serê tiliya

Rênas ya navê qelaşt heta qirçênî ji hestiyê tiliyê hatî qezetûre berda jêr. Êdî êş bê ader û Rênas ji bê hêvî bûbû. Li wir li cem wan govan tiştê ku dixwestin peyda nekirin û hê bi hêrştir bûn. Û ew ji wî cihê ku dikola derxistin û anîn qada cihê êmdana pezî (ew qad bi pêş malê ve dixuya) û gotin ka cihên govên we yên din, wan nîşanî me bide. Govên wan ên din bi qasî 100, 150 mîtroyan dûrî malê bûn. Hin ketin pêşiyê û hin ji li pey û du leşkeran ji bi çengên wî re girtin û ew ber bi govan ve birin. Di birinê de dema Rênas hêdî dimeşiya leşkerên ku li pey wî dihatin lê dixistin, dema ji tirsê lêdana wan lez dida xwe vê carê ji leşkerên li pêşiya wî lê didan. Heta ew birin cem govan bi dehan kulm û pehîn li zik û rûyê wî dan. Jixwe hema ji sermayê nemirîbû, ev bi saetan bû ku ew rût û tazî di nava berf û seqemê de lêdan û xeberên xirab dixwar. Heta gihişt govê ji hêz ket. Dora govan ji berfa hatî maliştin bûbû weke çiyayekî. Tenê serçaq û riya ku ji bo deriyê govê hatibû malaştin dihişt ku mirov bizane avahiyek li wir heye. Li ber kêleka govê sekinîn û gotin Rênasî; Aha vir bikole. Rênasî bi guhê qelaştî, tiliya dirandî, bedena rût û tazî ya di nava sir û seqemê de, bi wî serçavên xwe yê şirika xwînê pêde dihat xwarê, bi wî zikê xwe yê rûvî têde tevil hev bûyî û bi wê hêviya giyan û jiyan bêwate bûyî, bi destên xwe yên vîkî vala dest bi kolana berfê kir. Her cara ku destê xwe diavêt lepek berf, recifnok ji serî heta tiliyên piyan pêde dihatin. Bi qasî deqeyekê wisa berf vekola û avêt derve. Janek welê dida dil û hinavên wî, wî digot qey guhê wî tevahî hatiye jêkirin. Êdî hew xwe girt û ji nişka ve tilorî erdê bû û ji hişê xwe çû. Piştî Rênas ji ser hişê xwe çû ew birin hundirê govê û hin cil û milên sewalan avêtin ser bedena wî ya birîndar. Bi qasî 10, 15 deqîqeyan şûnde Rênas hat ser hişê xwe û dişa ew birin cihê ku berf dikola. Her deqîqe, her saniye û her gav gef lê dixwarin, xeberên bêexlaq jê re digotin, lêdixistin û kenê xwe pê dikiirin. Di navberê re qomûtên bi awayek hêrs û har qîrek da û got; tu dibêji an na? Rênasî dişa got ma hûn ne mirov in ez bi tiştêkî nizanim ma tiştê ku mirov nizane dê mirov çawa bibêje? Li ser vê yekê qomûtên gotê; diya te heye? Wî ji got; belê. Dişa got; hevsera te heye? Rênasî dişa got; erê. Qomûtên got ger te nevê em diya te û hevjinê te pêş çavên te ve tecawiz bikin tiştê em ji te dixwazin pêk bîne. Îtîrafkarê ku bi wan re ye digot; Komutanî bu kafir her şeyî biliyor. (qomûtânê min ev kafir bi hemû tiştî dizane) Qomûtânî ji yê îtîrafkar re got; Elî ka tu bibêje cebilxane li ku veşartîye. Yê îtîrafkar ji wî re got; weleh tu nebêji ev dê te bikujin. Rênas bi awayekî bê hêvî got; Elî ma hûn ne misilman in, ma hûn çî ji min dixwazin? Gidîno ez di bextê ola îslamê de me hûn bes vê yekê bînin ser min, an min bikujin an jî bela xwe ji min vekin. Li ser vê dax-

waza Rênasî hemûyan ji dest karên xwe berdan û gotin; te got Elî ha? Ka te digot ez Elî nas nakim va ye te navê wî bi lêv kir. Li ser vê, Rênasî got; weleh ez wî nas nakim, ji nîvro ve ye hûn dibêjinê Elî min jî ji we girt ku navê wî Elî ye. Dema bersiva Rênas seh kirin qomûtên pehînek heta ji hêlên wî hatî li Rênasî da û avêt nava çala ku kolayî ye û leşkerekî qelew ji jor ve xwe avêt nav ser û guhê wî bi erdê ve zeliqand. Got heta tu weke kewan nexwînî bi saxî derketina te ji destê min nîn e. Leşkeran du bêr anîn yek dan destê Rênasî û ya din ji leşkerekî girt destê xwe û yê leşker berfa ku ji cihê dikola diavêt ser û çav û bedena Rênas ya rût û birîndar û qerisî û bê edar. Her diçû bedena wî bêhêz dibû û hêviyên wî yên jiyanê dişikest. Piştî sê, çar bêr berf li wî hatin werkirin û wî ji sê, çar bêr berf avêtin jor hêza wî qediya û hema ji nişka ve bê hiş ma di çalê de. Leşkeran ew ji çalê derxistin jor dişa hin qerpel merpel lê werkirin heta ku piçekî hat ser hişê xwe, dîtî ku bi lêdanê wî bikujin ji tiştêkî nabêje, ferman da ku leşker biçin hevjinê wî bînin wir. Bi bayê bezê re leşkeran hevjinê Rênasî anîn û du leşkeran her du destên wê hişkehişk girtin leşkerekî din bi her du destên xwe yên qirêj dest avêt kincên li ber bedena hevjinê Rênasî û heta serê singê kirasê wê veçirandin û gotin; Tu hê ji naaxivî? Tu dixwazî biaxive û naaxivî ji neaxive. Ew tercîha te ye. Lê li gorî bersiva te em ê ji tevbigerin. Tu neaxivî em dê aha li vir pêş herdu çavên te, hevjinê te tecawiz bikin. Piştî van gotinên êş û zilm, hovîtî û rûreşî tenê hevokeke ku wî ji nedizaniyê çima got ji devê wî derket û got; gelî leşkerino ez di bextê we û yê ola îslamê de me hûn vê yekê nekin. Ji hêrsan dilerizî. Qomûtên got; ez bi ol û îmana te bikutim ma xelasbûna te ji destê min heye? Qomûtên ji xwe re digot vê carê ew dê teqez li ser xwe tiştinan bibêje û êdî yên din jî dê pê werin. Dengêkî ji xwe bawer got; kuro tu nebêji va ye em namûsa te tecawiz dikin. Li ser vê çavso-riya wan Rênasî got; ma ew tenê tecawiz e, ev a heta niha hûn li me dikin qey ne tecawiz e? Hûn çî dikin bikin weleh tecawîza herî mezin ev e ku ev bi saetan e we ez di nava vê berf û sermayê de û pêş çavên hemû gundî û malbata min ve tazî kirime. Dema qomûtânî dît ku Rênas hê jî li gorî wî nehatiye rayê ferman da ku leşker hemû kinc û libasên hevjinê Rênasî jê bixin. Li ser vê fermana qomûtânê Roma Reş, du leşkeran hevjinê wî tazî kirin û li ser piştê avêtin erdê, li erdê jî du leşkeran destên wê hişkehişk girtin yekî din pelesqeya xwe vekir paş ve avêt û dest avêt qayîşa xwe vekir û li Rênasî vegeriya û got; kuro ma tu şerm nakî ez dê hevjinê te pêş çavên te ve tecawiz bikim. Hevjinê Rênasî qîrên wisa didan mirov digot erd wê biqelişe û asîman wê ji jor hilweşe xwarê. Lê gotineke pêşiyên kurdan heye, dibêje; “Şêr şêr e, çî jin e çî mîr e.” Hevjinê Rênasî li

hemberî hemû êşkence, gef û sermaya bê edar jî bi lehengî li ber xwe dida û tu tişt li der xwe û hevjinê xwe nedigot. Rênas bi awayekî lertzokî got ma min çi neheqî li kê kiriye heta ez şerm bikim? Yê nehe-qiyê dikin bila ew şerm bikin. Dîsa li Rênasî hatin yek û dan ber kulm û pehînan heta kirin ku nikare xwe bilivîne. Rênas û jina xwe her du li ber wê serma û zilmê bê hewar, bê kinc, bê hevî û bê star di nav destên har û hovan de şaş, matmayî û gêj mabûn. Piştî dîtî ku Rênas tiştêkî nizane ew dîsa ber bi gova li cem malê ve birin. Zilamekî bi simbêl û simbêlên wî qerase ji wan leşkerên ku Rênas girtine re got; ka xwe bidin paş da ez bikutim dê û jina wî û serê lûleya tifinga xwe heta jê hatî li serê singê Rênasî da û Rênas li erdê ket û vegevîzî bi erdê ve bû yek. Yê îtîrafkar ji ber ku derewîn dernekeve bi îsrar digot; qomûtânê min welehî ev her tiştî baş dizane lê nabêje. Di vê navberê re hin leşker çûn hundirê mala Rênas û diya wî û xwişk û birayên wî hemû derxistin derve û bi saetan li ser berfê rawestandin. Gef li wan dixwar. Heta xwişkeke Rênasî ya 9, 10 mehî ji destê dayika wê digirin û diavêjin ser berfê, dibêjin heta tu cihê çekan ji me re nebêjî em jî nahêlin ku tu xwişka xwe ji nav berfê derbixî. Qêrîn û hewar hewara zarokan digihîje ber ersê mezin. Zarokên din hemû ji tirsan hema ku dîn nebûbûn. (Piştî 15, 20 rojên din xwişka Rênasî ya ku leşkeran avêtibû ser berfê û bi saetan li ser berfê mabû, mir)

Hewa sar û bi mij bû. Êdî dibû êvar û reşahiyê xwe dida der. Rênas bê liv û bê ruh di nav destê zebaniyan de bûbû term. Ew birin meydana êmdayîna pêz û ji wir jî birin hundirê malê ew xistin nava nivînan. Wan ji xwe re digotin piştî ev qas êşkenceyê ne pêkan e ku ew carek din li jiyanê vegere. Di mala

Rênasî de çi tişt xwarinê heye hemû anîn li ber xwe rêz kirin xwarin. Malbata Rênasî hê li derve bû. Ji ber ku êvar bû çend balafir hatin leşker siwar dikirin û ber bi Xisxêrê ve dibirin. Demekî Rênas bi xwe hesiya û hat ser hişê xwe, dît ku ew bi xwe di nava nivînan de ye û bi dehan leşker li ser sêniya xwarinê ne û li pêşgeha mala wî xwarinê dixwin. Rênas di dilê xwe de got; weleh ev dê bikerifin û biçin, nexwe ez xwe nalivînim da ku careke din li min venegerin û hê jî êşkenceyê li min nekin. Lê mixabin jana birînan nedihîşt ku ew vê mebesta xwe bi cih bîne û ji neçarî nalîn û intîmî ji nava kezeba Rênasî dihat. Leşkeran ev dengê birîndar seh kirin û careke din zor danê ku tiştinan li ser xwe bibêje. Lê dîsa weke her car Rênasî tu tişt negot û jixwe tu tişt nedizani. Balafira dawî jî hat û rabûn ku biçin. Qomûtên ferman da ku wî jî ligel xwe bibin. Leşkerêkî got; rabe kuro, aha va ne kincên te, li xwe bike em ê te jî li gel xwe bibin. Rênasî dest avêt derpiyê xwe piyekî xwe di derpî re kir hêj piyê din tê re nekirî leşkerekî heta ji hêlên wî hatî pehînek li wî da, dîsa dirêjî erdê kir. Û got; ker kurê kerê neyînin, bila bicehime. Li ser vê gotinê ew derxistin derve û heçî leşkerên ku li wir in yeko yeko çûn ser piştê Rênasî û pê li piştê wî kirin, rût û tazî, bi birîn û bê derman ew li erdê hiştin û çûn. Hevjîna Rênasî tazî, Rênas tazî, diya wî derve li ber sermayê, xwişk û birayên wî ji rawestana di nava berfê de ya bi saetan sermest, cîran şaş, sewalên Rênasî jî vê rewşê fedî dikirin. Êdî her kesî/ê ji mirovbûna xwe şerm dikir. Kesê/î nedikarî li rûyê keseke/î ji malbata xwe binêre. Tu kesa jî wan tu wate nedabûn vê kirinê. Tenê tiştê sedem bû li gorî Rênasî û malbata wî, ew jî, ew kurd bûn, lê yê ku ev hovîti li wan dikirin ne kurd bûn ji ber ku ji zimanê wan fêhm nedikirin.

Hej/mar/net Gulistan BARAN

nizanin
motorên lêgerînê jî
nizanin çend keserên min hene
nexeniqe, dev jê bernede hema
dest û dil deyne ser çend "com"an
malperên sêwî
li axeke dijîtal
tu yê bibîhîzî sewta min a tî
bide dû wê rêçikê

mişkek wê te bîne ser riya rûyê min
bibe marekî reş
bi çavên min vede
ez ê bitikînim gazî û hawaran
jjaaarrjjaaarrjjarr!
dabixe dermanê rêzikan
xweşmêr î
tu yê bihejmêrî hevdeh keseran

Hêviyeke nû

A.Selam BARAN

Otobus di şeva reştarî de mîna ku tariya şevê biçirîne bi ahengî ber bi bajêr ve diherikî. Ber destê sibehê otobus rawestiya. Derdor tijî leşker bû. Berê lûleyên çekên xwe yê dirêj bi ser wan de dirêj kiribûn. Hin leşker jî ketîbûn pişt torbeyên qûmê yê ku weke dîwaran li ser hev hatibûn rêzkerin. Serpelekî bi mirûzekî tehl û bi mehdekî tîrş qîr da rêwiyên otobusê; “Bila herkes dakeve jêrê û nasnameya xwe derîne!”

Bi dengê çawiş re, Rustem jî nava xeyalên xwe filitî. Wî jî mîna hemû rêwiyên bi çavên xilmaş û melûl, bêyî ku wateyê bidiyê, nasnameya xwe xist destê xwe û daket jêrê. Leşkeran, her yek li ber çenteyê wan dabûn sekinandin û mîna ku li tiştê bigerin dûdirêj li wan digeriyan û alavê wan tevlihev dikirin. Çenteyê Rustem jî vekiribûn. Cilên wî tev avêtibûn erdê û tevlihev kiribûn. Kirasekî sor ê ku jî bo hezkiriya xwe kiribû, avêtibûn erdê û di nav dest û piyan de li erdê mabû. Rustem qehirî û hêrs bû lê deng nekir. Piştî şûndekê dema rûyê Xecê li ber çavên wî ronî bû, hêrsa xwe tev jî bîr kiribû.

Leşkeran xortekî ciwan û zilamekî navsale jî wan cihê kirin. Kesî nedizani ew jî bo çi veqetandin. Tirsek di nava çavên xort û zîlam de rûniştibû. Kesî jî tirsan nediwêribû tiştê bigota. Tenê pîrekê di ber xwe de dinehwirand; “Qurban, qurban, çi heyfa wan e.” Piştî ku lêgerîna wan qediya car din otobus kete rê.

Rustem beriya niha bi du salan jî bo kar û şixul jî gund derketibû û berê xwe dabû rîya xerîb û xurbetê. Ew evîndarê Xecê bû. Miraz û daxwazeke wî hebû; ew jî bi Xecê re bizewiciya. Ma ne jî bo vê daxwazê bû ku wî di bajarên mezin de ew qas kerb û qehra çêkirina avahiyan kişandibû. Bi vê bêrî û azweriyê jî xwe re çend qurîş dabû hev. A niha jî dixwest ku vê daxwaza xwe ya bi salan e ku di dilê wî de bûbû kul û keder veguherîne şad û bextewariyê. Ji ber vê bû ku edî her tişt jê re hêsan û xweştir dihat. Her ku nêzî gundê xwe dibû êşa ku bi salan e di avahiyan de kişandibû jî bîr dikir. Di serê wî de hezar xeyal hebûn û di tevan de jî Xecê hebû. Xeyalên xwe tev bi Xecê dirêsand.

Berî nîvro otobus li xeraca bajêr rawestiya. Lazim e ji vir pê de rîya xwe bi dolmîşê temam bikira. Berê xwe da rawestgeha dolmîşan. Li dolmîşa gund geriya lê nedît. Di ber xwe de got, “Qey hîn nehatiye.” Bes dilê wî bê aram bûbû. Bê ku bizanibe, tirsek hat li ser dilê wî rûnişt. Wî jî nizanibû ev çi ye? Ji çend kesên ajovan pîrsa dolmîşa gund kir. Ajovanekî zeîf

û ziravok, bi heyr lê nihêrî, paşê fehm kir ku hayê wî jî tiştê tune ye.

- Pismam, dolmîşa çi halê çi! Ma tu nizanî gundê we vala bûye?

Îcar Rustem, şaş û heyirî, zîq li nava çavên ajovan nihêrî û mîna ku jê bawer neke bi safitî pîrsî;

- Gundîyan çima gund vala kirin ?

Ajovan weke ku bê hemdê wî kenek li ser levên wî rûnê, bişirî;

- Na heyran, ne gundîyan; leşkeran gundê we vala kirin!

Dema çend ajovanên din jî hevalê xwe piştrast kirin, ew kêfa ku di nav çavên wî de çirûsk vedidan vemirî. Giraniyekê xwe li ser singê wî danî û bû gurgurpa dilê wî. Di dilê xwe de hezar dia dikir ku tiştê wiha nebe. Berê jî di avahiyan de şewitandin û valakirina gundan bihîstibû. Lê tu carî neanîbû bîra xwe ku wê rojekê gundê wan jî bê valakirin. Jixwe gundê wan ne li jorê bû. Li derdora gund çend girên hûr hebin jî zêdetir nêzî deştê bû. Ji ber vê jî yên çiyê xwe nedidan aliyê wan.

Êdî ew west bû ku çenteyê xwe dabû destê xwe û rast berê xwe dabû ser rîya gund a bê asfalt. Qederêkê bi şûnde jî dûr ve gund xuya bû. Di nav tirs û xofê de her ku nêzî gund dibû diayên ku dikir jî zêde dibûn. Çavên xwe jî ser gund nediqulipand. Tenê dixwest lebatekê bibîne, sewtekê bibîhîze. Lê reşek jî li ber çavên wî nediket.

Dema gihîşt serê gund çavên wî çûn nava serên wî. Bi çavên beloq mîna ku hatibe warekî cuda û ketibe zewiyên xewneke tirsna. Her tişt pê xerîb, dûr û nenas dihat. Ecêbeke giran û tofaneke nedîtî bi ser gund ve hatibû. Gund tev hatibû wêran kirin. Her mal di binê xirbeyê xwe de riziyabû. Hew mabû ku hiş û aqilê xwe biavêje. Dinya bi ser de hatibû xwarê. Çong û qidûmên wî sist bûbûn. Kela dilê wî rabû û girêkêke hişk di qirika wî de aliqîbû, çavên wî şil bûn. Hindek mabû ku weka zarokê bigiriya. Di ber xwe de digot; “Gelo ev gundê me ye, dibe min rîya xwe şaş kiribe?” Paşê jî digot; “Na ew ne rast e, ez xewnan dibînim.” Cihê xeyalên bextewariyê, xewne-reşkên tîrsê girtibûn. Bi van fikaran di nav kolanên gund de meşiya, kolanên ku bi roj û şevan tê de pêxwas bazdabû, keniyabû, giriyabû...

Çend gumgumokên girs jî ber çavên wî reviyên û di qeliştokên diwarên rûxandî de winda bûn. Zarokatiya wî hat bîra wî. Gelek caran bi hevalên xwe re bi şiv û keviran diçûn nêçîra gumgumokan. Li gorî wan kê heft gumgumok bikuştê wê biçûya cinetê. Lê

tirseke wan hebû; lazim bû ku devên wan vekirî nema, yan na dê gumgumokê diranên wan bihêjmartana. Hêjmara diranên wan ketina diranên wan û mirina wan bû. Carina jî bi darqîtik û bi kepên beranan dileyistin. Ew roj çî rojên xweş bûn. Xwezî her dem wisa zarok bimana.

Berê xwe da mala xwe lê malên kolanê jî tev li ser hev hatibûn rûxandin. Hin mal tev hatibûn hilweşandin, hin jê jî diwarek du diwarên wan li ber xwe didan ku nerûxin erdê. Teniya şewata malan hîn jî li ser dar û beran diyar bû. Li ser deriyekî jî şewatê maye, nalekî hespan bizmarkirî bû. Gîsinekî jihevketî qîlên xwe heta nivî çikandibû bin axê û wisa mabû. Serê çend heb tayê gîha jî binê destarekî derketibûn. Di hewşekê de darê dergûşekê şikestî li ser lingekî li ber xwe dida ku nekeve. Xwedê dizane heta niha çend lorîk mezin kiribû. Li ber dergûşê bebekeke naylon bê pî û mil li erdê dirêjkirî mabû. Ferek soleke kesk bi ber çavên wî ket. Weke ku kes di vî gundî de nejiyabe, di ber diwaran de giheyên jar û ziravok serî berdabûn ser axê. Ev gundê xirbe û vîran û kolanên vikîvala dilê wî diêşand.

Rustem her ku gavek diavêt dilê wî xwîn dida û êş û birînên wî lê zêde dibûn. Mîna ku bi gûzan goştê canê wî qetqetî bikin, wisa pê zor û zehmet dihat. Tu carî êşekê wisa kûr û xedar hîs nekiribû. Bî vî hal û perîşaniyê, bi gavên sist û lertzok hat ber deriyê hewşa xwe. Lê tu tişt nemabû. Mala wan bi erdê ve bûbû yek. Dara hinarê ya ku bi destê xwe di hewşê de çandibû, wek deviyekê bi strî û bê can hişk bûbû. Agir jî dilê wî çû, jî qehran ronî di çavên wî de nemabû. Kelogirî bû, çizînek bi kezêba wî ket. Hew xwe girt, du hêsirên germ jî çavên wî rijîyan ser dêmên wî.

Bêyî ku hay ji xwe hebe, di ber xwe de digot; "Xecê tu li ku yî, çî bi te hatiye?" Ketibû kolana mala Xecê. Lê rewşa mala Xecê hîn xerabtir bû. Bêyî ku maneyê bidîyê, bi fikar li derdora xwe temaşe dikir. Ji çavên xwe bawer nedikir, wek ku di ser re ne du sal, sed sal bihûrî be gund kavi û wêran mabû. Her der bi gîha û dêviyan û bi striyan tijî bûbû. Mîna goristanekê tenê, pêjna tu tiştî nedihat. Ev gundê bi şînahî û bi dar û ber bûbû hêlîna teyr û maran, kund û dûpişkan.

Di ber xwe de û bi vî halî hat ber kaniya gund. Dema kanî dît, lê hay bû ku ji tîna dev û qirîka wî ziwa bûye. Lê weke her tiştî kaniyê jî ji vî malkambaxtiyê para xwe girtibû. Hema bêje kanî bi zorê diherikî. Awek mîna mîza kosiyan ziravok diherikî. Qet bawer nedikir ku wê rojek bê û ev kaniya delal wê tekeve vî halî. Li ser kaniyê daqûl bû û bi çengên xwe av vexwar û tîna xwe şikenand. Aveke sar û şêrîn hinavên wî hênîk kiribû. Têgihîşt ku li ber lawazbûna xwe jî tehma avê qet neguheribû. Hin nû pê hisiyabû

ku çî qasî bêriya ava vî kaniyê kiriye. Lê tu carî ev kanî neketibû xewnên wî. Li gel ewqas guhertin û kambaxtiyê tenê tehma avê wek xwe mabû.

Di wê gavê de çêlîkeke pisîkekê spî û zer, ku nîzanibû ji ku derketiye, hat ber kaniyê sekinî û serê xwe daqûlî avê kir û rakir. Li wê mêzand, paşê car din serê xwe qurîsand avê û bi zimanê xwe yê biçûk û sorik av çêlpand. Piştî ku tê av vexwar ber bi wî ve hat. Teriya xwe rakir û piştî xwe bilind kir û xwe li dora lingên wî aland û mirmirand. Li pisîkê ecebmayî mabû. Piştî ew qas tiştên ku dîtibû bawer nedikir ku wê di nav van xirbeyan de candarekê bibîne. Rahişt pisîkê û di destê xwe de ew mist da.

Di wê keliyê de pîrejînek bi gopalê destê xwe û bi gavên westiyayî ber bi wî ve dihat. Rustem lê nihêrî û di cih de Pîra Şemsê naskir. Lê ew ne Şemsa berê bû. Piştî wê xûz bûbû û xetên eniya wê û qermîçokên rûyê wê zêdetir û kûrtir bûbûn. Di xetên rûyê wê yên esmerî de kul û keser difûriyan. Mîna ku belengaziya gund tev bi ser wê de kavi bûbe, wisa jî bêkesî û bêxwedîtiya gund di bibîkên çavên wê de xwe dida der. Halê wê ne tu hal bû; diranên wê yê pêş tev ketibûn. Mîna ku şîr girêdabe, kirasekî reş li xwe kiribû û hibriyêke kevn a reş hevrêşîmî li serê xwe girêdabû. Hineya ku di porê xwe dabû jê çûbû û çend tayê porê wê yê spî jî ji bin çarîka wê derketibû.

Rustem jî bo ku li gund rastî yeke nas hatibû hew mabû ku ji kêfa hilfiriya. Pisîk jî destê xwe danî û bi kêfxweşî beziya, xwe avêt destê wê. Pîra Şemsê bi çavên kuskusandî lê nihêrî, ew nas kir. Li teniştî hevrêşîst. Rustem got;

-Pîra Şemsê, ev çî hal e, çî bi serê gund hatiye? Ez lava dikim ka ji min re bêje. Ez dikim û nakim ji nav dernaxim. Hindek maye ku ez hiş û aqilê xwe biavêjim.

-Kurê min va ye tu bi çavên xwe dibînî. Çî hewceyî gotinê ye. Tiştê ku hate serê me bila neyê serê gurê çiyê. Kafîrbavan ne mal hiştin ne jî gund, Xwedê heqê me ji wan re nehêle.

-Pîrê, belê ez dibînim; lê haya min ji tu tiştî tune. Ez dexilê te me ka her tiştî ji serî ji min re bibêje.

-Par payîzî zarokên çiyê û leşkeran li jora gund li hev dan. Her hal çend leşker jî miribûn.

-Ma heval dihatin gund?

-Na law, hatina çî! Bi dizîka hatibin ez nizamim. Lê min bi xwe ne hatina wan bihîst, ne jî dît. Îcar ez ji kurê xwe re bibêjim; wê şeva ku dengê çekan hat, bi ber destê sibehê re leşker kişîyan gund. Bi lêdan û zorê zîlam tev komî ber mala muxtar kirin. Digotin; "We alîkarî dayê yên çiyê. Ji we re pazdeh roj muhlet, ya hûn ê çekan rakin bibin cerdevan yan jî hûn ê terka gund bikin."

Gundî û muxtar çend rojan li hev çûn û hatin, dawiyê gotina xwe kirin yek û gotin; "Em çekan ra-



nakin!" Dema leşkeran ev gotin û bédiliya gundiyan dîtî, gotin; " Hûn hevalbendên ên çiyê ne" û gundî tev dan ber daran, îşkence li wan kirin. Çi jin û çî zilam, her kesî para xwe girt. Min rûreşiyêke, zilmeke wiha nedîtibû. Topa Xwedê li wan bikeve. Ji bo ku Sofî nehiştibû kes rahêlê çekan îşkenceya mezin li wî kiribûn. Kesî nikaribû tu tişt bikira, tişt-tek ji destê kesî nedihat.

- Sofî bavê Xecê?

- Erê, bavê Xecê! Xecêya pepûk! Piştî eziyet û lêdaneke giran Sofî rakirin nexweşxaneyê, lê pir xwîn jê çûbû. Piştî çend rojan Sofî çû rehmêtê. Rehma Xwedê lê be, zilamekî baş bû! Îcar leşker dîsa hatin, gotin; " Va ye ji we re ev qas roj û ji gund biçin. " Hîn sê roj neçûbû, wekê gurên birçî li me hatin xezabê. Wan kafirên bê îman mal û warên me, rez û dehlên me tev dan ber agir û şewitandin. Em ji însanan nehesibandîn. Kes nehat hawara me, dinya derewîn e.

- Pîrê ma tu tenê li gund mayî?

Pîrê bi keser û bi dengêkî zîzbûyî;

- Kurê min, ma min ê çawa dev ji vê derê berda. Min ê ça çî xwelî li serê xwe bikira. Hestiyê bav û kalên me tev li vir in. Her kes ji xwe re bi qiriktalî çûn cihekî, ez neçûm. Çend carî hatin. Bi kotekî bi çeplê min girtin û wek telîseke niskê avêtin tirimpêlê û birin avêtin qunceke bajêr. Lê min li bajêr debar nekir û ez dîsa hatim. Êdî ew jî ji min bêzar bûn û dev ji min berdan. Ji wê rojê û vir ve ez û ev sewalên hanê ne.

Cihê ku pîrê nîşan da, Rustem lê mêzand. Çend bizin û golîkek li bin siya dîwarekî xirbe mexel hatibûn û dikeyan. Mêjiyê wî ew qas tevizîbû ku qet nedîtibû ew sewal çawa û kîngê hatibûn wir.

Li gel ew qas tiştan dikir nedikir hîn fikra Xecê ji serê wî derneketibû. Di her gotinê de hişê wî li ser Xecê bû. Mîna ku li ser sêlekê sor rûniştibe û agirek

nava dilê wî bikizirîne, di ciyê xwe de diqilqilî.

- Pîrê, tu bi xatirê Xwedê dikî haya te ji Xecê heye gelo? Çi bi serê wan de hat?

- Xecê, Keça Sofî! Piştî ew tiştên ku hatin serê bavê wê û gund dan ber agir, êdî dilê wê de yaxî nekir. Piştî çend rojan şûnde me bîhist ku lîxistiye çûye çiyê. Digot; " Ji îro şûnde ji ser xwîna bavê min, zewaca mêran ji min re heram e! Heta em ji bin zilma van kafiran xelas nebin, çavên me rojeke xweş nabîne! "

Bi bihîstîna vê xeberê mîna ku di kendalekî wer bibe, êş û arîncî wî lê zêde bûn. Rêngê wî spî bû. Dinyaya wî ser û bin bû. Per û baskên wî şikes-tin. Nebûna Xecê jê re ji her tiştî girantir bû. Dema bi vê rastiye hay bû, mîna ku ruh jê biçe şewateke xedar li singê wî xwe da der. Hêvî û xeyalên wî yek bi yek ji singê wî firiyan. Ma çî wateya jiyaneke bê Xecê hebû. Êdî Xecê jî nebû. Êdî xeyalên wî tev hatibûn girtin. Hêviyên ku li ser Xecê dabû rêsandin tev di carekê de hilweşiyabûn.

Pîrê li nava bibîkên wî nihêrî û hêvîşkestinên wî di çavên wî de dît. Bi dengêkî westiyayî û dil bi kul;

- Law, ma tu hîna hişyar nebûyî, tu hîn di xew-nên xwe yê zaroktiyê de yî. Na kurê min, zarokatiya te û dengê zarokên şeng li dûr maye. Wan kuçikba-van xewnên zarokên me jî kuştin. Êdî ji xewna xwe şiyar bibe berxê min!

Dengê Pîrê bi henûnî û nermî lê ew qas jî bi şid li nava dilê wî diket û di mêjiyê wî de olan dida. Serê wî tevlihev bûbû.

- Law, dinya ji me kurdan re ker e, guh girtiye û çavkor e. Va ye tu halê me dibînî. Em dermanê xwe peyda nekin tu kesê din bi destê xwe birîna me derman nake. Berxê min li ser vê êşê evîn şîn nayê. Teyr bi heywantiya xwe hêlîna xwe li dûrî destan ava dike, lê ku em însan in...

Bi gopale xwe çiyayên serî li asîmanan nîşan da:

- Wa ye, hêlîna evînê li wan çiyayan e. Stara me tevan li wir e.

Rustem deng nekir, serê xwe xist ber xwe û pi-sîka di dawa xwe de mist da. Piştî bédengiyekê, mîna ku hîn nû bê bîra wî ji pîrê pirsî:

- Pîra Şemsê, gelo dê û bavên min çî bi serê wan ve hatin, li ku ne, tu dizanî?

- Ew li gundê pismamên te ne.

Gunde ku Pîrê digot ne dûr bû. Wê şevê li cem pîrê ma, roja din bi hilhatina rojê re xatirê xwe ji pîrê xwest û berê xwe da gundê ku dê û bavê wî lê bûn. Ew qas di nav fikar û mitalayan de bû ku, guhertina salan di rojekê de jiyabû. Hêviyên ku xwe spartibû wan tev bi carekê li bin guhê hev ketibûn. Dikir nedikir ji nav dernediket. Mîna ku ketibe nav pelên xewnekê û di çîrokên axirzemanan de riya xwe wînda kiribe, her tişt pê xerîb dihat.

Bi hêviyên qurmiçî berî nîvro xwe gihandibû gund. Bi pirsînê hatibû ber deriyê hewşekê. Ji derî derbas bû, dê û bavê wî li hewşê rûniştibûn. Diya wî têşî dirêsa, bavê wî jî titûna xwe ji hev vedikir. Çawa ew dîtîn, qirîn û qijîn bi wan ket û bi carekê xwe avêtin ser wî. Hev himbêz kirin û giriyan. Rustem li dê û bavê xwe nihêrî her du jî pîr bibûn û qermîçokên rûyê wan zêde bibûn.

Piştî ewqas ecêban pir li ber xwe ketibû. Êdî Rustem timî di nav mital û ramanên kûr de dima. Her ku diçû dilê wî girantir dibû, êşa canê wî sivik

nedibû. Dîmenên gund û gotinên Pîrê ji serê wî der-nediket. Ji kirînên xwe yê çend salên dawî fedî kir. Bi hatina gund perda reş a qetranî ji ber çavên wî çiriyabû û ronahiyek di çavên wî de biriqîbû. Xweziya xwe bi Xecê anî. Hêviyeke nû wî ber bi xwe ve dikişand. Mîna gulek nûbişkivî vedibû. Her ku diçû reng û rûyê wî diguherî, her ku diçû di nava xwe de dike-liya. Hew mabû ku wek volqanê biteqe. Bi hesta di navbera şad û xemgîniyê de li çiyayê raserî xwe nihêrî, nihêrî, nihêrî...

5 Mijdar 2010 Girtîgeha Tîpa Fyê ya Bolûyê

Hey lawik! Rêdûr DÎJLE

Ji bo bîranîna Brahîm Orûç

Li her benderê çav, li wan çavên te yên behrî digerin

Hey Lawik!

Gidî gidî hay ji xwe hebî;

Li wî cîwarê xap û xapînokan.

Belkî (ne)evîndarê wan çavên te yên behrî,

di çaxê evînbaziya te de,

bi baqên gulê goncayî te bikin şîrîkê nefsa kotî..

Tu zanibî: “Dinya mirarek e, xwestokên wê kûçik in.”

(Hey lawik! Tu hîn goncayî di bendika dil de)

Belkî çend xwedênenas bi sûretê Xwedayî derkevin pêşberî te
Û ji te re bi gotinên ayetî qaşo şîretan bikin.

Gidî gidî! Tu bi wan nexapî,

Mebesta wan dagiriya rê û rêwîtiya te ye.

Ma ne bi heman tiştî bav û bavpîrên te jî mat kiribûn.

Tu zanibî: “Dijminê bava ‘tu carî’ nabe dostê lawa.”

(Hey lawik! Bila bi xembarî mêze nekin çavên te,

Lîlan lîlan tu bûyî serîhildan)

Hey lawik!

Te agirekî xulavî pêxist û pişko avêt nava dilê min,

Bibore...helbest êdî te venabêje; lewre tu bêhempa yî...

Lê tu zanibî: Berdêla azadiyê xwîn e,

Civaka ku berdêlê nede peyda nake bedewê..



Wêjeya jinan Xelat EHMED

Mirov dikare kêmbûna çîroknûs û romanûsên jin heya radeyekê, bi guhertina wext û rewşê ve girêbide. Berê, kesên xwendevan kêmbûn, yên heyîn ji tenê mîr bûn. Civakê qebûl nedikir jin bixwîn. Heger em nebêjin bi sedê salan, em dikarin bêjin bi dehê salan mîran tenê helbest nivîsandin. Ji Melayê Cizîrî bigire heta Ehmedê Xanî heta tu bigihîji Cegerxwîn, tenê helbest dinivîsandin. Nivîsandina çîrok û romanê di wêjeya kurdî de, ji demeke nêzik ve dest pê kiriye. Di heman demê de, ez bawer nakim jineke xwendevan ya temenê wê zêdeyî 60 salan li Kurdistanê hebe. Heger hebin jî pir kêmbûn, ku nabin bingeha avakirina wêneyeke wêjeyî. Yanî heger em bêjin di 40, 50 salên dawî de, hêdî hêdî jinên kurd jî çûn dibistanan û hînî xwendin û nivîsandinê bûn; wisa em dikarin bibînin ku rêya mîrên kurd ji helbestê heta çîrokê û romanê di sedê salan de gihandin, jinan di wexteke kurtir de gihandin. Jinên çîroknivîs a niha hindik hene. Dema tecrubeya wan giha, dê dest bi romanê jî bikin. Ez bi vê yekê bawer im.

Taybetmendiya hest û laşê jinê cihê ne. Her wisa taybetmendiya hest û laşê mîrê jî hene, ku jinek nikare bîne ziman. Lê em, çi jin çi mîr, ne bi laşê xwe dinivîsin. Em ji bilî hestan, bi hizrên xwe dinivîsin. Nerîna xwe ji tişt, bûyer û jiyanê re. Her yek ji aliyekê û li gor hizir û baweriyên xwe ve. Çawa cudabûn di navbera hizirê du mîran de jî heye, wisa di navbera hizirê mîrekî û jinekê de jî heye. Di dan û standina li ser hezkirinê, nexasim di helbestê de, cudabûna herî eşkere ye. Lê ev yek nagihê radeya ku em bêjin wêjeyeke femînen heye. Bi xwe ne gerek e ku hebe jî. Dibe jî ku nivîskaran, nexasim yên jin, hîn gelek sînorên tirs û qedexeyên civakê derbas nekirine, heta radeya destûrdana peyda-bûna wêjeyeke bi vî rengî. Her kesê dinivîse, çi jin, çi mîr, kesayetiya xwe ya taybet li wêjeyê zêde dike. Em wisa ji wêjeyê derbasî analîza giyan dibin. Bi xwe nas kiriye ku jin her dan e (dide), hezkirin, dilovanî, piştgirtin, lêbihirîn û qurbanî. Çend bikarin bêhtir bidin, hewqasî xwe xweşik û jîndar dibînin. Mîr bêhtir xwe di hêzê de dibînin. Çend bihêztir

bin, hewqasî xwe bi qedir û qîmet dibînin. Ji ber wisa di bersiva pîrsa berî vê de min da xuyakirin ku di helbestê de zimanê jinê ji yê mîrê cuda ye. Lê dîsa jî ne di hemî babetan de. Yanî wekî nimûne di zimanê helbestên bo serfirazî û azadî û şoreşa kurdistanê re, mirov cudahiyeke mezin nabîne. Em ji bîr nekin ku hizra civaka kurdî ya bitriyarkî di hazirê salan de giyan û hizirê jinan jî heya radeyekê ber bi mîraniyê ve bîriye. Her jineke nivîskar di vê yekê de jî li ber xwe dide. Hîn em hewl didin, qaşilî ji ser giyan û hizirê xwe rakin, da em bikarin xwe bi xwe bibînin. Nivîsandin yek ji alavên wê hewldanê ye.

Bo min, tenê nivîskar heye, dibe jin be, dibe mîr. Li gor berhem û hewldanên wê/ wî mirov dikare wek nivîskar qebûl bike yan na.

Berê me got mîrê ji hêzê hez dikin û di nerîna wan de wisa bi qedir û qîmet dibin. Her wisa ne veşartîye ku jin di civaka kurdan de bindestê mîrê e. Em dikarin bêjin ku ew bi xwe vîdestiyê qebûl dike û li gor rêz û baweriyên civaka kurdan rast dibîne. Em li ser gelemperiya civaka kurdan diaxivin û ne li ser nimûneyên jinan ên serkeftî. Yanî mîrek dikare ji jina xwe re çêran bike, dikare lê jî bixe, û di gelek caran de civak tayê wî digire. Jinek nikare li mîrê xwe bixe, carinan jî nikare destê xwe li ber xwe hilîne, hem ji hêza xwe ve nikare, hem jî rêz û pêkanî-nên civatê wê şermazar dikin. Çareya wê ya dawî dimîne yezdan, lav û gazindên xwe ba wî dike. Mîr jî nikare şerê yezdan bike.

Hez dikî hûn ji destpêkê ve diçespînin ku berhemên jinên nivîskar, kêmbûn berhemên mîrên nivîskarin. Kî dikare bi xwe berhevdanek wisa bike? Berhe-meke jêhatî heye û berhemek qels heye, tu girêdana vî yekê bi zayînê re nîn e. Ji bilî dewlemendî, yan qelsbûna berhemê tu pîvanên din ji bo yê/ ya rexnevan re nînin, û divê nebin. Heger ê rexnevan wek hûn dibêjin li qelsiyên nivîsekê nenêre, ji ber ya nivîskar jin e, dê jinên nivîskar nikaribin li ber qelsiya berhemên xwe rawestin û hewl bidin xwe pêş de bibin. Tiştê tenê em weke jin ji çapemeniya kurdî dixwazin ew e, ku berhemên me bindest neke û

derfetê bide me, em jî gotina xwe û keda xwe tevî wêjeya kurdî bikin. Ez wisa dibêjim ji ber ku bêhtirê berpirsiyarên çapemeniyê mêr in. Divê ez vê jî bibêjim ku heta niha piştgiya jinên nivîskar baş tê kirin. Di heman demê de, carinan em dibînin ku zimandirêjî û bêbextî jî li wan tê kirin.

Berî a niha em li ser dem û rewş û xwendinê axivîn. Her wisa em li ser rola civaka betriyarkî û rêz û tirs û ji xwe xerîbiyê axivîn. Civaka kurdan bi tevahî divê pêş bikeve. Nerîn û hizrên li hember jinê divê werin guhertin. Yanî her tişt bi hev re girdayî ne. Siyaset, civak, zanebûn û gelek tiştên din. Helbet ev

guhertin ne tenê barê milê jinê ye, lê dîsa jî divê bi rola xwe rabe û xwe azad bike. Ez bawer im hîn bêhtir ji navên jinên nivîskar, jinên din hene ku dinivîsin, lê ji ber gelek sedeman xwe nadin xuya kirin. Belkî baweriya wan bi xwe kêr e, belkî têkiliyên wan bi çapemeniyê re kêr in, belkî newêrin nivîsên xwe belav bikin. Divê ew bi xwe arî xwe nekin. Cegera wan hebe xwe tevî tecrûba nivîsandinê bikin. Her wisa divê ku çapemenî bi hemî şeweyên xwe alî wan bike ku diwarê tirsê hulgurînin ango hilweşînin.

Bihar Kerem BÎLEN

Mistek ji biharê...

Ji bo ristina bêriyan

Ez meşiyam di şevên bê hîv de

Min xwest ez fêr bikim dengê dilê xwe

Dengê hesret û hezîrinê...

Îro rojek ji rojên biharê ye. Rojeke xweş û rengîn... Niha tu yê ji min re bibêji 'roj baş' ma biharê nû dest pê kiriye? Na heval na. Erê rast e, demsal jî zû ve dest pê kiriye lê bihar hîn nehatiye vî welatê xerîb, loma dem û dewran her tim di bin xemgîniyê de derbas dibe li vî diyarê bê kes. Te rastî bivê heval li gel tîrêjen rojê, yê geş û rengê biharê dîsa ji jîyan li ber çavên min xemgîn e. Sedem çî ye ez jî nizamim, lê wekî di bin xunaveke baranê de dimeşim, dûr û dûr mêze dikim. Gelo li çî dinîhêrim, dixwazim çî bibînim, ez bi xwe jî nizamim. Awirên kederbarkirî, xeyalên veşartî û hestên nepenî... Di nav dengê bê dengiyê de tene-tiyeke bê wext... Tenê ez û xeyalên xwe. Demên bê dem û biharek xemgîn... Beytik ref bi ref difirin li ser singê demê. Ji hesreta jinên awazên dilbikûl, stranên şadiwar. Ax tu bibîni heval, di valahiya asîmanan de çî şad û bextewar direqisin. Li ser tevnê azadiyê gavên bi aheng. Tenêtiya min bi deng û awaza wan xerab dibe niha. Belkî ji azadî û şahiya wan dihesidim, nizamim lê nava min bi dengê wan disincire, bi kel difûre dilê min. Li beramberê tîlîlî û govenda wan kenekî wînda konê xwe vedaye li ser rûyê min. Kenekî nepen û veşartî, kenekî ji dem û dewranan qutbûyî û ji şûn ve mayî...Li qeraxa temenê min ê navsale. Ez û kenê xwe. Tu dizanî mirov carinan nikare hestên xwe bişayesîne, mirov nizane bi kîjan hevokan bi lêv bike û bi kîjan peyvên birêse. Ji ber ku bê nav in, rengê xwe ji rengê bêrengiya xwe digirin, carinan di-kene, carinan digirî lê her dilorîne. Mîna straneke li ser zimanê kilambêjekî zorxweş binale, ji dûr ve li porên guhên mirov dikeve. Geh mirov dixê nava efsûnan û li pey razên bê şop neçar dihêle, geh jî mirov derdixe zozanan li nav mîrg û çîmenan, bi bêhna gul û sosinan mest dike. Carinan jî mirov dike mîvanê, Kela Memê Şivan bi şevbuhêrkên şevan, çîroka wî vedibêje, loma te bi her awayî digire nava xwe, tu nizanî çî navî lê bikî. Guh ker, ziman lal e û bê sewt e....Tu nêz dibîni lê pir dûr xuya dike. Wisa ku tu destên xwe dirêj dikî, tu dibêji qey min girtiye û di mista min de miçandî maye. Bi vê yekê dilê te xweş û rûyê te geş dibe. Bi hestên şadiwar rûyê te dibeşîşe, çavên te dikenin, li ser baskên papûleyeke cihêreng difire, di nava xwezayeke bi gul û kulîlkên biharê de xemîlî ye. Lewra tu naxwazî mista xwe vekî, ji ber ku tu ditirsî, tu ditirsî ku hêvî, xeyal û xweşiyên te di mista xwe de miçandiye ji dest bide û êdî nema dikare bigirî, lê bi eslê xwe di mista te de tu tiştek nîn e, tu jî vê yekê dizanî, lê wisa jî be, dîsa tu hîs dikî û dijî. Êêê ma jixwe jîyan ne hestek e ku mirov hîs dike û dijî. Hesteke nepenî û nebinavkirî. Mîna baranek ji peşken hesretê dibare, carinan ken û carinan ji kederê bar dike. Wekî xewneke mirov qet naxwaze bi dawî bibe, xeyal jî be, mirov dijî û li pey wê dimeşe. Bihara girtigehan jî wisa ye heval.

Nan

Feratê DENGIZÎ

Îroj roj roja min bû.

Min nivînên xwe pêçan û xistin malnivînê.

Bêhemdî min aqilê min çû ser şêwe û wateya “makulîn”, “malnivîn” û “kulîn”ê. Temam, “malnivîn” mala nivînan bû ji dema bav û kalan mayîn; di xanî û qesrên kevirîn de, wek mala di dîwêr... Yanî di dîwêr de “kolandî!” Her çiqasî bi lêkirê re şêwekirî. Bi xêlî û xalîçeyan xemilandî û nixumandî. Û “makulîn” jî wisa, denan tê de xwe didan kêleka hev; ên rûn, ên dimsê, ên qeliyê û li “kulîn”ê, yanî bi gotina niha li mutbexê. Baş e. Her tişt wisa xweş bi hev hatiye girêdan, zelal û xwerû. Çima em jî mutbexê re, jî pêjgehê re nabedin “kulîn!” Xweş, rind û gotineke qedîm! Makulîn li kulînê...

Min got, îro roja min e.

Ez berê xwe bi ku dim, ez ê herim. Berê gotinê jî bidim ku ew ê here. Nexeyîdin...

Min ew dît. Çavbitirs bû. Dîsa xwe negirt û silaveke şermok berê me da xweşaxaftinekê û parvekirina derd û kulan.

Digot “ditirsim, ji awirên wî ditirsim. Tu dizanî. Tirs mirov dixeşîne, bêaqil dike, mirov zêde li ser qencyê nafikire. Awirên wî dipirsîn; ezeziyê, azadiyê, evînê, jiyane, rastî û duristiyê û her wiha, dipirsîn û bersivên min jî neyînî ne. Min her tişt kir qurbana jiyaneke têrpere û hebûnê... Û azadî çû, evîn çû, jiyane bîreke bêbinî. Bibêje hema ez koleya hemdem û modern a jiyaneke sexte me. Jiyana min ‘wek’e. Ne jî dil û hestan e. Jixwe parvekirin tune. Carinan xwekuştinê dilêrî dibînim, ez ewqasî ne wêrek im jî... Newêrek im ez.”

Û dengê xwe birî... Bêdengiyeke kûr û têrwate. Min ew wisa hişt û birîna dil hilgirt xist berîka dilê xwe û çavên min bûn kaniya jiyane; kaniya ku bêrî, xwîn û elem jê diherikin. Kaniya derd û kulan.

Çawa mirov destavêtkarê xwe diecibîne û dibe evîndarê kujer û neyarê xwe! Zordar çima tim xwedî û serdestên xweşikan û xweşikayiyê ne. Gelo hirmî pir li hirçê tê, hirmiya qenc jê re afirîye?

Çima evîn û dil ji rastiyan ditirsîn?!

Hê jî nizamim. Jixwe ez nezan im!

Çaxa berê wê ket min, bi bazdan ez hembêz kirim, wek her germya xwe.

Çaya li ber bedenê, li ber berberojkê esirkî bêhempa bû. Û wê wek bilbilan dixwend. Ez ji xwendina kew û bilbilan pir hez dikim. Wê dizanibû û bi xweşbilbilya xwe azana esirkî didomand mîna ner-

mazana sibehê;

“Qedexkirina zimên, komkujiya mirovî û her wiha ya mirovahiyê ye. Ya ku herî zêde min aciz dike gotinên qaşo rewşenbîr û zaneyan e, ‘qanûn e, ku qanûn bibeye tuneye, tune ye. Ma dibe ku zimanekî din bibe yê perwerdehiyê!’ dibedin, bê şerm. Rûreşino! Ma mirov li gorî qanûnan heye yan tune ye.... Va ye ez heme û qanûn jî serê xwe bixwin!”

Nedisekinî, mîna ava rûbarên Zozanê Şerefîdînê bû, dixumxumî;

“Mirov çawa gelekî, gelekî bi milyonan nebîne û xwîna ku diherike xewan li mirov neherimîne. Ma wijdan li iznê ye gelo. Xwediyê dîn û îmanê jî, kerbaviyê dîkin. Wê îrşadker bê aqil bide min, min hîn hol bike û qaşo dil û mejiyê min ronî bike. De biqesîte. Bicehime. Biqelihe. Ev çi heqaret e Xwedêyo! Wek ku Simoyê gundê me digot, ‘ma selikên te xelas nebûn. Biqedîne wan mîratan û li jêrê binêre bê çi zilm dibare bi ser me kurdan, li ser navê te. Ê de bes e...”

Na nedisekinî. Ma av û jiyan disekinin? Ma zeman disekine? Hebûn jî nedisekinî û diherikî. Em jî bi rastî û reseniya xwe re digel zilma giran... Û “fereca xêrê ne dîr e!”

Ez jî mirovî qet fêhm nakim! Hinek zilmê dibînin û hinek li cem zaliman têr dixwin, malnişîn dibin, xwîn ji tiliya wan nayê û bi kaliya xwe radi-bin radihêjin çenteyê xwe û tên dibêjin ‘ez nûnerê we me, ez ê xizmetê ji gelê xwe re bikim, min li ser çavên xwe bikin.’ Wey li minê. Ma tu heya niha li ku bu yî! Hinek aqilê min hebû, ew jî bi bilbilê re çû, bi bilbila ku piştî wêraniya gund hêlîna xwe ji tehtë koçî ser pencereya min a dilê jiyane kiribû re, çû û hey çû...

Biborin. Ez mirovî qet û qet fêhm nakim. Ma Seydayê min ê ku **Xwîn ji Cegera** wî diniquitî belahêq digot; “Piştî ilmê xwe yê mezin ez bûm Dodê qulingvan!”

Mala wan ava, dora Bedenê xweş kiribûn. Min xwe da ser rûnişteke, piştî xwe da Bedenê û ketim seyrana alemê. Xwedî dezgehê ku li kolanan tiştan difirotin raserî min. Silavek Xwedayî bû sedema xweşaxaftinekê;

“Mala Xwedê ava, nanê me dertê, lê ez bêriya gund dikim. Gund, çiya, Xweza zehf xweş in. Bi rastî hê jî nizamim ev çi bobelat bû hate serê me. Çima hebûna ma sîc e? Ji roja Xwedê me dide û

heta mirinê em tim sûcdar in. Em çî bikin em sûcdar in. Gelo, çîma?”

Çimaya wî li bêdengiyê diket û di kerika guhê Xwezayê de deng vedida, dengvedaneke bê bersiv.

“Kî ji ber hebûna xwe tê kuştin û şewitandin ez nizamim. Gelo li ser rûyê erdê xelkekî mîna me, mî-nakeke din mîna me heye, ji ber hebûna xwe sûcdar? ‘Çîma hûn hene... Çîma tu heyî?’ Hela, hela, ma ez çî dizanim! Her kes çawa hebin, ez jî wilo! Çîma hebûna kesekî din, a serdestan, a malpiran, a dewletê ne sûc e ya min sûc e? Neyse ez serê te neê-şînim.”

Ma jixwe ji berê de serê min ji ber vê êşê diêşiya.

Heqet ên hemberên me, yên rikberên me çîma hene û hebûna wan ne sûc e û zimanê wan ne qe-dexe ye û ne zimanekî ku nayê nasîn e?

Oof... Jixwe serê min diêşiya.

“Tu herî zêde çî difiroşî?”

“Tu yê bawer nekî lê av... Herî zêde ez avê difiroşim û nanê min ji avê dertê! Lê a rast av jiyan e û her û her belaş e. Ava Xwedê ye. Ji asîmanan tê. Em ji ava ku belaş bû lê niha pir buha ye, nanê xwe derdixin.”

Ket bîra min ku digotin, “em avê ziwa bikin wê masî bimirin...”

De were mirovan û jiyanê fêhm bike!

Lê îroj roj roja min e.

Ez li serê keheha Mêrdînê me û berê gotina min li ‘*Berîka Mêrdînê*’, li beriya fireh û dûdirêj e. Dûv-dirêj, heta mala Xwedê...

Azadî û fêhmkirin wilo dûdirêj.

Winda me Huseyîn MISTO

Dereweke efsûnî
Bi rûpoşa “ez”ê lê
Xwe li dîroka winda pêça
Û bêsermiyeke sermedî
Xwe li eniya demê hilawist...


Li biyaniya biyan
Xewnên bêhnkizirî
Xwe xêz dikirin
Di çavê asoyên sor ê kilkirî da.
Winda me!
Ne nav û nîşan
Sêwiyê erd û asîmanan
Û ez bûm lixwegerekî riya wî dûr

Bi lawijan
Min berê xwe da deriyê yezdanan
Rondikên sar barandin
Hêvî di malzaroka xwe de qerisî...

Îro der barê par û pêrarên xwe giriya
Xweziyên stûxwar
Wê gavê
Min xwe li sînorên welatekî
Jibîrbûyî dît
Li wir
Mirina bê gor

Siltan bû
Ezraîl erşa xwe vedabû...
Çûkekê;
Li ser çêlçûkên xwe dilorand
Dayikek;
Bi hilma dilovaniyê
Cêwiyên xwe di singê xwe de vedişart
Û xatir ji jiyanê dixwest
Keçekê;
Xwe bi xeyala bûkaniyê kefenkiri bû
Li ser axa ku keçaniya xwe windakirî

Bi temenekî westiyayî
Min xwe li rawestgeha şevê girt
Û şev û şevistan li aramiya xwe digerin
Ji dilê xwe
Melodiyeke nehewandî
Stêrk melûl melûl hişyar dibûn
Li wir
Min xwe li bêrîkirinan pêçand
Û li ser berbangeke rojhilatî hişyar bûm
Min dît
Peyvekê;
Di tîrêjên zêr zerîn da
Li navnîşana xwe digere



Siya şevê teliqî ar-da JANXWAR

Hejên ji daristanên şevên şevtarî nahperûkên xwe yî qîlîn di nermika zengeloka çirûskên hêyvê de digerand. Heyvê rêça xwe ji ber pêçiyên reş şevê wenda kir. Şev lê gerîya. Germola bêdengîyê, xwe li qirika hêyvê girtibû. Rohnî di morika çavên wê de diteqand. Avreşek fetisokî li rûyên wê gewimî. Mij û dûmanek jengerokî li ser deqê rûkelên rûyê wê dixist. Şevreş teqîn ji gewdê xwe dihanî û pitik pitikî li herderê nava gewda xwe bela wela dikir. Gewdê ezman di nava tenîyê de fetisibî. Çav çava nedidît. Çavê mirov mişt xûmam digirt ji mijahîya reşahîyê. Kesî kes nedidît. Kesa/ê ne ji mecbûrî bû ya, ji mala xwe dernediket. Dengê wawîkan û kûndê şikêran bêdengîya şevê di nava şikeftê taldên paş darên hewran de diçirand. Şewl şewla ji baskên qertelên şevan dihat, ricif bi şûşeyên di şikeftên kûr û reş de diçikand. Ji cihê wê de dileqand. Hinek jî, ji cihê wan bi hohela dengên di olan de vedilîzî. Bi şîmaqek şerqînî ji bêdengîyê didizî û di belengoşka şevê de di zengeloka pepûka de diteqîya. Xerq li sewta pepûka radibû. Xişînî ji nav pelên darên çinarê yên bilind dihat. Pel û pûrtên hişkolekî li çimê darên sikûmên wan rût haliqîbû. Çûkê sîng pûrt, pûrtê xwe dinepixand û li ser dargûlikên di derdawê çinarê de, xwe di bin pelên destpahn de, serê xwe di bin baskên hevdû de radikirin. Di bin baskên hevdû de, serma li hevdû fisgerm dikirin. Dengê pirpira baskên wan, gûlîyên di çavên şevên darînî dihejand. Ba lê dixist. Bi terpînekê li zikê erdê diket. Tû nema bû mirov ji tirs, di bin xwe de berbida. Rincif diket nava mirov. Xofînî li dilê mirov dixist.

Êşo, di tirimbêla xwe de berê wî li rê, şoqa çavên xwe weka şûran li bin gûhê şevê dixist. Lê şeva bêar, şoqa çavê wî di gomzîka xwe de difetisand. Xerqa şeva kal, kel û dûxan lê rakiribû.

Ev çi şev e! Ez nikarim pêşîya xwe bibinîm. Şoqa çavê tirimbêla min di nav şeva tarî de vedilîze û di-perpîte. Tew ev derdê tirimbêlê ne bese. Bi bir û gewda xofên wawîka xwe li bin çavên, camên texsîya min dixin, inte inte makîna min e, min hîn nû ew duh ji temîrê derxistiye. Tu çi zû xerabû hey mîrat.

Êşo, haya wî ji bayê felekê tûnebû, tekerê texsîya

wî di cihokê de ketibû herîyê û tede badanaj dikir. Herîyê tekerê wî di gerînekên xwe de cûtîbû, di nav hûrên xwe de wenda kiribû. Nedihişt qet tevbiwe. Herdû alîyên rê ji qorên hewrên qambilind ew dor-pêç kiribûn.

Di ber xwe de got:

Hela ez peya bim, hîn min nigê xwe nehavêt derve jî tew waye îstop kir û sekinî jî, de ka ez ê vê şeva hanê çi li xwelîyê serê xwe bikim. Her der tarî; mij û dûman ez nizam ez li ku derê mim. Tû teliya di çavên hevdû de rake. Şevê zû ji rojê xwaribû. Ma mirov hewqas li dijî hev be. Qet rehm nakeve dilê we, ma! Piçek ronî jî tûneye. Di serde ev mija zingarokî bêhna mirov disekinîne. Ereba min tekerên wê di herîya cihokê de haliqîye, ne dehere ne tê, ji cihî xwe de naleqe. Ez der dora xwe binerim bê ka kesek tûneye, tew nebe ez ê îşev herim li ba wan biminîm. Hela heta sibê bê Xwedê çawa dike.

Êşo, ereba wî di cihoka şeva tarî de badanaj dikir lê şevê xwe wek kona li ser danî bû. Nedihişt tev de bigere. Li tela rastîya wî malek, şibake û derabên wan heta piştê vekirî bû. Bayê xerbî mija bê aram li bin gûhê perda nexşînî dixist pel û pûdankê li ber şibakê bi hewa dixist, şerqînî li binê fersê bin şibakê dihanî. Êşo, di cihê xwe de veciniqî û bi xişîna perda derdawê wê ve şînbêrikên girs li bin gûhê derabê diket. Wek şerqînî ji gûhê Êşo were bi erînekê bi hewa ket.

Haho! Ev çiye! Ma, qey hinek henekê xwe bi min dikin. Bi xêra vê hinekî saw bi min re çêbû, tew tûnebî ji xêndî min hinekî din jî ez dizanim li vir heye. Ka ez binerim bê çi li milên min î çepê heye. Malê-êêêêêh! Ha malêêêê! Kes tûneye li vira.

Ba li dengê wî diket, ber bi jurê de olên sist vedida. Şibake bi heta erînekê vekiribû, perde bi hêlekê diçû û bi hêlekê dihat. Çend banga banî xwedîyê malê kir lê bêdeng bûn. Deng ji kesî nedihat.

Êşo, çend denga bangî xwedîyê malê kir deng ji kesî derneket. Lê bê çare bû şev bi mijarî lê bûbû lorgosî, ereba wî, wî di hûndûrê xwe de bêçare xeniqandî bû. Çavên xweyî şerpitî lê beloq kiribû. Qîr qîrê tavanana carina erd bi spî vedialast, pelçimê darê

xişinî ji sînga şevtarîyê dihanî. Pîyê xwe bi hişk dijdand. Pêlawa xwe mîna qijnika bi erdê dizeliqand û ji cihê xwe tevnedilivî. Gûhê xwe mîj kir ji bêdengîya şevtarî û bala xwe da mala bêdeng. Pê li serê tilîka dikir. Şûşeyek serî tûj ji bin pahnîya wî de pengizî û gote, tereq li bin gûhê camekê ket. Xwe daqûl kir. Bi erdê ve zeliqî. Hema tû nemabû têteta binê erdê.

Çi ji min re hatîye. Ez berê ne hewqasî tirsonek bûm. Ez bûm im tîrmokên tirsonekan. Ji cihê xwe rabim. Dew û delingê xwe dawşînim. Berê xwe bidim vê malê, bê çi qewimîye, qey ji qestî li min wîsa dike. Belbî dixwaze ji mêvanan re fantaziyan çêbikin. Dibe ev teybetmendîyek xûsûsî be.

Êşo, hinek cilhet stend. Bê tirs bi gavên mezin berê xwe da mala ba ji hûndirê wan difirîya û xûre xûr ji bişkoke derebayên bê dengîyên wan dihanî. Xwe nêzî malê kir. Derî girtî bû. Tenê deraba ya şibakê vekirî bû. Sura bayê bêdengîyê cilhet di baskê wî de afirandibû. Derabe da alîyekî û berê xwe da şibaka jûra tarî. Gavê xwe ji kirikê şibaka vekirî avêt hundir. Alîkarî ji pîyên xwe yî çepê stend. Destê xwe da kirikên diwêr. Xwe hûpî hûndir kir. Çawa xwe hîpî kir. Zirpêçiyên mezin devê wî girt. Bû fisa fisa devê wî, bêhnê êgir ji nav tilîyên jinikê difirûdî.

Hûş tû deng bikî, ez ê te ji li vir temam bikim.

Wech li Êşo zer bû. Di dilê xwe de got: 'Ev çi gû bû ez ketimê. Xwezî, ez nehatimam vira. Ji xwe ev bêdengîya ne ji xêrê re bû. Ev delaletiyên xerabîyê dide mirov. Lê çi heyf! Ji destên min çû. Ya girîng ka, ezê çi bikim? Wê bifikirim.'

Bişkoka jûrê vexist. Êşo, di cihê xwe de cemidî û velizî! Di qoltixekê de zilamekî nav salî rûniştî. Lê derbek tenê li enîya wî ketî ye, paş serî bera ber daye. Tû dibêje qey mozê pê de vedaye, hewka qulbûye û piçekî werimîye. Lê ew li wir temam kirîye. Paş serê wî de holek fireh tê de vekirîye. Ving vinga mêş û kermêşa ji paş serê wî, yek bazdide yek ser yekê, ji wan re bûye cihê ser bazdanê. Tu ji dûr ve lê mêze dikî, tu dibêji qey, li ber singê xwe mexel hatîye û di cihê xwe de veketîye.

Temam. Ez deng nakim. Te ez bêhnçikandî kirim. Pêçiyê xwe ji ser qapaxa devê min rake. Tu bêji çi ez ê bi ya te bikim.

Lê ruh şêrîne. Êşo, ketina keran bi çavên xwe dîtibû. Di ber xwe de digot: 'Birîna ku tu bi destê xwe vekî, derman tune ye. Ya baş ez wê ji bin bigrim. Bê ka çi di bin vî genî de ye.'

Cixara te heye? Cixarakê bide min ji kerema xwe. Texsîya min tekerê wê di heriyê de ma, ez mecbûr mam bêm vira. Lê ne poşmanim hatim vê derê. Belbî ez karibim arîkarîya te bikim.

Piştî axaftina Êşo, hinek dilê jinikê hat ber wê, hilma wê fireh bû. Tîna tîrsa wê şikest. Ewrê tîrsê li ser serê wê bela wela bû. Bin heşê wê de gûm gûma

mij û dûmana gûmanîya pîrsa, derî hêdî hêdî ber bi sayî bûnê de vedibû. Qûlikê qomçeyê berdilkê bine-sazîya bin heşê wê hêdî hêdî verdisîya û ji bin de dirizîya, zexta li daxikê bîra wê dixist. Pelçînî ji zêrikê ser qûmaxê wê dihat. Ji astarê bîr û bawerîyên Êşo, bi tixikên wî piçik piçik nexşên bawerîyê li ser ruhê wê dihat dirûtin. Hestên wê rohn dibû. Peqîk bi dibin komgevizka hewdikên dilên wê diket. Belçînî ji hinavên hestên wê dihat. Ji nivşkê bi niqirîskan ken ket. Xwe avêt nav çavhenûnîya Êşo û dilop dilop hêsir diweşand nav pîyên wî. Te digot qey ji berê hevdu dinasin. Bû hûngûr hûngûra wê, Êşo, li ber gerîya, sewta wê bi kefa destê xwe bi ser porê wê bir û anî, ew biland.

-Ez xwe bi te naskirin bidim. Navên min Êşo ye. Xwe li ber nexe, belbî ev çêtir bû. Ka rûnê li cihekî, ev pakêta cixara te yî li vê tenîstê, misada te hebe yekê ji xwe re, yekê ji tere derdixim. A ji tere vê cixarê, min vexistî ye. Ka ez te bidim li ser vê pal-dankê. Hinekî bi xwe re bixeyidî. Bes xwe biqehirîne. Dem tune ye. Ka bêje mesele çi bû. Ji serî de ji min re bibêje.

Jinik him digirîya, him li kerîneka germola çav-belekê Êşo dinerî. Berên şekeliya êşên xwe dida bendavê êşbirên Êşo. Deriyê xêrê lê vebûbû. Dixwast Êşo, birina wê bimijê, çi girêz û gerîneka di gewrîya wê de werimî bû bi xortima êşbirên xwe dawerivîne, paqîş bike. Devê borîya lûlên êşê wê bi dermançavên xwe bernexûm bike. Birîna wê hêdî hêdî hênîk û nerm bike, bêhna barûdê bi bêvila wî bikişîne. Êşa le ser sînga wê bûye elem, bi xortima wî bikişîne û singewrîya wê bi hestên xelasîyê repin bike. Bi baskên hestên xwe wê bi firê bixe. Dixwest hêdî hêdî li ser wê bibane.

Ev kûçika berê ji min re pir baş bû. Me pir ji hevdu hez dikir. Yeka min nedikir dudo. Ji peyva min dernediket. Lê piştî ku çû peywîrên leşkerî kir û hat şûnde te digot qey; ew çû, li şûna wî yekî dinê hat. Sedûheştî pîleyî hat gûhertin. Zikê wî bi tu tiştî û tu kesî nedişîwetî, çi teba û heywan didît efû nedikir dikûşt. Digot ji min pê ve ez kesekî nîşandar nabînim. Tenê ez û ez. Ji qalibê xwe derketibû. Însanetî pê re nema bû. Bîst û çar saetan li seyde bû. Ew lawîrên bê dev û bê ziman dikûşt û berata wan li wan deran dihişt. Min qet îdare nekir, zikê min bi wan heywanên bê dev û bê ziman dişewitî, xew nediket çavê min. Tew ev ne bes bû. Bi hin bazirganên kûcûrên sileha difroşe, pê re têkîlî danî bûn. Min vê dawiyê ev ji bihîst. Ronî di çavê min de nema.

Min fêhm kir. Lê berî hertiştî şopên tilîyên te yên li van deran û yên li ser hacetên tîfingê paqîj bikim. Di bîranînên wî de tu bûyerên nebaş hatibûn serî yan na? Navbera wî û kesên din nexweş bû, tiştê hebû yan na?

Bêhn bi dor kendalê firnikê Êşo mij dûman gir-tibû. Wek rovî, bêhna şopên gerînekî di kortikê za-boqên tarî de veşartî, dikir. Li deşta jînewarîya hestên jinikê bêvla xwe pehn dikir. Xwe li ser kevanê birînê wê, hestên xwe merhemdikir. Birînên dilê wê bi vizîna bayê ji devê wî difirîya birîna wê pûxte dikir. Bahênîk li rûyê wê mist dida. Cansivîkî pê re çêdibû. Bi bêhnfirehek têr xûrt û stûr hinavên xwe li badikir.

Pir ji ajotandina bezabûna tirimbêla hest dikir. Mehek berê pê li zarokê kiribû. Lê kesekî nedîtî bû, tenê min dît. Li gor qala derdorê, bavê wî zarokî em dan dadgehê, lê bela şehad tûnebû. Şehadê rovî dêla rovî bû. Ew bûyer veşirtî ma. Bavê lêwîk dormekî hat ber derfeyên me, gote: 'Ev ji te re namîne.' Min nedît, wî dîtibû. Min pê re peyman çêkir, soz da bû min gote: 'Ez ê ji van xetayên xwe vegerim.' Lê mixabin çiqas çû bêtir xera bû, kûrmê şîrî heta pîrî bû. Min tenê xwe dixapand. Kêr hatibû li hestî sekinî bû. Te-batî nehat min. Hew heta vir min dikaribû taqet bi-kira. Xewa şeva li min bûn hesret. Ez bi saxî ketibûm agirê dogehê. Her şevê xwedê bi destan diaxivî û digot min kûşt, min kûşt.

Her tişt li gor dilê Êşo, qewimî bû. Ew pisporê van rewşena bû. Karê wî ew bû. Lê xwe li kerî datanî, bi baqilî dixwar. Bi kûştina lawê xwe dest bi vî karî kiribû. Bi dû bêhna zarokê xwe ketibû. Bêhna zarok ew di vir de derxistibû. Bi dû heyfê ketibû. Bi dû qe-sasê lawikê xwe ketibû.

Berbanga sibê bû. Rojê hêdî hêdî xwe ji sînga ger-dûnê dişeqitand. Soringên tavrojkê hêdî hêdî şev dialast. Li ber tîrojen beroşk, histrêkan xwe asê dikir û di çavên ewrên reşgom de vedilîst û li ber çav

wenda dibû. Xûmamî xwe li gomên di hêyvê de diçî-kand. Baçomêrkên şevê di gewrîya rojê de bask li ba dixist. Şev ber bi belengoşka erş û ezmên de dipe-kîya, di paxila birûskên berbangên sibehê de ji ezmên dûr diket. Tavrojk, şev ji tarîtiyê xelasdikir, bi şîrqînî êşê wê dimêt û li ser rûyê axê vedirîşîya. Gû-mînî ji nava zikê ewrê neheqîyê dihanî, erşê nehe-qîyê dilerizî, talîzok bi ezman diket, zikêşek şewt di gerînekên bêbextiyê de digobilî.

-Ka wê silehê em bidin destê wî. Bila şop li ser wî kom bibe. Destê xwe bide min. Hîn nebûye sibe, em ji vira biteqizin.

Ewrên reş xwe li ser wan dicivand ser hev. Şîrqe-şîrqa birûskan di navrenê hevdûde xwe li hevdu asê dikir. Agir ji navrana wan diçûrisî. Singa ewrên reş bi şîrqînîya birûskên şid diçirîya. Xumexûm bi erd û ezmên diket. Xwe tûj gobiland mala tarî. Sê çar derba birûsk bi ser hev lêxist. Agir bi malê ket. Zîpi-kên weke hebê tiriyên Hesenî li erdê repîn dixist, toz û tebara ji erdê radibû xwe li zîpikên gilover digirt, bi şerpînî li nava şekeliyê diket kortikên herîni bi şûj û bixûra dagir dikir. Wextekê deng ji şîqêşîqa tavê di hembêza ewra de û xîzînî ji sîngê biliya bû. Baranê êş digûvaşt.

Avê, rêya xwe dîtibû, di bin diwarê xerabe re xwe berda û diwar xund û xerabe kir, xwe bera cihokên li paş avahiyên yek qato da û di bin diwêr re xwe di hundir de da der. Şev di xewnên rijî de teqîya bû, xewnên rijî tevde avî bûbûn.

Êşo, di mirêka hûrik ya kêlaka tirimbêlê de li dû xwe nêrî. Bêhn û berata xênî nedixwuya. Jina qam-kihêl li bestên hinarekên wî de, li bin sîtava çavên wî de dimizmizî...

Li çirûsînên şîn bilûse Xecê OMERÎ

Kişfa pêşîn !
Bi çarlepikan bû, pêlîstok bû jîn...
hê bêhna şîr ji devê bûneweriyê dihat


Kişfa duyem !
Bi çar gavên pîkolî
Li ser pişta qozerê lîstok bû jîn...
Bi per dibû difirîya bi refên hehecîkan re
Bi coş dibû difûriya bi bandana dîkê sibê re
Di bin qozerê re dibeziya ,
Û digihîşt xwezîyan...

Û kişfa sêyem!
Bi dilê ewilî re, ba û bahoz bû jîn
Ji ser pişta qozeran qulopanî hev dibûn Zîn,
Û dişikîyan...
Dişikîyan!.
Awêneya baweriyê dişikîya...

Lê bêcebarî dicebirî, bikemilînê.
Û jîn...
Dîsa li çirûsînên bi şîn dilûse...

Carl Sandburg

Wergera ji îngilîzî: Lenya DILA



Reşik

Ez reşik im.
 Stranbêj,
 Û reqsvan ...
 Ji tayê pembo nermtir...
 Ji erdê reş hişktir
 Rêyên li bin rojê,
 Ji aliyê koleyên pêxwas tîn dewisandin...
 Kefa diranan ...şikestina kenên hirhirî...
 Evîna sor a ji xwîna jinekê,
 Evîna spî ya ji ketina zarokên reşik...
 Evîna zexel ya ji dengê bançokê* tê...
 Xwêdayî û diajon ji bo perê benderê,
 Kenekî bi dengê bilind li bin dest veşartî, weke
 xaman,
 Kulmên hişk bi çembilan,
 Kenê xewnên hênijandî yên deviyên pîr,
 Dîn wek roj û haviyê û xurtkirin,
 dilop dilop ji yana deviyê,
 Kûr kûr fikirîn û mirmirîn bi kelemên bîranînan :
 Ez reşik im.
 Li min binihêrin.
 Ez reşik im.
Banço: Navê amûreke muzîkê

Mij

Mij tê
 bi lingên pisîkeke biçûk.

Rûdinê, çav digêrinê
 li sekanê û li bajêr
 li ser hêtên bedeng
 û diçe dûre.

Şer

Dilopên SOR ji çena min, cihê ku ez dixwim.
 Na, ne xwîn e giş, nêzî xwînê jî nîn e, yên ku min ji
 devê xwe paqij kirin.

Kesekên li ser porê min ê sor û tevlihev
 Û piling, gamêş, dizanin bê ka çawa ye.

Ez kujer bûm.
 Belê, ez kujer im.
 Ji kuştinê tîm.
 Û diçim zêdetirê din.
 Diajom li pêşiya kêfa sor a ji kuştinê tê.
 Têrbûna ji sorê û tîbûna sorê di qirêja şilavên
 hestiyên min re derbas dibin
 Zarok digirîn ji bo mêtina diya xwe û ez digirîm ji
 bo şer.

Kî me ez?

Serê min li stêrkan diqelibe.
 Lingên min li ser giran e.
 Sere tiliyên min di deşt û perava
 ji yana gerdûnê de ne.
 Berbijêr dirêj dikim destên xwe, digêrinim di nava
 dengên kefa tiştên binyatî de
 Û dilîzim bi kevirên felekê re.
 Li dogehê bûm ez çend caran çûm û hatim.
 Dizamim her qunca bihuştê, ji ber ku birakiyê dikim
 bi Xwedê re.
 Lotik diavêjim di nava xwîn û wêrekiya xerabiyê de
 Dizamim bi bengînî zevtkirina xweşikiyê
 Û serhildanên nuwaze yê mirovahiyê
 yên ku li ser her nîşaneyan nivîsandine ji wan re
 “Dûr bisekine”

Navê min Rastî ye
 û ez girtiyê qet nayê girtin ê gerdûnê me.

Kitêba “sadi”ytanê bê guneh

Ehmed BELEK

Edebiyata kurdî bi lez û bez berhemên xwe zêde dike. Lê ya balkêş ev e ku em bûnin wek mirovên ji ber xelayê filitîbin. Loma jî em dixwazin zû bi zû vê valahiyê tijî bikin. Dema em helbestekê, stranekê, romanekê ango tenê hevokekê jî diafirînin, em dixwazin hemû êş û elemên xwe bidewîsin hindurê vê berhemê. Ev jî nivîskarê kurd dikişîne kilîşeyan û edebîyatê qels dike. “Gîtara Bê Têl” jî bi metaforêk pîrr xurt û helbestî hatiye honandin. Navê wê meraq, hêvî û her wiha heyecanekê bi xwînê re çêdike; lê sed mixabin ew jî ketiye kemîna vê kilîşeyê. Kilîşeya ez bahsa wê dikim ev e; yekî kurd û yeka biyanî (pirayî tirk e) ji hev hez dikin lê ji ber ku ciwanê me, yê kurd ‘welatparêzekî hêja’ ye, nikare dev ji welêt û doza xwe berde; wek we jî fêr kir, dev ji “evîna” xwe berdide.

Her çiqas wisa be jî “Gîtara Bê Têl” çîroka “evînek” nerm e û dilê xwînê germ dike. “Gîtara Bê Têl” di destê Cîhan Roj de, bi dirûşmeya zagona hezkirinê deng dide. Ka werin em li vê rîtmê guhdar bikin.

Naveroka pirtûkê, bi meşa doktor Şadî dest pê dike. Ji xwe dema hûn bixwînin hûn ê Mêrdîn pir baş nas bikin bi van meşên Şadî re. Ew dildarekî Mêrdînê ye û kolan bi kolan li kuçeyên Mêrdînê digere û cihên dîrokî, bi çavdêriya Şadî û vegotinên balkêş tên danasandin. Tê fêr kirin ku nivîskar bi xwe jî dildarê Mêrdînê ye. Lehengê me yê sereke Şadî, doktorêkî hêja ye û ji aliyê derdorê ve pir tê hez kirin. Ev mirovê balkêş bala hemşîreya xwe jî dikişîne.

Hemşîre Selîn, keçek Îzmîrî ye. Ev nêzîkahiya wan di wexteke kin de vediguhêze têtîkiliyeke germ. Diltênîkbûna nivîskêr di vir de xwe derdixe holê û vê têtîkiliyê bi metaforên balkêş dihûne. Bi vî awayî, pirtûk mîna xeyalek nerm diherike. Wek mînak; mistdana por ê li ser çongan, xwendina çav û keviran, bêhnkirina qehweyê û meşên dirêj, di nav dîroka Mêrdînê de. Di van meşan de, lehengê me bi bêhna qehweyê û bi dîrokek balkêş, sermest dibin; ev sermestî her car dibe sebeba şevên dirêj û erotîk. Erotîzma Roj, mîna Şanoya Trajedyayê, di paş per-

deyê de ye û xwînê aciz nake. Ev germahiya, “heta kêlîka biryarên ji bo pêşerojê têne girtin,” bi awayekî fantastîk didome. Lê edî gere biryarekê bidin. Her du jî evîndarên kevirên welatên xwe nin; li aliyekî Îzmîr, Agora, Bexçeyê Yezdan û li aliyê din Mêrdîna bêhna dîrokê ji barana wê tê. Di vê miçiqandinê de, Selîn biryarek radiqal distîne, lê bi ser nakeve. Têkçûna wê dibe têtîkçûna evîne, ya Şadî, ya pirtûkê û her wiha ya nivîskêr bi xwe.

Li ser şewaz û zimanê nivîskêr tiştên em dikarin bibêjin ev in; nivîskar bi hay -ango bê hay- pir ketiye feqa dubarekirinê. Tiştêk tê gotin, çend hevo-kên din dîsa tê dubare kirin. Dîsa ji çavnebarî, wek min di serê nivîsê de jî got, hemû pirsgrîrêkên ci-vakê dewisandîye ser hev; ji pirsgrîrêka jinê heta el-eviyan, cerdevanî, xebatên cemaetan, şewitandina gundan û pirsgrîrêkên koçkirinê...hwd. Van hewldanan nivîskar xistiye nava vegotinan û vegotinan, tevlihevî û acizî bi xwe re aniye.

Di nîrxandinê de, mijara herî balkêş jî îdealîzekirina lehengan in. Nivîskar, bi hestiyarî nêzî lehengan bûye, ev jî pirtûkê ji rasti-yê dûr dixê û dixê riyek fantastîk. Mesela Şadî; doktorê hêja, hevalê dilsoz, cîranê perwer...hwd. Çiqas tiştên baş û qenc hene daxilî takekesiya wî kiriyê, lê qet şeytan venehewandiye; “mîrovê bêşeytan” e. Gere ev rastiya neyê ji bîra kirin ku, di rastiya hebûnê de cihê şeytên jî heye. Nivîskêr Şadî kiriye pê-xemberê ola evîne û bi hemû leh-engên jin, yên pirtûkê re,

nivîskar jî bûye endamê vê tarîqatê. Lê nivîskar, hezkiriyê qesasê xwe û pirtûkê ye. Dema hûn baş li Şadî binêrin hûnê bibînin ku, ew çav û keviran dixwîne, qehweyê bêhn dike, nîşeyan dinivîsîne; Erê! Qala van tiştan tê kirin lê hundirên wan nehatiye dagirtin; tu nîşeyên wî, ya ji xwendinek wî mînak nehatiye dayin. Ev jî valahiyekê derdixe holê. Şadî, mîna yekî nû kamil bûbe li fantaziya digere, lê belê bingeha wî tune ye. Dilbijokek û birçîjinek e. Ji xwe ji ber çavqûndetiya Şadî, “evîna” wan qet naşibe ya Mem û Zînê, Leyl û Mecnûn. Şadî, mîna yezdanekî



hatiye afirandin; lê belê ew, mîna Zeûs e û Selîn jî Afrodîta bi dek û dolab e. Ev nirxandin di encama pirtûkê de xwe diyar dike, lê dîsa jî nivîskar dev ji dilsoziya xwe ya li hemberî yezdanê xwe bernade. Yanê ez dikarim bibêjim, nivîskar her ku Şadî mezin kiriye, pirtûk biçûk bûye, ew biçûk bûye. Lehanga jin Beyza jî balê dikişîne. Ew hevala Selîn a bi hev re di xaniyekî de dimînin. Kengî qala Şadî dibe bi dilbijokî diaxive, lê ev ne bala Selîn dikişîne, ne jî ya nivîskêr. Beyza, dîsa bi berjewendparêzî (menfaatperestî) bi dora Zîşan dikeve, ji bo wan bi-parêze; lê nivîskêr, ev helwesta wê bi şêrînahî, wek germahiyek hevaltî nişan daye. Ev jî vêya nişan

dide ku nivîskar, ji aliyê lehangên xwe ve hatiye xapandin. Li ser lehangên tiştêkî din jî heye; nivîskêr, çêyî û xerabî, mîna reş û sipî ji hev cihê kiriye; li aliyekî mirovên baş û paqij, (ku qet şeytan bi dora wan nakeve) li aliyê din jî, şeytan bi xwe ketiye dirûvê mirovan. Ev jî qelsiyeke ku nivîskar ji aliyê derûniya mirovan ve neserkeftî ye. Lewre mirov, hem şeytên, hem jî Xweda bi hev re, di hindurê xwe de vedihewîne.

Belê; Cîhan Roj, bi metaforek xurt û balkêş, qala “evînek nîvcomayî” dike. Ka werin deng bidin vê “Gîtara Bê Têl”, bê ji we re, çî li ser zagonên evînê, dibêje.

Rojdiz Mihemed AFŞAR

Ji hêmaya helbesteke zargêj im
Wêrana bextê xwe
Sergêjê bagera te me

Pêwîstî, bihareke neragihandiyê
Ji kavlê xalî re

Dengekî berxwedanî
Hatiye avêtin ji ziman
Dilopek xwêdana germ
Di kelecoşa tehmê de
Mêtiye azadî

Xemên xwarî diherikin ser lêvan

Di sewta dîlanên te de
Ji dangan kûrtir û ji rîyan dûrtir
Hestek sêrengî ye
Li kevir pêçayî

Were tu jî xwe bipêçe
li nexşeyê berkanîkê min
taca azadiyê îro kevirê me ye

dil dojhê te
di afirandina xewnên azad de ne
were xwe di biskên şeva min de veşêre
heya rojdizan bar kirin..

Em zarok in Rênas FARQÎNÎ

Dîl girtine dîsa dilê mirovahiyê
Berbanga rojê wek şikeft tê xuya
Fedî û zilm destgirtiyê hevîn
Xwîna me wek şerbet ji dilana wan re
Ne paşeroj hebû ji me re
Ne pêşeroj lê;
Roniya me bû ku roj bi roj
Zêde dibû bi nîvîştan
Kes me ne distirand
Di stranên dîlanî de
Û êdî em hew distirin
Di zimanên qedexeyî de
Ka pêlîstokên me li ku ne,
Ev gule kevirên heftokanin yan;
Roniya reşka çavan
Li ser hêviyên dilên me
Em bi çîrokan nayên xapandin
Hevî pir dûr e ji xêniyên feqîriyê
Ev melesa dayikan e yan;
Pêşeroja zarokatiyê
Axîna me ewrên reşin
Ji rondikên çavan re
Tunebûna me mirin
Be darbest di axa sar de
Dayikno!!!!
Guliyên me kêr bihonînin
Her gulî dibe guleyek li ser laşên me
Na na em tu car bi fermî nayên kuştin
Ji ber ku em bê nasname ne...

Vagona duyem

Şivan ZEREN

Bi bayê guvguvî re baran êdî hûr hûr dibarî. Yekane dibezi ber bi trêna ku dê rabe ve. Çar deqe mabûn ku ji Gara Sîrkeciyê rabe. Gihişte garê ku jetonê biavêje qula tûrnîkê, dengê pîpîka trêne ji milê peronan ve hat. Bayê bezê bi ser pêpelokan ve hilkişî, berê xwe da perona sêyem ku trêna dê rabe li wir bû. Gihişte vagona yekem, dengê motorê xûrt bû û dengê pîpîkê vîcarê dûvdirêjtir hat. Bi çend gavên dawî, bi kelecani xwe gihande vagona duyem, trêne hereket kir û ji deriyekî vagona duyem derbasî hundir bû. Deriyên otomatîk bi hev re hatin girtin.

Hin kesên di vagonê de, li wî nêrîn. Wî serê xwe tewand, destê xwe bire nav pora xwe, bi lezî dawesand, peşkên zêde belavî erdê bûn. Wê kêliyê trêne hinekî bi hejhejî, ligel dengê reqreqa rêlhesinan bi rê ket. Yekane xwe rast kir, destgirê derî girt da ku nekeve. Li dora xwe nihêrî ji bo qurçikeke bi dilê xwe bibîne. Berê xwe da goşeya herî paşiyê, bo bikare cimûyê vagonê û derveya ku di nav tariyê de bi lempeyan ronî dibe temaşe bike.

Yekane pala serê xwe dabû şibakê. Ji derve peşkên baranê li camê diketin, kom dibûn û ber bi jêr ve diherikîn. Ji hundir ve jî camê hinekî hilm girtibû. Li derve, bircên wêran, hilweşiyayî dihatin dîtîn, deryaya bipêl, tarî dixûya. Bi ser de aliyê din ê bajêr, şil û bibizav diçirîsî... Carina xaniyên kevn î darîn dihatin dîtîn, carna jî avahiyên hûr û gir nik hevdu diketin navbeyna trêne û behrê. Piştî taxa Cagalogluyê xeyala wê dihat ber çavên wî û di dilê xwe de kizirandina janneke veşartî hîs dikir. Bi çavên belek û gir lê dinihêrî. 'Na! Êdî nikarim bi te re destgirtî bim. Yekane, min ji bîr bike' Serê xwe ditewand, bi çavên lave... Berê xwe diguherand û diçû.

Xeyala vê dîmênê bêhna wî teng kir. Lepê xwe li şibakê da ji bo ku dükela li ser camê rabe û derve zelaltir bixuye.

Du kes hinekî dûrî wî di rûniştekan de rûniştîbûn. Behsa maça tîmên ewropî dikirin.

- 'Bi min Barcelona wê bi ser bikeve. Ji ber ku listikvanê Milanê Îbrahîmovîç birîndar bûye, ew ê nelîze'.

- 'Milan tîmeke xwedî tecrûbe ye, dîsa jî dikare bi ser bikeve. Li gor vê yekê giraniya listikê dikeve ser milê Robînho.'

Yeke li ber wan a ji pê jî, ji telefona xwe ya destan, li mûzîka rockê guhdarî dikir. Çavên wê kilkirî bûn, awirên westiyayî tavêtin. Pora wê ya kin û sorî bi jole bû. Ji paceyeke vagonê ve jî avê dilop

dikir û dipekiya hûndir.

"- Şiip şiip ..."

Yekane zaroktiya xwe anî li ber çavên xwe. Di zaroktiya xwe de nedikarî futboleka baş bilista. Ji ber nexweşiya xwe rojê sê caran heb vedixwar. Hebe wî sist û bêbizav dikir. Lewma nedikarî bi şid jî li gogê bide. Hevalên wî nedixwestin wî bi tîmê de bidin listandin. Bêliviya wî ew bi tenê hiştibû gelek caran di dibistanê de.

Li Kûmkapiyê derî vebû. Bi hêcan û lezeke xûrt kesên zîrek û çavbel xwe avêtin ser rûniştekan yekyekî yên valamayî. Piştî jî heçko xwediyê vê lezê ne ew bin, di cihê xwe yê rûniştî de bê his û kerênî bi çavên bêxew pix dikirin xewê. Westê ku qurçik î rûniştekan neman, leza hûndirê vagonê sist bû, yên mayî xwe li destikên daliqandî girtin. Piştî jî wîz-wîza axaftina her kesî tîkilî hev bû. Ji nav wê wîzewîzê sohbetên tîkel dengê berz ê kurmançiya Torê dihat.

- Tu pê neheliyayî lo! Li Behwarê çi qewimiye?

- Na welle. Haya min ji Behwarê nîn e.

(Bi ken)- Nedîmoyê başqorîci lêdan xwariye.

(Bi heyîrî)- Na loo!

- Du xortên zaningehê ji vir çûne gundê xwe, vîca dikevîne reza ku ji xwe re tiştinan jê bikin. Nedîmo jî di wê derê re derbas dibe. Dibîne ku hin kes ketine reza. Sixêfên xirab li wan dike. Vîca evnakê jî xort in, bikelecan in, ji ku bizanin ku ew Nedîmê başqorîci ye. Dikevin ser laşê wî. Ew jî wî eyarî dikin eyarekî dî, laşê wî nerm dikin. Îca Nedîmo jî gotiye: "Ez ê heyfa xwe hilênim."

- Ew ê gû bixwe, ew heyam derbas bû heyra!

(Yekane hinekî beşîşî û berê xwe da aliyekî dinê)

Zilamekî ji wan kesên ku li Kûmkapiyê siwar bûyî, pala xwe daye pacê, dikir ku çavên xwe bigere da ku xewa xwe bîne. Da ku cih nede jinika navsere ya li berê sekinî. Xwe wekî westiyayî û di xewê de dida nîşandan. Ê ku li hemberî wî rûniştî dudilî xuya dikir. Carinan beşin ji rojnameya di destê xwe de dixwend, carinan serê xwe radikir çav li jinika navser diket û aciz dibû. Piştî demekê rojnameya xwe pêça û da ser xwe û rabû û cih da jinikê. Jinikê spasî dayê. Wî jî serê xwe jê re tewand û bersiv da spasiya wê. Ê ku xwe di xew ve dibir, hinekî rehet bû. Weke ku ji xew radibû hinekî bawîşkiya, çavê xwe hebekî vekir û dîsa çavê xwe girt bo ku baştir jê bawer bikin ku bi xewî ye û nehatiye birê ku cih bide kesî.

Derî bistikeke din vebû li Floryayê. Kes derneket

ji vagonê lê firoşkereke rêbiwar derî vekir,
kîsê xwe yê reş danî ber derî û ji kîsê sedan kî-
sokên biçûk û tede nanokên spî û pembe li
têlê ve daleqiyayî derêxist. Û bi tirkîyeke
kubar, fesîh dest bi axaftinê kir: " Belê rêwi-
yên hêja û birêz.

Ezbenî ev nane naneyeke din e!
Nikarin bibînin hêncetek e
Tavêjî li devê xwe yek bi yek e
Vê naneyê ez çêdikim
Tê de mîxik wer dikim
Ji rêwiyên weke we birêz re
Difiroşim kîsik li pey kîsikî re

Yên ku nane bistîne Xwedê jê re zêr bide
Yên ku nestîne Xwedê hesûyeke zexm bide

Sê nane
Yek minare
Dirijin yek bi yek e
Hûn jî bikirin kîsikeke
Dê naneya tûj va ye!..

Girî qet nebe para we
Keser nebe li dilê we
Hûn jî vê naneyê nekirin jî
Rûkên we yê geş her bikene

Kîsokek 25 qurîş, sê kîsok 50 qurîş. Nane...
Naneyan...

Pîştî hemî dîmenên reng bi reng Yekane bi
tenêtiya xwe hesiya, bi dijarî. Stûpêça milê
xwe girt. Li derve, li rêhesina xeta din û kevi-
rên li dora wê nêrî û kete xewna rojên buhurî.
Yara wî Sêvê bi kenekî fêhetok lê meyze dikir,
stûpêçeke şîn û spî dirêjî wî dikir digotê: "
Mîn bi destê xwe hûnandiye..." Stûpêç dipêça
û li stûyê xwe û Sêvê difitiland. Her ku li
çavên wê dinêrî dilê xwe dax dida. Çavên xwe
bi zorê ji xewnê kişand û berê xwe da vagonê.
Ji ber ku wan xewnan poşmanî dida wî, poş-
maniyê azar dida giyana wî. Li vagonê nihêrî
dît ku mirovên rûniştî û li ser piyan, deriyê nî-
vekirî, destgirtêkên daliqandî, û pêde pêde ci-
mûyê trêne diheje û ew jî diheje di vagona dilê
xwe yê xwexapandî de, dilê wî jî diheje. Ahen-
gek diket navbeyna wî dilî û hejîna trêne.

Req req, req req req...tîss req req, req req,
teq xîzz!

Celaledîn MELEKŞAH Ji farsî: Dêrsim OREMAR

Mîn tu peyda kirî
Ey şîngêr
Xanima daxdar!
Pîştî hîzar salan
Hêj kirasê te
Ji mirina sora nazdaran
Xwînî ye

Pîştî hîzar salan
Hêj te
Dinava zincîran de dibînim
Bi ferqeke qelaştî
Ji deşneya zulmê

Xanima daxdar
Kurdistan,
Ey birîna mezina
Liser sînga dîrokê!
Liser rûyê te nermebaya xwînê weşiyaye
Ji çar aliyan
Xencer
li qirika te kirine

Çawa mayî
Di êrişê dinyaxwaran de
Esîl û bakire
Çawa maye
Perçema bilinda fethê
Ew perçema entîke
Di destên keskên tede
Ber bijor...

Mîn tu peyda kirî
Di ronahiya gule û mirinê de
Di eydên xwîn
Di baxên dilên parçe parçeyiyên ramanên xelkê de
Êdî, te hêsan ji dest nadim
Niha
Di sengerê bilinda evînê de
Binêre
Ji şora sora mirinê
Pir im

Sûnd bi nave teyî mezin
Neqşa te
Bi rengê sor a xwînê
Liser rûpela coxrafiya cîhanê
Xêz dikim.

Axx û ax

Şadiye MANAP

Bi şemitîna lingê xwe veciniqî. Bîr nebiribû ku koncalik heye li wê derê, ax û giyyayê ku bi nedaviyê, bi xunavê şil bûbû, bêhtir şematok bûbû. Destê xwe da ser çonga xwe û hêz da xwe. Dema şemitandinê çonga wî li kevirên binê koncalê ketibû. Pîneyê li ser şelwarê wî yê pizirî ku pîne bi xwe jî pizirî bû, li hev çûbû çonga wî şeqitîbû.

Bi çavên matmayî li derdora xwe nihêrî. Sersiya xemeke derman nebûyî kete nava perda dilê wî. Çonga wî li aliyekî ma. Şewata birînê jî bîr kir.

Nexwe jî bîr kiribû! Bîrkirina koncalê bû. Hal-hale ku di xeyalên xwe de, heta di xewnên xwe de bê hejmar bihust bi bihust geriyabû li van deran. Her dîmen her kevir neqîşîbû, li hişmendiya wî. Tu caran bawer nekiribû ku wê jî bîr bike, şopeke tenê ya li van deran. Lê belê va ye jî bîr kiribû!

Bi giranî destê xwe avête parçeyek axa rewadar û da ser birîna çonga xwe. Ji biçûkatiya xwe û vir ve wisa hîn bûbû, kîngê ji dereke xwe birîndar bibûya, piçek axa hûr direşande ser, ji bo xwîna birînê bisekine û bikewîne...

Piştî ku ji koncalê derket, boxçika xwe ya ku bi pişta xwe ve girêdabû palmiskant. Ev jî hînbûyî-nekbû. Hîna dema ku di zarokatiya xwe de, li zozana diçû ber berxikan, boxçika ku nanê dayîka wî amade dikir li hev dipêça û li pişta xwe girê dida.

Bi pêçiyên hînbûyî girêka boxçeyê vekir. Ji nû ve pêça û li pişta xwe girêda. Berê xwe da rojhilat û meşa xwe domand... Girê mezin jî wekî ku dizanibû li ciyê xwe bû. Roj li lûtkeya gir hêdî hêdî bilind dibû. Tîrêjên wê ber bi quntarê diherikîn. Deşt hîna di bin siya sibehê de bû. Berê xwe bilindî gir kir û kesereke kûr kişand. Hilmeke kelogirî kete rûyê wî. Destê xwe yê bi ax li ser rûyê xwe gerand. Tevlî hilma sersiya sibehê bêhna axê û gihê kûr kûr kişande nava xwe; ax, giha û sersî wekî kovanekê laşê wî û giyana wî pêçan. Bi nêrînên xwe xemî lûtkeya gir bû. Bi birûyên cotbûyî li erdê nihêrî. Bi hesteke xwe ya ku tevlî kovanê bû axa li ser rêya xwe ya spî de mistand...

Zozan li dûr mabûn. Zarokatiya li ser wê axê jî... Lê îro bîranîn jî qedexe bûbûn, digel wê kesereke din ji hinava xwe bi hilmeke ji hênika hiya sibehê germtir kişand. Nexwe dûrketin jî mezin dikir kovan. Êşên kombûyî jî... halhale ku di zarokatiya wî de ji hînbûyînekê wêdetir ne tiştek bû ax. Her yek çîrokek bû, li ser vê axê serpêhatiyên bav û

kalan. Lê îro wekî mecnûnekî, bi dilekî bengî qaçax digeriya li van deran. Çavên xwe yên ku bi van hes-tan tije bûbûn bi destê xwe yê axî paqij kirin. Û li deştê ber bi quntara gir ve meşiya... Her kevirî bîra-nînek vedigot. Her qevdek giha demsaleke ne jiyayî dianî bîra wî. Tenê heft sal in ku buhara vê axê ne-dîtibû. Heft demsal bûbûn weke kovaneke berhev-bûyî. Gelo kîjan giyanewer, kîjan dar û daristanê xwe radigirt, dijiya wisa dûrî koka xwe, dûrî warê xwe? Bilbil anî bîra xwe, ku warê xwe neguhartî bû bi qefesa zêrîn, bi tu tiştan, loma wekî mecnûnan, wekî bengiyan berê xwe dabû van çol û kepiran.

Ev cara sisêyan bû ku di hate serdana bîranînan, weke eşqiyatiyeke bênav. Wekî dildarekî ku evîn-dara xwe windakirî, li xwe di pirsî caran. Gelo li çi digeriya? Li bersiva xwe jî digeriya. Di nava hestên ku ew dikişandin van deran. Li çi digeriya ku! Wa-teya xwe hiştibû li vê derê. Bê temen, bê wate qey jiyanek hebû? Bajar hebûn, warên dûr hebûn, mirov jî lê dijîn. Lê ne ya wî bû... Li pişt wî girî go-ristana gund hebû. Çîrokên ku dayîka wî vedigotin, kalikê wî yê ku bi ebeya qemer li hespê xwe siwar dibû li vê derê bû... Li biniya gir, di nava zinaran de Şikefta Hewo hebû. Serpêhatiya wî ji kalikê xwe guhdar kiribû. Pişekarekî ermen bû. Ku ji aliyê cî-ranê xwe yê kurd, ku jê re digotin "kirîv" ve hatibû kuştin. Êşa Hewo jî li wê derê bû. Nedihate hilgirtin û nediçû cihekî din...

Li wê derê çi dikir, li wê derê li çi digeriya? Carî-nan bi demjimêra rûdinişt li hember gund. Û bi çavên xembûyî li dîmena xopana gund dimêzand. Carna çerx dibû li dora gund rûdinişt xwe dirêj dikir. Nav milên xwe didan ser axê, dinihêrî, dini-hêrî li ezmanan. Bê vê axê, bê vî gihayî, bê van girên bilind, gelo kê dikaribû wan fêm bikira. Dema ku bavê wî bihîst ku diçe gund tirsîya, aciz bû. Wekî biyanekî van deran xwest ku ew jî neçe ew qada qe-dexe. Ew jî wekî kulîlkeke camekanan dûr bikeve jî koka xwe û hînî wê rewşê bibe. Nexwe ne zilm û zorê, tirsê ew qada kiribû xopan. Jixwe biyaniyê jî ew fêm nedikir. Hemû dûr ketin jî jê re bûbûn biyan. Dema dît ku xelas nabe ji fikar û qazincan, soz da, da ku gerden aza bibe qada qedexe dê neçe wan deran. Lê çend heftan zêdetir xwe ranegirt, ku dem ber bi biharê ve hat. Careke din û careke din kete rêya gund.

Êdî jî quntara gir xopana gund xuya dikir. Ew

gund her tim dişewitî di hestên wî de. Alaveke venemirî her tim li ber çavên wî bû û qêrîna jin û zarokan...

Roj li ber nîvro bû. Ji zû ve ser siya sibehê belav bûbû. Ne xwest wê demjimêrê têkeve nava gund. Ne wekî rêwiyekî demborî derbas bibe, ne jî wekî mazûbanekî asayî. Wekî gunehêkî bû pêjna asayîbûnê. Çayîrê bejn avêti bû ta çonga. Erg û mîşarên xerabûyî ji giya û dirîşkan nedihatîn xuyan. Zê rêya herikîna xwe wînda kiribû.

Bi xemgînî nêrî li dirîşk û serberadayîbûna çayiran. Jê re werê hat ku; her tiştê Zê, dirîşkan, çayiran, axê ji xwezayê re serî rakirîye. Her tişt wekî wî dijiya û wekî wî dihesand rewşa xopan. Li derdora xwe nihêrî. Cihekî hinekî bê stîrî rast û guncav rûnişt. Boxçika xwe ji piştî xwe vekir û li pêşiya xwe raxist. Niv nanê tenûrê û di nava perçek kaxiz de hinek penîrê bi sirîk...

Rabû, bi gavên giran çû ber Zê. Li ser kevirekî rûnişt, Xwe giran û westiyayî hîs kir. Kêliyêkê bêyî ku çavên xwe bigire li xwezayê guhdarî kir. Dengê herikîna avê, hejîna çayiran di bêdengiya nîvro de firîna kêzik û pinpinîkan tevlihev dibû. Li Xwezayê guhdar dîkir. Hîs kir ku vêsgirtinek belav dibû li bedena wî. Hêdî hêdî û giranî dest û rûyê xwe şûst. Bi her du kulmê xwe ji ava Zê, ya ku kevîrê binî ji zelaliya wê xuya dîkir, vexwar. Piştî hêdî hêdî vegeriya ber bergeşa xwe û rûnişt. Hêdî hêdî nan û penîrê xwe yê bi sirîk xwar. Ji ber ku piraniya diranê wî tune bûn, hêdî hêdî dixwar.

Roj li nîvro qulipî bû. Bergeşa xwe pêça li aliyekî danî. Pêlavên xwe danîn weke balgiyêkê kêleka hev li ber serê xwe danîn. Xwe dirêj kir. Serê xwe da ser pêlavên xwe. Lûtkeya gir hêdî hêdî dikete nava seriyê. Bayekî hênîk û tenik giyayê çayîrê li bin guhê hev dixist, bi ahengî dihejiya. Dengê ava Zê weke rêyêkê bêdawî tevli kêliyê dibû. Awîrên xwe rakirin ezmanan. Kûr û dûr mêzekir. Komê ewrên biharê weke komên berfê di hêmbêza pembûyan de digeriyan li asîmanan, wekî ku li ser cemedê bin diherikîn. Bêhay, kenekî melûl li ser lêv û rûyê wî. Zarokatiya wî ket bîra wî. Berxik li mêrga Colemêrgê belav bûbûn. Zarok di nava çayîrê de direviyan. Dikenîyan di nava gihê de hev digindirandin. Piştî bêyî ku bifikirin ku berxikên wan bi ku ve diçin, xwe li nava gihê li ser piştê dirêj dîkirin. Çavên wan li ewrên berfinî bûn dinerîn. Di kenîyan û nîşanî hev didin.

“Ew ewrê han ê min e. Wekî hiriya berxikan e.”

“Na! Yê min xweşıktir e. Weke loda berfê ye. Xwezika ez li ser wê lodê rûniştima. Ez li ser bim ez

ê rûnim û lingê xwe hêlkim.

“Ez li ser bim ez ê ji jor de li wê binêrim. Destê xwe ji were bihejînim. Mirov li ser ewra be, mirovên li erde biçûk xuyadikin.”

Awîrên xwe berdane jêr. Deşt bi bêdawîtiyekê dirêj dibû. Awîrên wî bêyî ku li astengekî kevin, ta dawîya deştê diherikin. Axa biharê bi lêva zayîne nav mila wî germ kiribû. Wekî ku ji zarokêkî hez bike, destê xwe li ser axê bir û anî. Bi kulma xwe ax rakir anî ber rûyê xwe kûr kûr bêhn kir. Weke teziyeke ji nava piştî wî kişiya û kesera xwe bilêv kir.

“Aaaxx û ax!”

Roj li bêdengiyê diherikî. Ba û barana biharê bêxem, bi sersarî diqulibin, li wan çayiran. Lê weke payineke pejiyî tu şop neçûn wan deran. Piştî heft rojan şivanekî ku destûrname girtibû ji bo çayiran tevli keriyê xwe kete qada qedexe.

Piştî ku demeke pezê xwe çerand. Xwest ku pez bibe ser avê. Dema ku ber bi çayîrê ve hat çavên wî ji dûr ve li reşayiyekî ket. Got qey sewale diçêre li wan deran. Lê dît ku nalive, ji xwe re got “nexwe kevîr e, lê neşibe kevîr meviran jî.” Lê dema ku baş nêzik bû, fêhm kir ku mirov e, xwe li wê derê di nava çayîrê de dirêj kiriye. Di hesteke vekişandî gavên xwe avêtin. Hinekî tirsîya. Cara yekê bû dihat qada qedexe û kê li wê derê ba, niha dê pirs bikira. Destê xwe avête destûrnameya di berika xwe de û hêdî hêdî ber bi kesê dirêjbûyî ve meşîya.

Pezê ku çavê wî li avê ketibû bi hengema berjêrî ser avê dibû. Dengê zengil û merîna pez li nava hev diket. Lê mirovê dirêjbûyî qet nedilivîya. Dema ku şivan nêzik hat dît ku mirovekî kal e, razaye li ser axê. Pêlava xwe kiriye bin serê xwe. Şivan bi hesteke fedîkar serê xwe ji tîrs û qisaweta xwe re hejand. Şivan du sê gavên din avêtin û bi dengê nerm gazî kir.

“Xalo, salam û aleykûm!” Deng ji mirovê dirêjbûyî derneket û nelivîya. Şivan dubare kir.

“Dem xweş be hecî! Mêze dikim li ber hênika-hiya biharê tu gelekî kûr raketiyî.”

Dîsa deng nekir, bersiv neda û nelivîya. Şivan baş nêzik bû û xwarî ser bû. Kalo direjbûyî wekî xwêdan bida nedawîya sibehê li ser rûyê wî zipîk zipîk bûbû. Libên axê di nava riha wî yê spî de belav û şil bûbûn. Şivan veciniqî û bi awireke matmayî got; “Waa! Vo Hesenê Kalo! Çi digerî li wan deran? Qey hatiye wêranê gundê xwe.” Destê xwe avête milê kalî û hêdîka hejand. Lê di heman kêliyê de bi veciniqîn destê xwe şûnve kişand. Ji lewre Hesenê Kal zû ve çûbû ji wan deran...



Ma ez ji bîr dikim? Kawa ŞÊXÊ

Sal hezar û neh sed û not e, me nû xwendina xwe ya dibistana bilind qedand û me berê xwe da zanîngehê. Di sala dawîn de ji xwendinê, yanî di sala duwazdehan de, mirov pir tengasiyan dikişîne, ne wek tu salan e, ji ber ku pir tişt bi hev re tên û her yek xwe di ber a din re dike, xortanî, tayên simbel û rihê, welatparêzî, polîtîkbûn, girsbûna bedenê, bida-wîbûna zaroktiyê..... Û hemû ji xwe didin pêş, mirov nema zane kîjanê hilbijêre û îcar xwendin ji hemûyan zehmetir e û gerek mirov hemû dema xwe bide xwendinê, ji ber ku sala dawîn e û girîng e. Xew namîne, xwarin û çûna tuwalêtê li ser meriv tên hejmartin û hema ya star, ji nişka ve, her tişt bi hev re çareser dibe, dema meriv di xwendinê de bi ser dikeve û me ji wisa kir.

Piştî ku em çûn zanîngehê me xwe di warekî din de dît, li bajarekî mezin, dûrî sistema malbatê, di hundirê civakeke nû de, li bajarekî ku tu kes meriv nas nake. Li zanîngehê ji xort û qîz tevlihev in, xanî bi tenê yan ji digel xortekî re ne, bêyî ku bavek timî meriv kontrol bike û bêyî ku dayikek timî doza xwendinê li meriv bike, bêyî ku xwişk û birayên ku xwestekên meriv pê re par bikin. Li ser kêfa xwe radizê û li ser kêfa xwe ji xew radibe, lê tiştekî din di vê demê de pir balkêş heye; di nava wê komê de, di hundirê her yekî ji me de hunermendek şiyar bû, yê ku çîrok nîvisandin, yê ku li muzîkê xwedî derket, yê ku roman nîvisandin, yê ku stran gotin, hinekan helbest nîvisandin û hinekan ji şano çêkirin û hinekan berê xwe dan reng û nîgaran û wêne çêkirin, ji ber ku her kesî nikaribû reng û firçe û materyalên nîgarvanan bikiriyana. Hevalê min Ristem ê ku xanî li bin odeya min kirê kiribû, yek ji wan kesan bû, reng li xwe dicivandin û wek wênevanên bi navûdeng xwe girêdida û dihat civatên me, bi kincên bi boyax û rengîn. Her ku nîgarek biqedanda; gazî min fikir da ku ez bibînim, min didît ku bi rastî ji pir zû pêş dikeve lê ji ber tîpa ku xwe dixistê gelek dostan jê hez nedikirin û ew wek mijareke ji bo qerf û henekan diditin. Bi taybetî ji Celalê helbestvan, yê ku her carekê derfet bi dest biketa dihişt ku hemû heval bi Ristem bikenin. Ristem ji her tim li hemberî wî der-

diket, li ferheng û pirtûkan digeriya da ku şaşitiyekê di helbesteke Celal de derxîne, yan ji bişibanda helbesteke din, da ku di civatê de ji Celal re bigotiya: te ev helbest ji filan helbestvanî diziye. Û her wiha Celal ji li hêviya wêneyên Ristem bû û her ku yek nû bidîta hezar kêmasî jê re derdixistin.

Di kolana ku min û Ristem me xanî tê de kirê kiribûn, xortekî Erebbû hebû ji gundên dora Helebê. Navê wî Bekrî bû, dikana wî hebû, rojekê materyal û kincên Ristem bala Bekrî dikişîne û dixwaze hevaltiyê pê re deyne û bi rastî ji wisa çêbû.

Bekrî xortekî pir bi hurmet bû û li gorî ku me nas kir; wî ji biçûkaniya xwe de ji reng û wêneyan hez fikir lê ji ber civaka ku tê de mezin bûbû, tiştekî wisa qet nedihat qebûlkirin û ne ji nan dida, ji lewra Bekrî ew kul di dilê xwe de ji gundê xwe yê belengaz anî û li bajêr di nava çewalên sabûn û dendikan de û di nava komên bacan û tiviran de veşart. Lê di hundirê wî de mabû, ji lewre her ku kaxizeke spî biketa destê wî, wî wêneyê du çavên tijî hêsiir çêdikir û hewl dida heta ku jê dihat ku herdu çavan wek hev derxîne ji ber ku kêmasiyek di Bekrî de hebû. Her du nivên rûyê wî ne wek hev bûn, aliyê çepê ji aliyê rastê mezintir bû. Çav, lêv, guhên wî û hemû aliyê rûyê wî yê çepê ji aliyê rastê mezintir bûn, te yê bigota qey her du aliyên rûyên wî ne ferê hev bûn. Te yê bigota qey rûyê du kesan e û te li ber hev daniye û ji ber vê kompleksê ji Bekrî timî du çavên wek hev çêdikirin.

Roja pêşîn me hev naskir, ji min pirsî:

- Hevalê te nîgarvan e?

Min got: Erê, çima?

Got: ji ber ku xewna min bû ku ez bibûma nîgarvan, lê mixabin ez bûm dikandar.

Min li ber dilê wî da: ê ma her yek ji me xewnin wî hene ku bi cih nayên.

Got: rast e, lê ez dixwazim hevalê te nas bikim.

Û wisa çêbû, min ew bi hev dan naskirin û bûn dostê hev, Bekrî dikana xwe digirt û diçû ba Ristem malê, ji xwe re lê dinihêrî û Ristem ji hinekî tevgerên xwe yên surrealîst pir dikirin, qedeha xwe ya meye datanî ber xwe û dest bi çêkirina wêneyan

dikir.

Şevêkê, Ristem saet di duduyê şevê wek dînan li deriyê min xist, ez tirsîyam min got: çi heye?

Gote min: zû bi min re were, ez ê tiştêkî pêşî te bikim!

Bêyî ku bihêle ez sola xwe têxim piyê xwe, ez bi dû xwe kişandim odeya xwe. Nîgarek dardakirî bû, paçîkek bi ser dakirîbû. Kursiyek ji min re anî, li hemberî nîgarê danî û çû rahişt paçîkê li ser nîgarê. Ez çi bibînim; wênayê Bekrî çêkirîbû hema wek wî bû, aliyek ji aliyê din mezintir, heman çav, lêv, poz, hema tu yê bibêje qey ew e. Wî dît çawa devê min ji hev çû; serê xwe bilind kir û ji min re got: Tu çi dibêje, ma wê Celal devê xwe veke? Heger devê xwe veke ez ê devê wî biçirînim, lê ez alîkariya te dixwazim, heger tu kesî bala xwe neda ferqa her du aliyên riwê Bekrî, tu ji Celal re di nav xwe û wî de bêje, bê ma çima wisa xwaro maro ye?

Min got: lê ez zanim ku yê rastî jî wisa ye û te ji ber wî girtiye?

Got: na, na, tu wek min bike û heger wî ji ber xwe ve ev xwarbûn dît tu alîkariya wî bike.

Min got: ez wisa nakim heta ku tu plana xwe ji min re nebêjî, ji ber ku ez wek koran nikarim alîkariya te bikim!

Got: ez ê ji te re bibêjim, Celal pir ji xwe razî ye û tu bi dijminatîya nava min û wî dizane, ez ê vê nîgarê pêşî dost û hevalan bikim û ew bi xwe nikare, wê hewl bide henekên xwe bi min bike. Ez ê ji xwe ker bikim û ez ê bihêlim pir bikene û dûre ez ê werim Bekrî bibim, bila her kes wî bibînin, wê zani-bin wê gavê ku min rast çêkiriye û şaşîti ya Xwedê ye, ne ya min e. Û ez ê di dawiyê de bikenim û yê di dawiyê de bikene wê kenê wî jê re bimîne!

Min jê pirsî: ê baş e ma çima tu nahêle ez ji wan re bibêjim ku te rast çêkiriye, ma ne min Bekrî dîtiye û ez zanim ku tîpa wî wisa ye?

Ristem kenîya û got: ez dixwazim ez firsetê bidim Celal ku henekên xwe bi min bike ji bo ku dûre surprîza min cihê xwe bigire, te fêhm kir? Ez dixwazim tu alî wî bike û heger min ji te xwest ku tu bibe şahid, divê tu bibêje; min ew nedîtiye û ez nikarim bibim şahid te fêhm kir?

Wek plana Ristem her tişt meşîya, wek her carê di zanîngehê de, di civîna şagirtan de, Ristem nîgara bi navê Bekrî dardakir, her kesî dît, hinekan di reng û materyalan de felsefeya xwe vala kirin û hinekan di nêrîna Bekrî de û hinekan jî gotin ku di hundirê vê nîgarê de du nîgar hene û şikestina wêne ya vî xortî di vê nîgarê de şikenandina însanê hemdem şirove dike.

Ji nişka ve ji nav hemûyan dengê Celal bilind bû kenîya û got: lê çima her du çav ne wek hev in?

Ristem li min nihêrî û kenîya lê xwe wek yekî

têkçûyî nîşan da û got: na, wek hev in, xort wisa ye çavên wî...

Celal berdewam kir: tu dikarî a niha bibêjî ku lawik seqet e û dîn e û her du aliyên devê wî û çavên wî ne wek hev in?

Ristem got: na, na, ne dîn e û ne seqet e û dev û rûyên wî wisa ne û heger hûn bawer nekin ez ê wî ji we re bînim.

Celal got: na, em bawer nakin, qet însanekî wisa nîn e, tu şaştiyên xwe dixê stûyê Xwedê.

Hemû heval kenîyan û kenîyan, Celal berdewam kir: û heger yekî wisa hebe, ez bawer im tu nikare wî bîne vir, wê di rê de ji te winda bibe, yan jî wê polis wî ji te bistînin û wê wî bibin girtîgehê. Û dengê kenê hevalan asîman diçirand.

Bû firtefirta Ristem, hat bi destê min girt, ez birim orta hemûyan û bi dengê bilind ji min pirsî: ka Kawa ji me re bibêje te Bekrî dîtiye, ma tîpa wî wisa ye yan jî na?

Û xwêdana wî eniya wî ya sor dişuşt. Min jî hema wisa bêyî ku ez bifikirim, min got: na, min nedîtiye.

Kenê hevalan bû lehî Ristem li ber xwe bir, wî jî xwe bi destê min girtiye û qurincokan dide min, ez bawer im poşman bûbû, hema carekê destê min berda û bang kir: gelî hevalan sibê êvarê saet di heftan de, ez ê xortê di nîgara xwe de bînim û werim vir û yê dixwazin wî bibînin bila werin!?

Celal got: em hemû dixwazin werin lê heger te me xapand em ê çi bikin ji te?

Çavên Ristem sor bûn, hêrs bû û got: bi soz, heger we dît û we got ne wek wênayê ku min çêkiriye, ez nema careke din wênayan çêdikim û ez hew destê xwe didim rengan û hew li pêşîya te dixivim û nema behsa hunerê dikim, lê heger wek min derket tu yê çawa bike?

Celal bi zanebûn û giranî lê vegeand: ez ê di mafê te de rûnê, ez ê te wek nîgarvan qebûl bikim û ez hew dev diavêjim te û ez ê ji te re kartonek reng û firçe bikirim, baş e?

Em li ser vê biryarê belav bûn, tenê ez û Ristem em dizanin ku Bekrî bi rastî heye û tîpa wî jî wisa ye. Em bi hev re vegeyriyan, me berê xwe da dikana Bekrî ji bo em jê re bibêjin û Ristem jî ji kêfan dîlan dike û ji min re dibêje: te dît bê min çi kir jê, te fêhm kir çima min dixwest ku pir kêfa wî were? Ji bo qebûl bike ez çi jê bixwazim!

Em çûn dikana Bekrî, lê tiştêkî ecêb bû ku dikan girtîbû, çawa çêbû? Çi heye, ez jî nizanim.

Çavên Ristem sor bûn û got: ev kûçikbav bi ku ve çû ye, dibe ku çûbe xwe rihet bike, yan jî çûbe nîmêjê?

Min hewl da ku bêhna Ristem fireh bikim, wî jî serê xwe hejand wek ku bawer nekir û got: ji vir heta êvarî, heger di bin erdê de be jî ez ê wî bibînim.

Heta bû êvar Ristem sed caran çû dikanê û vege-
riya lê bê fêde bû û her carê derbasî malê dibû wek
guleyê dîsa derdiket, hat li deriyê min xist:

- Ma te tu caran ji Bekrî nepirsî bû bê mala wî li
ku ye, an jî li ku dijî lo?

- Na weleh min qet bawer nedikir ku wê mala wî
ji me re girîng be, sed carî hat ba te malê, çima te jê
nepirsî?

- Ma qey min zanîbû ku roja wê ji min re girîng
be wê wînda bibe, ma ne her roj di nav çavên me de
bû?

- Ê de heger îro neyê wê sibê were, ma leza te ji
bo çi ye?

- Leza min, ma te nedît îro çi çêbû, ma ez karim
sibê bê Bekrî rûyê xwe pêşî hevalan bikim, ma ne wê
Celal min bixwe?

- Lê wê îro Bekrî were netirse, ka bimeşe em
herin binihêrin bê nehat? Min jê re got.

Û bê deng Ristem da pêşiya min, lê dîsa dikan
girtîbû. Me ji cîranekî pirsî got: heger îşê we pê hebe
herin wî xaniyê li jorê dikanê ew xwediyê dikanê ye
û Bekrî jê kirê kiriye, wê ew zanibe.

Em çûn me ji wî pirsî lê bersiva wî wek çîrokeke
ji yê filmê sînemaya klasîk ji me re hat, wî got: îro
Bekrî û hinek beziyane hev û wî jî kilîtên me û pe-
reyê kirê anîn da min û çû nema tê, ji ber ku ji ber
hefê reviyabû û got; va ye ez li vir dîtîm, ez ê ji vir jî
herim. Zilam wisa got û bi gotina wî re Ristem xwe
nema li ser xwe girt, xwe bera erdê da û rûnişt.

- Îşekî me yê pir girîng bi wî heye, ji kerema xwe
re rêkê bide ber me, em gerek wî bibînin? Min ji
xwediyê dikanê pirsî.

- Ez navê gundê wî zanim, heger hûn bixwazin ez
ê ji we re bibêjim bê hûn ê çawa herin gundê wî?

Ristem çeng bû û got: erê, erê, ji me re pir hewce
ye.

Me navnîşana gundê wî stend û em hatin malê.
Ristem ji min re got: tu yê sibê here cem Celal û tê ji
hemû hevalan re bibêje ku ez nexweş im; ji ber vê
yekê min nikaribû sozê xwe bi cih bianiya, lê ez ê du
sibe wî bînim.

- Ma tê here wî bîne? Min ji Ristem pirsî.

- Ma ev pirs e, heger li Çînê be jî gerek ez wî
bînim, tenê saetekê, ez sibê diçim gundê wî.

Ristem çû û min jî ji hevalan re got: wê Ristem
sibe soza xwe bi cih bîne.

Êvarê Ristem şikestî vegeriya û got: min ew
nedît, neçûye gund!

- Ê îcar çare çi ye, tu yê çi bikî?

- Ez ê li bendê bim, heta ez wî bigirim.

Her in Ristem ji xwe re kir kar, diçû gundê Bekrî
û bê fêde bû. Bi rastî jî Ristem hew reng hewandin û
nema yek car behsa hunera xwe kir, timî bê deng û
fediyok bû û heger kesî behsa civînekê bikira wî

digot: ez roja îne nikarim werim, îşê min heye.

Û carinan digot: ez dixebitim, lê tenê min zanîbû
ku her in ew diçe li Bekrî dipirse.

Sal derbas bûn, me hemûyan çîrok ji bîr kir û em
ji hev belav bûn. Piştî demekê, êvarekê dengê deriyê
min hat, min derî vekir. Min dît Ristem li ber deriyê
min sekiniye, ez pir pê kêfxweş bûm. Destê min girt
û ez kişandim ber tirimbêlekê ku li derve sekinîbû.
Di tariyê de zilamek tê de bû min nikaribû ew bidîta,
Ristem ji min pirsî:

- Te ew nas kir?

Min got: na bibore, lê hema kî be jî, werin derbas
bin!

Got: ev Bekrî ye, Bekrî. Tu wî nas dikî, hat bîra
te?

- Erê, erê hat bîra min.

- Ê de kincên xwe li xwe bike û em herin.

- Em ê herin ku?

- Mala wî kûçikî, ma te ji bîr kir, mala Celal.

- Ma hîn tê bîra te?

- Ma ji bîra min çûye, tu mala wî nas dikî ya na,
tu yê werî yan na? Tu neyê ez ê herim bi xwe lê bige-
rim!

Ez pê re çûm, ez jî xweşik malê nas nakim ji
salên xwendinê de têkiliyên me qut bûne, lê min
kolan nas dikir, carekê ji min re navê wê gotîbû, em
çûn me ji yekî pirsî li mala bavê Celal, nîşanî me kir.
Em çûn me li derî da, diya wî vekir, me li Celal pirsî
me dît çavên jinikê tijî hêşir bûn û bi dilekî şikestî ji
me re got: Celal ji par de çûye Rûsyayê, ancex pênc,
şêş salên din vegere ji tîrsa leşkeriyê, jê were ez ê
heta qiyametê sax bim û li hêviya wî bim!

Me piştî xwe da jinikê û ew di derdên wê de hiş-
tin, em vegeriyan tirimbêlê, min dît Ristem dev
lêvên xwe dike û dibêje:

- Heta min ev anî ew çû! Ev çûbû Libnanê û ew
çûye Rûsyayê û ez di nav her duyan de wînda bûme.

Ez anîm malê û di tariyê de ji ber çavên min
wînda bûn.

Gava min ev çîrok piştî duwazdeh salan nîvi-
sand, Ristem hat bîra min, min xwest ez lê bipirsim,
min nimreya wî peyda kir, ez lê geriyam ji min re
gotin çûye Almanyayê. Min nimareya wî ji wan
stend, ez lê geriyam, pir kêfa min hat; em her du li
Almanyayê ne û haya me ji hev tunebû. Min navnî-
şana wî jê stend û ez çûm ba wî. Piştî hembêzkiri-
neke germ, ez derbasî mala wî bûm, min dît li ser
dîwêr wêneyê Bekrî dardakiriye, ez keniya û min
got:

-Te ji bîr nekiriye?

Li min nihêrî û got:

- Heger heta niha ez dijîm, bila tu zanibî tenê ji
bo hêviya ku rojekê ez karibim Bekrî û Celal bigihî-
nim hevdu, ma ez ji bîr dikim?

Çîroknûsên li ser riya trêne - xewnek

Oguz ATAY

Wergera ji tirkî: Brahîm RONÎZÊR

Em sê çîroknûs bûn li bajarokekî welêt ê dûrî bajarên mezin, bajarokekî li serê çiyayekî, li îstegeheke trêne dixebitîn. Sê xanîkên me hebûn di rex hev de bi kêleka îstegehê ve. Ez, cihûyê ciwan û jineke ciwan. Me bi gerokî çîrokfirosî dikir. Tu xêr û bereketa karê me nîn bû; ji ber ku trêna pir hindik dihatin vira. Herweha gava bi tenê trênen postayê dihatin me tu karê hêjayî gotinê nedikir. Di trênen ku danê êvarê dihatin de bi tenê nan û sicûq, dew, sêv dihatin firotin. Di vê saetê de em çîroknûs gelek caran radiketin. Bi vî hawî me ji bo şevê bêhna xwe berdida; ji ber ku hemû hêviya me trêna eksprêse bû ya ku piştî nivê şevê derbas dibû. Ew firoşkarên gerok ên din jî gelek caran wê saetê hişyar nedibûn nedihatîn. Em jî (çîrokfiros) carinan di xew de diman, nedigihîştin trêne. Hekena nava me û şefê îstegehê jî xweş bû; lê belê bê ka çima axleb sersarî dikir û em şiyar nedikirin vî tekane memûrê îstegehê. Ji aliyekî ve me lê nedigirt: meqes wî diguhe-randin, karê telgirafê wî dikir, hemû nîşan wî saz dikirin; bilêtfiroşî, vekirin û girtina deriyan... hemû kar di stûyê mirovekî de bû. Ji bo em xwe pê xweş bikin gelek caran me çîrok belaş didanê; dîsa jî carinan ji bîra dikir ku me şiyar bike. Axleb diviyabû em ji ber xwe şiyar bibin. Heke mirov bîne bîra xwe ku tevahiya rojê jî me çîrok dinivîsîn, wê ayan bûya ku ev ne karekî wisa hêsan bû. Erê, danê êvarê em radiketin; lê axleb berêvarkî îlham dihat û heta derengî şevê jî em ji dest nedifilitîn. Şefê îstegehê heneke xwe bi vê gotina 'em ji dest nedifilitîn' dikir; di van kêlikan de, me jî nedianî bîra xwe ku yekî bi tenê ye, nikare bi hemû karan re bidigihîje, me bi tundî ew rexne dikir: Ma xîret nedikir gava eksprêse teta bi xanîkên me yên bi odeya şêftiyê ve bihata. Ji aliyekî ve em xebatkarê heman kargehê dihatin hesêbê. Tew bi ser de hinek şevan, şîv nedihat bîra me, me çîrokên ku bi desta nivîsandin bi daktîloya li oda şefê îstegehê careke din dinivîsandin û sererast dikirin. Ji ber ku pêşî min dest bi çîroknûsiyê kiribû hevalên min dora pêşî ya nivîsandina bi daktîloyê didane min. Lê min gelek caran dora xwe dida cihûyê ciwan. Min pir ji vî cihûyê ciwan î zeîf î bîmarî hez dikir.

Erê, ji aliyekî ve em xebatkarê îstegeha trêne bûn: xanîkên me jî di nav erdê avahiya îstegehê de hatibûn avakirin, bi ser de jî hemû ji yek teşeyî bûn û bi xweseriyên mîmariya avahiya îstegehê hatibûn

lêkirin. Şefê îstegehê bi kenewerî digot 'memûrên çîroknûs' ji me re. Pêşî wê gengeşiya bêdawî dest pê dikir: Nexêr, em di rêza memûran de nayên hesibandin. Sermeselê, em serê parçe heqdestê distînin. Jê pê ve, ev heqdest ji ber ku rêwiyên eksprêse didin ne diravdaneke fermî ye. Hûn çîroknûsên esnafa ne, digot şefê îstegehê ji me re. Ya rast min nedixwest navê esnaf an jî memûrtî li min werê kirin; em hunermend bûn. Diviya em di rêzake din de bûna. Mixabin, di şevên ku firoşkarên nan û sicûq, dew, sêvan hişyar dibûn de dema me hev dehf dida û pesindariya malê xwe dikir nedihat parastin ku em di 'rêzeke din de' bûn. Me jî layî firoşkarên din dikir barebar ji bo em malê xwe bifiroşin. Helbet dengê cihûyê ciwan heme bêje dernediket; jina ciwan jî di navbera firoşkarên xwarinan û rêwiyên ku dadiketin peronê de asê dima. Ne jixwe malê meyî firotanê ne gelek bû. Bi daktîloya kevnîk ya şefê îstegehê bi kotek me hebek du heb sûretên her çîrokê derdixistin. Nivîsa sûretên paşiyê jî qenc nedihat xwendin, kiroxên wan jî bi kotek peyde dibûn. Çîrok ku careke duduyan nehatibûna firotin kevin dibûn; êdî bi kotek kirox ji wan re dihatin dîtin. Ji ber ku me çîrokên mijarên rojane dinivîsandin û gava me çîrokên rojek du roj ser re bihûrî û modeya wan li xwe şikandî dirêjî rêwiyên dikirin, mehdê xwe tîrş dikirin, digotin "Em van zanin, tiştên nû nîn in?" û çîrokjiyanên me diavêtin nav çavê me. Wê gavê jî me siûda xwe bi dest firoşkarên dew û sêvan ve berdida.

Kotekiyên me yên din jî hebûn: Trêna her car li ber xanîkên me nedisekinî. Şefê îstegehê gelek caran vagonê bar li ber perona yekemîn disekindin. Loma eksprêse mecbûr li ber perona (ku zîmanê mirov bigere ji wan re peron bibêje) duyemîn heta ya sêyemîn disekinî. Ji ber ku firoşkarên xwarinan pêşî bi vê hisiyabûn li wan deran li hêviya trêne diman. Ji ber ku em axleb di kêlika paşî de şiyar dibûn, çavlixew gelek caran pêşî bi pelesûrî li vagonên bar rast dihatin. Paşê diviyabû em li dora vagonan bifitiliyana, di nav riya trêne re bi hişyarî derbas bibûna. Ronahiya cihê trêna lê disekinî jî kêr bû. Nexasim ev ji bo me pir girîng bû: Çîrokên me yên bi tomarî di selikên hesîrî de bi dest xwe re nedihatîn firotin. Her rêwiyekî tomar (gelek caran diqetandin) vedikir, qet nebe çavek li rûpelan digere. Tarîtiyê karê me zor dikir. Ji ber ku rêzik

qenc nedidîtin piştî ku sere sere lê nihêrtin li me vedigerandin.

Karê me ji rê nedîçû. Heyama şer bû. Nan bixwe ji biha bû. Bi ser de ji gelek caran ronahî dîtefandin, lembeyên îstegehê yên kor êdî bi temamî bi kêrî ronak kirina berhemên me nedihatin. Di şevên weha de xebat beredayî bû. Di piştî şibakeyên ku perdeyênreş qenc nixumandî, li ber ronahiya kor a lembeyên bi kaxezên şîn pêçandî, me hewl dida kurteçîrokên xwe yên ku ne eşkere bû wê bîn firo-tin dinivîsandin. Xwedê kir ku rêwiyên vagonên razanê hebûn ku wan beyî qenc seh bikin hema çîrok distandin, bi ser de ji du qat pere didan. Van rêwiyên ji ber ku xwarina xwe di vagonên xwarinê de dixwarin piştî bi firoşkarên sêv, dew, sicûq û nan (nexasim ev) nedikirin. Ji ber ku çîrokên teze tenê li vê îstegehê hebûn, em li ba wan navdar bûbûn. Me her car sûretên pêşî ji wan re dihilandin; kiroxên hûrbijêr bûn. Lê belê zor dihat ji wan re ku piştî nivê şevê, ji nav nivînên xwe yên xweş ji bo çîrokekê rabin. Dîsa ji me çareyek ji vê re dîtibû: Me çend qirûş dixistin destê xebatkarên vagonên razanê ji bo rêwiyên li îstegeha me şiyar bikin. (Ji xeynî vê, her cara ku dihatin çîrokeke belaş ji me distandin. Ez ne bawer im ku dixwendin. Herhal bi nivheqekî difirotin.) Heke rêwiyên vagonên razanê ji nebûna halê me ne tu hal bû. Me bi hinekan ji wan re têkilî ji danîbû. Ji ber ku bi rebeniya me dizanîn, carina paste û kurabiyeyên ku lêzîmên wan bi xwe re dianîn di oxirkirina wan de, didan me. Ji ber ku axleb bi şev em dixebitîn, em pir birçî dibûn. Me bi şev çîrok dinivîsandin, bi şev sererast dikirin, bi şev difirotin. Gava eksprêş dûr diket em jîhalketî vedigeriya avahiya îstegehê; li salona rawestîne me kurabiyeyên rêwiyên vagona razanê dayîn me dixwarin. Carinan ew firoşkarên din ji bi me re dihatin. Dewfiroş, ji dewê ku nehatî firotin dida me; çawa be heta serê sibê wê tîrş bibûya. Bi gumana min hinekî dilê wan bi me dişewitî. Sêvfiroş ji –ne her car- sêvek ji me re diqêşart. Nedibû me çîrokên nehatin firotin bidana wan: Kesî ji wan xwendin û nivîsandin nizanibû. Tenê firoşkarê sicûq û nan çîrokek –ya kîjanî ji me bûya- ji me dixwest, bi şertê ku sûretê dawî bûya: Ji ber ku kaxizên me zirav bûn çixare bi wan dipêça.

Car caran ma ez kêfxweş bûma, yanî gava karê me li rê bûya, min ji firoşkarên xwarinan re çîrokên xwe dixwendin. (Jina ciwan li ber vê derdiket) Firoşkarê sicûq û nan, sêvfiroş hê di rêzikên pêşî de dihênijîn, belê heta dawiyê li salona rawestîne diman. (Ber bi dawiya çîrokê ji şiyar dibûn.) Dewfiroş bi hemû baldariya xwe guh dida min; ev baldariya wî li xweşiya min diçû. Heta ji destê min dihat min axaftinên lehengên çîrokê bi coş dixwen-

din. Di dawiyê de firoşkarê sicûq û nan serê xwe dihejand, digot, em di heyameke xerab de ne û keserek dikişand. Sêvfiroş ji digot, têne serê mirov tiştên wisa: Mirov çî dibînin çî nabînin di emrekî de. Min çîrokên di derheq firoşkaran de ji nivîsandibûn. Gava li van guhdarî dikirin dewfiroş bi xwe ji dihênijî.

Şefê îstegehê ji guh nedida çîrokên me. Lê bê ka çima, ji her çîrokeke me muheqeq yek dibir bi baldarî dikir dosyayekê û di dolabeke cihê de dihiland: Digot, zagon wisa emir dikin. Ji ber ku çîrokên me di nav erda rêveberiya Riya Trêne de hatibûn nivîsandin rewşa me di nav xala 248'an de bû. Gava behsa xalên zagonê derbas bû bêtî hemdê xwe ez soromoro bûm: Ma di nav erda îstegehê de zagonên ku rewşa me ji pak bikin, cihekî hêjayî şerefê bidin me nîn bûn? Ez her daîm li hember wê ferasetê bûm ku me û firoşkarên sicûq û nan dikin yek rêzê de. Dîsa nîqaşeke dûvdirêj dest pê dikir: Şefê îstegehê pirtûkên bergreş dadixistin, di der heq firoşkarên xwarinan de angaşt dikir ku Zagonên Parastina Tendirûstiyê hatine danîn.

Bi ya min rewş ber bi xerabiyê ve diçû. Cihûyê ciwan ro bi ro zêf dibû. Bi ya min nexweşiyê wî ya nexwiyayî hebû. Me pere nîn bû em wî tedawî bikin. Nexweşxaneyê Riya Trêne ji em nedigirtin. Ez ji şefê îstegehê hêrs dibûm: Dizanî me bixe nav xala 248'an û hema bibêje bi kotek çîrokan ji me bistîne. Ma xaleke zagonê peyde nedibû ku cihûyê ciwan tedawî bike? Hemû kesî dizanî ku rewş ber bi xerabiyê diçe. Gotegot hebûn ku wê kurterêyeke din vebe û wê di îstegeha me re derbas nebe. Êdî bi tenê wê trêne postê di vir re bihatana.

Ez di nav xemgîniyê de bûm, îca evîndar ji bûbûm. Helbet, evîndarê jina ciwan, ya di xanîkê rêza siyan de dima. Şevêkê, memûrekî vagona razanê, yekî ku me nas nake ew di deriyê vagonê de bi deve ve dehf dabû. Nedihiştin ku firoşkarên gerok bikevin vagona razanê. Jina ciwan ketibû erdê nav tozê, selika wê, çîrokên wê belawela bûbûn. Min li ber dilê wê da, min porê wê mist da, gotiyê negirî. Li peronê ji me pê ve tu kes nîn bû. Firoşkarên din hahaka malê xwe firotibûn, zûka ji îstegehê veqetiyabûn; vê pêlê nava me û wan ji ne xweş bû: Li vagonên razanê dixwestin gazozên ku li ser dinivîsî li gor Zagona Parastina Tendirûstiyê hatine amadekirin, sicûq û nanê ku bi kaxizên zelal û filan bêvanan bifiroşin. Bertîl dabûn memûrê vagonên razanê. Ya Rebî, her roj çima derd û belane nû derdiketin? Ev rêwiyên vagonên razanê yên tîrnexwar ji, piştî ku li vagonên xwarinê tîr xwarin –kî dizane çî dixwarin nivê şevê dîsa birçî dibûn. Xwedê da, me zagoneke demdemî dîtibû loma hêj nediwêrîn nêzî vagonên razanê bibin. Ev zagona jehrtêketî ji piştî mehekê

hukmê wê betal dibû. Em herduk –ez û jina ciwan-di sermaya şevê de dilerizîn, me xwe li hev pêçabû. Kijan siûdê em anîbûn vî bajarokî? Em di çî şertên xerab de dixebitîn. Ji bela firoşkarên xwarinan, memûrên trêne, birçitiyê û belengaziyê me nikaribû ji dilê xwe re çîrokên xwe binivîsanda. Berî her tiştî, pirtûkeke me ya wek edetê nîn bû. Di vê rewşê de kê wê çî ji me hêvî bikira? Her ku min serê xwe li ser diêşand min ev rewşa me ya seyr û hêvîsar çêtir fam dikir: Ya rast, rêveberiya Riya Trêne qet xêr bi me nekiribû ku li kêleka îstegehê odeyên layî qotiyên dabûn me. Bi roj ji ber trênen ku bi himûgum diçûn, di pîpîkê dixistin em ranediketin. Kesî bi qîmetê nivîsên me jî nedizani: Şevêkê ji yê bihûrî rêwiyekî vagonên razanê, yekî ciwan û lihevhatî çend çîrokên me yê ku me berî niha firotibûnê şanî rexnegirekî navdar dane, rexnegir gotiye ku çîrok pir klîşe û dûrî modeyê ne. Baran hûrik hûrik dibariya, pelên serî yê çîrokên di selikê de şil dibûn. Payîz bû. Ez bi fanêreyê xwe yî ziravok ku ji her deverê de qetiyayî diricifim. Di van şertan de min ê çî baştir binivîsanda? Ji nişka ve min bi hêrs ji rêwiyê ciwan ê vagona razanê re bi dengê sar gotibû, hûn dixwazin çîrokan li me vegebin, perê xwe jî bistînin! Ya rast min bi vî digot: Di berîka min de ribek jî nîn bû.

Di heyra van de ez ji xwe ve çûbûm. Min hay ji hawîrê xwe nemabû. Trêni bi dûr ketibû. Hê wisa min dît ku jina ciwan di himbêza min de ye. Xwe bi ser min de quncifandibû, serê xwe danîbû ser singa min. Min ew maç kir. Min selikên çîrokên me xistin çengê xwe, ber bi îstegeha me ya ku ji dûr ve ronahiya wê diwxiya meşiyam. Wê şevê ez û jina ciwan bi hestên tenêti û hêvîsariyê bi hev şabûn. A niha ez dema van rêzikan dinivîsim, li xanîkê xwe yê di navbera firoşkarên din, şefê îstegehê û riya trêne de asê mayî de ditirsim ku ber bayê rehaveta nivîsandina çîrokên xwe yê rojekê bikevim. Erê min ji jina ciwan hez dikir, gelek caran diçûm xanîkê wê. Ji ber ku odeya cihûyê ciwan di nivî de bû dema diçûm ba jina ciwan bêyî dilê xwe di ber yê cihûyê ciwan re derbas dibûm, vê ez aciz dikirim. Nexweşiya cihûyê ciwan lê zor kiribû. Êdî her şev nedihat firotina çîrokan; çiqasî diçû jimara çîrokên wî jî kêr dibû. Vê pêlê çîrokên wî jî min bi xwe dinivîsandin. Ew çend bê hal ketibû ku nedikarî ji vê alîkariyê re jî bibêje na. Kêlikên ku xwe baş his dikir, diçû ber masê çîrokên kinik dinivîsandin. Şefê îstegehê ev kêr didîtin û li gor xalên zagoneke ku aniha nav nayê bîra min, wisa berpêş dikir ji bo ku em kirêya xanîkên xwe derxin diviyabû em zêdetir binivîsin. Êdî têkilî mijarên me, heta têkilî şewaze nivîsandina me jî dibû.

Di wê demê de min dest bi nivîsandina çîrokên

evîne kiribû. Şefê îstegehê bi angaştê ku wê bibe sedema paşgotiniyan xwest li ber vî rabe. Bivê nevê me serê xwe li ber wî ditewand. Heke em ji vir bihata avêtin, me yê li ku îstegeheke weha ku bikarîbûya lê çîrokan binivîse peyde bikira? Dildara min xwarina şefê îstegehê çêdikir, cilê wî didirûtin ji bo tu bela ji me re dernekevin. Şefê îstegehê em kêr dixistin, bi rastî heke ez ne şaş bim her tim em kêr xistibûn. A niha jî bi boneya ku em bi saya riya trêne debara xwe dikin dixwest ku em tenê di vê mijarê de çîrokan binivîsin. Xwe dikir mînak ji me re: Ma qet şefê îstegehê jî bilî karên îstegehê tiştêkî din dikir? Min beredayî hewl da ku çawa zahmet e dîtina mijarên nû di derheq riya trêne de. Bi rastî dizanî ku em ê vê nepejirînin. Di vê jiyana me ya bi kotek ku me didomand de dixwest bi tehdîta ku wê ji meqamên jor re li dijî me raporên binivîse sedemeke tirsê ya nû ji me re çêdikir. Em û firoşkarên din jî bi hev ketibûn. Li vê quncika welêt a xewle bi me nebû em bi dilrihetî bi komika xwe ya piçûk a çendkesî re bijîn.

Min his dikir ku nava min westiyaye. Her şev xewa nivco, pîpîka trêne, mecbûrîyeta nivîsandina çîrokokine nû ji bo kiroxên nezan û dinyanedîtî yan jî jixweqail û xemsar, cihûyê ciwan yê ku her diçû nexweşiyê lê diwar dikir û şefê îstegehê yê ku her diçû cîrnexweş dibû... min hew dizanî bi kîjanê ve bigihim. Dildara min jî zivêr bûbû, kerixîbû; diviyabû min arî wê jî çîrok binivîsandana.

Min tê derdixist ku ramana min şêlo dibe. Her ku diçû têkiliyên min ên bi dinyaya derveyî îstegehê re jî qels dibûn. Ez ne haydar bûm êdî bê roj çawa derbas dibûn. Êdî wek berê ne jêhatî bûm ji dîtina mijarên rojane yê çîrokên xwe re, ji pevgirêdana mirov û serpêhatiyên wan re. Gelek caran bûyerên mezin jî di hisê min de nediman. Erê min bi hinek bûyeran dizanî: Şer qediyabû. Trênen tije leşker nofo nofo derbas dibûn, leşkerên ku ji eniya şer vedigeriyan. Min ji wan agahiyên jihevdeketî standin û çendekê çîrokên şer nivîsandin. Herweha gelek tişt nedihatîn bîra min: Şer li welatê me derketibû? Yan li çolistanên dûr? Axa me kêr bûbû yan zêde bûbû? Cihûyê ciwan bi kenewerî û jîhalketî bersiva min dida: Li gor ku îstegeha me her li ciyê xwe ye, ma çî qîmetê van heye? Li gor ku dengê topan negihîştîye îstegeha me, şer tu caran nêzî îstegeha me nebûye.

Paşê, di rûyê rêwiyên vagonên razanê de yê ku mirûzkirî li çîrokên min çavek digerlandin ez têgihîştim ku şer ji zû de qediyaye. Rêwiyekî jî rojekê got ku ez navên bajaran êdî pir şaş dinivîsim. Digo tin navê rêveberên me jî tevlihev dikim an jî ji bir dikim. Ma ne, bi salan bû ku min navê mirovan hilnedabû. Di nav komika me ya îstegehê de bi salan

bû me gazî hev nedikir. Pêdiviyêke wisa çênebûbû. Navê îstegehê bixwe jî ji ber ku tenê li dîwarê kêlekê, di ser de vera seyandî re hatibû nivîsandin jê çûbû, ji bîr bûbû. Ferhengê jî bi me re nîn bû ji bo gava hewce kir em li peyvekê bigerin. Gumana min hebû ku ez bi peyvên ji bilî yên ku her roj di çîrokên xwe de bi kar tînim zanim. Em bi firoşkarên xwarinan re nedipeyivîn. Şefê îstegehê êdî cîrnexesiya xwe tenê bi nîşaneyan derdibir. Cihûyê ciwan êdî wisa nexweş bû ku êdî ji axaftinê ketibû. Pêdiviyên xwe bi liva serê xwe derdibir. Ez û jina ciwan bê deng pev şadibûn. Ez di demek kurt de hînê vê rewşê bûm.

Ya rast ez bi dilrihetî nedigihîştim wê baweriyê ku dema bihûrî zû derbas bûbû. Diviyabû ez hîn bibim, tu çareyeke din nîn bû. Êdî ez têra xwe ne ciwan bûm. Ji xeynî çîroknûsiyê min bi karekî din jî nedizani. Êdî min nikaribû herim bajarekî mezin û ji xwe re jiyaneke din ava bikim. Dan û standina me ya bi dinyaya derveyî îstegehê re jî jixweber kêmbû. Ji bo ku rojname biha bûbûn û bi wesayîten din êdî dihatin şandin, pêşî têkiliya me û bûyerên rojane qut bû. Piştî riya nû ya trêne vebû û eksprês heftiyê carekê di ba me re derbas dibû. Ev bi kêrî min jî dihat. Êdî min nedixwest çîrokên kurt ku di bêhnê de diqedin ku her diketim heyra nivîsandina wan binivîsim.

Ji serê sibê heta êvarê jî odeya xwe dervedike-tim û min dinivîsand. Bi tenê teq û reqa koşkarê li kêleka min hişê min tîkel dikir. Ji ber ku êdî cihûyê ciwan nîn bû; berî demekê miribû. Ya rast min dixwest jina ciwan bihata kêleka min. Mixabin şefê îstegehê, hê negihîştim vê daxwaza xwe eşkere bikim rojekê –berî çend rojan– digel koşkar xwiya kir. Merik pê re pê re bi cih bû. Wek me li serê vî çiyayî karê wî jî ne bi rêk û pêk bû. Ez difikirîm ku xanîkê jina ciwan pêşniyarî koşkar bikim. Ev fikrê min herhal pir zêde ajot. Ji ber ku rojekê dema ez çûm xanîkê wî, yanî ji bo vê pêşniyarê bikim... axir hinekî hişê min tevlihev bû. Belê weha bûbû: Jina ciwan berî demekê çûbû. Erê xanîkê wê vala bû. Şeveke ku min çîrokeke xwe ya dirêj xilaskirî û pey re raketim, li trêne siwar bûbû û çûbû. Wan rojan hişê min bêhtir tîkel bûbû. Ev çîrokên min ên dirêj qet nedihatin firotin. Min jî ji ber ku di heftiyê de rojekê difirotin ez bawer im min zêde dixwest. Çîrokên min jî wisa eşkere û servekirî nedihatin hesibandin. Min rojên xwe nîvtêr derbas dikirin. Rojekê –yanî piştî çendekê– rêwiyekî di derheq çîrokeke min a ku min berê –berî çendekê– firotibûyê de rexneyên giran kirin. Numreyên rûpelan jî tevlihev bûbûn. Min jî jê re got, ev hefteyeke ku birçî me. Na min negot. Min ev jî rêwiyekî –piştî çendekê– din re got. Min hewl da ji rêwiyê berî çendekê

re bêjim ku hemû tişt min bi zanîn kiriye. Min gelek tişt ji bîr dikirin. Lê ez ji rexneyan re hesas bûm. Di demên weha de û kêlikên ku min fikar dikirin min ew rihsivikiya berê zêft dikir. Paşê min berdida, piştî çendekê. Sermeselê, gava şefê îstegehê digot tu nema bi kêrî tiştêkî tê, ez ê berdime te, min fikar dikirin. Hekena, tevî ku kêmbû kirox di dîtin jî, bi ya min çîrokên min êdî baştir bûn. Koşkar jî di derheq dinyayê de boçûnên xwe digotin. Vêga qenc nayê bîra min be çî digot. Lê belê koşkar behsa dinyayeke tîkel ku hişê min ranedigirt dikir. Li çîrokên min yên ku min dixwest jê re bixwînim jî guhdarî nedikir. Lê belê min wisa tê derdixist ku ew her ku diçû ji alîyêkî zor e bilêv kirina wê her ku diçû qedirgiran dibûn. Min nedikarî vê ji koşkar re bêjim. Ji ber ku çûbû, ez bi tenê hiştibûm. Piştî axaftina me ya paşî –helbet piştî çendekê– ji îstegehê veqetiyabû.

Ev çîrok yek ji çîrokên min ên dawiyê ye. Gelekên din wek vê ketin ser hev. Çîrokên min hemû di hişê min de ne. Hemû qenc tên bîra min. Belkî min hemû hê nenivîsandibin. A niha hinek şevan, ji ber elimandina berê, nîvê şevê radibim van çîrokên nû bi baldarî di selika xwe de –an jî di selika jina ciwan de, yan jî ya cihûyê ciwan ê mirî de dinijînim, diçim ser riya trêne. Êdî trêne di vir re derbas nabe. Herweha vê pêlê şefê îstegehê jî pêrgî min naye. Ez zen dikim izin standiye –ji ber ku bi salan e betlanya xwe nekiribû. Kincên wî jî vêga li ser min in. Herhal gava çûbû ez xistibûm cihê xwe. Axir, ev pûçîkê piçûk in.

Ditirsim. Ji ber ku dixwazim ji vir biçim. Dikandar hê bi deyn tiştan dide min. Lê belê ev rewş wê bêhtir neçe. Min ji şerma ji dikandar nepirsî, berî demekê –berî çendekê– ji ber vê şermê min ji koşkar jî nepirsîbû: Min dixwest nameyekê binivîsim, lê min navnîşan nedizani. Min tu navnîşan nedizani. Wê bawer nekirana, ji ber vê min şerm dikir. Min nedikarî bêjim, hûn dikarin navnîşanekê ji min re bêjin? Hekena, navnîşanek bi tenê besî min bû. Zehmetiyeke din jî hebû wê wextê. A niha jî heye, yanî piştî ku demek tê re derbas bûye jî. Divêtiya ku ez navnîşana xwe jî li ser nameyê binivîsinim heye, ev jî min dixê nav fikaran. Vê çîroka xwe bi awayekî, ji ber ku êdî eksprês an jî trêna postayê di vir nedichû –belkî tenê ji bo demekê– heke riyekê bibînim û bigihîjînim ber destê xwendevanên xwe –êdî kiroxên min neman– jî, ez ê ji wan re bêjim ez li ku derê me? Ev arîşe jî min dixê nav fikaran. Lê dîsa jî ez dixwazim hema ji wan re binivîsim, ji bo wan binivîsim, seraqet ji wan re bibilînim, wan haydar bikim bê li ku me.

Ez li vir im xwendevanên min ên dilovan, hûn li ku ne gelo?

Çavê min rê dikişîne

Hêvî RONÎ

Gava waneya dawîn a zaniyêgehê kuta bû, bi erebeyaya nav şar xwe gihand mala xwe ya li navenda bajêr ku li taxeke bêdeng e, bi du hevalên xwe yên zaniyêgehê re kirê kiribû. Rahişt çenteyê xwe yê duh êvarê ku ji bo îro biçê gund amade kiribû avêt piştê xwe û bi lez ji mala yekqat a nav baxçe derket. Di-viya xwe bigihîne otobêsa şaredariya navçeyê ku wê saet di dudu û nîvan de bi rê biketa. Minanî gelek carên borî dişa bi heman şeweyî piştî waneya dawîn xwe davêt gerîda şaredariya navçeyê berê xwe dida gund. Li çaryanê peya dibû, paşê nêzikî sê çar kîlo-metroyan bi peyatî diçû.

Piştî nêzikî saetekê û piştî guhdarîkirinên bê dil ên rêwiyên di gerîdeyê de ku her dem bi heman mijarên ji rêzê didomiya, xwendekarê pola yekem a beşa kolyarnasiyê Samanê Memê xwe li çaryana navbera navçeyê û gund dît. Beriya silava çivîkeke pêşî-qîçik bayekî şêlûgermî rûyê wî yê zenûn rapelî.

Rêya gund ji fêza gund ve tê şopandin hetanî bi-niya gund, rêyeke xizxizî û zaxxaxî wek marekî ku ji germa pûşperê giran bikişê, ji dûrve mîna şiverêyekê xwe digihand bin piyê Samanê Memê. Gund li pala çend çiyayên lêp bi lêp, li dev û dorê çend gir û kaşegewr lê bi çêre û çêregeh pêçayî, newal bi newal par par û tax taxî bû.

Nêzikî katekê paşê te digot qey rê marekî kişiyabû, Samanê xwe li bintara gund li aliyê rastê dît. Çimkî li hêla rastê dişa her du goristana ku bi rêyeke şose hatibû dabeşkirin bala Samanê kişand. Li fêza vê rêyê goristana Misilmanan û li jêrê, jê wêdetir ji goristana filehan cî digirt.

Li vî gundî bi qasî heştê not salî ye misliman bi cî bûne. Der barê gund de gelek çîrok, qewlik, meselok, gotegot hene. Samanê Memê her û her ev agahiyên der barê gund de mereq dikir û dikola, li ser vana diponijî, ro dikir û dipîva. De pîrika wî digot beriya kalikê wî bê vî gundî li wir ermen dijiyan. Digot dema kalikê wî ximê xaniyekî kolaye ji bin axê tendûreke çot kulfik derketiye û hêji di tendûrê de xweliya agirê daran hebûye. Wek gelek şopên ser ax û binaxên din jî, Samanê jî dizane, li fêza gund ciyek heye, ji wir re Pelê Reş tê gotin, li ser wî zinarê reş dirûvên xaçan hatine xêzkirin. Li gund hema hema hemû kes bawer in ku beriya fileh hatin mişextkirin ji ciyên bav û kalan hatin koçberkirin, derketin rêya çûnehatê, wê katê zêr, zîv û hêjahiyên xwe yên xemlê hemû binax kirin. Wek hêviyên xwe ku veşêrin ji rojên aram ên

winda re. Tê gotin di demeke heliyayî de xortekî gihiştî bi kalikê xwe yê kor ve hatiye gund û kalik li piştê ciwên hatine çûne rojhilatê gund li tanga newala çeçenê, niha ji bilî reherizyayiyên wan tu şop û dewes nemane, serê newala germikê (avegerm) ku zêrên li bin dareke kifş, berê hatine jimartin bibînin. Kalê destê xwe ji çavên xwe re kiribûye star ku çiqilên daran di çav re neçin. Neviyê wî dibêjê: Kalo çima destê te wisa li ser serê te ye, serê xwe xwar dikî? Kalik dibersivîne, dibêje; ji bo ku çiq û şaxedar di çavê korbûyî re neçin. Nevî lê vedigerîne: Kalo bi gora kalikê te yê file bikim li vir ne dar mane ne jî daristan. Tenê cî bi cî çend deviyên şilanan, çend kom çeçen û darên hirmiyên beyanî mane. Kalê têgihiştî ku wek zêran hêviyên wan jî binax bûn.

Meta Samanê a Horîsîma bi wê jinebîtiya xwe ji mêran zêdetir dixebitî, wek jinên vê kêşwerê. Sal dozdeh mehên xwedê berx û pezê xwe rastî tanga gorên filehan dikir. De ji ber çî bû kesekî pê nizanibû. Çêreya nava gorên filehan bi qasî bihustekê ajêr dida û paşê dibû zerepûş. Ker, hesp, pez, dewar û ajalên beredayî ji gişk her katê li nava gorên filehan diçêriyan û lotik diavêtin. Êdî nava goristanê bûbû war û dewesên lotikên keran, bûbû ciyê ku pez lê kitkitî dibû, hetanî beriya çuyîn û hilgerbûnên zozanan, qada çêre û çêregehtiyê dikirin van gorên ên çavliparemayiyan. Metê digot; sibehêkê zû kata ku berxên xwe ber bi goristana filehan kiriye, mirovekî biyan ditiye û piştî danîna çend qûç kevir, ku wek nîşaneyên tiştan, li nav goristanê winda bûye. Roja din dişa ku berxê xwe rastî heman ciyê kiriye, ditiye ku çehleke nûvedayî û li dorê çend kom hestî hene. Paşê bû gotegot ku ji wê çehlê zêr hatine derxistin. Te digot qey ruhên filehan ji deşt û çolistanên ereban hatine gund ku bi pey hêviyên xwe bikevin.

Samanê jî ramanên kûr û dûr avjenî kir, xwe gi-hand peravê goristana filehan. Hetanî hinda rêya ku goristan dabeş dikir çû û wê katê dengê gerîdeya gayan a apê wî yê Mistefê ji kûrahiya bîra wî dihat. Dema diçû dibistana seretayî ku apê wî bi erebeyaya gê ji jêr ve dihat, jor de bazdida diçû peşiya apê xwe, ku li ser nîr siwar bibe. Him bi vê bîranînê him jî bi karîgeriya waneyên kolyarnasiyê ji kendalekî nîzîm derbas bû çû nava gorên filehan. Dibawerî ku diroka gund pir kevn e ji ber wê yekê berê jî hin binmayiyên binax dîtibûn. Ku heger bibe, dixwest li gund hinek ciyan bikole. Paşê ji çend gorên bê nav û bê nasname

(bi rastî giş wisa bûn) derbas bû û ber bi wê gora ku beriya çend salan hatibû kolan ve çû û hêjî ew gor kifş bû. Wê katê li ber lingê Samên çend maregîsk û kêzikan bazdan wek şahidên demê yên ruhên mişext. Li tanga goreke li ber serî kêlikek çikandî û li derdorê çend tûmik ormîx a zerbûyî bi zeregoniyeke rehavêtî li qulofîskan rûnişt. Li rex, li goniyeke bi pejal î ji rû ve hêşîn bişkivî nihêrî, zûr ma li moris-tangên hûr ên di bin gonî de diqilqilîn gerisî. Likumî û paşê dîsa likumî, hew dît li nava gund e, mal û koşk û baxçe têkûz in, çemê zîvîn li binetarê diherike, der û dor, dar û daristan, bax û rez li dar in, şênî geş in, xebat û tevger pêl bi pêl... Gundê adan şênîyên fileh ji wan tirê rûniştvanê bihûştê... Saman dît her tişt li gorî dil û lêkolînên wî ne, dîtînen wî

wek xeyalên wî ne. Lê ji nişkan ve taviyeke baranê ya reşqîr hîlbû ji deştên esmanî ve, cî bi cî bobelîskan kir gopelan û ewrên mişt şilî ên şivşivî çerx dan. Li gund bûbû hêwirze, hespên behrê yên kumêt, boz û bi tenî bi çar aliyan ve raperîn, reng çilmisîn. Samên dît ku katjimêr qerisîn, dem dewixîn. Ji wan çivîkên pêşîrçîçik yekê li ser serê wî kir wîtewît, sê caran sê fetl dan xwe di esmên de sê helqe afirîn û pêl bi pêl lêp da wek kevirê ku li aveke peng bikeve. Saman veciniqî dît ku dem heliya û herikî, divê biçe malê. Çivîka pêşîrçîçik li serê kolekî, li hember wek pasdarekî li kolyarnasê li ser rêya çûnehatê diraçavî. Şahidê demê yê wê kata zimanê zemên.

Vê pêlê

Sidîq GORÎCAN

çavên min êdî dişibin çavên bavê min
bavê min ê kal
çavên min ên extiyar
qul û westiyayî...

xewna min a van rojan:
dayika min dimer
hevnasê tuneiya wê dibûm
hîseke xerîb
hesteke daxiyar û tenhayî...

min li ba dilê xwe
bexşanî ji biçûkçana xwe xwest
û helbesteke şiledilkî rêzerê kir
helbesta lêborîn û nedametiye
ji her kesî xef
ji her kesî dûr
zivistanî û windayî...

ji du çivîkbilbilên xanehêlîna min
yek mir, navê mem bû
zîn ma tenê
bêhn li me teng bû...

dibînî tu ey haylênemayî
îşev jî xemê li me zordestî kir
helbest kir nîvî
helbest kir du tiş
helbest kir sêwî
pêve pêve
û
hêdî hêdî
ji xwe bêhnbezî ketim
bûme berederiyê xwe ez
peyv hilorî asîmanan bûn
stêrên kadizê xuricîn bi sernişîvî

Li welatê xerîbiyê “ez û yên din”

Kenanê NADO

Welat, xerîbî, kirêti dibe ku ji kesî re tu mayeyê ifade neke. Lê di bingeha rastiyan tehl de, di dilê min ê ku ji samîmiyetan, bi destekî girûz, angostekî ku diêşîne, bi destekî di literatura zilmê de bi navê xerabkerê xwezaya heyînê, min qirêj dike. Ji eslê min dût dixîne û min di hebûneke madî de dilewitîne. Li gorî zanistê tu rastiye ji min re nahêle. Cih xerîb, fikr xerîb, hest xerîb dimînin. Lewre tiştên ku bi destê min tên kirin. Tenê wisa dixuyên. Xuyana derewîn, xapxapok, ne samîmî... Çimkî destên girûz hişên saf dixurînin. Hişên saf jî di bin zordestiya xerîbiyê de dikifin. Heywax! Te dît li welatên xerîb hiş qirêjî dibin. Di bin perdeya zilma tarî de jeng digirin, dikifin, diçin, diçin, diçin û dimirin.

Li Stenbolê, welatê xerîbiyê û kirêtiyê. Wela-tekî wekî tenûreke di nav çem de bi alozî mirov bikişîne xwe û pêşiyê biêşîne û piştê bixeniqîne. Biêşîne jî, bike hêwirze jî hê di serbayê ser de bixeniqîne jî xerîb e. Ew jî bîr naçe. Rast e, dibe ku hûn bibêjin ji diyardeyekê re nîşandayîna sedemê gelekî hindik e. Yanî ji bo kirêtiyê xerîbî tenê bi serê xwe dibe? Lê ez dibêjim jixwe xerîbî, kirêti ye. Jixwe xerîbî sedemên qirêjiyê diafirîne. Xerîbî vedirêhe li sûk û kolanên kurdan qirêjiyê, kirêtiyê...

Nizanim îro ji ku derket ev kuredera kureder, hat bû bela li serê min. Gelo ji rêwîtiya min a trêne bû. Dibe jî. Xwedê qebûl neke ez wê çaxê ji kulan direviyam, lê neçar ez dîsa ketim nav bîreke kûr û tarî. Te digot qey tavehîvê tê de xeniqandine. Ser de jî hezar lihêf şev pêçane. Ka ez çî bikim! Zêde dirêj nekim ji we re bi kurt û kurmançî meseleyê yan jî tiştê ku li serê min qewimî vebêjim.

Welhasil min bilêta xwe stend û li trêne siwar bûm. Rojek ji rojên havînê bû, wext jî ber bi êvarê, êdî hêdî hêdî tav dê biqulibiya. Ez li ser paldankeke rûniştim. Tenê bi serê xwe bûm. Lê lehzeke şûnde millet tijî bû. Belê tenêti ne xweş e û meriv bêhteng jî dike. Lê hin caran hez bike bila hezar kes dev dorê te bin, dîsa jî tenêti ji te dût nakeve. Lewra tu, tu kesî nas nakî. Ne reng, ne ziman, ne nêrîn... Hema tu bibêje xêncî pêncî kilo

goşt, bîst kilo hestî pêştir tu tiştêkî we naşibe hev. Ji ber wê tenê cih, tenê namîne. Lê mirov dîsa tik û tenê ye. Eva ez rewşek wiha de bûm. Min got temam jixwe ez hêviyek wisa de nebûm ku dê niha çend kes werin bal min û em ê ji xwe re bikevin nav sohbe- teke kûr û dût... Ji ber wê min got ka ez di şibakeya vê qulzêma dirêj de ji xwe re dinyayê temaşe bikim. Ca ez ê çî bibînim. Mînanî her nîrxandineke basît bi rastî jî derve pir xweş bû. Li hemberî min; behreke zelal û sekan û bawer im piçekî germ, wekî din avahiyan dewasa; dema ku meriv didît devê meriv vekirî dima. Ew qas mezin, bilind, sosret... Li her cihî mirov bi karên xwe ve mijûl dibûn. Zikê her kesî têt, perê wan pir, lê devê wan tijî vir bûn. Pêşiya her bî- nayekê hewzeke paqij û parqekê zarokan û li kêleka wan amûrên werzîşê ji bo werzîşvanan. Ka xwezî kurmançiya min têtê bikira ku min hin tiştên din jî bijimarta. Ango çî tiştê ku ji bo mirov lazim e, hebûn. Lê dîsa hundirê min tijî kul bûn. Min got bawer im ez ji van xelas nabim.

Êdî tenê çavên min li derve dinihêrîn, jixwe heyvê tav pêçandibû. Ji ber wê min tu tişt nedidît.

Hişê min jî ne li serê min bû, ez ketibûm nav fikr û ramanên bê teraz, bê sînor. Car caran ez bi xwe ve dihatim û min dinihêrî ku ez di şibakeya trêne de ji ber ku -şevêk û tarîtiyeke pala xwe daye şibaka min- li xwe dinihêrim. Dihizirîm û ez difikirîm ku ev kul ji ku dizên. Ji kîjan kaniyê dizên û ji kîjan gurgureyê dipekiyan. Tenê yek tiştêk ji bo ku ez ji xwe re bersivê bibînim bes bû. “Ez û yên din” angostez û mirovên li derdorê, ez û derve, ez û trêne, ez û ev welat, ez û xerîbî, belê xerîbî. Ji ber ku ez hatime mişextkirin ji xwe, ji welatê xwe. Di nav gopeke guran de me. A niha dê min bigirin û daqurtînin. Dê hebûna min bikin qurbana zikê xwe. Ez dê

bimirim, ne bi rastî ez ê qir bim, di nav mirov, bîna, trêne, behr û şevên daqurtî de. Hey Xweda ev çî ye hate serê min! Ez ê ji te lawa dikim. Min xelas bike hebûna min! Ez bi te gazî xwe dikim, bi te qîra xwe, çêra xwe dikim zimanê min. Tu hebûna min î, yara min î, evîna min î, xerîbiya min na, ‘ezîziya min î, rûmet û serbilindiya min û serkeftina min î. Min nehêle tenê li welatê xerîbiyê, kirêtiyê, qirêjiyê...





Dosye: Tu ji bo çi û ji bo kê dinivîsî
Amadekar: Elîxan LORAN

Di çend qonaxan de peyv-karî
Bajar MÎRZEMAN

Hey teacher's! leave it writing alone!
Elîxan LORAN

Nivîsa kurdî
Çiya MAZÎ

Çi çima?
Hasip YANLIÇ

Çima nivîs?
Gulgeş DERYASPI

Dinivîsim
Huseyîn GUÇLU

Mirov çima dinivîsin
Şerefxan CIZÎRÎ

Nivîsandin xîret e
Îsmail DÎNDAR

Ez ji bo şoreşê dinivîsim
Mistefa TUNCYUZLU

Çima nivîs?
Înan EROĞLU

Di nîqaşên wêjeyî de her dem hatiye nîqaşkirin ku nivîskar ji bo çi û ji bo kê dinivîsin. Her nivîskarekî/ê mebesta xwe gotiye. Hinekan gotine “ji acizî”, hinekan gotine “kêfê dide min”, hinekan gotine “ji ber ku tiştêkî din ji destên min nayên”, hinekan gotine “ji bo cihaneke xweş û baş” û hwd.

Me jî bi vê dosyeyê xwest em xal û babetên wekî;

1. Li welatê ku şer û pevçûn û qir û qiyamet lê heye, nivîs dikare bi kêrî çi bê?
 2. Nivîsandina te ya bi kurdî çawa dest pê kir? Ji ber helwesteke polîtîk an jî ji ber pêdivîyeke hunerî?
 3. Heke Kurdistan azad bûya te yê dîsa jî binivîsiya? Di nivîsandinê de rola bindestiyê çi qas heye? Nivîsandin dikare te yan jî me kurdan bike serdest?
 4. Tu dema ku dinivîse, gelo dixwazî kî nivîsa te bixwîne? Tu dixwazî ji bo çi bixwîne, peyama te ya sereke çi ye? Profileke xwendevanan a çawa tên ber çavên te?
 5. Gelo bi ya te nivîsandin çi ye? Gelo nexweşî ye, îbadet e, deyndan e, serîhildan e, stûyê xwe çemandin e, rastkirin e, şaşkirin e, rexnekirin e, nixrandin e, dagirtina valahiyê ye, valakirina hebûnê ye, qewartin e, qeşartin e, veşartin e, pêdivî ye, qidam e, erk e, fantezî ye, pîşe ye, kêf e, sebr e? Yan jî ji xeynî van tiştên ku me rêz kirin, tiştêkî din e gelo?
 6. Nivîs bi ya te tiştên heyî vala û pûç dike, yan jî berovajî wê, hundirê tiştên heyî dadigire? Piştî nivîsandinê aramiyek xwe li te dipêçe yan jî “cira te nexweş” dibê?
 7. Baweriya te bi îlhâmê tê? Piranî kîjan deman, kîjan saetan, çawa dinivîsî? Ji bo nivîsandinê ji fikir/peyva pêşîn heta ku ew nivîs bê belavkirin/xwendin ji te re çi hewce dike? Di wê pêvajoya destpêk-qedînê de tu li hêviya çi yî?
 8. Ji ber ku di kurdî de paşxaneyê xurt a nivîsandinê tune – ji ber de dem û pêl ji hev hatine qutkirin- gelo mirov dikare di kurdî de qala “nivîskarî” yê bikî?
 9. Dilê te dibije kîjan nivîskarî?
 10. Ji bo kesên ku nû dest bi nivîsandinê dikin, pêşniyarên te çi ne?
- nîqaş bikin. Bi hêviya ku *ji qumaş re hebe xerîdar...*

Di çend qonaxan de peyv-karî

Bajar MÎRZEMAN

Ji kesayeta ku ji “do”ya xwe ko bûbe û dewla xwe bi bîra enderîn ve berdabe derman tenê peyvên no ne. Peyvên ku bi girêkên salan hatine şidandin in ku gelek caran ji parastinan re kon in.

Me li ser kokeke hatiye pelçiqandin, eciqandin, rûçikandin, rizandin acirû daye û em li ber bayê zemên ketine. Em çiqasî bi kûr de diherin hew qasî em bi kûrî dinihêrin li hebûna xwe. Em hene, lê hebûna me hebûneke di keriyê de ye. Ji ber ku dengê me ketiye. Em hene, lê hebûna me di laliyê de ye. Ji ber ku zimanê me nagere. Em hene, lê hebûna me maye li ser tayekî. Ji ber ku me ji “do”ya xwe şax bernedaye. Kesên ku ji “do”ya xwe bikulê ew ê ji hebûna xwe ji bikulê piştî demekê. Kesê ku ji hebûna xwe bikulê, sibehên wî beravêtî ne jixwe.

Valahiya hebûneke rewnaqdar û kesayetiyeke kêrhatî carina ji peyv dikare dagire. Peyvên “no” yên ku dikarin di keriya wendabûnekê de bibin kerînek ji guhan re.

Nivîskarî, girrê xelasiya ji wendabûnê ye di hembêza hebûna ku dikulê de.

Roja ku hişmendiya însên rûnê û ew pirsên “Ez kî me?” “Ez çi me?” “Ez ji bo çi me?” ji xwe bike, êş dest pê dike. Însanê ku ji “Ez kî me”bûna xwe dest bi êşê bike, gaveke dinê nêzî xwe dibe. Bi vê nêzbûnê re îcar li çareyan digere ku karibe êşa xwe aş bike. Peyv ji alavine kêrhatî ne wekî alavên din yên ku dikarin êşê sivik bikin. Însanên ku bi piranî ji zimanê xwe diêşên, ji mecbûrî xwe diavêjin bextê peyvên û wan wekî melhemekê di êşên xwe didin.

Nivîskarî, kewandina êşan a bi peyvên e.

Nivîskarî, haybûna ji hebûna xwe, xwenaskirina destpêkê û xwetemamkirina derengmayî ye...

Ji bo civaka ku ji eyarên xwe hatibe guran û ji eyarê xwe hatibe derxistin derman peyvên şor in. Peyvên ku bi kulman xwê li wan hatine reşandin in ku gelek caran ji birînan re naşor in.

Zimanekî ku bi salan di bin girêza zemên de mabe ew ziman ne zimanekî paqij, zimanekî gemarî ye. Zimanê gemarî devê însên, devê însên ji dil û

mejiyê însên necis dike. Ji dil û mejiyên necis ji ew ê ne civakeke tahir, civakeke necis derkeve holê.

Nivîskarî, di destê xwe de “axa sor” gerandin e hinekî. Peyv bi peyv tahirkirina zimanekî ye.

Civakek ku bi peyvîne eşiyayî, derizî, şikestî û qop dan û stendina xwe bike, ew ê ji biêşê, biderize, bişikê û taliya talî ew ê qop bibe. Ji civakên qop ew ê kesayetên qop, ji kesayetên qop ji ew ê berhemên qop derkevin. Civaka me ji bi sedsalan e bi peyvîne ku tehm û ruh û xwîn di wan de nemaye, dan û stendina xwe dike. Yan ji em dikarin bêjin ku bi peyvîne ku xwar hatine cebirandin, peyvîne ku di bin zexeliya peyvên zimanên din de wenda bûne, peyvîne ku ji derba xwe ketine û têra xwe qels bûne. Bi peyv û kesayetên qop civakek, ew ê karibe çiyî rast bi ser hev de bîne? Ew civak çi ava bike ji ew ê şopa lingên wê yê ku dikulê di pey wê re xuya neke ma?

Li civakekê bifikirin ku kesayetên wê, hezkirina xwe di dilekî ji derveyî giyanê xwe de dijîn. Li civakekê bifikirin ku kesayetên wê qalikên birînen xelkê li birînen xwe diedilînin. Li civakekê bifikirin ku kesayetên wê ji zimanê xwe dest bi rizîne kirine. Li civakekê bifikirin ku kesayetên wê hebûna xwe di tûnebûna hişê xwe de wenda dikan.

Di helwesteke werê de peyvên ku bi destekî hoste ve bîrên niqurçandin, karin bibin darên bin çengî ji civakê re.

Nivîskarî, hinekî ji cebirandina derizandina civakê ye.

Ji welatê ku hebûna wî di hest û ruh û xewnên welatîyên wî de hatibe neqîşandin û tenê di wê neqşê de mabe re, derman peyvên şor in. Peyvên ku bi serê tiliyên jêkirî hatine nivîsin in ku ew peyv gelek caran sînor in.

Sînorê welatekî heta cihê ku peyvê wî derbas dibe ye. Ew sînor ne mecbûr e ku fireh û li ser hev be. Dibe ku teng be. Dibe ku belawela be. Lê divê peyv di nav wî sînorî de bi deng be. Divê ew peyv kêrhatî be. Olana dengê wê peyvê divê dagirtî û têr be. Heger ku wê peyvê ji şîrî heta pîrî hebûneke qerase dabe ahilê wî sînorî, ew sînor ji xwe welatek e. Na, heger ku peyv di wî sînorî de şîrkuştî û di çarpiyan de mabe ew ê ew sînor nebe sînorê welatekî jixwe. Ew ê bibe tiştêkî din.

Nivîskarî, hinekî ji bilindkirina dengê peyvê û bi



wê re jî bilindkirin û diyarkirina rengê welêt e.

Kurd bi Kurdbûna xwe jî mêt ve bi dîrokê ve zeliqî mane. Çi hêzên ku rabûne û dil kirine Kurdan wekî şaxeke mêtewekê bixesixîne û bavêje ristan, ji bo ku hişk bibin, bi ser neketine. Kurd, her mane. Li talanê wan hatiye xistin nebûye, ji warên xwe ew hatine teriqandin nebûye, gund û rezên wan hatine şewitandin nebûye, bi darên ku ji ber agir berdana wan filitîne ew hatine darvekirin dîsa nebûye. Her ku xwestine Kurdan ji dîrokê biqetînin, Kurd bêtir bi dîrokê ve bûne mezeloq. Lê ev mezeloqbûna wan nayê maneya ku di dîrokê de ji van bobelatan bi-dengtir, ji van trajediyan bi êştir şop hiştine. Dîme-

nên wan her tim nizm mane û têrî ku di pelên dîrokê de cih bigirin nekirine.

Kurd û Kurdî di dîrokê de timî nîvkelî mane. Tevî ku gelek caran beroşa dîrokê bi agirê wan keliyabe jî. Çend rengên ku hene, ew jî ji ber xezeba zemên çilmisî û gewrik bûne, ji nav bêyî derxistin tu carî Kurdî, bi ekleke zêde nehatiye tehmandin û tehma wê di bin zimanê dîrokê de nemaye.

Nivîskarî, ku alava wê peyv e, hinekî jî dîrok bi peyva xwe ve zeliqandin e.

Nivîskarî, hinekî jî bi hebûna zimanê xwe, dîrok sebixandin e.

Hey teacher! leave writing alone!

Elîxan LORAN

"Huner tê kişandin ji otomatan" Kawa Nemir



Dîdaktîf e, ne dadaktîf e, ne dadaaktîf e Rewşen,
Xweda yê banî ye ew jî cevşen e, zeryayên Ariyayê ye nivîs
Ev kevîşen kewşena piştê ye wezîrê jêwergiranê!..

Xwîna berazî helalkirinê dixwazî

Bêhn fikir ji tiliya xwe
Di navbera nal û bizmar de tiliya giliyan
Fermo! Vereşe vê hilma mecbûrî
Tu ji qiyameteke qiyametan fitilîbûyî ser qiyama hundirê xwe
-68'ê Kurdistanê, nîfşê 90'î; raborî li me bûye aborî-

Dûre dewlet e!

Ji bo zarokên li herêmê bê tv û teknoloji derseke vebijartî ye,
Janya, hêdî! Tu dikarî xwe bikujî.


Telaqên serdestan wan avêtin, rahiştin mekapan
We ji ber avêtin! Bi hestiyên wan we kab avêtin
Mamosteno! Nesîl û embesîlên nû dê berhema we bin

Kevanên peyva te kurisîne mamoste
Tu yê bi peyva xwe ya qewartî negihîjî dilê heyva qeşartî
Mehdê mamoste ji serdest dixele, xwediyê malê ji her duyan aciz e
Nexwe tu gazina sê mehên havînê yên berberêkî yî, mamo
Di holbûna huşitiyê de
Şeş pênc heft! Huş dibim û aştiyê dixwazim
Berî ku şoreşger li pisikan vegerin

Ez mamoste me
Neh mehan bi ser Xwedê sê mehan jî bi ser Wanê me!

Nivîsa kurdî

Çiya MAZÎ



Li welatê ku şer û pevçûn û qir û qiyamet lê heye, nivîs dikare bi kêrî çi bê?

Ç.M: Nivîs dikare pir tiştan bike. Yên ku şer dikin li şer difikirin, li serkeftina wê demê difikirin. Lê belê yên ku li wan dinêrin, tevgerên wan bandora wan a li civakê û li giyanê mirovan û li axê dişopînin û fikrekê jê derdixin nîşeyan dikin. Û wan nîşeyan dikin wêje, ew wêje jî ji civakê re dibe hiş û ew hiş jî dibe hiş-mendiyeke mayinde.

Nivîsandina te ya bi kurdî çawa dest pê kir? Ji ber helwesteke polîtîk an jî ji ber pêdivîyeke hunerî?

Ç.M: Pêşiyê ji ber helwesta polîtîk dest pê kir. Lê dûre ji xweber bi ser pêdiviya hunerî ve dageriya û dom kir. Ango valahiya wêjeya kurdî û xwestin û hezkirina min a ji hunerê û giyanê min ez ber bi wê nivîsa wêjeyî ve kişandim.

Heke Kurdistan azad bûya te yê dîsa jî binivîsiya? Di nivîsandinê de rola bindestiyê çi qas heye? Nivîsandin dikare te yan jî me kurdan bike serdest?

Ç.M: Ku wextê min dest bi nivîsê kir Kurdistan hebûya; dibe ku min nenivîsanda, lê dibe ku hestên min wê demê ku aniha bûne helbest an bûne çîrok, dê bibûna penceşêr û di bedena min de derketina. Dibe ku ez bi xwe nehesiyama ku “çi me û çi dikim?” Ya ku hestên min kirin teknîk û li ser kaxezan rêz kirin halanên netewî bûn.

Heke ev nivîs û wêje ji gelekî re bibe hiş û bibe bîr an jî heke zanistîya lîteraturê wisa be, wê demê nivîs dê neteweyan bibe qada xelasbûnê. Ev ne bi awayê serdestiyê be jî, bi nivîsê azadî tê, lê belê yên bixwazin bibin serdest jî dikarin wê bi kar bînin. Divê mirov wêjeya devkî jî di qada wêjeyê de bihesibîne û wê jî wekî nivîsê bihesibîne û di nava faktorên xelasiyê de bibîne.

Dema ku tu dinivîsî, gelo dixwazî kî nivîsa te bixwîne? Tu dixwazî ji bo çi bixwîne, peyama te ya sereke çi ye? Profileke xwendeva-

nan a çawa tê ber çavên te?

Ç.M: Bi rastî ev jî li gor pêvajoya nivîsandina nivîskêr diguhêre. Heke ev pirs di destpêka nivîsandina min de bihata kirin min ê bigota “ez dixwazim ên ku kurdîtiyê nizanin bixwînin anga yên ku rewşa netewa xwe nizanin.” Lê aniha ji ber ku di wî warî de serkeftin çêbûye û kesekî ku ji kurdî nehaydar nemaye, îcar ez dixwazim ciwan û mirovên li nakokiyên civakê asê mane bixwînin. Ji ber ku bi bawerîya min likuman-din û asêmana mirovan di quncikên civakê de ew zagon, pergala û hiyerarşîya feodal e. Êdî ew pergala û zagon (qaîde, qural, yasa) demode bûne û astengiyeke mezin in ji bo pêşketina takekesiya azad. Îro yekî feodal bi piranî navê biraziyê xwe nabêje û her tim bi “xwarzê”, “birazê” û “xalo” û “apo” dipeyîve. Anga ew kesê ku xwe di ser mirovan re digire, ew ê qurre (hilbet gelek kes ji hezkirinê dibêjin ne ew) yê ku naxwaze navê kesî bibêje, ew ê feodal an ê bi hiş-mendiya serdema eşîretiyê ye. Ji ber ku dema dibêje “xwarzê” ew bi wê peyvê xwe di ser wî re dihesibîne û yekser dibe amirê wî/wê. Di heman kêlikê de rê li ber wî kesê “birazê” digire ku fermana wî hukmê wî û erka wî red neke, yan hurmetê jê re bigire. Û dide hiskirin ku li gor peyva wî û fermana wî tevbigere. Ev psîkolojî nahêle mirov bi navê xwe mezin bibe. Navêkî lê nake ji ber ku naxwaze ji wî pê ve kes hebe. Dema ku navê mirov û heyîna mirov î kesanî tune be, taybetî û nêrîna mirov tune be, ku mirov xwe bixwe nikaribe birayaran ji bo şexsê xwe bide, azadî tune ye wê demê. Mirov bibêje “viyê hanê biraziyê Ehmed e” tiştekî din e û mirov bibêje “ew filankes e” yan “Metîn, Elî ye” yan “Ferhat e” tiştekî din e.

Ku ew kes ne azad be û navekî wî tune be, civaka wî jî dê ne azad be û çawa ji wî re dibêjin “birazê an xwarzê” dê ji civaka wî re bibêjin “kurdên me” û ji axa wî re jî bibêjin “başûrê welatê me.” Îcar profileke ku ji van tiştan haydar an jî xwezgînê haydariya wan be, qîz û xortên ku li çirava feodal-eşîretiyê aliqîne û nizanin çi bikin, ên ku di wê çemberê de asê mane û nizanin dinyayeke din jî heye, yan ên ku zanin û pişt-girî ji wan re çêbibe, dixwazim bibin xwendevanên min. Anga dixwazim kes azad bibe û kesên azad û

yên ku azadiya kesên derveyî xwe bînpê nekiribe, ci-vakê azad bikin. Ne ku yê ji bo ego ya xwe navê kesan bi lêv nakin û dîsa ji bo peyva wî ferman be hiş-mendiyeke ku sed sal berê ya feodal divê heta niha qediyabûya, bi kar bîne.

Gelo bi ya te nivîsandin çi ye? Gelo nex-weşî ye, îbadet e, deyndan e, serîhildan e, stûyê xwe çemandin e, rastkirin e, şaşkirin e, rexnekirin e, nirxandin e, dagirtina valahiyê ye, valakirina hebûnê ye, qewartin e, qeşar-tin e, veşartin e, pêdivî ye, qidam e, erk e, fan-tezî ye, pîşe ye, kêf e, sebr e? Yan jî ji xeynî van tiştên ku me rêz kirin, tiştêkî din e gelo?

Ç.M: Ev giş in. Lê belê ev têgeh her yek li hinek cûreyên nivîsê tên. Mînak “deyndan, îbadet, rastkirin û pîşe” li wêjeyê nayên bi ya min. Lê têgehên wek “dagirtin û valakirina hebûnê, fantezî pêdiviya rûhî” li wêjeyê tên. Têgehên din jî li cûrenivîsên din diban-nin û peywira nivîskarên zanîne derdixe holê. Yanî nivîs giş ne wekî hev in.

Ji bo wêjevan û kêfa wêjevan carinan nivîs bi kêr nayê û berevajî wê carinan dibe jehr û li bedena wî digere. Ew jehr heke ji wî re bibe berhem, ji hinekan re, ji xwendevanan re dibe kêf û qidam.

Nivîs bi ya te tiştên heyî vala û pûç dike, yan jî berovajî wê, hundirê tiştên heyî dadi-gire? Piştî nivîsandinê aramiyek xwe li te di-pêçe yan jî “cira te ne xweş” dibe?

Ç.M: Ez dîsa bibêjim nivîsa wêjeyê; di demên nivîsê de carinan ez xwe pir tengazar dibînim û cîrnex-weş dibim heta ku bi ser dikevim. Wê demê aramiyeke bêhempa li bedena min dide der. Lê bi te-vahî yan jî mînak piştî ku ez li paşeroja xwe bifiki-rim, dîsa poşmaniyeke kûr bi min re çêdike. Wekî encama deh salên nivîsê, heke mirov deh salan wê-jeyê binivîse û mirov bi ser bikeve, mirov û civak ber-hema mirov biecibîne kêfeke mezin e. Lê belê ku nivîskar di wê dawîya deh salan de, li paşeroja xwe bizivire û bîne bira xwe, xembariyeke bi poşmanî derdikeve holê. Ji ber ku wêjevan xwe ji gelek tiştên jiyanê dûr dixê, ji hêmanên jiyanê fedekariyê dike û jiyanêke bi tenê fikirandin û ponijandinê dijî. Ew jî wî ji gelek tehmên dinyayê bi dûr dixê û careke din nikare bi dest jî bixe. Latên kûr dikevin nava jiyana ciwanî û ya bitemen, xwe di nava deryayeke ne serî û ne dawî de dibîne, Ne veger heye û ne dikare dev jê berde, bi sermestî dom dike, lê tirs û xofêke dawîya hebûnê jî pê re çêdibe û cîrnexweşiya dawîya temen xwe hêdî hêdî dide der. Îcar wêje him tiştê heyî, ji-yana dinyayî pûç dike û him hundirê vala ji aliyê hiş ve tije dike û him jî tîrsa pêşketinê, tîrsa tenêbûnê dilê wî dikurîsîne.

Baweriya te bi îlhamê tê? Piranî kîjan deman, kîjan saetan, çawa dinivîsî? Ji bo nivîsandinê ji fikir/peyva pêşîn heta ku ew nivîs bê belavkirin/xwendin ji te re çi hewce dike? Di wê pêvajoya destpêk-qedînê de tu li hêviya çi yî?

Ç.M: Baweriya min bi îlhamê heye, ji ber ku îl-hama min heye. Heye lê her tim ne bi min re ye, her tim ne di hişê min de ye. Dema ku nîşaneke wêjeyî dibînim ango di hişê min de direhme û dixwazim tiş-teki ji bo wê binivîsim li bendî wê îlhama xwe dimî-nim. Dema îlhamê, dema nivîsa wêjeyê tune ye ku çawa û ji ku ve bê. Ne diyar e. Carinan sewtek e, ca-rinan bûyereke e, carinan kerbêk e û carinan kenek e. Dibe ku mirov di xew de bibîne, şiyar bibe û not bike. Dibe ku di bin avê de bê bîrê û bi lez û bez derkeve ser avê û not bike. Tenê îşareta îlhamê, îşareta hê-mayekê bi min re çêdibe û dimînim li bendî îlhama ku ya giyanê min e; ku tîpan bike peyv, peyvyan bike hevok û hevokan bike berhem. Ku hat rêzkirin êdî qediya ye û tenê xebata serastkirinê dimîne, ew jî (nivîs) ne hewceyî îlhamê ye, ji ber ku êdî li ser îl-hamê neqîş çêdibe. Lê wekî wêjevanê dinyayê jî ge-lekan gotiye ‘dema ku mirov ne li bendî îlhamê be ew nayê.’ Heta û heta, ku mirovek xwedî ruhê wêjeva-niyê be û nizanibe birijîne ser kaxeze û li bendî îl-hamê nemîne ew îlham ji xwediyê xwe dixeyîde, ji wî dixeyîde û wî di pêvajoya temenê wî de bi awayekî din nexweş dike.

Ji ber ku di kurdî de paşxaneyêke xurt a nivîsandinê tune – ji ber dem û pêl ji hev ha-tine qutkirin- gelo mirov dikare di kurdî de qala “nivîskarî”yê bike?

Ç.M: Erê, heke mirov dirokeke bi demên dirêj bîne ber çavên xwe mirov dikare qala nivîskariyê bike. Ango mirov kurdan wekî kalekî 500 salî bihe-sibîne mirov dê bibîne di temenê wî kalî de paşxane-yeke bêhempa heye. Di heyamên wî temenî de gelek caran ew paşxane ketiye binê behrê yan jî tofana qûmê bi ser de hatiye. Lê aniha gelek kes kalê 500 salî nabînin, tenê yê 80 salî dibînin û li gor wê nir-xandinê dikin. Ji ber ku di wan 500 salan de teme-nên qut hene. Civakek emirqutî her tim hebûye di 500 salan de. Ji ber wê yekê dibe ku ew nivîskariya wan heyaman ji civakê re nebûbe paşxane. Ji ber ku nivîs, nivîskar û civak ji hevdu hatine qetandin. Mînak em bibêjin li Qafkasyayê ev sed sal e ku nivîsa kurdî, wêjeya kurdî heye lê haya kurdên bakur van çend salên dawiyê jê çêbûye û hê jî baş haydarî çê-nebûye. Ji Ehmedê Xanî û heta niha bi sedan nivîs-ka- û wêjevan hene û berhem afirandine, heta dibe ku ji gelên cîran bêhtir jî afirandibin, lê belê ji gelê

wan re nebûye paşxane, neketiye bîra mirovên wan. Ev ji bo wêjeyê wisa ye. Ji bo cûrenivîsên din pir kêmanî hene. Mînak wekî nivîsa bi zimanê kurdî ya siyasi, kême di dîrokê de. Heke ev hebûya ji xwe dê ji nivîsa wêjeyî re jî bibûya şemsiye û di bîra mirovan de veşarta û bibûya paşxaneyê netewa kurd. Ji xwe wisa bûya dibe ku azadiya kurdan jî ji zûde hatibûya.

Dilê te dibije kîjan nivîskarî/ê?

Ç.M: Ew nivîskarê ku xwestiye hişê mirovan bileqîne. Wekî Dostoyewskî.

10. Ji bo kesên ku nû dest bi nivîsandinê dîkin, pêşniyarên te çi ne?

Ç.M: Ji ber ku êdî paşxaneyê wêjê û nivîsa kurdan ketiye rêyê baş, ên ku dest bi nivîsê bikin divê haya wan ji vê paşxaneyê, ji van nivîs û berhemên ku

hatine holê hebe. Ji ber ku kes di dibistanên kurdî re nemeşiyaye û meş hê jî dûr e, ku mirovekî dest bi nivîsa kurdî kir an dest bi berhemekê kir divê ew bigere û bipirse “gelo berî min çi hebû, çi hatiye nivîsandin?” Heke haydarî tune be ku yê nû nebêje “di kurdî de kê çi nivîsandiye, çiqas û kîjan demê nivîsandiye?” Û bibêje “ev dinya ya min e, kes tune ye û tiştê kurdî tune ye berî min.” Wê demê dê pir bi şid û di demeke nêzik de li bin guhê erdê bikeve û perçe bibe, ji ber ku, bin wî valahiyeke kûr e jî, dê pir jî biêşê.

Jixwe bi demê re pê bihese wa ye berî wî jî gelek tişt hatine nivîsandin jî û pê bihese ku, berî ew bê ser rûyê erdê jî tiştên hêja, berhemên ji yê wî gelekî xweştir hatine afirandin, wê demê dê pir fedîkar bibe û veger jî zehmet e.

Çi çima? Hasîp YANLIÇ

Çima nivîskar dinivîse?

Rastî mirov li ser vê mijarê dikare pir bisekine û pir rave bike. Ez dixwazim bi kurtasî ji we re qala meseleya xwe bikim . Ji ber ku her kes bi xwe dizane, her kes bi meseleya xwe dizane.

Min çima nivîsand?

Çima dinivîsim?

Ez yekî civakrev im (antîcivak). Ne yê civakê me. Nikarim hestên xwe bi hesanî ji hevalên xwe re, ji civata xwe re bêjim. Herî zêde ji hestên xwe sedî pêncî dikarim bînim ziman, hestên min ên ji sedî pêncî yê din jî di hundirê min de dimînin. Ji ber wê ye belkî, min dest bi nivîsandina wêjeyî û zanistî kir. Ji ber ku di hundirê min de tijî dibûn û min nikaribû van hestên xwe û van zanînan xwe li ba xwe, di hundirê xwe de hilgirta û veşarta, min avêt derve. Hestên xwe û zanînan xwe bi alîkariya nivîsê min der kirin. Kul û derdên xwe vegotin.

Îcar ez çi dinivîsim; ez çîrokên li ser şoreşgeriyê û mijarên zanistiyê (pirtûka min a bi navê “Jimêryarî” yê derçûye) dinivîsim. Ez dixwazim di vê nivîsa kurt de hindik be jî qala çîroknûsî û wêjeyanîya xwe bikim. Gava ez li xwe vedigerim ez dibînim ku di bingeha xwe de ez ji şoreşgerên azadiyê hez dikim û dixwazim di nav civakê de her tim qala mêranî û mêrxasiya şoreşgerên azadiyê bikim. Sedema min a nivîsandinê ev e.

Berî ez vê nivîsê binivîsim min ji çend kesan pirsî; ez yekî çawa me, hûn evîna min a şoreşgeran dizanin û hwd. pirs ji wan kir. Canik û camêrna wîha bersiv dan gotin ku; “*Te tu carî ji me re qala evîna xwe ya şoreşgeran nekiriye, ji ber vê jî em dibêjin ku tu ne evîndarê şoreşgerên azadiyê yî.*”

Van hevalên ku ev bersiv dan, çîrokên min nexwendibûn. Ji ber ku min xwe di nav civakê de veşartiye, ji ber ku ez civakrev im ji ber ku ez nikarim bi hesanî fikir û ramanên xwe vebêjim. Civak jî min ev qas nas dike. Gava ku min heman pirs ji yê ku çîrokên min xwendine kir, bersiva wan ev bû; “*Mamoste tu evîndarê çiyayan û şoreşgeran î, ev jixwe pir pir diyar e, her çiqas tu ji me re nebêji jî.*”

Ez ji ber vê yekê dinivîsim.

Çima nivîs?

Gulgeş DERYASPÎ

Dema li welatekî şer û pêvçûn hebe, divê ku li wir nivîs jî hebe. Di dema şer û pêvçûnê de nivîs tune be dîroka wê dema şer û pêvçûnê jî dibe derew. Nivîs dibe ku dîrokî be, dibe ku helbest û roman be. Westê ku nivîskar di dema şer û pêvçûnê de romanek an jî helbestek nivîsand, ez bawer im ku dê şer cihê xwe di nav wê romanê an jî helbestê de bigire. Hema hemû nivîskar jî di jiyana xwe de çî bibînin wî dinivîsin. Nivîskarên ku di nav şer de dijîn, nivîskarên çî dibin bila bibin miheqeq dê şerî di nav nivîsên xwe de bineqîşînin. Em wisa bifikirin ku di dema şer de tişt neyên nivîsandin û şerek 30 - 40 sal bidome û piştî ku şer qediya, ciwana/ê bîst salî dê çiqas bikaribe rastiya şer binivîse? Em niha li zarokên Kurd û Tirkî dinêrin, tu wateyekê nadin vî şerî. Bikevin pê û bikolin jî dê çiqas nêzî rastiye bibin. Rastî ew e ku mirov bi çavên xwe bibîne û binivîse. Rastî ew e ku mirov bijî û hêstên xwe binivîse. Kesên ku nejin û hest nekin, ji pênûsa duyem sêyem binivîsin dîrokeke rast dernakeve holê.

Şer bandoreke mezin li nivîsandinê dike. Kesên ku di nav şer de bin, ji jiyana ehlê kêf dûr dikevin. Kesên ku ji jiyana dûr bikevin, aliyê wan ê vepirsînê bi hêz dibe. Kesên bi vepirsîn bin nivîsên wan xurtir in.

Kesên ku di welatê azad de dijîn gorî kêfa xwe li jiyana mêze dikin. Kêfa wan bixwaze dinivîsin, kêfa wan nexwaze nanivîsin. Lê kesên bindest û di nav şer de bin, jiyana qirêjî bandorê li wan dike û têkiliya wan bi nivîsê re xurtir dibe. Mirovên ku gundên wan bîn şewitandin, zarên wan bîn kuştin, tajang li wan bîn kirin, bîn îşkencekirin, dê çawa derdê xwe bînin ziman? Dê çawa dengê xwe bidin bihîstin? Rêya kurt û hêsan nivîsandin e. Kesên ku binivîsin, dizanin zilm û zordariya ku dîtine dê qet neyê jibîrkin û neyê veşartin.

Nivîsandin gorî kesên ku di nav şer de ne, (dibe ku ev şer tenê şerê navnetewî nebe û dibe ku kes bi jiyana re di nav şer de be.) nexweşî ye, îbadet e, deyn e, serhildan e, rastkirin e, şaşkirin e, rexnekirin e, nixandin e, dagirtina valahiyê ye, valakirina hebûnê ye, qewartin e, qeşartin e, veşartin e, pêdivî ye, qidam e, erk e, fantezî ye, pîşe ye, kêf e, sebr e, hefstendin e, pîvandina jiyana ye, xwenaskirin e, ji her tiştî girîngtir hînbûna empatiyê ye.

Nivîs tişteki gelek girîng e. Mirov baş agahdar û

zana nebe, dibe tiştê ku tê nivîsandin, tiştên heyî çewt bide nîşandan, çewt bide famkirin. Û ger zanîn têrî bike, nivîs dikare tiştên vala yan jî kêmtir bike.

Dema kesekî/ê dest bi qunciknivîsê kir, pêwîst e ku zanîna wî/ê ya siyasî, civakî, psîkolojîk û zanistî têrî bike. Pêwîstiya helbestvanan bi îlhamê, yê romannûsan jî bi çanda gelemperî heye. Nivîskar çî dinivîse bila binivîse pêwîst e ku bi qasî hemû dem û kesên binivîse, ne tenê bi qasî malbatekê, gundekî, bajarekî, welatekî, bi qasî hemû dinya û deveran binivîse. Ger ku romannûsek dixwaze romana wî/ê bê xwendin pêwîst e ku tu profileke xwendekaran ji xwe re neke armanc. Romannûs bi hestên paqij û zelal pêwîst e binivîse û bikare porofila hezkirin û aştiyê xêz bike. Nivîskar ji çî û jî kê hez bike, dê ew jî jê hez bikin. Nivîskara/ê ku ji hemû cîhanê, ji deman, dema borî, dema bê, ji dar, kûçik, mirov, çol û çîyan û heta laşê sewalan hez kir û ji zimanê wan hemûyan fam kir, ez bawer im ku dê ew jî bê hezkirin û dê xîtabî hemû dewran bike û bê famkirin jî. Profila xwendekarên wî/ê bi vî awayî bi serê xwe dê kifş bibe.

Paşeroja nivîsa Kurdî gelek bi kêmasî ye. Ji ber vê, kesên ku dest bi nivîsa Kurdî dikin, gelek zor û zehmetiyê dikişînin. Zimanê Kurdî zimanekî dewlemend û xurt e. Lê nehatiye traştin (telaştin). Nebûye zimanê siyasî, bazirganî û perwerdehiyê. Li welatê me, tv bi Tirkî ne, perwerde bi Tirkî ye ji hemûyan girîngtir pirtukên ku em dixwînin bi Tirkî ne. Heta van demên nêzik bi Kurdî pirtûk tune bûn. Em, kesên ku bi Kurdî dinivîsin pirtûkên ku me xwendine tev bi Tirkî bûne. Ji ber vê yekê nivîsandina bi Kurdî divê ku xurtir bibe. Ev jî dê bi keda nivîskarên Kurd ên ku bi Kurdî dinivîsin bi ser bikeve. Siyaset, bazirganî, perwerde û civak dê zimanê xwe ji nivîsên wan nivîskarên ku bi Kurdî dinivîsin hilbidin.

Jina Kurd, ku bi salan li ber tişteki nebû, hîna zarok bû dihat zewicandin û bi deh û pazdeh zarokan jiyana wan dihat pûçkirin, divê ku zêdetir li zimanê Kurdî xwedî derkeve. Ziman, zimanê dayîkê ye. Derd û kulên ku di tevahiya dîrokê de di nava xwe de veşartine, divê bi nivîsan derxin holê. Dengê xwe bi nivîsandinê re bilind bikin. Û li xwe li pêşeroja xwe, ya zarokên xwe xwedî derkevin.

Dinivîsim

Huseyîn GUÇLU

Mirov hebûneke noqsan e. Ji wê tim di nava lêgerînekê de ye lê digere, li xwe digere.

Lêgerîna xwerû heqîqeteke xwezayî ye, gerdûnî ye. Dikarin bibêjim her tiştê heyî di cewhera xwe de lêgerîneke ne bes dîtî û temamkirina wî dihesîne xwekêmdîtî enerjiya xwesteka xwe temamkirinê jî tîne bingeha pêşketin, avakirin û afirînê ev taybetiya hebûnê ye.

Xwesteka temamkirinê kîngê di mêjiyê mirov de siftbûnekî dijî, hewl dide ku wê bi rê û rêbazên cûr bi cûr bide der. Pêşxistina lêhûrbûna xwe anîna ziman jî hin caran bi riya nivîsê çêdibe. Nivîs qonaxêke bilêvkirina hest û ramanên ser esasê gerîna temamkirinê derketina holê ye. Nivîs di aliyê daxwaza xwe temamkirinê de lûtkeyeke ku razberiya ramanî şênber dike, hebûna xwediyê lêgerînê mayînde dike.

Nivîs ji aliyekî ve hewldana xwetemamkirinê ye, ku mirov di nava livbaziyeke de digere; ji aliyê din ve jî çavdêriya xwenaskirin, di xwe de derdornaskirin û vê naskirinê hizirandîneke têrbûyî bi peykên tijî anîna ziman e. Xwenaskirin, xwe li derdora xwe dayînnaskirin. P. Nerûda di şexsê helbestvanan de nivîskaran dişibîne mirovên ku qumaşên wan ji agir çêbûyî. Duman ji tiştê nivîsandinê ango cewherê nivîsandinê, bi dil û mêjiyêke agirî xweşewitandinê dixwaze ji mirov. Ev jî hewldanek e, xwe ji mirinê rizgarkirinê daxwaza nemiriyê ye. Mirov ji aliyekî ve bi têkiliyên zayendî domandina nîfşê xwe, ji aliyê din ve jî, ji aliyê fikr û raman ve lêgerîna bêmiriniyê. Bêmirinî jî di rastiya xwe da temamkirina kêmdîtîne ye. Gor dixuye mirov di dewlemendiya nivîsê û sêhra wê de xwe gihandiye vê daxwaza xwe.

Tiştê ku lêgerîna bêmiriniyê ya Gilgamêş heta îro me anî, nivîsa mîxî ya ser tabletan bû. Çiroka Îsîs û Osîrîs, Zerdeştê ku ji xwedayan hesap pirsî, Baba Tahîrê Uryan, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî... yên ku lêgerîn, jiyîn, afirînerî û ustadiya xwe mayindekirin, heta îro jî dikin, dijîn. Ev zane û cihêbûn e, ev reh e ku, piştî ewqas pirtûkên helbestî pirtûka “li xwe mikur tîm ku jiyame” bi P. Nerûda dide nivîsandin. Nerûda gireke bijare ye di nav girê nivîskaran de.

Di wê baweriyê de me, ji bo nivîsandinê hin xalê hevpar hebin jî, dîsa dema nivîsandina her kesî de cudahiyeke jî heye. Ango sedemên nivîsandina kesên hin tiştê dişibin hev, hin jî her şexsî de cudatî heye;

her kes hinek jî di wê armancê de ye ku, bi naskirin û xwe dane naskirinê di nava rûbarê nemirinê de cihê xwe bigre, tevlibûna xwe çêbike. Eger kes rêya vê yekê di civakê de bibîne yê xwe di nav wê de îfade bike. Na eger di hewldanên kesî rêbaza xwe tenî de bibîne, yê di vî alî de hewl bide ku xwesteka temamkirina xwe pêk bîne. Lewra mirov ser esasên nakokiyên xwezayê çêbûye û bi livbaziya ji wir tê jî hebûnê didomîne.

Gelo ez çima dinivîsim? Pêşiya ku ez pirsê bîbersivînim dixwazim vê jî bibêjim; her çiqas hinek mirovan karê nivîsê ji xwe re kiribin pişe, dema xwe zêde didinê, gelemperî ji wan re tê gotin ku nivîskar in; ez nivîsandin û nivîskariyê bi xwe re sî-nordar nakim. Yên ku hay ji hebûna cudatiya xwe hene, hewl didin xwe nas bikin û bidin naskirin dinivîsin, ew jî nivîskar in. Nivîs jî ji bo wan navgîneke xwebilêvkirinê ye ew jî bi kar tînin. Hewl didin ku hebûnê ji aliyê her du pencereyên xwe ve çawa tê dîtî, bi siftbûna hest û mêjiyê xwe fêhm bikin û bidin fêhmkirin. Mînak; em şoreşger in û karê şoreşê ji xwe re esas digirin, lê em jî dinivîsin. Ha ji xwe re ha ji derek din re...

Kîngê pirsê “gelo ez çima dinivîsim” ji xwe dikim; li hemberî wê jî pirseke din dibe bersiv, “çima ez nenivîsim” Ji bo nivîsandinê hingê dinyayeke hincetên min hene. Lewre ez têkoşerekî kurd im û nivê emrê min di nava vê têkoşînê de derbas bûye. Dibe ji parçeparçebûna welatê xwe bigirim, dîroka gelê min a ku bi komkujiyên tîkçûyîne ve girêdayî û bi êşan hatî honandin. Çarenûseke bêyom, taristaneke mirov tiliyan dixê çavan, ew qas bîrketî. Ji aliyê din ve ji berxwedaneke bi heybet, hêviya rojên azad... Mirêsiya çiyayan bi serê xwe sedema nivîsandinê didin mirov; çiroka her zinarî û kendalî heye bi xwîn, xwêdan, bi evîn, mîrxasiyê hatî rê-sandin.

Okyanûsa êş û janê ya gelê min tê de dijî weke mahsiyekî xiyaneke û xwefiroşiya di şexsê Harpagos, Bako û Rêberan de bûyî remz.

Serobino bûyîna 30-40 salên dawî de di bin pêşengiya pêşewayê mezin de qewimî...

An jî xiyaneke hemdemî...

Mirov dikare bi sedan sedem û hincetan bibîne ji bo nivîsandinê. Yek tenê jî tune ye, ku mirov têr bike. Ev sedemên min gotin tev di hundirê daxwaza nivîsê de cihê xwe digrin. Ji xeynî van sedemên min gotin jî, bi dehan sedemên din hene ku li gor kes,



welat, erdnîgariyê diguherin. Lê taybetiya nivîsê tiştêkî wilo ye ku di nivê çola ji germê sorbûyî de behrê bi mirov dide nivîsandin û bi wê nivîsê yê ku dinivîse xwe diavêje wê şîniya behrê.

Ew tiştên min gotin di sedema nivîsandina min de jî cihê xwe digrin, lê ya di şexsê min de derdikeve pêş, ya ji bo min sereke ye, bi min dide nivîsandin xwedeynardîtîn e. Vêca çima xwedeynardîtîn? Ev derdikeve pêşiya mirov.

Di felsefeya tevgera ku ez jî endamek wê me de, xwedeynardîtîna gel, hevalên xwe û mirovatiyê stûneke bingehîn a stûr e. Em her yek va ye bi salan e di nava vê mirovahiyê de geh bi rê ve diçin, geh dibezin. Di himbêza me de rêhevalên me şêhid bûn û me ew bi destên xwe binax kirin. Dilên winda, eşq, evîna pîroz, di bihara emrê xwe de, di xizmeta gelê xwe de çûn û diçin. Her bihusta axa Kurdistanê bi xwîn û xwêdana wan hate avdan. Piraniya wan jî bênav, bêkêl in û çiroka wan baş nayê zanîn, tevli ax û rehên welatê xwe bûne. Xatirxwestina wan, gotinên dawî ji me re qewîti kirin. Awirên bîranîna çavên xwe yên dawî didan.

Çiroka rondikên bûkekê, tilîliya dayikekê û di wê tilîliyê de jana dîroka gelekî, di rê de mayîna çavxezalekê, di rûyê zarokekî de nenaskirina dê û

bavekî... Mirov bibîne, mirov bizanibe û mirov bijî, lê nebêje nabe, mirov dê biteqe. Ez bi xwe, xwe di vegotin û ravekirina van tiştan de deyndar dibînim.

Û hewl didim ku vî deynî li gor zanebûn û hêza pênuşa xwe, carinan wek bîranînekê, carinan wek helbest û çirokekê bînim ziman û parvebikim. Ev heman demî, ji bo ziman û çanda ez li hember deyndar im jî ango nîrxên ku ez kirim ez, ez li hember wan deyndar im û hewl didim ku deynê xwe bidim. Lewre dizanim gelê min xwediyê mîrateyek giranbuha ye, xwedî êşêke çiyayî û serbilindiyeke newrozî ye. Nivîs ji xwesteka xwetemamkirinê xuluqiyê. Xwetemamkirin, di heman demê de azad-bûne jî.

Divê em bi pênuşa xwe jî bixebitin û hewl bidin hêviyên karwanê qehremanan pêk bînin. Wan bi nîfşên nû bidin nasîn, bigihînin hev.

Deyndayîn encax dilopek xwîn û xwêdana wan veşartî nemîne, her ked û fedakariya hatiye dayîn û kirin li gel û mirovahiyê bibe mal, dê hingê were dayîn.

Ji bo wî ez dinivîsim, ez ê binivîsim...

Girtîgeha Sêrtê

Mirov çima dinivîsin

Şerefxan CIZÎRÎ

Heger mirov tenê li bersiveke şexsî di vê mijarê de bisekine, wê ev mijar ji me re hîna ronîtir nebe û wê rê li nîqaşên bi ser û bertir veneke. Dîroka vê mijarê bi qasî dîroka mirovên ku dest bi nivîsandinê kirine, kevn e. Divê mirov bi hosteyî û metoddên dîrokî nêzikî vê mijarê bibe. Yan na wê ev mijar ji gelek alîyan ve nixumandî û xumamî bimîne.

Dîroka nivîsandinê, dîroka mirovantiyê ya herî li pêş e. Bi nivîsandinê mirovan ji xwe re bîrek kolaye. Bi nivîsandinê mirovanti ji qonaxekê derbasî qonaxeke nû bûye. Bi nivîsandinê re ragihandin û zanebûn hêsantir bûye. Ev dîroka ku em li vir qala wê dikin a me hemûyan e û pîrsa “em çima dinivîsin divê bersiva vê dîrokê bi haweyekî resen bide.

Ji ber ku dîroka me, hebûna me ye, dayîka me ye û di xurcezîna dîrokê de nasnameya me, tecrube û rastiyan me veşartî ne.

Di vê mijarê de bersiveke şexsî dikare daxuyaniyeke ne durist be, ne rast be, dibe ku bersiveke jiberkirî be jî, yan jî bixwaze dilê hinek deveran xweş bike, şelafîyan bike, li gora modeya rojane be û ya kuraniya dilê xwe jî mirovan re nebêje. Em baş dizanin ku gotin, mikûrhatin û rastî di nava têkiliyên kompleks de ne. Her tiştên ku tên nivîsandin û gotin ne rast in. Divê mirov şiyar bin. Bi taybetî mirovên rewşenbîr peywira wana ev e.

Formûleke sihirbaziyê ku bi carekê re ewrên reş û tarî ji hevdu belawela bike, di vir de tune ye.

Di van mijaran de gelek xebat û lêkolînên edebiyatzanan jî hene...

Ev jî tê zanîn.

Vêca bê ku em li ser wan mijaran gelekî hûr û kûr bibin, em dikarin wilo bibêjin; Kurdên me ev mijar gelekî nîqaş nekirine û haya wana jî baş ji lêkolîn, teorî û modelên ku li dinyayê hene tune ye. Mirovên me gelek caran biyaniyên vê mîrata entelektuelî ne. Di ber xwe de diaxivin û pitpitê dikin! Hebana xwe vala dikin lê tu encamên bi rêk û pêk ji axaftin û nivîsandinên xwe nagirin. Em dîsa her gav mecbûr dimînin ku em vegerin serî.

Ango taba Xelef çû bertelef!..

Yê ku nezan be, gelek tiştan korfeleqî dibêje, dîtînen bi tevahî tîne ziman û di cîhê xwe de ji tebût nasekine. Diçe û tê, weke hêlanê ye...

Bav û kalên me dibêjin; ê ku zane zane, yê ku nizane baqê nîskan e!

Ji ber wilo jî pileya nîqaşên me gelekî ne bilind e û ev nîqaş zêde ber jî nadin. Ma tenê li gora krîte-

rên siyaseta rojane mirov dikare wan nîqaşan bi rê ve bibe gelo? Hinek jî me gelekî tiştên ku diyar in dubare dikin û tiştê ku xaltîka Hefso jî zane weke zanyariya nûjen pêşkeşî Kurdan dikin. Ew bi xwe nezan in lê bawer dikin ku her kes nezan e!

Di hişmendiya wan de derdora wan hemû gundî ne! Weke rewşenbîrên kemalist ji jor de li mirovan temaşe dikin, lê ji bîra dikin ku ew bi xwe zarokên gundiyan in!

Ango gelek caran em dixwazin ku Amerîkayê ji nû ve kişf bikin. Lê xelkê biyanî Amerîka jî zû de kiş kirine birakê mino! Ango gelek ji me karên ber-telef dikin û xwe weke Qîtana Hemedanê didin nîşandan. Lê ji bîra dikin ku nîqaşên me di ser re ne û hîna jî xwîn û goşt negirtine.

Ev nîqaş gelek caran bersiva demê û rastiya welatê me nadin.

Em di cîhe xwe de dihejmêrin û selawatan didin! Selawat li ser eynê Muhemed!

Ev rastî bi serê xwe psîkolojiyeke gelek biyanî ye û tu nîrxên nû jî li zanyariya edebiyatê zêde nake. Li pîrsgirêka “çima mirov dinivîsin” tişteki zêde nake. Tişteki kevn, an nû yan bi wate jî ji me re nabêje...

Lê ji bo ku em bi kurtî di vê mijarê çend tiştan bibêjin, divê em çend tiştan zelal formûle bikin; der barê edebiyat û hemû curê nivîsandinên hunerî de em dikarin wilo bibêjin; mirov ji bo mirovan dinivîsin! Divê yê ku ji bo teyrik û tilûran, dar û beran, kevir û deviyan binivîsin, berî hemû tiştî zimanê wan zanibin! Ma mirovê wilo hene gelo? Ango em dizanin ku di bingehe xwe de nivîsandin weke çalakî, çalakiyeke zimanî ye û ji bo mirovan tê nivîsandin! Ew mirov jî mirovên ku li teniştê min in, beşek ji min in, ji welatê min in...

Bi rêya çalakiya zimanî mirov dixwaze hinek dîtînan, hinek daxwaziyan, hinek pêşniyar û raman, zanebûn û tecrûbeyan bi mirovên xwe re parve bike. Gava ku mirov dîtînan, raman, zanebûn û tecrûbeyên xwe bi mirovan re parve neke, ew nabin zanebûn, nabin raman, nabin dîtînan... Ev mirov dikarin ji welatê me bin an jî ji deverê din bin. Tiştên wan ê hevbeş mirovbûna wan e. Ew mirov ji xwediyê zimanekî ne, xwediyê welatekî ne, xwediyê pîrsgirêkên civatî û kesayetî ne û xwediyê hebûneke dîrokî ne, ev hebûn jî hebûneke mirovî ye! Çi tiştên ku mirovan elaqadar dikin, nivîsandinê ji elaqadar dikin!



Bi nivîsandînê hemû kes dixwaze ku perde û nixumandinên li ser dinyayê hene biçirîne. Rastiya dinyayê raxe ber çavan û avaniyên ku dibin weke sêncekê di nava mirovan de ji hevdu belawela bike. Rastiya civatî bi hemû stûnên wê, bi kûranî û rûwê wê, bi şîrînbûn û tehliya wê pêşkêşî mirova bike. Nivîskar divê paleyê rastiye be.

Jean Paul Sartre di pirtûka xwe ya bi navê Edebiyat Çi Ye de, dibêje; heger nivîskar bixwaze yan nexwaze, heger daxwaziya wî kişîrkirina qanûnên gerdûnî be yan na, ew her gav ji dema xwe re dinivîse, ji welatîyên xwe re dinivîse, ji nejata xwe re dinivîse, ji çîna xwe re dinivîse...

Li vir tecrûbe tê ziman, zanebûn tê ziman, edebiyat tê ziman...

Ango kurt û kin mirov ji mirovên xwe re dinivîsin. Mirovên me bi wateya çand, ziman, sosyalbûn, kesayeti û derûniya dirokê. Mirov bike neke, nivîskarê Kurd, pêşiyê ji kurdan re dinivîse. Dixwaze gotubêjan, sohbetan, ramanan, qerqesûnan, pevçûnan, lihevduhatinan, lihevduhanandinan, arambûnê, kîn û nefretê, evîn û dilovaniyê ji mirovê tênişta xwe re bibêje.

Ma ku mirov ne ji bo mirovê ku li teniştê me ye re binivîse, ma mirov dê ji bo eşîra Zulu li Efriqa binivîse? Yan jî ji bo Înute Grönland e binivîsîne gelo?

Hilbet hemû gelên dinyayê jî dikarin ji van çalakiyên nivîskî parekê ji xwe re derxînin û edebiyat, çand û zimanê xwe dewlemendtir bikin. Kurd jî divê sûdê ji nivîsandina ku li dinyayê heye werbigirin. Di vir de şik tune ye. Ev mijareke serbixwe ye. Lê em nivîskar û entelektuelê Kurd divê pêşiyê ji bo mirovên Kurd binivîsin.

Li ser encamê nivîsandînê jî, li ser mirov çima dinivîsinin jî gelek tişt hatine gotin; bê ku em vê mijarê gelekî dirêj bikin ez dixwazim ramanên nivîskarekî Swedî bi we re parve bikim; navê wî Ivar Lo Johansson e.

Ivar Lo yek ji wan nivîskarên ku navê bi dil-

germî di nava nivîskar û edebiyatvanên ku di bin navê 'edebiyata karkeran' de heye tê bibîranin. Ew di mijara edebiyatê de realist e û alîgir e. Nivîskariya Ivar Lo gelekî dewlemend e û hema hema li ser hemû mijarên ku pêwendiya wan a bi mirovan re heye û bersiva hebûna mirovan dide, wî nivîsandîye.

Di pirtûka xwe ya ku bi navê 'Ji Nivîskarekî Re' hatiye çapkirin de, Ivar Lo li ser mijara ku mirov çima dinivîsin wilo dibêje; 'Ji bo hemû kesên ku dixwazin bibin nivîskar sebebên rewşa hene. Ev dikare hew-

cedarî bi xwe îfadekirinê be, dikare daxwaziya ku xwe bide pêş be, dikare qureti be, dikare bêkarî be, dikare ezezi be, dikare nêçîrvaniya şerefê be, dikare evîn be, dikare zikreşî û hesûdî be, nefret be, kîn be yan jî piçek ji van taybetmendîyan hemûyan be, an jî ev taybetmendî hemû bi hevdu re bin. Heger em ê vê meseleyê hêsantir û tevahîtir bikin divê em bibêjin ku; wê gavê tenê hinek ji wan daxwaziyan li rastê dimînin; ew jî daxwazkirin e, bedêlgirtin e û dilxwestina raperînê ye...

Heger em xeyala xwe baş bidin taybetmendiyên ku Ivar Lo dide pêş, em ê li vir dişa bîrên ser mijara hebûna mirovan. Weke hebûneke civatî hewcedariya mirovan bi çî hebe, mirovê nivîskar jî bi heman motîvan dest bi nivîskariyê dike. Hemû kes dixwazin şopekê li dû xwe bihêlin, civat wan di bîrê bîne, kedekê, zanebûnekê pêşkêşî civata xwe bikin. Di vê mijarê de jî divê mirov realist nêzikî nivîskariyê bibe û çalakiya nivîskariyê ji mistîsîzm e, quretiyên vala, ji bilindkirineke bê wate û pîrozbûneke olî rizgar bike.

Bi kurtî zanebûn, tecrûbe, raman û dîtînen ku bi mirovan re neyên parvekirin nabin xwedî wate û jiyana mirovan hêsantir nakin.

Yek ji armancên herî berbiçav di pirsgerê nivîsandînê de, hêsanîkirina jiyana mirovan e. Em çiqasî alikariya mirovên xwe bikin bila em bikin, em çiqasî wana ji xew şiyar bikin, bikin bila em bikin, em çiqasî rê nîşanî wan bidin bila em bidin, em çiqasî bixwazin wan ji nekamilbûnê rizgar bikin jî bila em bikin, biryara dawîn mirov bi xwe didin!

Gava ku Marks Kapital nivîsandibû, gotibû; tiştên ku min rast dîtine, min gotin. Bi dû min de çî tê gotin bila bê gotin!

Ez jî weke bav û kalan dibêjim; rastî zêrê zer e! Divê çalakiya nivîsandînê jî wilo were fêmkirin. Zêr çawa xalis be, rastî çawa binirx be, divê çalakiya nivîsandînê jî wilo bi rê ve here.

Nivîsandin xîret e Îsmâîl DÎNDAR



Ez çima dinivîsim? Berî ez li ser bersiva vê pîrsa ku gelek bersivên wê hene biramim, ez jî dixwazim bipîrsim gelo ku pîrs, “Tu çima dixwînî?” bûya dê bersiv di heman xalê de bigihîştina hev? Bi bawerîya min ku mebesta her du karan (xwendin û nivîsandin) gelekî nêzî hev e.

Helbet hemû hebûnên li ser ruyê erdê, bi awayekî diherikin coya jiyanê; tîn û diçin. Di navbera vê hatin û çûnê de bêşik pêvajoyek pêk tê: Jiyan! Lê gelo jiyan dikare her tiştî vebêje, her tiştê di kûrahî û xewleyên dil û mêjiyan de derxe holê. Li vê derê ligel vê bikêrî û hunera pênuşê (nivîsê) ku dibe bîvîr û dil û mêjiyan dikole û piştî radixe ber çavan, wan tiştên ku ji ‘bîrên’ kesên derdixê, tavêje ‘bîra’ mirovahiye, ku êdî ‘jibîrkirin’ li aliyekî ew dibin hebûna her mirovekî ji vê gerestêrkê. Ma tenê ev? Û gelek caran jî nivîs ne tenê tomarkirina rewş, bûyer û kirûyên pêkhatî, ne tenê parzinandina rabirdûyê ji hêla raman, rewş, civakî, derûnî, siyasî, aborî, olî û hwd. e jî, nivîs(wêje) di heman katê de, dikare bibe, daxwaz, raman, utopyaya jiyanekê, pergalekê jî ku bi riya berhemê mirov di hiş û mêjiyê xwe de, sinc û rewîştî pergala jiyanê ku dixwazin difesilînin û jixwe dirûtin û lixwekirin dîsa ji vîn û kar û xebata mirovan re dimîne. Eyn mîna berhema Yaşar Kemal a bi navê Sêbareya Çîroka Giravekê. Ku birêz Yaşar Kemal pergala jiyanekê mirovane ji netewe û çînen cûrbecûr li ser giravekê dihûne.

Ji vê berhema navborî jî derdikeve holê ku nivîs, lêgerîna li rastiye ye. Ji bo hin kesên mebesta navdariyê, mebesta dewlemendbûnê be jî nivîsandin berpirsariyeke rewşenbîrî ye. Nivîskarên xwedî berpirsiyarî, bi karê nivîsê dibine wîcdan û berdevkê bi milyonan mirov, wîcdan û berdevkên mirovên ku di jiyanê de nikarin xwe rave bikin. Loma nivîsandin xîret e, xîreta rewşenbîrî û mirovahiye ye.


Her weha tê zanîn ku rewşenbîriya Îngilîz, Frensewî, Alman û Rûsan bi destê filozof û nivîskaran dirûv girtiye.

Bi riya nivîsê hevpariya dil û mêjiyên li her dera cîhanê, di navbera kesên ku hev û din nas

nakîn û ne pêkan e ku hev û din nas bikin pêk tê. Bi riya helbesta N. Hikmet Tanya û gelek kes bûne rêhevalên hev. Bi riya (bi xêra) Dostevskî (Sûc û Ceza) her kes dikare destê xwe deyne ser wîcdanê xwe, bi riya pênuşa E. Xanî mirov dikare di civaka xwe de Bekoyan bibîne, li dîroka kurdan a bêxwedî û kambax û her weha civaka kurdan û her weha li ser pîrsgirêkên siyasî yên her dem û dewranê bifikire, biaxive, bibehice... û ya herî girîng dersan bibîne, bixwîne...

Ligel van, weke ku di rewş û jiyanê nivîsbîriya kurdî de jî xwe dide der, nivîsandin lihemberderketina bişavtin û windakirina zimanekî û her weha çanda neteweyekê ye jî. Weke birêz Îsmail Beşikçi jî di nivîseke xwe de dibêje, li welatê mîna Tirkiyeyê ku pergala dewletê dijminatîya her hebûna kurdîyatîyê dike, xwendina pirtîkûke olî jî bi kurdî, şoreşgeriya herî mezin e. Lê li vê derê divê wêje bi berpirsariya mirovahi û şoreşgerî, hişmendîya li hemberî her cure neheqî, zîlm û zordariyê bihûne. Ku nivîskar berdevk û wîcdanê kesên bêzar be, divê hemû xerabiyên civakê û kesane jî derxîne ber çavan, ew dîmenên ku jiyan bixwe nikare derxîne gastiñê. Divê perdeya li ser rastiyan hilîne. Dibe ku ev neheqî ji hêla kesên bindest ve jî pêk werin, dibe ku ji hêla desthilatdaran ve. Kar û peywira nivîskarê berdevk û xwedî wîcdan ew e ku her tim bi wêrekî tevbigere.

Bi tevayî nivîsandin lihemberderketina mirinê, lixwedîderketina jiyanê be, bi taybetî nivîsandina bi kurdî li hemberî pergala mêtînger û pişavkar rûmet e, xîret e. Tenê bi riya nivîsandinê, bi saya huner û wêjeyê çand û zimanên ku hatine jibîrkirin – yên ku desthilatdarî dixwazin û hewl didin ku bîne jibîrkirin- dikarin zindî bibin û bi pêş bikevin. Divê nivîskar xebatkar û xemxwarê ya qedexekirî, ya liberwindabûnê be. Mîna ku romannûsê Awusturyayî, Hogo Von Hofmannsthal jî gotiye, divê mirov westiyayê neteweyên ku bi carekê hatine jibîrkirin be. Zimanzan, kaskaszan û kurdolog N. Y. Marr, di xebateke xwe de dibêje ku ‘Kurd sêwiyê dî-



rokê ne.' Ku em li helwest û kirinên dewletên ku gelê Kurd di bin desthilatdariya wan de dijîn binêrin, bi hêsanî em ê rastiya vê yekê bibînin. Ji ber vê yekê, weke ku me li jor jî got, nivîsandina bi Kurdî, bi tena serê xwe hewldaneke mirovane, hewldaneke şoreşgerî ye. Lê helbet li vê derê divê xwediyê nivîsê, her tim bi feraset û berpirsariya ku 'Min li nivîsa (wêjeya) gelê xwe, li cîhana wêjeyê û heta li wêjeya cîhanê çi zêde kir?' tevbigere.

Bi rê û bi saya nivîsandinê mirov dikare tiştên ku bi hezaran çav, her yek ji pencereyê cuda dîtine bi yek carê li ber xwe bibîne. Bi vê yekê re nivîsandin hênikkirina dilê mirovî ye. Ji bo kesên ku dil dane vî karî, tišta jêneger e.

Ji bo min nivîsandin ew navgîn e ku paranga di dilê min de dilên din jî germ bike, hesteyê ku çîrûskên di mêjiyê min de pêk tîne di mêjiyîne din de jî pêk bîne, coya ku rondikên min tê de diherikin bigihîne coyên hinên din e, ya xweş û rast, ya ku divê û ya pêkan ew e ku nivîsandin bibe sedema ku di heman katê de, li deverên cûrbecûr û ji hev çî nêzik û çî dûr, kesên ku hev û din nas dikin an nas nakin, hev dibînin an nabînin; bi hev re bibînin, bi hev re biramin, bi hev re bigirîn û bi hev re bike-nin...

Nivîsandin her weha nivîskarî serdestî li hêlekê pir caran mirov dike dijminê hêzên desthilatdar û girseyên paşverû jî. Orhan Pamuk û İsmail Beşikçi ji bo vê yekê mînakên berbiçav in. Sedema ku nivîskar her tim li rastiye digere, xwedîlêderketina li rastiye rewşenbîr dike dijmin ji hinan re, bêşik ew kes bi vê helwesta xwe dibîne dostê gelek kesan jî.

Rasterast girêdana nivîsê û şer û aramiyê bi hev re nîn e. Karê nivîsê û her weha karê hunerê,

rasterast bi jiyanê bi xwe ve girêdayî ye. Li cih û dema ku jiyan hebe gerîna li rastiye, hûnandina dahatûyekê jî her tim heye. Heta ku nivîskar William L. Randall dibêje ku çîroka ku nehatiye(naye) vegotin, jiyanê ku nehatiye jiyîn e. Dîsa nivîskar Hermann Hesse, dibêje ku wêje (roman) dikare mijara herî bişêşa (mezin, berze) ya cîhanê hilde dest û bibe bêrûmet, li hêla din dikare tišta herî bêqîmet a cîhanê weke derziyeke windayî, weke şorbeyeke bi binê beroşê ve girtî hilde dest û bibe berhemeke wêjeyê ya gewre.

Dema ez dinivîsim ez hesabê kesên ku dê nivîsên min bixwînin nakim, ez pêşiyê bi xwe re diaxivim û piştî axaftina xwe bi riya nivîsê bi kesên din re parve dikim. Helbet dema ku ez hest û ramanên xwe vedibêjim rihetiyeke derûnî bi min re pêk tê û bi ser de ku hin kes bi taybetî werin bibêjin 'min filan çîroka te xwend û min gelek çêj ji xwendina wê wergirt, êdî ew ji bo min şadbûneke bêpayan e.

Rast e paşxaneyêke xurt a nivîsbariya kurdî nîn e lê wêjeya kurdî bi yek carê ne bêbingeh e. Kêmbê jî, fîrk be jî rayên xwe di nav dîroka xwe ya kam-bax de dirêj kirine. Û tunebûna paşxaneyêke xurt ji bo nivîskarên kurdî neyînîyek be jî divê nivîskarên kurd bi wê hişmendî û peywirê tevbigerin ku pêlikên kêmbê dîrokê sergihayî bikin. Ev hêz û ev pêdivî li gastiye ne. Û di gelek rûpelên xwe de dîrokê nîşanî me daye ku hêz û pêdivî hebe rêbazên diyalektîkê tu astengiyê li ber xwe nahêlin. Ew hêz û ew pêdivî li hêviya dil û mêjiyê xwedî xîret û hunermend in. Weke ku me got, heke nivîsandin xîret be, bê xîret jî tu carî nabe...

Ez ji bo şoreşê dinivîsim

Mistefa TUNCYUZLU

Ez dixwazim pirsra “tu ji bo çi û ji bo kê dinivîse” wekî şoreşgerekî, gerîllayekî, dîlekî û nivîskarêkî bibersivînim, lê berî wê dixwazim bi du hevokan bêjim bê nivîs ji bo min çi ye?

Nivîs, bi xwîna nivîskar a dibe hibra pênuşê ve neqîşkirina rûpelên spî ye, di heman demê de xwe kuştineke û ji xweliya agirê xwe, ya ku li ser rûpelan belav bûye xwe afirandin e û zewqa wê afirandinê bi xwîner dane tehmîkirin e.

Di serî de ji bo gerîllayekî/ê di dilê xwînerêkî/ê de bidim lêxistin û dilê wan xwîneran ji wan gerîlayên bin her dar û berên Kurdistanê tîrbek e re bikim wargehên nemir dinivîsim. Ji bo xwîner wî/wê gerîlayî/ê hîs bike: pê re bijî: jana neynokên tiliyên tîrbekolayî ku ax ji stêrkên wan re dibû xwe bikişîne û girtina kurmên birîna birîndarekî/ê fêhm bike dinivîsim. Yanî ji bo deşt û çiyayên xwe ve, gerîla bikim wêneyekî ber dilê her xwînerêkî/ê dinivîsim.

Wekî dîlekî, ji bo xwe azad bikim û bi xwe azadkirinê ve rêya azadbûna mirov bi xwîneran bidin nîşandan dinivîsim. Di zindana bûye goristana zindiyan de nivîsandin berxwedan e. Ji ber ku zindan hatina sînoordarkirin, tiştê ku wan sînoran bi

mirov bide qewastin ji nivîs e. Ji ber wê jî azadiya ruh cihê hemû azadiyan dadigire. Ji ber ku tiştê herî zêde gerdûnê hembêz dike nivîs e û gerdûnîti jî azadbûnê pêwîst dike, ez dinivîsim.

Wekî şoreşgerekî, tiştê ku ez kirim şoreşger dinivîsim, ji bo yên mîna min bibin şoreşger û hîn ji bi hîskirîna şoreşgeran ve şad û bextewar, serbilind û serfiraz bibin dinivîsim. Tiştên ez kirim şoreşger jî bindestiya gelê kurd û Kurdistanê, bi hevrebûna bindestî û serdestiya di zîlamê kurd de, jan û kulên jîna kurd, jiyaneke azad ji xeyalbûnê derxistin. Têkilî û evîneke azad ji xwezîtiyê derxistin û “xwezi” ya Ehmedê xanî li Kurdistanê azad pêk bê, dinivîsim.


Wekî nivîskarekî jî dixwazim van mijaran bi nivîsê bigihînim xwînerên cîhanê. Dixwazim zimanê xwe ku hê jî ez ji bo wî janan dikêşim, bigihînim zimanê hemû xwîneran û di heman demê de bîrdozî û felsefeya xwe bi hestên bedew re bikim yek ku bi wê jeyê re bigirin reqseke bedew û mîna nermabayekî xwîneran sermest bikim.

Di sa ji bo evîn û evîndariyê dinivîsim, ku mirov evîndar bibin. Ji ber ku di serdema pergala kapîtalîst a her tiştî kiriyê madîyatî, hemû tîkîliyan li gor berjewendiyan pêş xistiye û mirov bê ruh kiriyê de evîn şoreşgeriyek e, ji ber ku di evînê de serhildan û rapêrîn heye. Ji bo xwîner bizanibin bê evîn çawa dibe şoreşgeriyek û jin û mêran çawa azad dike dinivîsim. Ji bo bizanibin bê gerîlayek çawa hez dike, dîlek çawa hesreta janbar li ruh bar dike, şoreşgerek evîna xwe çawa feda dike, dinivîsim.

Niha ji ji bo xwedîya van rêzikên li jêr ya 17 salî dinivîsim. Ji ber ku ew bi hemû bedewbûn û zîrekbûna xwe ve nîrxê ji teref vê şoreşê ve hatiye afirandin e.

Dema min dawîya rojnivîskê xwend ez pir xemgîn bûm û hemû şadî û bextewariya min jê girtî jî çû. Ji ber ku te gotibû ‘ez ê êdî nenivîsim’.. çima xalo çima? Çima cewîyê ruhê min çima? Çima parçeyeke ji her parçeyê min çima? Ez tenê bersiva wê ji te dixwazim. Rica dikim binivîse. Bêbêzarî, bêwestandin binivîse. Me ji xwe mehrûm neke. Ji ber ku tu pir baş dinivîsî û hestên xwe ji dil tîni ziman û bi şiklek bedewkar derbasî nivîsê dikî. Ji bo Nalîn, ji bo min, ji bo Dilanê, ji bo jinan, ji bo hemû mirovên tiyên azadiyê ne, binivîse.”





Çima nivîs? İnan EROGLU

“Çima nivîs?” Beriya niha bi çar hezar salan mirovan li van bajarên ku em lê dijîn, li ser axa Mezopotamyayê vê pirsê ji xwe kir. Berî vê pirsê jî hin daxwazên weke “Em naxwazin bîn ji bîr kirin. Em jî dixwazin di dîrokê de cihê xwe bigirin. Bila nav û nasnameya me li ser zimanan nemîne.” derketin holê. Mirovan bi her daxwazê pirsan ji xwe kir û bi her pirsê daxwaz afirîn û di encama van afirandinan de Destana Gilgamêş afirî. Her çi qas hin beşên vê destanê nehatibin dîtin û hin beş nehatibin xwendin jî, em dikarin bibêjin Destana Gilgamêş yek ji destana herî girîng ango balkêş e. Gelo Sumeran wê destanê nenivîsandina nedibû? Weke her neteweyî efsane û destanên wan jî bi devkî, ji yekî heta yekî bigihiştî roja me nedibû? Na, nedibû. Ew jî dizanibûn ku heger nenivîsin wê rojekê teqez bîn ji bîr kirin û dê navê wan neyê ser zimanê rûspiyekî jî. Destana Gilgamêş heta îro jî di her civakê de êşê vedibêje. Destan ji ber ku êşekê di hundirê xwe de di hewîne gerdûnî ye. Ma ne, “*Gerdûn tim ‘digere’ û nivîskar jî tê de ‘digere’*.” (R. Jiyan) Heger Destana Gilgamêş nehatiba nivîsandin wê ne gerdûn bigeriya ne jî nivîskar tê de bigeriya û îro em ê li nav çavên xelkê mîna parçeyekî ji me kêmbigeriyana. Ji bo wê nivîsandin, ji bo wê destan. Nivîsandin hebûn e, û kesê nebûnê jî tê de bi cih dike nivîskar e. Ji ber ku em dinivîsin, em îro dikarin bibêjin “Ez heme!” Lê siberojê em ê nikaribin heman tiştî bibêjin. Ji lew re; hin peywir, şewaz û metodên nivîsandinê hene û kesên dinivîsin (Em nikarin ji her kesê ku dinivîsîne bibêjin nivîskar.) divê li gor van erkan tevbigere. Nivîsandin gerdûnî ye û heger nivîskar berhema xwe bi gerdûnî neşewîne dê ne bibe vebêjê gelekî din û ne jî nivîskarê dahatûyê. Nivîskarên li dû qûna hev diçin, ku diçin û tên bi heman gotinan heman tiştî dinivîsinin –dibêjin–; nivîskarên ku tenê bi “berçavka hespê” li derdora dinihêrin, ku berhemen wan jî ji yek qalib û şewazekê pêk tê; nivîskarên ku tu pêşketin di berhemen wan de xwe nadin der û li gor xwe şeweyekê, vegotinekê neafi-

randine û tenê bi tiştê vala û belaheq xwe diştexilîne dê nebe nivîskarê dahatûyê. Û di civakeke weke a Kurdan de, divê nivîskar destê xwe dirêjî “*Hunera ji bo hunerê*” neke. Meriv hunerê ji bo xwe nake, ji ber ku hunermend dixwaze hunera xwe nîşanî gel/civakê bide, pêwîst e ku di navbera berhema û civakê de têkiliyek hebe. Nivîskar divê karibe xwe li tixûbên postmoderniyê jî biqelibîne; lê nivîskar divê xwe neşibîne nivîskarên postmodernîst. Qada wêjeyê fireh e; lê a muhîm nivîskar karibe hespê xwe ji tewleyê derxe û wan li vê qadê bide çargavan û wan rake pêdarê. Hewce ye ku nivîskarên Kurd bi hev re di nav pêşbaziyeke de bin. Ger berhemek ji berhema din hem ji hêla naverokê ve û hem jî ji hêla şewazê ve ji berhema din pêşketitir be, wê ew berhem neyê ji bîr kirin. Lê na, nivîskar xwe bi tiştên beredayî û belasebep biwestîne û di berhemen xwe de ji dîlpêşewitînê pê ve cih nede tu tiştî, dê berhema wî nivîskarî bibe xwelî û li ber bayê vî welatî here. Ne nav dimîne, ne jî nasnav.

J. P. Sartre dibêje, “*Bêjeyan bi tena serê xwe bi-hêlin, wê bêje hevokan biqfirînin*.” Na, Sartre xelet difikire. Ev tişt ne ew qas hêsan e, ne jî pêkan e. Ev rast bûya, divê me ji kesên ku nikarin çend gotinan bînin ba hev jî bigota nivîskar. Ji bo nivîsandinê xwê dan divê, xwîn divê û belê, êş divê. Nivîskarî karkerî ye, hewce ye ku meriv karê xwe baş bike. Ger em mînakeke ji nav jiyanê bidin; Cilfiroşekî ji ber ku karê xwe baş dike, derbasî dikanê dibe, dawiyê derbasî mexazeyê û paşê jî mexazeyên wî li derveyî bajêr vedibin. Nivîskarî jî wiha ye. Heger nivîskarek karê xwe baş bike wê derbasî asteke bilind bibe û wê qedrê wî jî roj bi roj bê girtin. Lê na, gava kes li bendî îlhamê be û karê xwe baş bi rê ve nebe, ew îlham tu rojekê jî nayê. Qaşo îlham hat jî, ew nivîskêr ne nivîskarê rastîn, nivîskarê derewîn e. Qedrê nivîskarên wiha nayê girtin. Ji bo nivîseke baş xebat divê. Hewce ye ku nivîskêr xwe daqûlî ser maseyê bike û bi saetan ji ser paldanka xwe ranebe. Ji bo nivîsandineke baş serêşandinek

pêwîst e. Gava kes biryar da ku dê binivîsîne pêwîst e ku berhema xwe ji serî heta binî baş analîz bike. Hevokek ji li hev neyê ew berhem ji asta xwe ya berê dadikeve. Berhemeke baş bi matematîkê re di têkiliyê de ye. Divê nivîskar ne bi hestên xwe lêbelê, bi hiş û bîra xwe pêûsê rahije dest. Nivîskar heger karibe bi pêûsa xwe û heger karibe aqilê xwe bi pêûsê re bike yek, dê berhemeke hêja derkeve holê. Lê na, nivîskar nizanibe ku çi dinivîsîne, nizanibe ku wê dawî angî navîn û naveroka berhemê çawa be, dê berhemeke xerab derkeve holê. Kesên wiha bê armanc û bê mebest heta ku pêûsa xwe kedî nekin, divê pêûsê ji destê xwe bi-avêjin. Nivîskarên bê armanc û bê mebest nolanî pêlên deryayeke har e. Ma ne O. Pamuk nabêje, *“Ji bo min raza nivîskariyê, ne di îlhama ku hatina wê nediya de, lêbelê di eks û sebrê de ye.”* Her çî qas hin nivîskarên Kurd bibêjin, xwendevan ji nivîskêr bêhtir dixwînin jî, ev tiştekî normal e. Çawa ku karê nivîskar nivîsandin be, karê xwendevan jî xwendin e. Nivîskar bêhtirî dema xwe bi nivîsandinê, xwendevan jî bêhtirî dema xwe bi xwendinê derbas dike. Nivîskarên ku di vê de nenormaliyekê dibînin jî divê dev ji van gotina berdin.

Roja ku min dest bi nivîsandina Kurdî kiribû hebû, û roja ku min xwest bibim nivîskarê Kurdî... Tê bîra min, pirtûkxaneyekê min hebû. Kekê min bi her vegera ji Enqereyê ve, ku li wir di zankoyê de bû, bi çenteyan pirtûk dianî. Ew cara pêşîn bû ku min leqayî pirtûkên Kurdî hat. Temenê min li dora sala nehan wan bû. Wê demê min leqayî navê Cegerxwîn, ku berî wê jî min navê wî bihîstibû hat. Min çend helbestên wî xwendin. Ez nizamî navê helbestê çibû, lê ji ber ku hevokeke bi Tirkî jî di helbestê de cihê xwe girtibû qet ji bîra min nedîçû. Ez dikarim bibêjim ku, piştî wê xwendina helbestên Cegerxwînî, heta pola heştêmîn min ji du sê pirtûkan pê ve tu pirtûk nexwendin. Xwehên min pirtûkan dixwendin, û kurteya pirtûkên dixwendin ji min re vedigotin. Gava biçûk bûm min bi zorê dişandin dibistanê. Min nedixwest pirtûkan jî bixwînim; lê kêfa min ji guhdarîkirina çîrokan re dihat.

Di pola heştêmîn de bûm. Hinekî jî bi han dana mamosteyê min ê zimanê Tirkî re min dest bi xwendina pirtûkan kir. Û ji wê salê heta niha –niha li lîseyê sala min a dawî ye, pola duwanzdemîn.– min xwe li nivîsandin û xwendina Kurdî kûr kir, hûr kir. Min bi ser serkî xwe li tixûbê zimanê qedexê, li Kurdî diqeliband. Û her gava ku min diçû li pêşberî pirtûkxaneyê disekinî, min li xeyalên xwe siwar dibû û xeyalên min jî min dibirin deverine dûr, kûr û teng. Her cara ku min ji refan pirtûkekê

dikişand û dixwend, min xwe êşandî his dikir. Mîna pelên pirtûkekê bi pêl dibûm. Bi vê êşê re jî min dizanibû dermanê min pirtûk in. Di pirtûkxaneyê de bi sê zimanî, herî kêr hezar heb pirtûk hebûn. Min carinan radibû yeko yeko pirtûkan dihejmart û bi her hejmartinê re jî min biyografiya nivîskaran û nivîsên li ser berga pirtûkê dixwend. Bi her xwendineke baş re min çêr û dijûnan li nivîskarî digirt. Van nivîskaran min diêşandin, ev êş jî min li Kurdî sor dikir. Pirtûkxane; hêlîna çivîkên baskşikandî ye. Her çiqas min xwendina pirtûkên hin nivîskaran di nêvî de hiştibe jî, min gelek caran xwe bi xwe kul kir û bi ser xwendinê ve çû. Min dizanibû ku pirtûkekê di nêviyê xwendinê de ji dest bê avêtin li nivîskarê wê pirtûkê tajegek e. Lê ev pirtûkên min ji dest xwe avêtiye yan wergera wê qels bû yan jî fahmkirina wê dijwar bû. Lê weke me got, pirtûk ne ji bo avêtinê ye; jî bo xwendinê ye û jî xwendinê re jî serêşandinekê divê. Min nedixwest jiyana xwe di bin jiyana hin kesan, nivîskaran de bextewar bikim. Min nedixwest bişîbim wan jî. Belê, min di serî de dizanibû ez ê binivîsînim; û min dizanibû ez ê rojekê van rêzan jî binivîsînim; armanc hebû, armanc...

Jiyana min a Kurdî gava ez di pola heştêmîn de bûm bi çîroka “Evdalê Zeynikê” dest pê kir. Min di Kurdî de pirtûkên çê jî û pirtûkên xerab jî dît. Lê bi qasî ku min zewqê di Kurdî de distend, min di tu zîmanekî din de nedistend. Hevîrê min bi Kurdî hatibû meyandin. Kes hevîr du caran nameyîne.

Ji min re digotin, tu yê bibî derhêner. Min bi çavê duyemîn li derhêneriyê dinihêrî. Min bi xwe digot, “Ez bibim derhêner jî ez ê binivîsînim.” û min senaryoyekê bi Kurdî nivîsand jî, lê belê min paşê wan pelên ku senaryo tê de nivîsandî ji lîstûskê qetand û avêt. Gava kekê min careke din got tu yê bibî derhênerêkê hêja, min bi xwe negirt û gotê: “Ez naxwazim bibim derhêner, ez dixwazim bibim nivîskar.” Min fedî kiribû.

Min bi Kurdî dinivîsî; ji ber ku ez Kurd bûm. (Her çiqas hin nivîskar navê xwe bi Kurdî lê zimanê xwe bi Tirkî biqîrin jî; çî qas bibêjin em rewşenbîrên Kurd in û nizanibin çend gotinan bi Kurdî binivîsînin; nivîskarên jî ber ku Kurdî ji bo wan pênc qirûş nake, dest bi nivîsandina Tirkî angî zîmanekî dikin û nêviyê xwendevanê wan Kurd in, divê çend gotinan li ser rewş, çand û wêjeya Kurdî jî nekin. Bila baş bizanibin ku ne navê wan, lêbelê şopa sola wan jî dê di tixûbê Kurdî de derbas nebe.) Çawa ku E. Xanî *“Da xelq-i nebêjîtin ku Ekrad / Bê me’rîfet in, bê esl û bunyad”* Mem û Zînê bi Kurdî nivîsandibe, ez jî ji bo ku kes nebêje “Kurd e, lê hîn nîzane bi Kurdî binivîsîne” bi Kurdî dinivîsînim. Ez ji bo dê û bavê xwe dinivîsînim. Ez ji bo Kurdan, ji

bo hemû gelê bindest, ji bo cîhanê dinivîsînîm. Ez ji bo gerdûnê dinivîsînîm. Ji bo ku bibêjim “Ez heme!” ez dinivîsînîm. Ji bo hebûn û berjewendiya Kurdî, bi Kurdî dinivîsînîm. Ji ber ku Kurdî gelek caran sêwî maye, ji ber ku gelek caran neheqî li Kurdî hatiye kirin bi Kurdî ji bo Kurdistanê dinivîsînîm. Min nexwest gotina C. E. Bedirxan a “*Ax min nizanibû ko mirov dikare du caran jî sêwî bimîne*” rast derkeve; ji bo wê min bi Kurdî dinivîsand. Ez ji bo (W)e dinivîsînîm. A herî baş; ez ji bo azadiyê dinivîsînîm. Weke ku Sartre jî dibêje, “*Nivîsandin, şeweyeke azadîxwaziyê ye.*”

Min helbestên xwe yên Kurdî pêşî li li bazarê nivîsand. Bavê min li bazarê cilfiroş bû û ez jî diçûm alikariya wî. Ew helbestên ku min li ser kartonên tenik, ku diketin navbera cilan dinivîsand, min dawiyê jî melodiyekê li wan dianî û dikir stran. Wan çaxan jî şerma min pirtûkên Kurdî an dixist ber kembera xwe an jî min dixist poşetekî û dibir li bazarê dixwend. Wê demê ne moda bû ku yek rabe li bazarê pirtûkan bixwîne. Lê belê min jî bi şermokî serê xwe dixist ber xwe û pirtûkên xwe dixwend. Hingê min fedî dikir, min nedixwest kesek bibêje “Tu çi dixwînî?” Carina cilên me jî di hate dizîn, ev jî hebû. Li dibistanê jî bûyerên wiha diqewimîn. Min hin çîrok û helbesta xwe li di dibistanê nivîsand. Û tişt ku herî zêde min diêşand jî, gava mamoste ji min bipirsiya ku ka ez dixwazim bibim çi bû. Her çi qas min dixwest bibêjim jî, lê min nikaribû bigota “Ez dixwazim bibim nivîskar.” Ev kul her di dilê min de ma. Min hîn nizanibû çend tîp di elfabeya Kurdî de hene, min dest bi nivîsandina Kurdî kir. Tîpên weke “-ğ, -ö, -ü” ku di elfabeya Kurdî de cihê xwe nedigirtin, di nivîsên min de cihê xwe digirtin. Min negot, bes e! Li gorî gelek hevalan nivîsandina bi Kurdî tişteki belasebep bû. Hema bibêje ji sedî notî hevalên min jî nizanibûn ku bi Kurdî tê nivîsandin. Lê ji min re bû cîr û min bi ser Kurdî de çû. Bi her çûyina ser Kurdî re hefsar diket destê min. Ji bo nivîsandinê cîrnexweşî pêwîst e.

Li lîseyê sala min a pêşîn bû. Pirtûka O. Pamuk a “*Baholê Bavê min*” ku tê de axaftinên Nobelê hebûn, bi ber çavê min ket. Wê şevê min pirtûkê qedand. Lê ez wê carê neêşiyam, birîndar bûm, birîndar... Dîsa min li nivîsandinê sor kirin. Belê, weke her kesî min jî dixwest baholekî bavê min ku tê de nivîs û pirtûkên wî cih digirin hebe. Ne tişteki din, tenê baholek. Ma em nikarin bibêjin, mekanê herî pêşî ê nivîskar bahol e?

Gellek nivîskêr dixwaze berhemên wî bişibe

berhema nivîskarên navdar. Dibe ku berhemek/nivîskarek bandor li ser nivîskarekî kiribe; lê divê nivîskêr jî bîr neke ku, xwe şibandina tişteki, dizî ye, yanê nivîskêr jî wê berhemê angî ji wê/î nivîskarî tiştina didize. Divê nivîskar li gor xwe karibe şewazine nû biciribîne. A wê çaxê nivîskar ne hewce ye xwe bişibîne hin nivîskaran.

Xerabiya ku herî xerabî bi nivîskêr dike jî otosansûr e. Otosansûrî, stûxwarî ye. Stûxwariya li hemberî serdestî angî kesekî/ê ye. Heger ev nivîskar jin be, divê “s” ya sansûrê jî qet û qet tev li nivîsên xwe neke. Me di serî de jî negotibû nivîsandin, azadîxwazî ye?!

Ez ji bo xwe nanivîsînîm, bila xwendevên vî tiştî baş bizanibe. Min ji bo xwe binivîsanda, min nivîsên xwe di kovaran de nediweşand. Ger nivîskarek bibêje, tenê ez ji bo xwe dinivîsînîm jî, serçavan. Li welatê ku şer û pêvçûn lê nasekine, ziman tê qedexeyê kirin, zarok tê kuştin, Kurd tê lînc kirin, kezêba dayikê tê şewitandin, rûmet tê pêpes kirin, ku her roj bûyerên qirêj lê diqewimin, ma meriv li welatekî wiha ji bo azadiyê, ji bo gel nenivîsîne wê ji bo kê binivîsîne?! Ma wê çi xweliyê li serê xwe bike. Nivîskarek li welatekî wiha çawa dikare bibêje, ez ji bo xwe dinivîsînîm?!

Ez ji kêf û zewqa xwe re nanivîsînîm. Yekî weke Dostoyevskî ku qumarbaz e, rabe pirtûkan binivîsîne ne ji kêf û zewqê ye; ji êşê ye, êşê. Tolstoy beriya ku “*Şer û Aştî*” yê binivîsîne şeş mehan li cihê ku şer lê qewimibû geriya. Ma kî dikare bibêje Tolstoy pirtûka xwe hema wisa nivîsandiye? O. Atay “*Tutunamayanlar*”ê (E. Loran ji bo Kurdî ya vî navê berhemê gotina “*Pêgirt*” bi kar tîne; Kesên *Pêgirt*.) ji bo mirovên *pêgirt* nivîsand. Û kesên vê romanê dixwend ji xwe dipirsî, ka gelo ew jî yek ji *pêgirta* ye an na. Ma em dikarin bibêjin Atay hema wisa vê romanê ji kêf û zewqa xwe nivîsandiye? H. Cindî romana xwe a “*Hewarî*” yê di sala 1965’an de temam kir. Kesê vê romanê xwendibe dîsa leqayî temaya êşê tê. Ma Cindî vê romanê hema wisa nivîsî? Di gellek romanên wiha heja de temaya êşê serdest e; lê divê ev ‘êş’ negihîje asta dilpêşewitînê.

Pirsa dawî: F. Kafka beriya ku bimore wesyet kir ku hemû berhemên wî bê şewitandin, û F. Ûsiv jî piştî ku hin kes dek û dolaban li serê wî gerandin û bêbêxtiyê lê kirin, Ûsiv hemû helbestên xwe bi destên xwe da şewitandin. Gelo, em dikarin ji bo van herdu nivîskaran bibêjin ji bo xwe û zewqa xwe dinivîsandin? Bersiva vê pirsê jî hûn bidin.

Serketin

Osman PLATÎN

Demekê ji alema ajalan beqên afirandiyên şîrîn, di nav xwe de pêşbaziyeke li dar xistine. Pêşbaziya ku armanca wê derketina girek bilind bûye, gelek beq ji wek temaşevan beşdar bûne. Ji temaşevanan tu beq, her wekî guman nedane ku pêşbaz derkevin girê bilind, bi zena "Hevalên me yên belengaz, hûn ê qet sernekevin, dev ji vê sewdayê berdin." awaz vedane. Encama van qajînen temaşevanan pêşbazên ku ezma xwe winda kirine yeko yeko dev ji pêşbaziye berdane. Bi tenê beqek, bi eksa hevalên xwe yên hevîyên wan qediyane, di encama hewl û xîretek mezin derketina gir de biserdikeve.

Hevalên wê yên din ku heyirîn mane, meraq kirine ku vê têkoşînê çawa qezenç kiriye. Nêzi cem beqa qezençkirî bûne û "Tu çawa serketî, sira vê serketinê çi ye?" ji wê pirs kirine. Lê mixabin tu bersiv nestandine.

Çimkî beqa ku pêşbaziye qezenç kiriye kerr bûye

...

Werin em ji alema ajalan vegerin alema însanan taybetî ya Kurdan. Ji şibandina me ya ji ajalan hûn ji niha ve pêşbiniyên xwe biavêjin derekê. Di dîroka me de çend serîhildan hene ku bi bedbîniya mirovên me têk neçûbe. Gelo hê ji berdewam nake? Hinek li derûdora xwe binihêrin bi baldarî. Hûn ê bibînin ku beqên ezma mirovan dişikînin û didin winda kirinê çiqas pir in. Li kolanan, li kovaran, li malperan, li televîzyonan, li rojnamayan û hema hema li her kêlîya jîyanê hûn bixwazin hûn dikarin wan bibînin. Dema ku we çavdêriyê kir berê dûrbînê bidin xwe ji dibe ku hûn ji nexweşiya bedbîniya kurdan par girtibe.

Barê li ser milê kurdên me yên bîrbir ne barekî sivik e. Îro li hemû cîhanê binihêrin û bibînin ku gelo çend gel wek gelê me kurdan stûxwar û stûxwarî bûye qedera wan hene? Pir serê xwe neêşînin hûn nabînin. Em pir dûr neçin em li dîroka xwe ya vê sedsalê (1900-2000) de lêkolîn bikin. Em ê bizanibin ku çi hatiye û çi nehatiye serê me kurdan. Însan faniye îro heye sibe tune ye, em ji bo ziman ji

dikarin bêjin îro heye sibe tune ye? Bawer im em hemû bi hev re dibêjin NA. Dema ku em difikirin kurdên me yên pêşeng, xebatkar, ronakbîr û nivîskar çiqas pir in lê ji nexweşiya me ya bedbîniyê di nav zeryayekê de dibin diloqeke avê. Pedivîya me kurdan herî pir bi mirovên pêkhatî û wêrek heye. Ew bedbînen malxerab nahêlin mirovên wiha xwe derxin pêş. Saziyên me yên çandî, hunerî û siyasî gelek in. Em çiqas li wan dibin xwedî? Ha em bêjin hûn ji siyasî dîtirsîn hûn nikarin biçin saziyên wiha, kerem bikin birano/xûşkno werin saziyên me yên çandî û hunerî ji hene. Hey! we naxwin. Divê em wek beqa serketî kerr bin ji gotinên nexwaz û bedbînan. Divê herî pir em xwedî li Kurdîderê/an derkevin. Çend kes, li mala xwe li ser zimanê xwe xebat dikin? Çend kes kurdê ku bi tirkî diaxive hişyar dikin? Çend kes li mala xwe pirtûkên kurdî dihevin û hwd... Em dikarin pirsên "çend kesan" dirêj û dirêj bikin lê çi heyf e ku ew ê

van qarînen min tenê yên ku kurdîhez in bibîhîsin. Yên ku dengê min dibîhîsin ez û wan yek in. Wek ku ez herdem bala mirovan dikişînim ser Zimanê Kurdî û dayika wê ya fermî Kurdîderê dengbirayên min ji ez bawer û hevîdar im bi vî karî serê xwe diêşînin û wê biêşînin. Xurtkirina Kurdîderan wê bibe derman ji me re. Divê em gelek bixebitin, rojên xwe bikin şev û şevên xwe bikin roj bêsekin ji bo rizgariya zimanê xwe hewl bidin. Dibe ku ez û dengbi-

rayên min, em ê dengê bedbîn û xemsaran bifetîsin. Û li girê bilind ala xwe biçikînin. Ancax wê demê ew ê tîbûna me ya serketinê bişke. Çi xweş gotiye Şêx Ehmedê Xanî "Çi bikim qewî kesad e bazar / Nînin ji qûmaşî ra xerîdar". Gotina şêxê min rewşa me xweş dide diyar. Lê bila tunebe bazar û xerîdar, Ez ê binivîsim bi kurdî heta bimîne dilopek xwîna min a herikbar. Û dînek wek dînen farqînê derketiye divê tu çima, çawa û ji bo kî/dinivîsî? Heyrano, ez ji bo xwe dinivîsim ne ji bo tu kesî. Çimkî ez ji rêhevalê beqa kerr im weyy.



Tavên stêrîn

A.KARABAX

XIII.

Serê çîyan bi mij û moran in; naxêr, agir û dûman in
De bêjin, em in **Dîjle** û **Ferat**, li ber heyameke din in!

Ew, ne bes bi daxwaz û nedaxwazên benî adem bûn,
Ji berê de bi geremol e ev dinya bi her hebûnên xwe
Hîn alema candaran tune bû jî bi îsyar bû li her livê.
Ew çîya ku xwediye serhildêrên herî qedîm in
Û bi xwe ne yê ku serhildayî li dijî asîmanên ewrîn
Û rêberên me ne, em jê hîn dibin azadî û serbestîyan
Wê bidomin koşîn da ku wek wan dibin bin û binyat.

Li ku bûn, nivîsevan û nivîsgehên gerdûnî û dinyayî!

Heger hebûya pelek nivîskî yê dîrokî wek çemên me
Ji destpêka bûyîna hemû heyberan de, heya roja niha
Û bihatana tomarkirin her tişt û bûyer, bi dem û nam
Kîjan roj û saet dibe bila bibe, dema ku bîn xwendin
Wê bihatana dîtin ku bona mafên jîyanî û biwarbûnê,
Têkoşînên herî çetin li derdorên av û çeman bihurîne
Ji wê tê ku dendarê lêborînê ye bo tavên me, **Xwedê!**

Ne xeyalî ne, her yek wek destan in, bi şûn û war in!

Em in berxwedêr, dilawer û mafgerên **Dîjle** û **Feradî**;
Ne xwarin û xelatan, ne qisûr û kêmasîyan dîkin tehn
Helbet bi ser bendên me nakevin qeydên wan deman
Qebehet ne ya me ye, ticarî û bajarî ne herf û hejmar!
Him jî ne diviyabûn, can û çav ji hevûdu re kefil bûn
Û me girt, rê li ber me bûn ji rîsê ziravtir, ji şûr tûjtir,
Bi dewlet û şaristan in tîp û jîmar, sûc ne yê me ne!

Ew der bînavnas in, bi rastî bihuşt û dojah bi xwe ne
Perde vedibin, perde tîn girtin ku li herikînên me ne!

Zildan, raperîn in bo rewşên jîyanî û mafdar ên tovîn
Teneyên tîn tewlisê, ji qalçikan dixermişin, zîl didin
Ku ew çima tawan, bîn nirxandin li sirûştê heyberan
Ca bila bi cih be, bi danehevên dil û zên bîn sehiyan
Û ximeximên çemên me, kel û dûkelên ku li ser wan
Pesend dîkin rewşên me bi dîmenên xwe, bînvîs in!

Ne ji nezanî ye, me ji xwe re nekiriye mesele, nivîsîn
Ksenefon nivîskarekî jîr e, çê dizane şerê **çiyayîyan!**

Ji deman serdemek, li serdeman hêzek, wek neteweyî
 Kî ye **Çemşîdê** li ser textekî rûdine, key û keyanî çî ne
 Azadî bi rê dikeve ji **Çiyayê Demawendê** de, tê **Babilê**
 Him serhildan in, him serkeftin û mîhrîcan in bi tavan
 Û me wê rojê, bi av û çemên xwe, **roj** aniye ba gelan!
 Qral kî ne, em in ên ku bi heftan direngînîn **Ekbatanê**
 Bextên wan deran in: ne **Dehaq**, ne jî **Kawa** kême bûne
 Pelên salnameyan jî diqedin di bin karên wisan zor de
 Soz, bi qewlên gotinan in, siwarên eşîrî ne yên ku tên,
 Êl bi êl, qebîle bi qebîle; war bi war, dever û herêm in
 Xilaf tê de nîn e; em li ku hene, li wir serhildan çêdibin!

Kîjan xwenezan dibêjin ku li berî me, tu tişt tune bûn
 Lê belê pirsên pêr û duh ên rêxistinan, îro jî bi sêyr in,
 Sehne vedibin, sehne tên girtin ku li herikînên me ne!

Belê, em in **Dîjle** û **Ferat**, ew tarîx xistin koçên salan!

Dibêjin, mêrxas û gernas in, wek şêran radibin hevdu
 Deng didin li qadan, şeşşeq û şingêşingên bi hespan
 Şervan û siwarî ne: bi şûr in, bi mertal in, bi tiving in!
 Tof û tofan in: dem bûn, ew ketin; dem bûn, em ketin
 Ew parastinên me yên rewa vala derdixê: bê yekîtî ye
 Û **ezbûn, tubûn, ewbûn** in; ku bibin **embûn** bi tavan
 Perde tên girtin û vekirin: li şûnên wan, pelşîrîn hene!

De nebêjin, lehiyên xwînê ne yên li wan deran dirijin
 Zû yan dereng dê bên ew rojên ku gel li benda wan in!

Em in ên ku **Dîjle** û **Feradî**, ked û kerban dîkin kulîlk!

Tu kes ne wek erdnîgara me, serbixwe û berhingar e,
 Yên ku serî hildidin, bes ne serbazên xwezaya wê ne
 Û yên ku bi tavên berê sergewaz dibûn, li pêş me ne!

Careke din, em xwe didin rê û rêçên xaka çarparçeyî
 Gulberfîn çandin çend caran li qontarên **Çiyayê Agirî**
 Em in ên ku bi gulan, pêşwazî dîkin xwediyê kedan!
 Em dîsa xwe berdin ji bakur de herêma **Gola Ûrmiyeyê**
 Û gul danîn li qadan hetanî sînorên êrdîmên deryayê.

Em in kulîlkvanên li pêlên dengvedanên çaxên wan!

Gulevînan, gulhêviyan û çavlêmayinan ber hev dîkin
 Heger bawer nekin, em ê bêjin şûnwarnas û hekîm in
 Şûnwarderdan, kulîlkjanan, kulîlkêşan derman dîkin!
 Eger qîma xwe hîn pê neanîn, em ê bêjin ku şivan in,
 Li şivantiyê digerin mînanî **Cembelî** diçe **Qerejdaxê**!

Şîn û loma lê negerandin, me dan ber dilên evdalane!

Dibêjin ku şûr, kawdanên xwe nabirin, lê bi kul dîkin
 Kulên berxwedan û têkçûnên wan êlan, bi çend alî ne
 Gelo wek hev dibin emr û encamên eşqên warên me!

Pê daketin, dilgiran bûn; silavên me man li şervanan!

Çi kulîlk in **Lepzerîn, Babanî, Bingazî, Cizîrî, Sincarî**
Û Rewandizî, Botanî, Nehrî, Berzanî, Koçgirî, Zîlanî
Û Pîranî, Hezroyî, Sasonî, Mûnzirî, Dihî û Sîlemanî,
Amedî, Duhokî, Efrînî, Laçînî û hê li war û şûnwaran
 Û sirgûnê cihanî ne ji welatekî, em dê tevde bizivirin
 Hey çî gul û kulîlk hene, bi her halî kulîlkvan in, em!

Çav di geravên ronahiyên xwe de girav in, pê dinêrin
 Rûyên tavîn li ber in lê durûtî li ku ne, di geravan de!

Wê şevê Yaşar AKSÛ

We şevê, ji min re çîroka xezal û delal hat xwendin. Ev çîroka ku ji zaroktiya min û watedar e. Min li ber xwe dida ku ez hişê xwe yê raborî ji bîr nekim. Ev raboriya hêja û bi rûmet. Paşê, min riya xwe dît û herikim serbestî û azadiyê...

We şevê, ez bûbûm beytik û min baskê xwe li hev didan. Xurexura singê min bû, hilmeke bi cemed. Helîna min a li daristanan xemgîn û tarûmar bûbû. Ketibûm şerê hebûnê. Geh li ber çemê Zape geh ji qolanê be sînor. Wek ku ez li xwebûna xwe digeriyam.

We şevê, hestên min tevîzibûn. Ne cemed û ne şewat bê tehm bûn. Mejiyê min hatibû şuştin li ber sûretê te. Ketibûm xeyale stiya Zînê û bûbûm Memê Alan. Evîn ne sax bû, birîna xwe bi xwêya tehtan dikewand...

We şevê, min sozên berê dan. Vê soza ji bin qirike. Vê soza talankirî. Min xist mêzînê û min pîva. Nîqutek nehatibû cih û xiramek giran nebûbû. Çermê laşê min diheliya û zimanê min lal dibû. Soz li cem te wekî dengêkî bê qîmet bû. Lê ev soz ji min re sebeba jiyane bû.

We şevê, hawîrdorê min diwarekî bi pêt û agir bû. Laşê min li nav wê şewatê de dicemidî û diqurîfî. Rengê pizotan li nava çavê min dojah ava dikir. Û haya te ji min tune bû.

We şevê, min biryara herî mezin da û min rûpelekî spî û paqij vekir. Pênûsa destê xwe min reqisand. Dilê min zora mejiyê min dibir û pênûs dibû koleyê dilê min.

We şevê, te pirça xwe şeh kir li ser Sîpane Xelatê. Te navnîşana dilê min kifş û eşkere kir. Te mafê zilmkaran, tadekaran li ser çavên wan xist. Bi navên Xwedê carî kir. Tu bûyî qamûşkên laşê westiyayî, betilî. Hingê ez bûm bergêrê te. Xweziya ez bibûma şehê pirça te, xweziya ez bibûma bêhna li ber pozê te. Xweziya ez bibûma xelat, ev diyariya ji bo pirça te, berbiskeke zêrîn.

We şevê, min gazî ferîşteyê gunehan kir û min gunehên mezin ji xwe re nivîsand. Ev gunehên bêdeng û neçar. Ev gunehên ku bê pêş û paş. Ez li dojahê geriyam. Vê dojahê bi şewat. Bihuştê ez dilxavî dikir ji ber ku ez timakar. Min altaxiya xwe dikir ji ber ku ji timakirîna te birîndar bûm.

We şevê, kela girî kete qirika min, wê kela hişk û ziwa. Ev ziwabûna di nava xwe de bi xwîn. Bi lez xeyalên te gihîşt min. Piyalek zemzema xwe da min. Ji darbesta dinê rabûm ser piya û min xwe li te pêça. Pêçaneke wisa germ, pêçaneke wisa bê heval. Tu bûyî melhem, ez bûm şifa û me hev du temam kir. Paşê Loqman Hekîm doza me kir û bi nexweşiya evîne belav kir.

We şevê birçibûna ji zaroktiya min mayî, ketim ser nane tisî û min cût heviyen xwe yê di berîka çêpe de veşartî. Min nizanibû ku kelên derziya dayika min avêtî, temenê min tayê dora wê çirand. Dafilim xemên pelîstokên windabûyî û tozgirtî. Min bêriya qirêjokiya xwe dikir. Min beriya birîna bi-keta ser ejnûyê xwe dikir. Min beriya hêsirên zaroktiyê dikir. Min bêriya xwe dikir.

Sond

Îlhamî OZER

newroz
newroza bi pirsgirek û doz
û bi hêz û hoz
ji te re soz

heta ku
erd û asîman bi hev nezeliqe
dê ev ala têkoşînê
li her şênayî û şînê bê aliqandin

heta ku
xwêdana agirê te sar nebe
û ji armîştê te re
êvar nebe

û heta ku
hêsirên rojê
nebe dermanên mirovahiyê
û xwêdana bextewariyê

wek pêvek
em dê her xeml û xêzê
bikin ekl û çêja sewt û awazê
û bibêjin, “şewq û ronahî ji te
dizê...”

newroz
newroza bi pereng û koz
û ezîz û pîroz
ji te re soz

heta ku
roj û şev
nerin dest û rûyê hev
û ji bo tarî û ronahiyê bi hev nek-
evin

heta ku
li asîmanê mêjîyê me
di çavên stêrkên kor de
findên dev bi mor vênekevin

û heta ku
hemû stêrkên asîmanan
nebin kevokên zimanan
û di siya birûskan de ranekevin

em dê bi sed hezar
ziman û zar
û bi wê sewt û awazê:
bibêjin “agir û tîn ji te dizê..”

Wate

Azade KESKÎN

li ser eniyê min xwêdaneke bêdeng
bêriya bayekî bi deng dike
û li ser qelşên rûyê min birîn kûr in êdî
çavên min di/mij/in
laşê min wek xeyalek hişk û biring
bangeke germ
mahane li pêş min rêz dibin
şîretek bi qedr û qîmet di nav lêvên wî de
kefên destan şil, bêhnvedanek!
a li wir e
germahî, xwêdan, rê û çend peyvên
....çend peyvên bê wate

Miqersiya bi şeva payîzê re

Rêzan NAS

Roj hêdî hêdî bi ber êvarê ve diçû. Colê pez ji rojê girantir xwe bera nava mala dida. Kalekala mî û bizinan bi ser gundê kê mî mal diket.

Bedriya ku wextê vegera col zanîbû hêdîka ji ser dikê daket û deriyê hewşê ji col re vekir. Pezê wê ji nava col berê xwe dabû mala xwediyê xwe û gihastibû devê derî. Bedriya ku bi temenê xwe nêzî heştêyî dihat, wek zendekê li ber derî rawestiyabû. Bi çavlêketina pezê xwe re mîna zarokeke ku bi çav pêlistokekê bikeve dilşad bû. Bişirîneke şîrîn xwe bera ser rûyê wê yî ku ji qermîçonkan rê nemabû da. Germahiyekê xwe avêt ser dilê wê. Bi kêfxweşiyê pir kêfxweş pezê ku xwe bera hewşê dida jimart. Dilê wê mîna keweke di dahfikê de lê da. Mehdê wê bi dest xwe re zer bû. Xwe hinekî xapand. Cardin yeko yeko pezê xwe jimart. Lê ne hewceyî xapandinê bû. Şeş mî ji pezê wê kê mî bûn. Di nav pez de çû hat. Dawiyê biryar da û bi nawayeke herî bilind ba kurê xwe yî mezin kir.

Cûma gava fêr bû ku her şeş mîhên ku ji mala Sitqî kirîne nexuyane ew jî hema bi lez çû nava gund, li birayê xwe Xidir geriya û agahiya nexêrê dayê.

Herduyan wê şevê kurên apê xwe Şêxo û Ezîzo jî dan pey xwe û berê xwe dan mala şivanê gund. Piştî ku fêrbûn şivan herî dawî pez biribû Mişrextewîl bê ku bifikirin berê xwe dan wira.

Şevêk ji wan şevên payîzê ya reşahêyvê bû. Mirov tiliya xwe di çavên hevdu re rakira mirov hev nedîtît. Di wê şeva reşahêyvê de Cûma, Xidir, Ezîzo û Şêxo bi hezîr gihabûn nêzî Mişrextewîl. Mişrextewîl ji bo çêrandina pez pir xweş bû. Ji dar û devîyan, bi şî-nayîyeke pir mirov guneh dikir ku lê meyzîne. Zinarên tê de bi çavan zor dihatin tevsilandin. Her çiqas bi roj mîna bihuştêkê xuyanî dibû, êvarî ewqasî jî bi xof bû. Lê malê dinyayê şîrîn bû. Xofa Mişrextewîl zora şîraniya malê dinyayê nedibîr.

Bi wê şîraniyê Ezîzo li pêşîya wan û Şêxo jî li paşîya wan dimeşîyan. Gihastibûn ber çem. Ji bo ku derbasî aliyê din bibin di ser derbasekê re derbas dibûn, Şêxoyê ku bi roj jî çavên wî baş nedidît nîzanim papoka duduyan bû yan ya siyan bû bê hemdê wî lingên wî şemitîn û di nava avê de bû miştaxe. Bi şerpênîya wî, hevalên wî bi wî hisîyan. Bi alîkariya Xidir, ji nava avê derket lê wek beqê ku ji nava avê derketibe şil û pilo bûbû. Rûyê wî jî ji fêtiyan wek bacaneke sor, sor bûbû. Lê Xwedê bi xêra wî bû ku reşehêyv bû. Piştî wê bûyerê haybûn ku çavên wî baş nabînin û guhên wî jî hebekî giran in. Jê xwestin ku hîn nêzî gund bûn vegere lê bavê miqersiyê venegeriya. Piştî miqersiya wî hat bîra wan û bela xwe jê vekirin.

Tev mîna libên tizbiyekê bi pey hev di newalên kûr û dirêj de li mîhan digeriyan. Ewrên reş û tarî serî li

wan gerandibûn. Cihên ku bi qasî navê xwe nas dikirin wê şevê nas nedikirin. Bi wî awayê biyan gihastibûn serê Newala Eto û herêma Mişrextewîl, lê hîn jî pêjin ji mîhan nedihat.

Serê newalê zêde hevraz bû û şiverêkek jî tê de tune bû. Gelekî zahmetî dikişandin. Vizviza bayê kur meriv ji serma hişk dikir. Şêxo mîna bi cizbê ketibe, ser û bin lerizî. Diranên wî li ser hev nedisekinîn. Ji ber rewşa wî, wan xwe avêt nava Şikefta Mişrextewîl. Teva di rê de hêvî dikir ku mîhên wan mîna wan xwe spartibin şikeftê. Lê mîhên wan mîna wan nefikîribûn. Dilê Cûma li ser Şêxo êşîya û bi hêrs got; "Tah-til erda mîhan bikeve. Ma em ê xwe li ser wan bikujin. Ya baş ka em vegerin mala xwe. Gur wan dixwin, diz wan dibin, di zinaran wer dibin cehnema wan kiriye. Ma bû mesela wî yê ku çû heyfa bavê û qûna dê li ser kir?" Lê Ezîzo mîna wî nedifikirî. Giş qanih kirin. Piştî ku Şêxo hinekî bi ser hişê xwe ve hat berê xwe jî şikeftê dane mala Seîdê Selmê. Hêvî dikirin ku mîhên wan tevî pezê wî bûbin.

Xidir di pêşîya gişan de di şeva tarî de dimeşîyan. Qederêkê çûbûn an neçûbûn Şêxo jî dahm ve rawestiya. Destê xwe bire ber guhê xwe û bangî mîhan kir; "duvduv..." Lê mixabin ji dengê bayê kur pêştir tu deng nedihat. Şêxo bi hêrs dîsa rêya xwe dom kir, wanên din jî dane pey. Lê hîn sê gav neavêtibûn lingê wî yî çepê li kevîrêkî hiltepilî û heya ku li deviyekê aliqî ma qindirî. Hevalên wî dan pey nalenalên wî û xwe gihandinê. Bi zor wî ji erdê rakirin. Wek hinekî êşiyabû û ji lingekî dikuliya. Meşa wan a ku ji ber reşahêyvê giran bûbû ji ber rewşa Şêxo êdî girantir bûbû.

Ez bi sûnda qesem bikim mirov digot qey wê şevê li ser miqersiya wan her ku diçû şeva tarî tarîtir dibû û vizviza bayê kûr zêdetir dibû. Lê miqersiya şeva reş û bayê kur li cem miqersiya wan ne tiştêk bû.

Bi wê miqersiya xwe, xwe gihandin mala Seîdê Selmê. Li devê deriyê wî seyêkî har hebû. Ji tîrsa wî newêriyan xwe nêzî deriyê wî bikin. Xidir bi hezîr destê xwe li erdê paland. Rahişt du sê kevîran û avête paceyên mala Seîdê Selmê. Xwediyê malê bi teqreqa kevîran re şîyar bûbû û deriyê xwe vekiribû. Lê hîn jî teqreqa kevîran nesekinîbû.

Seîdê Selmêyî ku bi eslê xwe ereb bû mêvanên xwe vexwendî mal kirin. Tifinga xwe ya kemalî dîsa bi ciyê wê ve daliqand û ji hevsera xwe xwest ku paşîvekê ji wan re amade bike. Piştî vêxistina sobê jî Şêxo xwest ku wan cilên şil ji xwe bike. Bi kuxte kuxteke dijwar, Şêxo cilên xwe bi cilîne ziwa guherandin. Lê her ku diçû laşê wî wek destarekî giran dibû. Laşê wî jî soba vêxistî sincirîtir bûbû. Gava xwediyê malê

çav bi wî rewşa wî ket, hem bi meraq hem jî bi hêrs ji wan pirsî; “Zaroyên mala xalê min ên neşareza, vê şeva ku çav çavan nabîne û ji serma gur ji qula xwe dernayê hûn derketine li çi digerin çavên min?!”

Piştî xwarina paşivê û piştî ku fahm kirin havênê mîhên wan di nav pezê wî de tune ne rabûn xatir ji xwediyên malê xwestin, piştî stûyê xwe xurandin û dan ser rêya gundê xwe. Her çiqas Seîdê Selmê ji wan lavelav kir ku wê şevê bibin mêvanên wî, wan bi ya xwe kir. Ma carekê gotibûn na, îja miqersiya wan dihişt ku li wir bimînin?

Li gor şîretên Seîdê Selmê di ser pirê re derbasî aliyê din bûn û di riya zift û qîrê de rêya xwe berdewam kirin. Gava gihaştin gund dîkên serê sibehê bang didan. Li ser pêjina wan Bedriya ku çavên wê ji bêxewî werimîbûn û li rêya wan qerimîbûn bi lez xwe bera ber deriyê hewşê da û çû pêşiya wan. Bi dengê şewat; “lawo ma hûn li ku man? Bila mî bi qurbana we bin. Cehnema wan kirî. Ma we yê xwe li ser wan bi-kira?” Got û berê xwe bi hev re dan hûndir.

Ji bilî Şêxo gişan çavên xwe hinekî germ kirin. Lê kuxika kambax nedihişt xew nêzikî çavên Şêxo bibe.

Bi şeveqê re Cuma û Xidir rabûn dîsa berê xwe dan çolê û li mîhên xwe geriyan. Lê weke şevê din ne tarî bû. Dîtina mîhan êdî pir rehet bû. Gava gihaş-

tin serê Newala Eto, mîhên wan li ser bendera piştî şikefta ku şevêdîn xwe lê germ kiribûn diçêriyan. Mîhên xwe dan pêşiya xwe. Birin bera nava pezê ku li Newala Qoriye diçêriyan dan û berê xwe dan malê.

* * *

Di ser wê şeva reşehyê de sê meh û nivê tekûz bihurîbûn. Bi qasî pereyê pêncî mîhî xistibûn devê bijîşk û siwareyan. Lê havênê başiyê li Şêxoyê reben xuyanî nedibû. Her ku diçû ji roja din xerabtir dibû. Şev jê re ne şev, roj jê re ne roj bûn. Bi saxî di gorekê de bû. Rewşa malbata wî jî ne kêmtir wî bû. Giş li ber diketin. Lê tiştê ji destê wan û ji destê kesî jî êdî nedihat. Di wan rojên biharê yên xweş de gişan êdî rojên wî dijimartin. Di biharê de ji xweşiya biharê mahrûm diman. Wan tenê bêhna mirinê dikir. Bêhna kulîlkên ku li Mîşrextewîl vedibûn nedikirin.

Rojeke ku baran bi çipikan dibariya di mala Şêxo de dengê qêrîn û hewarê digihişt erşê Xwedê. Êdî diyar bû ku nan û avê wî li ser rûyê erdê nemabû. Diya wî Wesîla kurê xwe Şêxo yê ku mîna çavekî seriyar bû radestî goreke di goristana dawîya gund de kir. Êdî ew bûbû kurê gorê. Êdî ew bûbû ji malbata goristanê. Ciwaniya wî û kulîlkên Mîşrextewîl bi malbata wî re li ser digiriyan. Stêrkên wan tevî stêrkên çipikên baranê dibûn.

Pêşaneyên wêneyan Nesrîn NAVDAR

Min berê xwe da pêşanyeke wêneyan,
Li welatê xwe.
Bi hêviya ku di çavên dayikan de
dîlana dîlşadiyê bibînim
û di hembêza hezkiriyên de
destegulên evînî bêhn bikim.
Bi hêviya ku dengê kenê zarokên ku ji hêla bavê
xwe ve
di hêlekanê de tînin hejandin bibînim
û aramiya di rûyê kal û pîran de bibînim.
Min berê xwe da pêşanyeke wêneyan.
Bi hêviya ku dîmena xwezayê keskesor,
gund û bajarên şênkirî bibînim.
Min berê xwe da pêşaneyê.
Bi hêviya ku di dilê xwe de
evîna ciwanan,
kêfxweşiya dayikan,
bextewariya bavan,
kenê zarokan
û aramiya kal û pîran
hîs bikim.
Di pêşaneyên wêneyan a li welatê xwe de

gav bi gav geriyam.
Di her gaveke de hêviyê min şikest!
Li ber her tabloyêke dilê min ricifî!
Di her wêneyêke de kezêba min şewitî!
Di pêşaneyên welatê min de
dayik di erdê de dihatin kaşkirin,
ciwan di xwînê de...
Çavên zarokan ji piştî caxên hesinî diçirîsî...
Kal û pîr li warê xwe digeriyan.
Xweza bi dar û ber,
bi gund û bajarên xwe ve reş û tarî...
Di tabloyên di pêşaneyên welatê min de
mirovahî fedîkar,
demokrasî vik û vala,
edelat xwenenas,
azadî baskîstî diman...
Û wek generalê di pêşaneyên Pîcassoyî
Generalek jî tunebû di pêşaneyên welatê min de
Ku dema pîrsa çêkera/ê van tabloyan bike
wênesaz bibêje tu yî!
Çêkerên van tabloyan tu bi xwe.

Diyarê hezkirinên destanî: Cizîra Botan

Ekrem BATMAZ

Ev axa qedîm ku qet derya nedîtiye mîna giraveke rûbiken di bin asîmanên şîn de sekiniye. Zemanekî bajarekî wê hebû. Hikimdarên serdemên kevin ji bo vî bajarî ji dagirkerî û zeftkirinan biparêzin, deravên ku avê rê nedida derbasbûn lê çêbibe, hawirdorê bajêr bi çîrokên avê yen kûr û fireh rapêçabûn.

Ax û herî dermanê demê bû. Her ku bi destên mirovan çûn hosta û hunerwer vedigeriya avanî û xemildanan, ji rûniştgeh û xanên nû re dibû îlham. Malên kerpîç, xan, seray û kelehên curbicur dihatin ava kirin. Lewra ev bajar di wan zemanên nayê zanîn de hatiye damezirandin. Gelên hawirdor her tim xwe bi kûrahî û xweşikahiya vî bajarî bi lêv kirine.

Ava Dicle ku her tim weke keçeke xame û bedew xemiliye di ber vî bajarî re diherike û bajar li qeraxên vî çemî hatiye ava kirin. Bajar îro ji ger û dîtina wî wêdetir li benda kifşkirinê ye. Tiştên ku ew bide me pir in. Giraniya ew hildigire çiqasî em bikaribin parve bikin em ê ewqasî bikaribin bijîn û biparêzin. Ji bar ku di bin her keviyekî vî bajarî de dîrokek kevnare veşartîye. Ev dîrok, dîroka me ye, ya me hemûyan, a Mezopotamya...

Cizîra Botan bajarekî efsaneye ku ji demên Nuh maye. Sê deriyên vî yê ji dîroka kurdistanê re vedibin hene. Deriyê destpêkê di dewra Nuh de vebûye. Deriyê duyemîn di dema Mem û Zîn de bi pê-nûsa zanyar û feylesofê Ehmedê Xanî vebûye. Ev

derî bi sancoyên yekîtî û vejînê vebûye. Deriyê sêyemîn jî rastî destpêka vejîn û berxwedana gelê kurd a civakî tê. Deriyê herî girîng deriyê sêyemîn e. Ji bar ku ev derî rabirdû û dahatûya gelê kurd bi pêşerojên azad ve daye girêdan û êdî qet û qet nayê girtin.

Navê vî bajarî beriya zayînê di salên 3000'an de yanî di serdema gutiyan de weke Kazarda Kurtay (Kardu Kazardasi) derbas dibe. Ev nav piştî hatiye gûhartin. Mînak; piştî bi navên mîna Bozbida, Gazarta û Îrem jî hatine bikaranîn.

Bi mislimantiyê re (P.Z. 639) navê bajêr dibe Cizîr. Ji ber ku hawirdorê bajêr bi cihokên avê dorpêçkirîbû û ev yek jî wekî giravekê pêşçav dike, ev nav lê hatiye kirin. Peyva cizîr bi zimanê Erebi tê wateya giravê. Di serdema Ebasiyan de (P.Z.1180) navê "Girava Lawê Emer; Cizîret-ul Îbnî Omer" tê bikaranîn. Piştî serdestiya Mîrîtiya Cezîrê (1508) navê bajêr vê carê dibe Cezîra Botan. Demekê Cezîret-û Şeref (Cezîra bi Şeref an Cezîra Şeref) jî tê gotin.

Bajarê Cizîrê, ji gutiyan heta selefkosan, kelton, partan, emevî û ebasiyan, ji selçûkî heta osmanî û Dewleta Tirkan, di nava dîkmê de bi giştî 27 hêzan serdestî li ser vî bajarî kirine û ev desthilatî her tim dest gûhertiye. Mirov dikare bibêje ku Bajarê Cizîrê bajarekî dîroki ye.

Bêguman, îro Bajarê Cizîrê jî rabirdû û kevneşopiyên xwe gelek tişt winda kiriye. Dema mirov



lê mêze dike ji xeml û xêza wê ya kevin pir hindik tişt dibîne. Wekî tê zanîn remza Cizîrê keleha wê ye. Keleha Cizîrê di warê endazyarî de keştiyekê tîne bîra mirov. Jixwe me gotibû di demên kevin de bi kanalên avê yên cemê Dicle hatibûn Kêşan, bajar xistibû dirûvê giravekê. Lê îro tenê di aliyê bakur re av diherike. Ligel ku mîmariya wê ya kevin xera bûye û bi zeman re keleh rûxiyaye jî, lê di dema bi baldarî lê bê nihêrîn hîn jî ji mîrateya wî ya kevin mirov dikare gelek tiştan bibîne. Li rojhilat û rojavayê du deriyên kelehê hene. Ev derî mîna nimûneya keştiyê temam bike bêrikên wê tîne hizrên mirov. Ji deriyê rojava (topkapi) niha tenê xirbeyek li cî wê maye. Deriyê rojhilat jî kemberiyên serderiyê wê xera bûn e lê milderiyên dîwêr xwe ser digirin, hîn sexlem in. Dirêjehiya kelehê kîlometre û nîv tê hesibandin. Ji ber ku teşeyê keştiyê de ye keleh, firehî û dirêjahî cî bi cî tê gûhertin. Li aliyê qismê başûr firehî kîlometreyek e, lê her ku dîwar ber bi bakur ve pêş dikeve, ev rêje dikeve. Heta digihe seriyê bakur ev rêje heta 200 metreyî dadikeve. Her çiqasî yê mayîn bi temamî ji kevirên bazalt hatibe nîjinîn jî, kevirên spî jî di nav de tê dîtîn. Bilindehî çardeh; firehî jî du metre ye. Sê birçên kelehê hene. Birca li seriyê qismê bakur, jê re Belek tê gotin. Gelek nivîs û pişpişandin ji ser dîwarên suran hatine çinkirin. Ev nivîs û pişpişandin niha jî ronahî li ber dîrokê vedikin. Lê bi zeman re hinek cî di bin axê de mane. Bi vê re gelek bînesazî û berhem jî di bin axê de winda bûne û niha jî di rewşa kavilî de ye. Lê li cihen mayîn niha jî gelek turbe, mizgeft, medrese û berhemên dîrokî tene dîtîn.

Hiz.Nuh, ku li gorî rîwayetê wekî bavê mirovatiya duyemîn tê pejirandin û mîna efsaneyê Mezopotamya tê jimartin. Ji bo Cizîra Botan wateyekê wî ya taybet heye. Piştî Tufana Nuh a mezin, keştiya wî li bejahîya çiyayê Cudî hatiye rûniştin. Dîsa li gorî rîwayetê sazkirina jiyana nû jî li ser wê axê hatiye destpê kirin. Nuh pêxember li ser vê axê çûye ser dilovaniya xwe.

Di vegotina dîrokzanên misliman de, bajarê Cizîrê; piştî Tufana Nuh jiyangeha duyemîn e. Navê wê yê wê demê Kazarta Kartay- Gazartu Bakartda bû. Sûrên Cizîrê di dirûvê keştiyê de ye. Turbeya Hiz.Nuh li vî bajarî ye û di hemî demê de piştrast kirina rîwayetên heyî aşkara dike, her wiha Hiz. Nuh jî li vî bajarî jiyaye.

Turbeya Hiz.Nuh di bin mizgefta Nuh Pêxember de ye. Jêzemîna ku qebra Nuh lê ye, teng û dirêj e. Tê de tenê ciyê nimêjê û cihê mîhrabê heye. Tam di nivêkê de li ser kevirên spî ji rengên şîn û sor motîfek ber çavan dikeve. Di sala 1997' de mizgefta Hiz.Nuh ji nû ve hatiye veherandin. Xaniyên li

hawîrdor jî hatine xerakirin û bi wî awayî qada mizgeftê hatiye fireh kirin. Çiqasî li gorî reseniya wê hatiye çêkirin nayê zanîn. Lê dîsa jî avaniya nû avaniyek xweş e û berbiçav e.

Di hewşa mizgefta Nuh Pêxember de turbeyek bi navê "seriyê jêkirî" heye. Li gorî rîwayetan di artêşa mislimanan de kesekî bi navê Muhemed, heft şev û heft roj bê serî şer kiriye û piştî miriye li wir hatiye defn kirin. Ji bo vê yekê ev nav lê hatiye kirin.

Di sala 1954'an de Alfred Flabil li mevkiya Girê Reş dema bi mebesta xezîne kolanê dike, peykerekî û tabletekê dibîne. Li ser peyker û tabletan ligel nexşeya Cizîrê hinek deman gelek nivîs û pişpişandin hebûn. Ev berhemkurahiya dîroka Cizîrê destnîşan dike. Lê mixabin pir î jî van berheman ji çavkariya wê hatine qût kirin û ji kevnargehên (muze) biyanî re hatine rêkirin. Peykerekî ku xwedî dîrokek 4000 salî ku li bakurê rojhilat yê Cizîrê dima, di sala 1956'an de birine Emerîkayê. Ez bawerim ji bo talan kirina berhemên dîrokî yên vî bajarî ev mîna bîlekê e.

Dîsa di sala 1981'ê de li mevkiya Deriyê Rojhilat xebateke bîr kolanê çêdibe. Di vî xebatê de daneyên bîlekê hatine bi destxistin. Ji metroyên nozdemîn û pêda di teşeyê nîv heyvê de bi kurahiya sêzdeh santîman qewerekê tê dîtîn. Di vî navîsa nû û veşarî de kûzên hundirê wan tije zift hatine dîtîn. Ew jî diyar dike ku di zemanekî de li bajarê Cizîrê hîncan zewreqên mezin û hwd. dihatin çêkirin. Di bin ewqasî kurahiya axê de dîtina berhemên wiha dîrokî û çandî, dide nîşandan ku di binê kelehê de hîn dîrokeke veşartî û nehatiye kifşkirin heye. Berhemên ku ji babelat û şeran mane li hawîrdorê Cizîrê hatine dîtîn. Ev, ihtîmala ku beriya tofanê jî jiyan li vir hebûye, xurt dike. Lewma zanyarên li ser jeolojî û arkeolojî lêkolîn û xebat kirine jî vî yekê piştrast dikin ku felaketekî lehiye û bagerek mezin rabûye.

Deriyê deştê yê kelehê, li Pira Deştê vedibe. Niha xerabuyî ye û di rewşeke xerabe de ye. Gel ji bo odeyên li hundir Meşet Elî dibêjin. Berê li vir bi mermerên ji rengê qehweyî berdnivîsek hebû. Lê ev nivîsek di sala 1881'ê de winda bûye. Li ser nivîstekê di derbarê zagon û rêzîknameyên wê demê de pir cure nivîs hatine xwendin.

Wekî ji destana Mem û Zînê jî tê zanîn, zindaneke kelehê jî heye. Dîwarê zindanê bê kumbet in. Li ser milderiyên wê yên daketin û rojava bi figurên ku dişibin kevilên kuviyan hatine arastin kirin. Her çiqasî bê gotin di zemanê xwe de di vir de pût hebûn, lê li paş tu şop nemane. Xerca keviran ji ber ku ji guleyên helandî hatine çêkirin, avaniyek bimirê e. Di heman demê de zindana ku Mem ne-

fesa xwe ya dawî lê daye jî ev zindan e.

Di nava kelehê de ciyê berê dêr lê bû, niha li cihê wê mizgefta mezin hatiye ava kirin. Kengî dêr hatiye xerakirin û li ciyê wê mizgeft hatiye çêkirin, ev nayê zanîn. Deriyê Mizgefta Mezin (Ulu Camî) di warê dîrokî de xwedî nirxeke bêhempa ye. Ev mizgeft ji aliyê zanyar ê fen, werger (otomat) û sîbernetikê Ebûlûs Îsmail ku, ew bi xwe Cizîrî ye, ve (1153-1233) hatiye çêkirin. Li ser mizgeftê gelek motîfên ejderha, eylo û şêr hatine çînî kirin. Dîsa gelek lêkirinên tunç jî hene. Ev jî taybetmendiyeke xas yê mizgeftê derdixe pêş. Her çiqas heta niha hewildanên berhemên wekî vana bîne çêkirin çêbûbe jî, lê bi ser neketine. Berhema navê wî derbas dibe xwedî kompozîsyoneke xurt û motîfên balkêş e. Ji van pêvedanan yek di sala 1969'an de revandine Kopenhagê. Yê dinê jî li Kevnargeha Stenbolê dimînin. Deriyê mizgeftê jî niha li Kevnargeha Topkapiyê dimîne.

Di nava kelehê de avaniyek din jî Mizgefta Mîr Ebdal e. Ev mizgeft ji aliyê Emîr Ebdal Seyfetîn ve hatiye çêkirin, loma navê wê dane mizgeftê Mîr Ebdalê bavê Mîr Zeyneddîn e. Mîr Zeyneddîn wekî tê zanîn di sala 1451'an de di bûyera Mem û Zîn de rolekî pir girîng listiye. Di qata mizgeftê ya binî de Turbeya Mem û Zînê ya ku bûye mijara destanan dimîne. Li aliyê başurê mizgeftê medrese, dersxane û mescîd hene. Li bakur û rojavayê wê jî wargeha telebeyan a kevin (xera bûye) û lojman (xera bûye) hene. Qismê mescîdê yê li derve mîze dike ji mermerên spî ne. Bi motîfên cihê xemilandî, mîhrabeke ji mermerê çêkirî jî heye li wira. Dema mirov pêplengên turbeya Mem û Zînê dadîkeve jêr-zemînê, li aliyê rastê tirbên Mem û Zînê, li ber seriyê wan jî qebra Beko Ewan tînin. Turbên Mem û Zînê mirov dikare bibêje hîn vekî berê ne û qet mehilandinek lê çênebûye. Lê qebra Beko Ewan her tim xera dibe û jî ber vê yekê salê carekê jî nû ve tê selihandin. Sedema vê yekê kesên tene serdana tirbeya Mem û Zînê nikarin pêşî li hêrsa xwe bigirin û qebra dirûxin.

Ji taybetiyên kelehê yek jî Birca Belek e. Birca Belek, di gelek berhemên nivîskî de bûye mijara destan û helbestan. Birca Belek di sala 1596'an de ji mîregên Cizîrê Şeref Bîn Muhemed daye çêkirin. Hostatiya bircê kesekî bi navê Hana kiriye û ev kes xirîstiyân bû. Birca Belek navê xwe ji dewlemendekî cihû digire. Ji ber ku Birca Belek bi alikariya dewlemendê cihû yê bi navê Belek(!) hatiye çêkirin. Navê wî lê hatiye kirin. *(Lê Belek, bi Kurdî, Kurmancî navê rengên reş û spî bi hev re ne; mînak Karika Belek, Çeleka belek. Kevirên kelehê jî reş û spî ne; divê ev jî neyê ji bîra kirin, kovara Wyê)*

Birca Belek çar koşe ye û hemû dîwar û

qatên wê bi kevirên reş û spî hatine nijîn. Birc jî dîwarê kelehê destpê dike û ber bi çem ve diçe. Her ku ber bi çem ve dirêj dibe teşeyê wê tê gûhartin û wekî qoqizekê derdîkeve pêş. Li gorî efsaneyê tê gotin di zemanekî de bajarê Cizîrê ji aliyê kuliyan ve te leyandin (dagirî, îstîla). Hemû çandîni bi talûkeya tunebûnê re rû bir û dimîne. Lê di vî navberê de gelek legleg derdikevin û tene bajarê Cizîrê. Legleg kuliyan tune dikin û milletê li bajêr jî ber talûkeya xelayê rizgar dikin. Gel jî li hember vê qenciya leglegan minetdar dimînin. Li ser vê yekê jî bo gel, minetdarî û spasdariya xwe bide nîşandan hemû kevirên birca ji rengê leglegan, an reş an jî spî çêkirine. Her çiqasî Birca Belek heta niha li ser linga mabe jî, gelek beşên wê xera bûne û kevirên wî rijiyane.

Dema mirov bi giştî rewşa kelehê dinêre, hema hema her gavê mirov rastî qirçirineke dîrokî tê. Ew berhemên dîrokî yê bimirêş jî ber dihn nedanê û nexasim jî ber şerên giran yê sedsalên dawî di gelek hêlan rûxiyane û mehilîne, mehiyane. Bêguman, pir berhem hene bi polîtîkayeke zanebûnî di bin talûkeya tunebûnê de tene hiştin. Balkêşe ku hinek avahiyên mîna Qışlaya Hemîdiyê tê girtina bin parastinê û lewma li ser lingan dimîne û hebûna xwe diparêze. Lê li miqabilê vê hed û hesabên windabûnê nîne. Jixwe revandina hinek berhemên êdî wekî rewşek rûtîn lê tê mîze kirin. Mîna ev jî nebes be gel jî kevirên kelehê dibin û di çêkirina xaniyan de bikar tînin!

Ji Keleha Cizîrê îro bitenê beşa li aliyê Dicle mîze dike, li ser lingan e. Ji beşên din her çiqasî bermayîyek hebe jî lê pir rûxiyaye û nayê nas-kirin. Hem Keleha Cizîrê û hem jî avahî û berhemên di zikê wê de, her yek li gorî xwe çirokek an jî taybetmendiyeke xwe yê xas û hêjayên vegotinê heye. Ji bo ku em çand û dîroka xwe biparêzin, li gorî yeqîniya min parastina berhemên li wira peywireke lezgîn e. Berevajî vê bi van rûxandanan re dîrokek wînda dibe.

Bê pêwendî û bê eleqetî hem mirov û hem jî berhemên dîrokî diqedîne. Lewra ev berhem şahîdên dîrokê yê zindî ne. Di heman demê de îfadeya hest û hîsên bîrdariya gelên xwediyê wê ne.

Belqîs, Heskîf, Keleha Cizîrê û Sûrên Amedê; ev hemû nirx û devlemendiyeke me ne. Ayidî me ne. Lê mixabin em nirx û qiymeta wan nizanin. Lewra em çavên xwe li rabirdûya xwe digirin û zêde li pêşeroja xwe mîze nakin. Bi çarenûsa berhemên wînda bûne, em nikarin li yê mayîn binêrin. Xemgînî, êş û hêrsa me ya li hember nirxên me yê windabûne pêwîstiyê dike ku em vegerînin hest, hîs û ramanên parastina nirxên heyîn.

Albûma kuştîyekî

Hoşeng OSÊ

1

Kelecana şêwekar, weke çûkek ji ber ba û baranê bipirpite bû.
 Li aliyê çepê, daristanek, ji ber qolincên zayînê, digirî.
 Li aliyê rastê, kalemêreke zer bi jineke şîn re radizê.
 Li paş xwe ne dinerî...
 Bê çawa ba, diranên xwe qîç kirin...
 Û du kûçikên kef bi devên wan ketine, dirên.
 Xayinek kêra xwe tûj dike û çavên xwe berdaye dara gûzê.
 Şêwekar, piştî xwe da tabloya xwe.
 Kefa sawêrên xwe di mijê da... û çû.

2

Dema dengê yara wî li guhê wî dide...
 Dilê wî, weke dilê hehecîkekî, disincî û lêdide.
 Siya xwe di gewriya mirinê de çand û di oxira razên wateyan de çû.

3

Siwarekî ji sînga xwe ve birîndar, ji ser piştî hespa xwe peya bû.
 Desmala xwe ya bi xwîn li gerdena hespê pêçand.
 Destê xwe li qûna hespê xist û wê şand destana Siyamend û Xecê.
 Gustîlka yara xwe xiste bin zimanê kevokekê...
 Dara hejîrê hembêz kir û di xew de çû.

4

Hîna çar demsalên peyvan ji zayîna vî cemî re mabû.
 Hîna sê welatên boz ji zayîna vê xewnê re mabû.
 Hîna du dojah, ji dawîya vê janê re mabû...
 Û hîna nuh xur bi memik û gewdê wê ketibû...
 Surek bayê hênîk, li xeyalê xist û wê ji çixara wê, ji fîncana qehwa wê, ji lîstîk û teşqeleyên wê...
 bir û çû.

5

Her ku li wêneyên albûma xwe dinerî...
 Çênedibû şûna wêneyan neguhêze.
 Çênedibû wêneyekê dernexîne û ne çirîne.
 Çênedibû negirî.
 Çênedibû xwe nekuje.

Şîrîn Elemihûlû

Kamran Simo HEDILÎ

pêlên xeyalan
 xoşewîst radimûsan
 dê û bavên dilşewitî tu pêşwazî dikirin
 çiyayên vînê
 di hembêza te de rûdiniştin
 teşîya ramanan
 bîranîn dirêstin Şîrîna min...
 teqereqa deriyên hesinî
 fermanên bêtêlan
 kurtepista bêdengiyê
 xişîna reşkujiya sêdaran
 te dibihîst...
 xemgîniya tirsê kon didanî
 lê hişyarî mêvan bû û rê ne dida girî...
 te li hêza ku
 nijadeperestên kor nizanin
 û li dilên şîrikên xwe guhdar dikir
 hejandina rojê te dît...
 di nalînên çîtikên Firat û Aras de
 xoxa azadiyê te xwar
 "azadî ne tenê şadiyê tîne
 mirovan dike mirov"...
 sibehan zû Xwedayên kujer
 ferîşteyan dikujin
 di aramiya sibehê de hatine kuştinê...
 ba xweşbêhna te belav kir
 gul gerdena te maç dîkin
 û ez
 dibime Merşa bin piyên te
 dibime şehê
 şekirina gûliyên bixwîn
 dibime berbiska biskên te...
 mîna qurbanê
 sinorê pîroziyê derbaskirî
 dilerizim
 di êşa berxwedana te de...
 zarokên Înanna û Arîna
 li bedenên Ur û Hatûşa tifikan pêdixin
 çûkên başûr bêdeng in
 gurên herêmê li bakur dizûrin
 û di bagera xwe de
 gêj bûye dîrok...
 sibeha dubêhn ji deqa eniya te dizê
 ji bêhna yekem Leyla Qasim vedigerê ber sê-

darê
 ji a din zindîtiya tekoşîna jiyanê...
 pakrewanan sibeha te silav kirin
 sibeha te reng daye nehê Gulanê
 hezkirina ji hezkirina te dilşadî ye
 mîna hezkirina rojê ji xwe bihurtine...
 tu roniya wijdana cîhana min î
 bayê bakur asîman anî wir
 tu roja rojhilata min î...
 li aliyekî jinên bihêrs
 li aliyê din zarok hildikişin
 penceran vedikin
 da Hecheckên çavtirsandî
 û kevokên bûkaniya te werin
 xoşewîstî tu yî keça Ararat...
 mizgîniya fereca xêrê dibiriqîne
 mîna biriqandina dilê te
 çerxa felekê
 di govenda hevdozên te de vedigerê...
 tu vehese û raze
 te doz nivîsand
 siyê li dîwarê girtîgehan lêdan û jana hestiyar
 Dêrsim û Enfal nivîsandin...
 kêliya qêrînên te
 perdeyên guhên Xwedê didirandin
 te bawernameyên hemû zanîngehan dirand...
 bi xeyalên mirî, mirin anîn
 xwestin çavên wê bibîne çavên te
 te çavên xwe kirin peyvên zanan
 kirin ayînên bêdeng û niyazên derwêşan...
 çavên te bûne çira civata nîvmirî
 bûne guhdarkirina devên girtî
 û axaftinên bêdeng...
 çavên te xweşikî anîn
 çavên xwe
 bi deyn bide min
 da li te û bîrdoza baweriya te binêrim...
 leyîstikvanên şanoya xerabiyê
 rûyên maskekîrî
 sêdar li sêdarê barkirin
 û çarmixek ji penc sêdaran çekirin
 dilên reş û destên tarî hûn fedakirin...
 tişteke li çaxên çûyî zêde nekirin
 ji Daryos û Xelîfê yekem ve

jehra sêdaran kêmbû li vir
 lê kaniya dadweriya Keyxosrew
 û evîna Şîrîn û Ferhadan jî ziwa nebû
 şevên her çaxî şev in Şîrîna min...
 derve ronî ye û derî vedikim
 stêr di valahiyê de bûne tîr
 ewrên şuştina tawanan
 Tofana Nuh dibînim...
 li ayînên şadiyên olperestên sexte

seyê pîr di nav xwînê de mirî
 qerqotê bavê gurên boz
 di newala kuştinê de xeniqî dibînim...
 ez hêza
 ku çiya kirine bajarên bêdîwar
 kulmên bilindî asîman dibin
 ala rûmetê Gerilayên hevalên te dibînim
 keça warê Celaliyan
 xweşika êla Mihoyîyan Şîrîna min...

Xatirxwestin

Kemal DEMÎRBAŞ

Di stûyê me de
 Giraniya kevîrê aşê demê
 Di laşên me de
 Çîrokên birînên me yên emkuştî
 Û di dîlitiya me de
 Jana birînên nêmgirtî
 Û tarûmariya têgihgehên me
 Yên ku di şevên mirînên me
 yên westiyayî de tî bûne

Û em
 Di devdasiya dema ku rewşkurdiya me dihêre de
 Binbarên ayetên secdegeha sebra şerê xwe ne
 Xweserwest û wextserwestkirinan de
 Bi tenê
 Bi xatirxwestina bi dil
 Û bi dibetiya bêveger pêk hat
 Û em çûn
 Çûyîna me
 Çûyîneke wisa bi êş û hêvî
 Û bi azweriya ayetên awarte bû
 Hingê me
 Dagirkeriya wexta ne serwest
 Di rûafitaba dîlbera xwe de
 Bi hilmeşandina helwestên harbûyî
 Serwest kir

Metropol

Berfo BARÎ

Dil, ji linga paş de maye
 Û saet
 Di pêşiya dil de.
 Lez'a tusunamîyê ye jiyan
 Di bin pêlên wê de
 Hawar!..
 Li peravên wê xistiye
 Hest û hez!!!
 Li vê derê
 Mirov li ber rehma pere ye!

Lawiko

Mem FERAT

Ji Andok Dorşîn (Sacît Bayram)
û Zana Hekîm re (Mesut Sakîn)

Heft çiya, heft deşt, heft zozan digêrî lawiko
 Ava heft çeman vexwar bi hesreta welatekî
 Rê bi baweriyek ciwan vemalt
 Li pêy kenekî geriya bi dînîti
 Li peravê spîndarekê hesin avêt
 Bû gulî.
 Çi digere lo!..
 Çi digere li vî bajarî?
 Ma tu nizane dîno
 Vê êvarê reş diherike Zergan
 Qoser mîna nîfirek dêmarî.

Lo Lawiko vegere warê xwe
 Kuçe teng e, heta sibehê teng e
 Piranî betal nekiriye mêranî
 Navê te li asîman xêz kirî ye stêrka rijiyayî
 Lawiko lo!
 Ev roj ne roja rahmetê yê.

Serê xwe danî ser balgiya ji dîlopek hêsir ce-
 midî
 Germ bû bi xwesteka hezkirinekê lêv
 Dema dil rûyê hesretê paç dikir
 Yezdan liviya bi qêrîna zarokekî
 Û
 Sivik ma halanên hozanan yên qehremanî
 Sivik ma mirin bi qasî xewnerojkekê
 Lo lawiko, girantir e barê jiyanê.

Li deşta Mêrdînê rêyek dirêj ma
 Ma alanvedana stranek dengbêjî
 Vê şevê bînimêje kenê biharê
 Li perê Qoserê Evdalê Zeynikê digrî
 Lo Lawiko
 Ji hemû qeliştokên vê axê dengê Evdal tê
 Digirî, digirî, digirî bê hêrsa kenekî...

Lo Lawiko
 Kata nîvqurmiçî
 Xak bi mirinê sar bû
 Bêtir har e êdî
 Li erdnigara dil girekî ne vemirandî
 Dibe şopên belawela
 Xwezî cihê tu lê ketiye bibe derya.

Vê êvare bêtir dûr xuyaye çiya
 Bablisok li kolanên teng dide alan
 Û
 Nîsan bi dengê Evdal dibêje:
 Di nav hemû baxçeyên zindî
 Yê li jêr stêrka bakurî
 Deng jî pirin, reng jî pirin, lê
 Bila dayika we tenê bêje
 “Min ji xwere lawek anî”

Hevpeyvîn bi Çîdem Baranê re

Hevpeyvîn: Fatma SAVCI

Hêdî hêdî jinên çîroknûs û romanûs xwe bera qada wêjeya kurdî didin û dest û milên xwe bi ser bêdengiya qetran de dihejin. Gotinên di gewriyan de dîl û dilmayî bi bask dikin û hezar kevokan ber bi ezmanê zimanê qedexê ve difirînin. Peyvên xwe yên veşartî ji kalanan diderînin û di birîna bindestî û bêdengiya xwe ya kûr û dûr de diçikînin. Belê yek ji wan jinên ku xwedî xencereke kalanî ya bi pelkên nefela gotinê neqîşandîye Çîdem Baran e. Romana wê ya bi navê "Li Peravên Torê, Torên Evînê" beriya bi mehekê ji weşanxaneyê Ronahî derket. Romana wê ya duyem jî amade ye û di demeke nêz de wê were çap kirin. Çîdemxan li ser jiyana xwe û hest û hizra xwe ya li ser nivîs û romanê axîvî.

Tu dikarî xwe bidî nasîn?

Ez di sala 1985'an de li gundê Bamizrût ku a niha girêdayî Kerboranê ye hatime vê jiyane. Di heman salê de ji ber bend û hola gund me bi malbatî koçî Êlihê kir. Ji wir û heya a niha em li vir dijîn. Em du keç û du kur in. Ez ya herî biçûk im. Ya herî nexweş jî ew bû ku hîn di yazdeh saliya min de cara yekem ji ber sedemên aborî em bi malbatî ji warê xwe dûr ketibûn. Jixwe gava cara yekem hat ew carên din jî hatin. Lê belê tu caran me xwe fêrî biyaniyê nekir. Tu carî bi wî çavê ku em ê ciyê xwe li biyaniyê xweş bikin me lê nenêrî. Mîna qulingên ku havînan biçin zozanan û zivistanan jî vegehin germiyanan, em jî havînan diçûn bajarên biyan û dîsa em vedigeriyan welêt.

Heya 2008'an bi wî awayî derbas bû. Di 2009'an de jî di kargeha mamoste Fewzî Bîlge de min cî girt. Ji wir û heya a niha dersên wêje û wênesaziyê dibînim. Pêşî min li Kurdî Der a Êlihê dest bi mamostetîya Zîmanê Kurdî kir, a niha jî di fêrgeha Orhan Dogan de dersan didim. Sirûştîye ku nivîsandin bê navber didome û difikirim bi saya serê kesên weke Mihe-med Ronahî di demeke herî kin de romana xwe ya duyemîn jî biweşînim.

Romana te ya yekem derket, ev hesteke çawa ye?

Ez dikarim bêjim ku ji 2010'an û vir ve ez bi wêjeyê re zewicîme. Ev romana min jî zaroka min a yekem e. Di nezera çavên min de ew zarokeke nemir û gelekî henûn e. Gava ku dayîk nû bi çav zaroka xwe dikeve ewqas êş û zehmetiya xwe wê gavê bi giriyê zarokê re ji bîr dike. Gava nû çavên min bi halê romana min a çapkirî ketin hêstên dayîkeke ku nû welidî be bi min re çêbûn. Bi kurtasî ev hêstek ewqas pîroz e ku bi hêsanî pênase nabe.

Çi hestê, çi fikrî, çi janê roman bi te da nivîsîn?


Ez ji vê bawerim ku çawa hezkirina her bûnwerê ya li hember çêlikên wan xwezayî ye nivîs jî tişteki wiha ye. Gava mirov nû çêdibe ew bi mirov re heye. Lê nayê wê wateyê ku mirov lê xwedî dernekeve wê heya û heya bidome. Gava mirov wê

xwedî bike, wê goşt û xwîn bigire. Lê mirov lê xwedî dernekeve wê bimire. Gava mir jî ji mirinê re çare tune ye. Ya min jî ji pêşî ve bi min re hebû. Lê li der dora min hema bêje tişteke tune bû wê xwedî bikim. Piçik û pariyên ku ne li gor dilê min bûn min didanê. Têr nedibû lê nedimîr jî. Hema li ser piyan bû. Di nava diwarê polê de mîna zarokeke feqîr mezin dibû. Heya ku rojekê bi alîkariya Mamoste Fewzî Bîlge rêyek di wî diwarê polê de vebû. Wê gavê ma ne romanê dilê min hênîk bikira, wê çi dilê min hênîk bikira? Mîna kesên tî ku li çav golekê bikevin û xwe bi dest û lingan ve bavêjinê. Ya min jî an ancax romanê têhna min veşkandibûna. Avjenî di romanê de hêsanî e. Di romanê de

mirov bêtir hebanê xwe dikare vala bike.

Mijara romana te çiqas li ser buyerên rastî ye, an çiqas xeyalî ye?

Ji bilî lehengên min Wensa, Salih û Marogê hema bêje mekan, bûyer û lehengên din rast in. Lê



min navên hinek lehengên xwe guherandine. Min tu lehengên romana xwe raste rast nedîtine lê bi sedan car min ji malbat û ji derdorê bihîstine. Herî zêde jî Pêrûza Dêwanî hema bêje her roja Xwedê di jiyana min de dibuhurî. Gava ku jinekê dengê xwe bilind bikira ya gotina wan a yekem ew bû ku digotin; “Keçê ma tu bûyî Pêrûza Dêwanî ku tu dengê xwe li ser yê me dixî?” Jineke ji xwe bawer dîtibûna wê dişinabandin Pêrûza Dêwanî, Pêrûza Dêwanî jî dişibandin mêran. Ji ber wê jî gelek bandor li min kirine ku min ew di romana xwe de bi cih kirine. Ji bilî wê rastiye rastieyêke din jî heye ku gelek hêst, fikir, raman, xem û xeyalên min bi kesayetiye wan re çûne û hatine.

Lehengêk ji yê romana te jineke axa ye û li gor wê çaxê bi dad, dilovan û dilşewat e, ma tu dixwazî bi vê lehengê çi bidî diyar kirin?

Ji ber ku di der dora min de ew leheng pivana jêhatîbûnê bû hîn ji biçûkantiya min ve gelekî bandor li min kiribû. Her çi qas kesên derdora min çî jin çî mêr bi serokeşiriya Pêrûza Dêwanî dizanîbûn jî mîna ku jin bi kêrî tişteki nehatiye û wê neyê difikirîn. Lê her dayîm mîna ku tu jî dêbêjî; dilovanî, dad û jêhatîbûna wê li ser zimanê wan kêr nedibû. Lê mixabin rastiya wan jî ev e jinên ku kesayetiya xwe dabin qebûlîkirin wan ne wek jin wek mêran dibînin. Mînak ku dibêjin; “Jineke mêranî ye, jineke mêrxas e” û hwd. Bi kurtasî peyama min a pêşî ku min dixwest bêjim, dem çî dem be bila be, jinê her dem li Kurdistanê roleke girîng --ger me mafê wan teslîm nekiribe jî- listiye. Kesayetiye weke Adîle Xan Xatûn, Fatma Reş, Fatma Domanî, Medîna Dêrxalibî, Zeyneba Gêrî û hwd... Lê kêfxweş im ku a niha jin lehengên jin dinivîsînin û ez bawerim wê

hîn bêhtir û baştir jî bên nivîsandin. Ez jinek im û pir sirûştîye ku di pirsgerêka jinê de şiyar û hêstiyar bim. Ez bi dehan, bi sedan romanên jî binivîsim wê têra vegotina tekoşîna jina kurd neke. Lê de axir jinên kurd çîroknûs, romanûs, helbestvan û hwd hene.

Lehengên romana te yên mêr piranî xayîn, sextekar, yan gêj, yan virek in. Ma gelo te bi zanebûn ev leheng hemî zindî kirin di romanê de, an na?

Ji bona ku ez wan lehengan zindî bikim, ez qet li wan negeriyam. Neketim nav afirandineke xeyalî. Jixwe ew hebûn. Tenê çiyek ji wan re diviyabû. Min jî bê ku mîna pîne bisekinin di romanê de bi cih kirin.

Di romanê de her du lehengên te yên se-reke li hember jiyane û astengiyên wê pes dîkin, yek xwe dikuje, yek jî wenda dibe, çima?

Her xwendevan mîna wêneyekî razber dikare li gor xwe şirove bike. Lê ez dixwazim vê bêjim jixwe her du jî ji zû ve miriyê cebanan bûn. Lehenga min hîn di roja daweta xwe de dimire. Lehengê min jî gava ku pê dihesa lehenga min zewicî ye dimire. Ji ber ku herdu jî hema kevelê wan li wir mabû nikarîbûn li hember astengiyên jiyane bitekoşin û xwe dispêrin qederê. Qedera ku jixwe hîn di serê romanê de ne alîgirê wan bû. Wekî din jî dikarim bêjim heya ji min hat, min bi bergeheke rastiya civakî bûyer tevinand. A rast ez naxwazim dûdirêj qala lehengên xwe bikim, jixwe yên ku romanê bixwînin wê pir zelal wan bibînin.

Şev e Dilşêr BÊWAR

wek seyek tûle
di bin kuliyên berfê de
ji kuçeyên gundê me yê kavilîkirî
berhev dikim
nalina kemana tayên porê te qemerê
û
ji vebîşîrîna te difesilînim
hêviyan
li ber hêstrên mê yên hatine teloqîkirin.
îşev
bi teniya pêrxîngan dineqîşînim
eniya helbestên
ji xweliya nava sing û berê te dipijîqin.

Ziwanê apêdayene

Sînan SUTPAK

Edebîyatê Fekî/Devkî

Pîrikan û kalikanê ma bi ziwan dê may da xo ya janê xo, janê derd û kulan dê xo ard ziwan. Qandê kî îmkânê nûstene ci dest ro geriyaybi ziwanarden da janan dê xo rê ray û raybazê bînî keftnay. Bi o babeta edebîyatê Fekî (Devkî) bi xurt. Bi dêrana, estanikana, Fabilana, xeberojkana, dilokana û stranana hissê xo ardî ziwan, day tever, cematîya kerdî bara. Bi nê babetana edebîyatê fekî hêmayana xemiliya, bi o ahenga bi hîmê edebîyatê ma yê ewroyênî. Kalikan û pîrikanê ma dejê xo defina kakil dê hêmayan, kakil dê newa(melodî) yana mûnd û rijna mezgan dê tezan ro.

Digel heme tûfan, serebotan û talanan dejê verênan dê ma kakil dê edebîyatê fekî de nimite mend, ziwan dê dengbêjan sero her şevbihêrke de newe de ra emiliya, aheng girot. Bi goştareykerden da a apêdayena ma esl û neslê xo silasna.

Asîmîlasyon / bişavtinê cematîkî

Kolonyalistan nêverda domanê welat dê adir û rojî bi ziwan dê may(Dayik) da xo ya biwanê, bimûsê, binûsnê. Bi emeldo kî “Qandê kî ti şarên beyntar ra hewadê lazimo ti verê verikan ziwanê ê şarî çinêbiyaye kere” ya çekû bi çekûya ziwan dê may da ma yê erciyayî cenê axu dê zuray kerdên ro. Qandê kî qeçan/qijanê şardê ma bişibnê xo. Wenden û nûstena bi ziwan dê zûraya kerdê mecbûrey. Qandê a mecbûrverdayene çiqî kî serdestan dest ra ame kerd û kerdên da x ora can êmendî. Qisekerdena bi ziwan dê maya kerdî qorî. Ajan û sîxurê xo devistî cematê ma mîyan; kuçe bi kuçe, dew bi dewe, keye bi keye vist qontrol dê xo bin. E kî bi ziwan dê may da xo ya qisey kerdî ro ceza dê qisekerdenan dê bi ziwan dê may a dayê û veyşan ageyrayê dewe.

Virardenên da pî/bab dê mi estîbî. Vatê “ma mast, penîr bedrê rotê. Ma waştê kî sabûn biherînê/bigîrê. La ma nêwetardê bi zazakî qisey bikerê. Qorî bi. Ma şîyê dûkan ser û ma vatê “sabûn mabûn lot pere”

Asîmîlasyonê Mekteban

Polîtîkayanê asîmîlasyon/bişavtene tewr vêşêrî bakûr dê kurdistanî de û mekteban de, viraştên da komar da tirkîya tepîya sistematîk ame ramitene. Nimûneyê nê asîmîlasîyonî o kî na wer da muqe-

dese sero ameyo ramitene rî dê erd dê dinyay sero çinîyo. Raştay da x ora dûrî vistene, raştay da xo ra şermayene bî encamê nê asîmîlasîyonî. Na jû bi mi-jara filman dê yeşîlcamî.

Domanê/qeçê şarê kurdî hetanî 5-6 serrey da xo bi ziwanê may da xo ya bî girdî, cisyay, nameyê çîyan mûsay. Ey seran ra tepîya mektebanê dewan de, mektebanê rakewten de (yatili) asîmîlasîyon ra ravêrneyay. Dek, dolap û dezgeyanê asîmîlasîyonî mîyan de perwerde kerdî. Bi vatenên da bîna, qandê asyên da zûray qandê raştay da xo ra xerîb kerdene çiqî desthilatdaran dest ra ame kerd û ê kerdênan dê x ora peyra nêmendî.

Wexto kî maş îyê mektebê verênî ma şewra rewê bi tersê werden da kotekana, kotekanê mamosteyana şîyê mekteb. Qandê kî ma ziwanê xerîbî bimûjê, rêbaza mamostan a tewr verêne kotekî bî. Wexto kî ma nêzanayê bi ziwanê tirkîya sondê tirkî biwanê, mamosteyan vatê “Elînî ûzat!” (Destê xo derg kî) Engîştê ma panc heme ardê pêhet û “mamosteyî” bi çîwe, bi şiv û bi tûjey da cetwelîya dayê nenguyanê ma ro.

No ware de vîrardenen da mi esta: Dersa “sosyal bîlgîler” de mamosteyî di rûpel û nîm dêbî ma. Û vatibî “lazimo şima na derse hemê ezber kerê” Ez a şewe nêrakewta. Mi a derse heme ezber kerdibî. La mi nêzanayê kî o çîyo kî mi ezber kerde se vano! Mi meştêrî dersa xo ezberê wendibî la fina zî qandê kî mi bi ziwanê tirkîya weş nêvatibî mamosteyî vatibî “To çîrê rind ezber nêkerdo? Wexto ma navber danê (tenefus) ti şîne vanê “embaz bê ma dame kaykerê”, çîrê ti derse ezber nêkenê?” Û bi cetwela daybi mi dest ro.

Na vîrardene de çîyo kî tewr vêçêrî tesîrê ci mi sero mend a jûya kî, mamosteyî ê vatenî bi ziwanê zazakîya mi rê vatibî.

Apêdayena Zurayî

Bi nê babetê dekê dolabana ma mecbûr verdayay kî ma bi ziwanê serdestana biwanê, bimûsê û bidê apê. La janê ê kotekanê dejê ê kerdênan, qadê qiseykerdan da bi ziwanê maya cezaya kî kalikan û pîrikanê ma ro amebi birnayene ma vîra nêşî. Leymê ê kerdênan ma zerî ra nêsoya. Hetanî dereceyên bi musnayen û apêdayen da ziwanê xerîbîya fikirîyayeno, behremî vetene yeno

famkerdene. Ewro roj heme roşnvîrê m ana jiwere sero hemfikirîyê kî bi apêdayen da zurayî ya bi ziwan dê serdesteya sîyasetê kurdî, politikayê kurdî ray ra nêşino, edebîyatê kurdî ro kêverê neweyî nêakeno. Ronasansê kurdî bi ziwan dê xerîbîya nêvirazêno.

Her Tekoşîne Ziwanê Xo Welidnena

Şarê kurdî no hîris sero kî lêver dê zilm û zorî de tekoşînên daya destpeykerdene. Tekoşîna şarê kurdî qandê aştî û demokrasî da cematê xo ya. Tekoşîna şar dê ma ameya derece/radeyên do winî kî bê ziwan dê kurdî sîyaset û politikakerdene qebûl nêkena. No ware de nerazîyeya nustoxan dê şardê ma nustan dê ci de xo dana tever.

Bi na apêdayen da bi ziwan dê xerîbîya, bi ziwan dê serdestana sîyaset, politika û dîplomasiya şar dê kurdî ray ra nêşina. Ziwanê asîmilekerdene êdî qîmê kerden da nê sîyaset û politikayê nêkeno. Sazîyan dê şardê ma de hetanî kî bi ziwan do xerîba dayen û girotene estibo sazîyan dê ma de psîkolojiyê kurdî nêbeno hakim, manewiyatê kurdî do lewaz bo, zêif bo, tamsal bo.

Babeto tewr verên o kî destîrmayê doz da kurdî, ê kî qadan dê legalî de xeftênê sero vinderê, rewşa xo çim ra ravêrnê wareyê ziwan dê apêdayeno. Apêdayena merdimî bi kamcîn ziwana bo mezgê merdimî bi o ziwana girweyêno. Mezgê merdimî zey dê erd/ hêga dê karîteno. Erdên/ hêgayêno kî ti bîramê û ti tede çiçi bikarê ti do mexelê ê toximî hewadê. Apêdayena merdimî goreyê têgihan mexel dana. Serdestan hêgayê mezgê ma bi emelan dê xo ya ramit, bi ziwan dê xo ya karit. Toximo zûray hêga dê mezgê ma de kariya. Apêdayena ma zexelay de virazîyê. Çikî goreyê şit dê may da ma nêbi. Guman çinyo kî mexelê koriten da zûray do zexel bo. Ma kî bîme haydarê na jiwene û ma karitena zûray qebûl kerdi tepîya karê ma o tewr verên oyo kî ma a karitena zûray, ê toximê zexelî xo mezgê de bihelisnê û herûn da ey de toximê ziwan dê may ra xo mezgê bikarê. Qandê na karitene ma wihêrê/ wahêrê îmkanan dê girdanê. Saye dê canfedayan dê şar dê ma de, sazî û dezgeyê kî virazîyayê û vijyayê beyntar, îmkane kî ma pa bişê xo newede ra virazê estê û vêjî yê.

Ziwanê Apêdayene û Sîyaset

Tekoşîn da demokrasî de rola/ rista sîyasetî yena zanayene. Ramiten da sîyasetî, kerden da politikayê de rola ziwani, tesîrê ziwani zî wahêrê hesirên dê xoserî yo. Renga xo dano karî.

Ware dê ziwan dê sîyaset ramitoxan dê şar dê ma de her civîn, panel û kombiyayîşan dima minaqeşey virazênê, rexney yenê kerdene. Sîyasetmedar

û hunermendê şar dê ma, ê kî vanê “ma nêşenê bi ziwan dê may da xo ya xo îfade bikerê” benê mijara rexneyan û bal ancenê xo ser.

Tayn roşnvîrê tirkî billa heq nêvanê “hetanî vizêr nameyê qeçan/qijan dê înan bi tirkî bi la înan tirkî nêzanayê qisey bikerê. La ewro nameyê qijan dê înan heme bi kurdîyê la ê nêzanê bi kurdî qisey bikerê.”

Apêdayen da bi ziwan dê maya de rista Azadiya welatî

Verê verikan no kar karê roşnvîr û nustoxan dê şar dê ma yo. Lazimo renga apêdayen da roşnvîr; sîyasetmedar, politikakerdox û dîplomatan dê ma bîvîryo. Na jû kerden û caardenên da asane nîya! Seretewnayenên da arizî lazim a. Hêcayey/ erciyayeyomna seretewnayene bi sozê dê şehîdana girêdayê ya.

Ware dê kemaney da kararden da ziwan dê may de xeylekê nustoxê şar dê ma A. Welatî de nusnenê. Bi nustenên dê erciyayana bal ancenê nê egerî ser. Birêz Î. BABAOĞLŪ, Welat XOSER, Serhad AMEDİJ, û xeylekê nustoxanê edebîyata zazakî/kirmanckî û bi nustan dê kurmanckîya zî no dem do peyên de birêz Evdila KOÇERÎ xeylekê nusteyê balantey nustî. Ahmed Biray, ...NÊSITEYÎ zî no ware de xeylekê finî sereboranê xo, vînaneyê xo ardî ziwan û ma wendoxan nê nusteyê erciyayey A. Welatî ra wendî. Nê nustoxê erciyayey bal ancenê kuçê û kolanan dê Amedî ser, dayen û giroten da mîyan dê sazîyan dê şar dê ma ser. Birêz Evdile KOÇERÎ Name nabi pa “Kurdên turkîaxêv”

Bi arizî ziwanê zazakî/kirmanckî lazimo meridm sero vindero çikî ziwanê kirmanckî/zazakî talûke dê vînîbiyayene de yo.

Potansiyelo kî şar dê ma mîyan de zaf xurt o. Wexto kî roşnvîrî serkêşey bikerê û potansiyelî vejê beyntar kes texmîn nêkeno kî do netîceyên do senîn bivijyo beyntar!

wazena kî tîya na mijare sero mînakên/nimûnên bida. Verî A. Welatî de hefteyên ra finê jew nuste vijyayê. Bi ziwan dê zazakîya nusteyê zaf kemî bî. Qandê coy bî kî nustoxê bi ziwan dê zazakîya nîmîtey mendê. Wexto kî Azadiya Welatî de her roj rûpelên bi zazakî nusya ma dî kî senîn nustoxê bi zazakîya vijyay beyntar. Na jû zerîya ma wendoxan kena weş, omîdê ma kena vêsî û ware dê nusten û wendan de bi ziwan dê maya ma finena cigeyra yene û lebayenan mîyan.

Rola/Rista Kovara Vateyî

Ver visten da edebîyatê kirmanckî/zazakî de rista Gruba xebate ya vateyî erciyayêya kî merdim sero vindero û bal banco ser. Gruba xebate ya kovare va-

teyî sera 1996 de Îsweç de dest bi xebata xo kerdû kovara Vateyî vete. Ware dê ziwandê nustene ê standartî de xeylekê kombîyayîşî viraştî, hewna zî ê na xebat da netewî û erciyayê famenê. Her ware dê welatî ra roşnvîr û zimanzanoxî na kome miyan de xeftêne. Her ware dê welatî ra vatenanê tewr nimitan veyenê beyntar û defînenê edebîyat dê ma miyan. Bi vatenên da bîna na grûbe ware dê edebîyat dê zazakî de jiya hîmî ronaya.

Ziwan dê Apêdayene de rista TZP Kurdî

Ware dê edebîyat dê kurdî de na tevgera şar dê ma a tewr verhera û erciyayê nê seran dê peyênan de nameyê xo devist mezg dê her kurdî. Pirsgirêkê ware dê ziwani de teniya mabên dê roşnvîran de nêverday bi şarî ya kerdî bara. Qandê kî ziwane may bibo ziwane perwerdeyî meşî, panelî, kombîyayîşî viraştî, hewna virazenê. Xebatan dê TZP Kurdî ra jû zî war dê gramerê kirmanckî de A. Welat de neşr bena.

Lazimo nê hîman sero apêdayenê roşnvîran dê ma reng bivîrnê. Hetanî ki no ware de dêsê awan-kerden da apêdayen da roşnvîran dê şar dê ma nêweşaneyê û bi apêdayen da bi ziwane dê may a, newede ra nêdawayê, tersê vînîbiyayen da ziwane dê ma ê erciyayî ma zerî ra nêvijêno. Hetanî kî apêdayena siyasetmedaran dê şar dê ma politîka ramitoxan dê ma û hunermendan dê ma bi ziwane dê may a nêbo, no ters do ma mezg ra nêvijyo.

Şarê ma bi des finana dayo ispatkerdene ke, no şar xovurnayene û xo newekerdene rê amade yo. Na jû her meş û mitîngan de, diruşme û pankartan de şarî de vineyêna û vijêna vernî. Roşnvîne ma, ray ra berdoxê ma, ê kî sazîyan dê ma de serkêşey kenê bar kewno înan mil. Ware dê xo newekerdene û xo vurnayene de gereke nê vernîyê/pêşengê ma ver bîfinê. Şar dê ma miyan de vatenê esta vanê “zeydê marî ver vîstene” Nê vernîyan dê ma rê zî ver vîstene lazima. Vervîstena ware dê ziwane dê may de.

Helbesta biharê Selamî ESEN

*Ne qasî xuya dikî rast î
Ne jî qasî xewnên min pêkbînî rastîbin î*

Duh min bihar a paşîya me de mayî dît di nivê rê de. Bêyî rawestan kulîlk vedibîyan, bi hengên newest. Esman birbisî û şerê me dinêriya. Avrêl a bi şînayî slav dida. Bihar hevaleyê ji xwe re dîtibû. Ew ne ez bûm ne jî tu. Ew ne destê te bûn ne jî çavên min. Bi tenê ew rêyên westî bûn.

*Di bajarê dil de dadgehek xemrî vebû
Navê dozê: stranên xemrî û erxewan ên ne gihayî
hev bû
Kilamên min ên exrewan
Û lorînên te ên xemrî*

Lê bihar digot heman axê we mezin kir. Lê bihar bi jan bû, hinek jî xuyang a bêdad. Min nekenand û şerê min giran kir. Pêçîkek av ne da ser lêvên te. Rêber ê saziya lêborînê jî bihar bû. Ma, em ê lêborînê jî ji liborînê bixwazin?

*Bûye sibe û ez hişyar
Çi lêzbûna Rojê he ye ku
Bila berde ku Cîhan bimîne xerîb
Min bi tenêyîyê pir kişandîye
Tu jî bi tîrsa xemgîniyê rê diçî
Roj bi Cîhanê re dereng mîne ku
Wê çi bibe?*

Bihar dibêjê ev ne teviz e. Îro jî rojan de Xecêsem e. Saet Xecê diborê heft meh. Wez di ronîya revandîya rêya te difikirim. Tu yê dîsa bifikarekî ji min û ez ê nav gotinên bi welatî de lal bibim. Dema bibe sibe ku çûk li aliye te de bên ji min nezane. Min nekarî ez wan bi aliye te re bifirînim. Dema bibe sibe ku çûk aliye min de bên ez ê ji te bizanim. Ancax tu dikarî wan bifirîni. Ji kewan heta beytikan, rengo-rengo...

*Ez ev bim û tu birefîcî
Lî paşîya me de bihar dimîne
Bila bimîne biharek din ew Avrêl...*

Her tişt di nav navê te de bihurî

Orhan ALÎCÎ

Bihar

Wî çavên xwe bi baranê re vekir. Ji nava ciyan derket. Şibake vekir û li dilopên baranê, yên wekî ku her yekî ji deryayê veqetiyaye nihêrî. Ev çend roj bûn ku baranê lê fikir kesî nizanibû. Lê hilma axê hê jî germ, bêhna axê hê jî xweş û gur bû. Wî bêhna axê dirêj dirêj kişand pozê xwe. Bi vê bêhnê sermest bû.

Dem dibihurî. Ariyê cixarê li ser xwelîdankê hêdî hêdî diweşiya. Dû ji xwe re rêyek vekiribû û di wê rêyê de hildikişiya. Çavên wî li ser cixareyê mayî, bê tevger, bê deng wekî ku tişteke kûr bifikire bi deqeyan di cihê xwe de ma. Dawiye di hundirê odeyê de bi jêr û jor de çû û hat.

Şibake vekirî bû. Bayekî hênîk bi hêstên aramî xwe digihand aliyê hundir. Ode hêdî hêdî sar dibû. Dema ku serma xwe li dora wî lefand, hinek tişt di jiyana de tevgeriya: bîra wî jî bi vê sermayê hişyar bû. Ji jiyana wî çend bûyêr hatin bîra wî. Ev bûyêr tev li ser biharên jiyana wî bûn. Lê hişyarbûna bîra wî ne hişyarbûneke gewz bû. Bîra wî wekî listikekê pê re bilîze wêneyên şîlo dianîn ber çavên wî û car din ji ber çav dibirin.

Saet wekî ku ji bidawîbûnê bitirse bi hêdîka dizivirî. Bi dengêkî çî nizm çî jî bilind şîna jiyana xwe digerland: tik, tik, tik... ji nişkê ve hemû deng birîn û tenê dengê saetê ma di guhê wî de: tik, tik, tik... di cihê xwe de sekinî: tik... meşiya: tik... rûnişt: tik, tik, tik...

Pênûs li ser kaxêzên spî reşahiyeke bêsebir bû, wekî ku bixwaze li ser vê spîtiyê tevbigere, jehra ku di xwe de tijî kiriye biniqûtîne. Destê xwe dirêjî pênûsê kir. Li helbesta nîvcomayî ya li ser kaxêzên spî nihêrî. Çend caran xwend. Fikirî. Cardin xwend. Fikirî. Tenê rista hêrî dawî xwend, 'gelo jiyana çend demsal in?' Fikirî. Çavên wî li ser vê pirsê man. Dengê saetê, dengê dilopan, dengê mirovan, dengê erebeyan, dengê hehecokek, wêneyên şîlo... pênûs danî ser kaxêzê û ji dilê xwe pirseke din niqutand bin wê pirsê: "Ya sereke çima bihar e?"

Havîn

Av ji nişkê ve kêmbû. Bêra di destê xwe de danî, di seranserî cihê de meşiya. Li jor cihê veqetana avê, kevirên ku pêşiya avê digirin belav bûbûn. 'Dibe ku karê zarokan be, an jî heywanek dema ku bixwaze derbas bibe lingê xwe lê xistibê.' Wisa fikirî

lê zêde li ser nesekinî. Li ba ket. Bi bazdan gihîşt bêrê û pêşiya xetan vekir. Avê bi careke re xwe berda ser deh xetan. Wekî bikevin pêşbaziye, av di xetan de bilez herikî. Li herikîna avê nihêrî, kêfa xwe pê anî.

Tîrêjên rojê li ser serê wî bûn. Tîneke sotîner xwe berdabû nava canê wî. Ew çend saet bû ku bînavber xebitîbû. Bi desmala li dora stûyê xwe xwêdana eniya xwe paqij kir. Bêr kir binê milê xwe û li şitilên ku êdî gihîştine nêrî. Dawiyê li dara nezikî zeviyê, li zinarên di bin tava rojê de, li gund, li rê nihêrî.

Ava ku ji bîrê anîbû germ bûbû. Hinek jê li dest û rûyê xwe kir, lê jê venexwar. Xetên ku bi avê tijî bûn devê wan bi axê girt û devê yên nû vekir. Bêra xwe danî. Berê xwe da siya darê.

Di bin siya darê de xwe dirêj kir. Dema xwe dirêj kir aramiyek li der dora wî tije bû. Di jiyana de hinek tişt tevgeriya; hehecokek bi fir hat li ser guliyek darê danî. Kulîlkekê rengê xwe ji nû ve li xwe kir. Di hişê wî de kom bi kom raman derbas bûn. Le ev raman wekî ku di bin mijekê de bin xuya bûn û car din winda bûn. Pîrî caran hişê wî bi ramanan li hev ketibû. Lê wekî vê carê nebûbû. Demek nehatibû jiyana ku hemû ramanên ku di hişê wî de derbas bûn ew qas di bin mij de, ew qas şîlo, tenê heveokek ewqasî zelal û ewqasî bi cih di hişê wî de li ba diket: "jiyan li dû hev hatina demsalan e..." (...)

Payîz

"Ez ê jî dernekevim. Dernekevim ji vir. Li min bigere û bisekine. Vê carê tu nikarî min bixapînî. Dîsa ketiye mitbaxê. Dengê firakan tîn ez dibihîsim. Xwedê dizane disa çî dike."

Deng hatin birîn. Bi aliyê hundir ve tî. Dê niha tasika di destê xwe de dayne û gazî bike: Xwelî, Xwelî. Kevirekî bi qasî Xwelî li serê te."

"Xwelî, Xwelî, nan amade ye. Ka tu ketî çî quncikê."

"Te ji bo çî navê min Xwelî danî. Çî navekî sosret. Ez naxwazim. Nên jî naxwazim, avê jî naxwazim. Ez ê dernekevim ji vê quncikê. Li min bigere û bisekine."

"Xwelî ez ê derkevim. Nan amade ye. Tu di kîjan qulikê de yî derkeve ji wir."

Çû. Ez dîsa tenê hiştim. Ez qet di hişê wê de

nînim. Carekê min jî bi xwe re bibe, na. Xwelî tu nanê xwe bixwe ez tîm. Xwelî tu bimîne ez tîm. Qet li dû xwe nenêrî. Qet negot ka Xwelî li ku derê ye. Gelo sax ê an mirî ye."

Çû. Di nav pelên daran ên weşiyane de meşiya. Dinya rengê zer li xwe pêçabû. Bayekî hênîk di nav pelan de weke marekî tevdigeriya.

Rêyeke dirêj li dû xwe hişt. Kovarek stand. Li ser banqekê rûnişt. Rûpelek ji kovarek vekir. Bayek ji nişka ve komek pel bi hewa xist, dengê Xwelî hat guhe wê. Li rûpelê nêrî li rûpelê nenêrî. Ker bû, lal bû, dinya tarî bû, kor bû. Ji çîroka di rûpelê de xwend, ji çîroka di rûpelê de nexwend. Ewr guriya, hehecokêk qîriya. Dengê Xwelî di guhê wê de tije bû. Dinya di cihê xwe de cemidî. Dinya ji bin lingê wê şiqitî. Ket. Ker bû, lal bû, kor bû. Ji ciheke bê dawî ket ciheke bê dawî.

Ji çîroka di kovarek:

tu çûyî demsalek ji jîyana min mir
çi jehr hiştî
çi hêvî
çi oxir

pirs: gelo jiyan çend demsal in
çend dimîne ku yek ji wan bimire

bi min: av jî diherikî dem jî
bi te yek bûn: ha çûyîn ha li vir

Ket. Ji ciheke bê dawî ket ciheke bê dawî.

Zivistan

"Tu ji min hez dikî?"

"Hez dikim."

"Çiqasî?"

"Pir."

"Çiqasî pir?"

"Pir, pir."

"Yanê?"

"Pîir..."

Dawiya saleke zeman a firfirokan

"Tu qet meraq nakî?"

"Çi?"

"Gelo ez çiqas ji te hez dikim?"

"Na."

"Qet?"

"Qet."

"Çewa yanê."

"Qeeet."

Dawiya deh sal zeman ên firfirokan

"Çiqas?"

"Çi çiqas?"

"Tu ji min çiqas hez dikî?"

"Çima dipirsî?"

"Ez meraq dikim vayê."

"Derewçîn."

"Bi rastî."

"Tu bi rastî jî meraq dikî?"

"Pir."

"Qasî ku kes nikaribe ji te hez bike."

"Yanê?"

"Yanê pir."

Dawiya hezar sal ên firfirokan

Bi kîjan demsalê baweriya xwe bînim, bi kîjan gotinê. Bi kîjan biranînê xwe aş bikim, bi kîjan xewnê. Bi kîjan kindirê xwe bikujim, bi kîjan şûrî. Bi kîjan çavî binêrim li dinê. Bi kîjan destî binivîsim. Bi kîjan zimanî bixivim.

Li derve berf. Çal a te ya di nivînan de mayî hê jî germe. Hehecokêk di qulikeka diwêr de helîn çekiriye. Dicemide. Hehecok dicemide, ez dicemidim.

Li derve berf, firfirok nafirin. Tu ji firfirokan pir hez dikî.

Li derve berf, hehecok dicemide, ez dicemidim.

Li derve berf, bi kîjan destî binivîsim.

Li derve berf, demsala sereke çima bihar e?

Li derve berf, hert tişt di nav navê te de bihurî.

Li derve berf, tu tune yî.

Li derve berf, tu naxivî.

Li derve berf, qasî ku kes nikaribe ji te hez bike.

Qasî ku kes nikaribe ji te hez bike: bi kîjan demsalê baweriya xwe bînim, bi kîjan gotinê.



Kêr Şevger ÇIYA

Li serê Ofisê heta gihîşt malê li dora xwe nenihêrt, daxwaza kirîna dendikan ji xelkê nekir, neket nava qehweyan û dendikên xwe nefiro. Bi gavên fireh û lez, bêyî ku balê bikîşîne cixareyeke ji xwe re ji dikanekê kirî, cixareyê pêxist, kir kêleka devê xwe û weke her rojê meşiya, bi her gavê digot qey her kes li wî temaşe dike. Gihîşt mal, oxîniyek ji kezebê kişand, li odeya mezin li ser paldankê rûnişt û destê xwe di nava dendikan de gerand kêra xwe derxist, kêr vekir pîvand. Kêr ji zendê wî digihîşt heta serê tiliyên wî. Ev bes bû, bi vê kêrê fors nedihat kirin lê kêr kêr bû, her kêr kêrhatî bû.

Van salan, salên pişt koça mezin, di destên xortên nûhatî de kêr dibûn nişana mêrbûnê. Hê çardeh salî bû, sala dawî ya dibistanê bû, saleke din dê êdî biçûya lîseyê. Par mala xwe anî bûn bajêr. Bi çûyîna dibistanê re ew tîbhen wî yên şerokî, sûtûn û tolbûna wî hefsar qetandibû. Ew bûbû hevalê tolên dibistanê, şûna caket saqoyê xwe yê eyar ku kevnesaqoyê apê wî bû li xwe dikir, porê xwe bi ava limonê dibiriqand û di destê wî de deftereke kevnare ku bi xêzên bêwate dagirtî bû, berê xwe dida dibistanê. Ne mamoste hebû, ne azmûn, ne xwendin ne jî tiştekî din, dibistan ji bo wî pevçûn û şer bû. Ew ji vê yekê razî, mamoste ne tenê ji wî ji koma wan bifîkar û bigazinc bûn. Bi zora bav û diya xwe piştî dibistanê diçû dendik difiro. Siûda wî vekiribû dendikên xwe di pêşiya birayên xwe de diqedand û piştî ku kodikek dendikê xwe difiro. Te ew bikuşt dendik nedifiro. Do piştî ku derketibû dersa bedenê û ew tenê bi cilên xwe yên mektebê bû, her kesî eşofmanên xwe li xwe kiribû, mamoste weke her carî hat pêşberê wî û jê pîrisî ka çima eşofman li xwe nekirine, wî jî bi rûtişkiyeke ka ev pîrs çima ji min tê pîrsin li mamoste mêze kiribû, berê xwe aliyê din ve kiribû û bi zareke sar gotibû “eşofmanên min tune ne lê heke hebin jî ez dê wan li xwe nekim” piştî vê peyvê mamoste şemaqeq lê xistibû wî jî li nav çavê mamoste nihêrtibû û gotibû yeka din jî lêxe, mamoste yeka din jî lê xistibû wî dîsa gotibû yeka din jî lêxe. Mamoste dîsa lê xis-

tibû, wî dîsa gotibû yeka din jî lêxe, mamoste êdî fêr kiribû ev yek ber bi xirabiyê ve diçe ders terikandibû çûbû. Wî di wê kêliyê de sonda lêdana mamoste bi dengê bilind xwaribû ku deng biçe hemû mamosteyan. Piştî belavbûnê her çiqas wî kêrek ji hevalên xwe xwestibû ji havalên wî kêr nedabû pê, biryar ji bo sibê hatibû dayîn. Sibê dê dor li mamoste bihata girtin û mamoste bi destê wî bihata kêrkirin da kû fêr bike mêr kî ne, çi dikin.

Vê kêra wî û hevaleke xwe dîtibûn, dîsa rojeke îne ku divê xwendekaran sirûdê bixwenda û reva ji sirûdê adeta wan bû, ji sirûdê reviyên hatin li meydana bezê li ser axê rûniştin, hevalê wî ketibû nava serpêhatiya bavê xwe ka çawa bavê wî li du mêrên qeraxê xistibû, dev û poz li wan şikandibû, qala hezar tiştên weke van tiştan dikir, wî çawa lingê xwe li axê xistibû ji bin axê kêrek derketibû, ev kêr kêra wî û hevalê wî bû lewre adeta mêran wiha bû, nedibû ku bigota min dît, kêr kêra min e. Îro ev kêr êdî dibû navgîna mêraniya wî. Li gora lihevkirina wî û hevalê wî, dê kêr her hefte li ba yekî bûya. Îro hefteya hevalê wî qediya, dor dora wî bû.

Kêra xwe dîsa xist nava kodika dendikan, dendik bir danîn ser balqonê. Xwedê bikira îro polêsan navêta ser malê û kêra wî nehata girtin. Pêr gava polêsan avêtibû ser malê li nava dendikan mêze nekiribûn, hejmara serdegirtina malê nayê bîra wî lê tiştekî dîzanê her gava polêsan davêjin ser malê li nava dendikan mêze nakin. Par ji malanîna bajêr û heta niha hema her hefte du sê caran polêsan davêjin ser mala wan û li kekê wî digerin.

Sibêyeke ji her rojî, tava biharê mirovan dişewitîne, asîman çik sayî ye, xelkê navçeyê li ber qehweyan komî ser hev dibin. Qehweya jor jî ya jêr jî tije ye. Dewran li ber qehweya jor rûniştiye, dora wî xelekek çêbûye. Çenteyê xwe daye ber lingê xwe ji çenteyê salnameyan derdixe û li xelkê belav dike ji aliyekî ve jî pereyan berhev dike. Ev bû serê çend rojan e ku millet jê salnameyan dixwaze. Ev salname zivistanê wexta sersalê derketinê lê dewletê qedexe kir, yên belavkirî berhev kir û îmhakir. Bi

zor û zehmetiyan ev salname dîsa bêdestûr hat çapkirin û belavkirin. Heta hat gihîşt navçeyê dem bû bihar lê xelk li hêviya salnameya ku wêneyên gerilayan li ser wan bû, sekinî bûn. Li ser her rûpelekî wêneyekî cuda, di nava berfê de, yek yek, kom bi kom, yên jin yên mêr, di govendê de, bi çek, bi biksî, di perwerdeyê de, di rêveçûnê de.

Ji nîşkê ve cemseya eskeran hat li ber qehweyê sekinî, serleşker ji cemseyê hat xwarê, hat li tenişt Dewranî rûnişt. Xeleka li dora Dewran kom-bûyî belav bû, li maseyê serleşker û Dewran tenê man. Serleşker bi dengê asayî got; “Dewran hûn mêvanê xwe wiha diezimîn? Ka ji min re çayekê bixwaze!” Dewran bi devlikenî got; “Belê belê, hela ji qomitan re çayekê bînin!” Çaya qomitan hat, qomitan salnameya destê Dewranî jê xwest, li rûpelên salnameyê nihêrt, wexta rûpel xilas kirin li dora xwe meyzand, herkesî li serleşker û Dewran mêze dikir. Serleşker got; “We hemûyan girt?” Kesî dengê xwe nekir. Li Dewran vegeriya got; “Her kesî girt?” Dewran bişirî got; “Ez nizanim.” Serleşker jî bişirî got; “Hingê ev jî para min e, dibe?” Dewran jî got; “Bila be.” Serleşker lê vegerand; “Bila ev di-yariya te be. Dewran, belkî careke din em hev nebînin, ji bo bîranînê.” Dewran tenê bişirî. Serleşker ber bi trembêla xwe ve çû, beriya ku têkeve lê vegeriya got; “Dewran heke te Zinar dît bila mêr be, bila dahfikan daneyne, heke şer dixwaze bila bê em şer bikin weke mêran ne weke namerdan, tamam?” Di wê kêliyê de gotin û negotina tiştekî weke hev e, sucdar kifş e, mikurhatin û înkâr birayê hev in. Dewran jî got; “Ew jî weke te difikire, dibêje bila bi top û firokeyên xwe neyên, heke mêr in bila bi çekên destê xwe bên weke me.” Serleşker bişirî li ti-rembêlê siwar bû, çû. Bi çûyina wî qehwe li bin guhê hev ket, di nav du sê deqîqeyan de qehwe vala bû, xwediyê qehweyê qehwe girt û yên mala wan nêz bûn çûn mala xwe û hinek ketin newala bin qehweyê ku ber bi malan ve diçû, hinekên din ketin nava dikanên din ên çarşiyê. Carekê weke zezûran timên taybet li çarşiyê tije bûn. Her yek qama wan du mîtro, kêrên wan ên rambo, M16, Eqrebên wan, serên wan girêdayî, gîzme wan li wan bi dijûnan ketin çarşiyê. Ne diya mîletê ma ne xwişka wan, ne jî jina wan, ne tenê yê wan yê Zinar yê şervanan jî her wiha. Yekê ji wan digot; “Hûn dê bibînin dê çi bê serê we, hûn dê newêribin li jina xwe mêze bikin, em dê serê wan xayînan jêkin û li vê orteya çarşiyê daliqînin. Hûn dê neweribin biçin ser meytê wan, divê ew meytên wan ên gemar li navçeyê li ber rojê çil roj bimîne ku hûn nikaribin bên vî çarşiyê. Divê kurm bikeve meytên wan. Em dê wiha tiştan bînin serê wan ku bibe sosret û hûn ji xwe re aqil bigirin. Min gûyê xwe kir hişê we, heke hiş bi we re

hebe hûn dê heta biçin çiyê hûn dê weke mirovan bixebitin û keçên xwe yên orispî ji binê me derxin.” Di vê navberê de gurzek çilo şewitandin û avêtin nava qehweyê, qehwe bi tamamî şewiti. Li cemseyên xwe siwar bûn û çûn.

Dotira rojê kaxiz li bin deriyê her kesî hatibû belavkirin û di kaxizê de digot: “Tenê hefteyekî we heye, hefteyek şûnde êdî şerê qirkirinê destpê dike, dewleta me ya mezin û arteşa me dê derbeke wiha li terorîstan bixe ku dinya bibîne em çiqas bi hêz in. Yên ku bar nekin jî ji tu zirara wan dewleta me berpirsyar nîn e. Ev qad êdî qada şer e, divê her kes aliyê xwe hîlbijêre. Dewleta me dîlovan e. Yên xwe dispêrên pê di nav xweşî û ewlehiyê de ne. Xwe bispêrin dewleta xwe.”

Çar aliyên navçeyê hat dorpêçkirin, tênê riya papûrê ji wesayîtan re vekirî bû, xelkê bar dikir, li serê rêyan li noqteyên lêgerînê hemû milîs û alîgirên şervanan dihat girtin. Lîsteyên di destên wan de dirêj bû, her kesê ku digirtin li ser navê wî/ê xêzdkirin. Bavê Dewran pezê xwe anî bajêr bi nîvbûhayê firot, vegeriya navçeyê. Mal û erd pere nedikirin, çû ji nas û dostan hinekî pere deyn kir. Wê ji bêgavî wan jî barbikira. Dewran çûbû axûra Mele Îzetîn de xwe veşartibû, her kesî texmîn dikir ku piştî hefteyekî dê esker biketa malan û saxî bikira lê a niha tenê dora navçeyê girtibû. Çareyekî divê bihata dîtin. Çare tune bû. Dewran dawiyê gotibû; “Bavo hûn herin jixwe hinek heval li vir in, em dê bikevin stargehên xwe.” Lê dewletê jî dizanibû di bin hinek malan de stargeh hene û dewlet dê li wan bigeriya, destên wan de çek tunebû, heke hebûya jî rewş nediguherî lewre piraniya wan nizanibû çekê bikarbînin. Çend ciwanan xwe di nava alavên malê de veşartibû û xilas kiribû, kîngê dewlet bi vê yekê hesiya êdî hemû alavên barkirî dihatin danîn û yeko yeko li wan dihat mêzekirin.

Roja çaran bû, bavê Dewran û apê wî berê xwe dan mala Rîzo, Rîzoyê reş. Xelkê digot Rîzo ajan e, lewre carek şervanan jî hat ew ji nava navçeyê bir û kirin ku bikûjin lê, gundî ketin navberê gotin; “Rîzo yekê bavê xwe ye, zarokên wî, jina wî heye. Weke malbatî jî malbata Zinar beriya beranî yekê mala wan kuştîye. Ev her du malbat dijminên hev in, heke hûn Rîzo bikûjin dê ev dijminatî jî kûrtir bibe û dê şênî jî ji vê yekê aciz bibin, efûkirin dê mezinahiya we bipeyitîne.” Rîzo bi soza ku careke din van karan neke hat berdan. Piştî vê yekê Rîzo li navçeyê dikanekî vekir hinekan digot gerilayan pere daye pê û gotiye êdî ajaniyê neke heke tu dewam bikî em dê te bikujin, hinekan digot dewletê pere daye pê û hê jî ajaniyê dike. Îro ew Rîzo li kuncikeke mala xwe rûniştîye, jina wî weke qerwaşa wî li ber destê wî digere caketê wî liser piştâ

wî, qelûna wî di devê wî de ye. Qet teşqeleya barkirinê li ber deriyê wî tune ye.

Bav û apê Dewran derbasî hundir bûn.

Çaya wan hat ber wan, Rizo di binê çavan re li van dinêherî. Bavê Dewran hema ji nîşkê ve dest pê kir got; "Law Rîzo, roja tarî li ser serê me digere. Mezinan gotiye roja teng an çiyayeke bilind an mêrekî çê, em ketin bextê te, tu Dewran ji vî dojhê xilas bike hema çî dixwazî ser serseran ser çavan." Rizo deng nekir, çavên xwe kurkusand, nefeseke kûr ji cixareya xwe kişand, ponijî, ponijî got; "Bi Xwedê xalê Ehmed ez ji Dewran weke kurê xwe hez dikim. Bi rastî îro roj roja reş e, di destê min de tu tişt tune ye, de ka ez evdalê Xwedê dikarim çî bikim, ez jî weke we me." Li navçeyê her kesî dizanî Rizo bi peran mehkûm xilas dikirin. Bavê Dewran dîsa got; "Rîza heke rêyeka min a din hebûya ez dê biçûma, ez dê du roj paşê bar bikim lê heke tu aliyê min nekî ez dê bihêlim ku Dewran bê kuştin. Ev yek jî ji mirinê xirabtir e, zarokên te jî hene. Hema tu rêyekî bi me bidî nîşandan bes e. Ez îro di bextê te de me. Min heta vî emrê xwe, xwe navêtiye tu kesî ev cara ewil e ku ez xwe davêjim ciwamêrekî, heke pere be pere, heke mal be wa mala min li wir e. Çî dixwazî bibêje ez dizanim di van karan de mesrefe mezin jî diçe. Tu çî bixwazî ez hazir û amade me." "Hingê ez dê binêrim ka ez dikarim çî bikim ez dê xeberê bidim te." Bavê Dewran got; "Ez dê mala xwe sibê na, dusibê bar bikim heta wê çaxê tu safî bikî dê pir baş bibe." Rizo bi maneya erê serê xwe hejand.

Roja din Rizo hat mala bavê Dewran û got; "Xalê Ehmed bi xwedê min bi zor û zehmet karê te qedand, ev serleşker bûye dijminê Dewranê xedar, ne ji min bûya kes nikaribû wî ji destê segbavî derbixe. Sibê xwe amade bikin divê hûn sibê derkevin. Bila Dewran jî bê mal, aliyê esrê hûn dê herin. Cilên paqij bila Dewran lixwe bike lewre em dê wî weke miawinê dolmîşê ji navçeyê derbixin. Lê divê bi kelecana nebe lewre dê nasnameyan bigre bibe ber leşkeran hingê divê gelekî li xwe miqate be ha."

Hemû fîraq û alavên xwe li kamyonê barkirin, malbat tevî Dewran li kamyonê siwar bûn derketin. Bavê Dewran çiqas jî Rizo daxwaz kir ku ew jî bikeve dolmîşê û bi Dewran re here Rizo got; "Xalo kurê te emanetê min e, tu here bila balê nekişîne, haya serleşker jî vî karî tune ye. Min bi onbaşî re xeber daye divê haya serleşker em pê nexin ha! Xalo welleh we xwe xilas kir ka em binêrin em dê xwe çawa xilas bikin!!" Bavê Dewran lê vegerand got; "Înşelleh, em dê her dem minetkarê te bin, hela em xwe bigihîşinin bajêr, ez dê tu car vî çêyiya te jibîr nekim. Xwedê ji te razî be ne carek hezar

car" Çawa deriyê kamyonê vekir ku têkevê Rizo bi milê wî girt got; "Xalo onbaşî vî xaniyê te û pênc hezar pere xwest." Rondik li çavên bavê Dewran tije bûn, destê xwe kir bêrika xwe got; "Ha miftiyê xanî û sê hezar û nîv pereyê min heye." Rizo got; "Neysê yê din ez dê ser temam bikim û bidim pê, dawiyê ez dê ji te bistînim." Bavê Dewran serê xwe hejand, ji bo ku bi halê xwe negirî xwe avêt kamyonê û bi destan îşaret da ajoker ku bajo. Ajoker ajot. Li binê navçeyê kamyona wan sekinî dolmîş hat li pişt sekinî, Dewran zûzûka xwe ji kamyonê avêt hat li dolmîşê siwar bû, bavê Dewran ajokerê dolmîşê got; "Dê hûn bidin pey kamyonê divê hûn nekevin pêşiya me, em dê piştî her lêgerînê li hêviya we bisekinin", ji tiliya xwe hingulîska xwe ya zêrîn derxist kir nav destê şofêr, şofêr hingulîskê kir bêrika xwe, bişirî, got temam. Bi rê ketin, kamyonê da pêş dolmîş li paş bi rê ketin.

Sê qereqol hebûn li ser rê, Qereqola Hengulê, Qereqola Karazê û Qereqola Mermerê. Dewran di rê de serê her kêliyê ji xwe re digot divê ez xwe şaş nekim, divê ez xwe baş qanih bikim ku ez miawinê dolmîşê me. Şofêr jî qet go nedida rewşa Dewran, Dewran hizirî ku vî şofêrî pir mirov bi vî rêyê xilas kirine lewre ew qet neketibû nava mitelayan, qet bi kelecana nebû, tenê wexta Dewran li dolmîşê siwar bûbû serê xwe jê re hejandibû weke ew dizane çî dike ewqas. Bi van ramanan Dewran hinekî tebitî, li ber Qereqola Hengulê eskeran dolmîş sekinandin, rêwiyan nasnameyên xwe dan Dewran, hemû mîr û ciwan ji dolmîşê hatin xwarê, dê eskeran ew saxî bikirana. Dewran berê xwe bi aliyê serleşker ve kir, bi hemû hêza xwe beyî ku destê wî bilerizin û rûyê serleşker binêre nasnameyan dirêjî serleşker kir. Serleşker tavilê listeya xwe derxist yeko yeko nasnameyan da ber listeyê, bi qedandina nasnameyan re hemû nasname dan Dewranî û got "Ka tu jî nasnameya xwe bide!" Dewran qediya, ruyê wî vegehiya wê roja ber qehweyê lewre wî çend caran di nava hevalan de gotibû û bi vî xebera xwe gelek serbilind bû; "Car heye xelasî tune hingê divê meriv li xelasiyê negere, yên ku di wan deman de li xelasiyê digerin dibin îtirafker û çêş" ew dem ev dem bû. Di nav çend kêliyên ku van tiştan di hişê wî de bihûrîn û biryara li xwe mikurhatinê da ku bi-bêje ez Dewran im û slogan bavêje, yekê ku piştî wî bi wan vebû got, "berde bila here". Dewran qomitan ji dengê wî nas kir. Bişirî. Hinekî din xwe di ewlehiyê hîs kir lewre qomitan jî ew naskiribû û gotibû here. Rizo ew xelas kiribû, ne ji bo xêra bavê xwe lê ji bo pereyan, ew pere dikir ku qomitan bibêje here.

Wexta dolmîş bi rê ket, kamyon hatibû piştî girê ku qereqol jê nexuya ye sekinibû, bi çav lêkirina dolmîşê şofêr du caran selektor kir, kam-

yon bi rê ket, dolmîşê da dû. Wexta ketin deşta Fîsê, ji nîşkê ve tîmên taybet dora kamyonê û dolmîşê girtin. Tîmekî taybet hat deriyê dolmîşê vekir bi milê Dewran girt ew daxist û yên mayî re got, “bajo”. Piştî girtina Dewran dolmîş ket pêşiya kamyonê û ji ber çavan wenda bû. Bavê Dewran bihêti mabû fêhm nedikir çi bû, çima bû? Tenê li rê mêze dikir, diya Dewran xwişk û birayên wî dest bi girî kirin. Dengê girîna diya Dewran ajokerê kamyonê tirsand, got; “Xalo divê em herin naxwena dê bên me hemûyan bikujin.” Diya Dewran bi hemû zarokên xwe ve ji kamyonê peya bûbû. Li deşta Fîsê, li nava rê digiriya. Bavê Dewran wisa sekinîbû, tavê li nava çavên wî dixist, carek da serê wî gêj bû li cihê xwe rûnişt. Ajoker dîsa bi çavên tije tirs û fikar berê xwe aliyê xalê Ehmed ve kir, xalê Ehmed bûbû robot. Erebyan ber wan de vîzevîz dikir û diçûn, ajoker çûbû ber xalê Ehmed rûnişt û lavayê wî dikir, rica dikir, bi çavên tije poşmanî, tirs, fikar, bêsiûdî li dora xwe dimeyzand, na. Xalê Ehmed wiha sekinibû yên din jî digiriyan. Hat bîra wî ku wan li vir bihêle û biçe, na ew jî nedibû. Carekî de xalê Ehmed rabû çepilê jîna xwe û zarokên xwe girt ew avêtin paşiya kamyonê, li jîna xwe tembîh kir ku here bar Ezîzê birayê wî û li wir bibe mêvan heta çend şevan ew dê vegere, got; “Hûn herin ez dê biçim Dewran binêrim û bêm.”

Bi dolmîşêke din vegeriya navçeyê, yekser berê xwe da mala Rîzo, Rîzo ne li mal bû. Li çarşiyê ber qehweyê Rîzo dît, çawa çavê Rîzo pê ket ji cihê xwe rabû hat got; “Xêr xalê Ehmed çi bû?” “Dewran girtin Rîza”, “Çawa girtin xalê Ehmed?” Meseleyê hemû qal kir, Rîzo dest bi çêrên onbaşî û serleşker kir û berê xwe da qereqolê. Xalê Ehmed di wê navberê de li ber qehweyê rûnişt, çayek vexwar. Berê xwe da mizgeftê da ku limêja esrê bike. Hê destlimêja xwe digirt ku dengê cemsên eskeran çarşiyê tije kir. “Li ku ye?” Her kesî digot em nizanin Rîzo giliya wî kiribû, Rîzoyê ku giliya wî kiribû giliya Dewran jî kiribû bi ihtîmaleka mezin. Xwe ji ser dîwarê mizgeftê avêt aliyê bexçeyan. Baxçe baxçe xwe bi zorê gihiştan mala pismamê xwe, pismamê wî yekî feqîr bû, xwe

û zarokên xwe dûrî vî şerî girtibû. Ne aliyê dewletê girtibû ne jî aliyê şervanan. Pismamê wî canbaz bû, heywan dibir Çewlik, Diyarbekir, aliyê Serhedê difrot, distend. Li navçeyê tenê yên feqîr ku nikarin bi cihekî ve biçin û karmendê dewletê mabûn.

Hecî Murat, Ehmedê pismamê xwe bir di nava heywanên ku ji Hênayê standibû û hêviya destûra dewletê bû ku bibe Çewlikê, bi cih kir. Got; “Heke te bigirin dê tu bibêjî ez ji ber xwe ve hatim li vir, heke na ez dê te xelas bikim, ez nikarim ji te re şîvê bişînim ev dê balê bikşîne. Hinek firaq li wir hene heke tu dikarî ji xwe re mêşinan bidoşe. Bi şev li vira ranekeve ew dê bên saxî bikin îro sibê. Qorziya jor de pişt dara biyê cihekî veşartî heye tu dikarî li wir rakevî. Kîngê ez destura çûyîna Çewlikê ji dewletê bistînim ez dê te bikim nava heywanan û bibim divê tu bîhna xwe fireh bikî û li hêviya min bî.”

Roja çaran Hecî Murat hat got; “Sibê em dê bi rê kevin, axir ku dewlet neketiye pey te. Yên çarşiyê gotine ketiye erebeyê çûye. Do kîngê ez çûm qereqolê ji bo destûrê qomitan qet behsa te nekir. Carek du caran Rîzo li dora mala me geriya min ew dît ez pê re hêrs bûm. Ew jî teqizî çû. Nizanim li çi digeriya.” Xalê Ehmed got; “Ez dizanim li çi digeriya lawê qehpikê!”

Xalê Ehmed aliyê destê sibê bi vekirina derî re şiyar bû. Îşev di axûr de raketibû, çend şevên kozikê ku sar û serma bû, cih teng bû kir ku xalê Ehmed xwe biewiqîne, da-

wiyê bêhemdê xwe ji ser hişê xwe here. Axura tarî û germ sed car ji wê kozikê baştir û xwestir bû. Li kozikê li erdê pişt, mil û destên wî li hev geriyan, lingê wî yê rastê ku berê hinekî di dikuliya niha êdî raste-rast qop bûbû. Reşek ket hundir. Xalê Ehmed bê pejn sekinî, pêşiyê got qey esker in, hinekî sekinî dengê tirkîyê nehat, tu dengêkî din jî nehat. Reş ber bi paşiya axurê ve dihat, hinek jî sekinî got belkî cin bin. Eşheda xwe anî, destê xwe kir berîka êlegê xwe kêra xwe derxist, devê kêrê vekir, bi kevirên dîwar girt rabû ser xwe pejna reşî nedihat, xeynî fişefîşa dewaran tu deng tune bû. Got qey min xewn diye, dîsa cihê xwe rûnişt, sekinî. Terpîniyek hat, weke zebeşek li erdê bikeve. Li cihê xwe rabû, kêra xwe kir destê xwe yê rastê, hesteyê xwe kir destê



çepê û aliyê reşî ve çû. Çawa dengê bîhna reşî çû pê hesteyê destê xwe pêxist, kêrê dirêjî reşî kir. “Dewran”

Dewran, laşê wî hemû di nava xwînê de îç-likekî reş lê, jêr ve pantorekî qûmaş û solên esem. Dewran ji ser hişê xwe çûbû. Tavlê çû ava ku do êvarê anîbû li rûyê Dewran kir, Dewran tenê nefes digirt û berdida ewqas. Bi her du milên Dewran girt hejand, devê xwe bir binê goyê Dewran û got; “Dewran, Dewran, Dewran...” Deng û hes ji Dewran derneket. Li ber Dewran rûnişt û giriya, cara ewil ku ji bo mirina bavê xwe giriya, ev cara duyemîn bû ku digiriya. “Dewran, şiyar bibe kurê min, şiyar bibe ez heyran şiyar bibe. Çavê xwe veke, mêze wa ez li vir im. Vê carê heta min neku jin nikarin te ji min bistînin. Haydê Dewran şiyar bibe. Şiyar bibe, çavên xwe veke çî kirin bi te, ez bavê te me, li vir im. Ez qurban, çavê xwe veke. Dewran, tu yî sebeb mirina min. Diya te ew çûn bajêr, xwişkên te, birayên te, her kes çû bajêr. De şiyar bibe berxê bavê xwe şiyar bibe.” Na, Dewran şiyar nebû. Dengê mela giriya xalê Ehmed birî, li saeta xwe nihêrt saet ji pêncan deh dibihûre. Saet di şeşan de dê Hecî Murat bê. Hecî Murat hat, çawa dewran dît xof lê ket. Dewran ji destê leşkeran reviyabû. Laşê wî di nava xwînê de mabû, rûyê wî hemû bi qîşamên birînan tije bûbû, tiliyên wî hemû werimî bûn her sê tiliyên wî yên rastê şikandî bûn. Hecî Murat qet dengê xwe nekir, bela hatibû ber deriyê wî, êdî nikaribû bibêje na. Lê dixwest lingekî zû ji wî belayê xwe xelas bike. Hecî Murat bi bezê çû kaniyê av anî, dest û rûyê Dewran şûşt. Dewran û xalê Ehmed li cihê karikan siwar kir. Dewarên din hemû li kamyonê kir û berê xwe dan Çewlikê. Serê riya Çewlikê tenê qereqolek hebû, qomitanê qereqolê ji Hecî Murat hez dikir. Dikaribû bi her halî wan ji wê qereqolê xelas bike. Li serê wê rê, bi dorê Biryas, Pûyeng, Kelê, Korxa hebû. Qereqola Korxayê ew qereqola ku behs dikir bû. Li binê navçeyê Hecî Murat kamyon kişand ber benzînxaneyê. Xwediyê benzînxaneyê ji Hecî re got; “Hecî van rojan serê deh metreyî cihê lêgerîne danîne, îro serê sibê li bin kelê dewarê Mistefayê kor hemû daxistine, Mistefa digot serê sibê ve bi zorê dewaran dîsa bar kiriye. Dixwazî tu jî neçe.” Hecî got ez dê biçim, heke ez vegerim belkî sibê dîsa daxin kî ji karê wan fêhm dike.” Ji benzînxaneyê berê xwe aliyê Çewlikê ve kir. Li bin gundê Puyengê sekini, bi lez û bez li kaseya kamyonê siwar bû, ji xalê Ehmed re rewşê îzah kir û got; “Divê hûn çend rojan li vî gundî bisekinin gund hatiye wêrankirin, heta hinekî rewşa rê baş bibe ez dê dîsa bêm we bibim Çewlikê. Li hêviya min bin. Teqez ez dê bêm.” Dewranê ku nûzenûza wî bû kir

pišta xalê Ehmed.

Malên werankirî, şewitandî, xerakirî, li jêrê malan bexçeyên fêkiyan; alûc, hinar, bîhok, hirmî, darên gûzan, darên tihûyan, dengê çem bi hejandina darên çilo re harmoniyekê çê dikin. Dengê çîrçîrokan dinyayê dixwe, li bin kaniyê darên hewran bi her liva bayê geh wî aliyê ve diçin geh vî aliyê ve. Bi her livandina hewran siya hewran jî dilive. Ev bédengî saw li mirov çê dike. Xalê Ehmed, Dewran kir pišta xwe anî li ser kaniya binê dara tûyê danî. Çend kulm ava cemidî anî li serûçavê wî reşand, hinek av kir qirika wî, Dewran çavên xwe pirpitand, nûzenûza wî dewam dikir. Dewran di pišta bavê xwe de ketin nava darên hewran hatin paşiya erd. Li binê sêncê bavê wî ew danî, bi destan qirş û qalişên erdê paqij kir, Dewran dirêj kir, çû nava fêkiyan, dem bihar e, vê demê tenê alûc û mişmiş hene. Her du bêrikên saqoyê xwe bi alûc û mişmişan tije kir, hat. Hat ku Dewran şiyar bûye, pišta xwe daye sêncê û bi çavên tirsokî li hawirdorê dimeyîne. Bi yek dengî got; “Dewran!” Dewran ji ciyê xwe pekiya, rûyê wî de bişirineke. Keneke bê wate pê girt, cara yekemîn e wiha bi dengê bilind bêsedem dikene, her ku dikene dengê wî bilindtir dibe, ji kenan duqat dibe, bênefes dimîne, dikene.

Roja sisêyana hatine vî gundî, hê jî li binê wê sêncê de ne, bi Dewran re bêtî livandina destê rastê û her sî tiliyên şikandî tu êş nemaye. Her şev bi nobet radikevin, serê sê saetê nobetê diguherin. Ew bayê ku bişevan tê û daran dide axaftin, ew siyên darên ku bi her liva bayê şiklên xwe diguherînin ber tava heyvê dibiriqin, ew dengên guran, roviyan, weşan ji çîyan tê dike ku nobedar xwe bi sêncê ve bike yek, tehm û hizura dinyayê diqedîne. Wextên gundan û sî, di nava tîkiliyên cuda de ne. Bi berbangê, bi derketina rojê siya meriv herî dirêj e, di nava rojê de siya meriv herî kin dibe, hingûra êvarê dîsa siya meriv mezin dibe û li ber tava heyvê jî car heye mezin e û car heye biçûk e.

Deng ji Hecî Murat derneket. Ev çend rojên ku bi mişmiş û alûcan îdare kirin êdî zikê wan diêşiya, Dewran çend caran vereşiya. Aliyê esrê, bayekî hênîk hinavê mirov tije dike, heke mirov têr be û kêfa mirov li cî be mirov dibêje ha ev bayê ha ji nava bihûştê hat, bîhna hezar kulîlk û darên cihê gihîştand me lê heke mirov lawaz û birçî be, ji birçîbûnê hinekî agirê mirov derkeve, serê mirov biêşe mirov nalet li vî bayî tîne. Ne tenê vî bayî hemû liv û tevgerên xwezayê, dikin ku mirov çêran bike, sil bibe. Dewran ji mij ve ji Hecî Murat û zarokên wî hez nedikir. Wan salên serhildanî û şoreşî ku xort û keç li dora partiyê civiya bûn, xortan saqo û pantorên jeans li xwe dikir

meqeb dikirin lingên xwe, rojnameya wan li berîka wan a paş de, serê şeveqe heta ser çongan li nava heriyê de diketin navçeyê, bi her rakirina cenazeyekî çend xort û keçan berê xwe didan çiyê Hecî Muro xwe û zarokên xwe dûrî vî karî girtibû, te digot qey ev welat welatê wan nin e, ew kurd nin in. Lawê biçûk ku Dewran ew qanîh kiribû jî, bi şîretên melayêkî ji ji eşayê heta banga serê sibê dîsa çûbû ser ramanê bavê xwe.

“Hecî Muro, xwelî li qûna me ku em hêviya te ne.”

“Çi bûye bi Hecî Muro?”

“Em anîn li vir û çû, em jî hêviya Hecî Muro û heywanên Hecî Muro ne.”

“Wa camêr ewqas camêriya xwe kir, me ji nava wê dojhê derxist.”

“Rojâ pêşîn divê me xwe bigihîştanda hevalan wan dê em xelas bikirana.”

“Kî?”

“Heval.”

“Law, lawo ji hevalên min nebûya niha Xwedê dizane em li ku bûn û çi bi serê me hatibû?”

“Hevalên te Hecî Muro û Rîzo ne?”

“Erê wele, Hecî Muro hevalê min e lê Rîzo min kîrê hezar keran tobe îstexfirellah..”

“Erê.”

“Erê la, çend caran min ji te re got neke, neke lawo neke, em feqîr, em sefil, em ketin dû Kurdistanê. Ha ji te re Kurdistan, ha ji te re erda ku hûn xwe li ser dîkujin ha ji te re, ji semedê we mirovên li vir dijîn malên xwe barkirin, malên wan hatin şewitandin, dev ji warên xwe yên bav û kalan berdan.”

“Wexta wextî we bikira, niha dê me nekira. Roja rojîn kîngê we weke eşîr û êl li hev dixist, li ser hev kilam derdixistin divê hinekî hûn biaqilbûna we serî li hemberê dewletê rakira.”

“Erê wa we rakir, çibû? Çi ket destê kurdan ji xeynî barkirin, şewat û zilmê?”

“Kurd êdî dîzanin ew kurd in, êdî ji bo mirîşkekî li hev naxin, êdî doza welatê xwe dîkin. Li her welatî ev tişt çêbûne, her welat hatiye şewitandin, wêrankirin û her welatî zilm dîtiye lê dawîya dawî her kesî azadiya xwe bi destxistiye tenê em kurd mane li orteya dinyayê bêdewlet û bêxwedî”

“Erê erê, aniha rewşa me pir baş e, ewqas baş e ku em li vir hêviya guleya eskerekî sekinî ne, em êdî doza welatê xwe dîkin, çi xweş e, dilê min çiqas rihet bû!!”

Destê sibê kamyonek hat li binya gund sekinî, bavê Dewran bi dengê sekinandina kamyonê şiyar bû, nobedar raketîbû, dûr ve sîfetê Hecî Muro derxist, Hecî Muro bi çavên tirsokî li dora xwe dimeyzand. Lingê xwe lingê Dewran xist Dewran ve-

ciniqî, got kurê kewsikê (kîngê bi yekê henekên xwe bikira digot kurê kewsikê) rabe wa hevalên min di pêşiya hevalên te de hat.” Pêşî berê xwe dan Çewlikê li wir du roj bûn mêvanê nasekî Hecî Muro. Hecî Muro pişt re berê xwe da Elezîzê, ji Elezîzê bi rêya du saetan gihîştin Diyarbekirê.

Hêviya serê sibê bû, ew mêrên mezin ku çardehsaliya xwe de bûne mêrkûj dê sibê binasin ka mêrkûj çawa mêran dikûjin, ew mêrên çargurçik ku li pevçûnê digerin, bertilê ji xelkê distînin, çoya wan di destê wan de ye, giyanê wan li serdilê wan her dem ji mirinê re amade ne, li girtigehan destê wan kelepçekirî bi seran diçin gerdiyanan, ew mêrên ku her kes newêre li rûyê wan binêre dê yeke jixwe, xweşmêre weke xwe nasbikin, kîngê ew xwîna bînamûsê mamoste li ser kêra wî birije û germbûna xwîna camêr hîs bike dê destê xwe bilind bike û biqîre, “ev tola min e”, bila keçikên nazik û qîzên polêsan bikin qarewar û bila zarokên jar û feqîr li cihê xwe zeriko bibin, bila rûyê wî bînamûsî zer bibe, giyanê wî hêdî hêdî jê biçe û bila çavên lavakî li mêrkûjê xwe binêre.

Wê şeva berê tolhildanê, Dewran bi ketina tariyê re hat mal, serê xwe şûst, bêyî ku nan bixwe bi lez ji mal derket. Diya wî ewqas li ber geriya ji bo ku şivê bixwe hê derkeve, lê Dewran qebûl nekir û derket. Pênc deqîqe pişt derketina Dewran derî lê ket, diya Dewran got qey Dewran e tiştêkî xwe ji bîr kiriye lê bi vekirina derî re polês li hundir tije bûn. Beriya tiştêkî ji wan bipirsîn bi solên xwe yên gemar hemû odeyan, metbaxê, serşoyê geriyan û kîngê Dewran li mal nedîtin îca bi herseke mezin pîrs kirin; “Ka Dewran?” “Min nedîtiye!” “Ez nizanîm.” “Va bû çar meh e çavên min pê neketine” “Bi sed Qûranî haya min jê tune ye” “Nehatiye li vir.” Lê şemaqeq li rûyê bavê Dewran ket bavê Dewran li erdê dirêjkirî ma, pihîna ku li tengala diya Dewran ket kir ku diya Dewran bêhilm bimîne, porê xwişka Dewran bi erdê ve hat kişandin. Li nava malê heriya doşek, balgîf û lihêfan, çêhêzê sindoqan, birinc, bilgur, nîsk, tûrê şekir, rûnê malê, salçeya di tenekê de kirin ser hev. Her du paldankên wan bi kêran perçe perçe kirin li keleşê digeriyan. Dikenîyan. Dawiyê polêsekî anî kodika dendikan jî valayî ser koma birinc, bilgur, salçe, nîsk, rûn û heriyê kir. Carekê bi dengeke guzm ji hevalê xwe re got; “Werin, werin min çi dît?” “Ev a kê ye? Min dîzanibû divê malê de çek heyê.”

Dengê xwediye kêrê gihîşt erşê xwedê. Kêr di nava her du tiliyên wî yên eşhedê û orteyê de hatibû kişandin. Kîngê ji mal derketin gotin; “Heke ew kêr ji cihê xwe bê kişandin em dê we hemûyan bikujin.”

Kurtedosye*

Hogir Berbir: Romana Kurmancî ya ku bandor li ser min ava kiriye, romana ewilî ya ku min xwendiyê, bi xwe ye. Ev roman di sala 1995'an de, li girtîgeha Mêrdînê ji komek extiyarê ku li hev civiya bû û bi eşq û evîneke bêpayan min ji wan re xwendibû û ez di binê tesîra çîroka xwe de hiştibû, Romana Memed Uzun ya bi navê 'Rojek ji rojên Evdalê Zeynikê' bû. Helbet min gelek romanên dinê jî xwendin lê ne weke ya ewilî bi tahm û çêj bû...

**Em wekî kovara Wyê me biryar dabû ku em di her hejmarê de kurtedosyeyekê jî amade bikin. Dosyeya hejmara borî "peyv an jî biwêjên zaroktiya nivîskar" bû. Babeta me ya vê hejmarê jî "herî zêde kîjan romana bi kurdî hatiye nivîsandin bandor li ser te hişt" bû. Ji bo vê kurtedosyeyê jî, me ji nivîskaran daxwaz kiribû ku ji kerema xwe re bila bersiva te herî zêde 8 rêzik be. Lê ligel vê kurtasiyê jî, ji nav 19 nivîskaran tenê birêz Hogir Berbir beşdarî dosyeyê bû, em jî "tenê bersiva wî" diweşînin!*

Akrostîşa kuştarekê HELBESTKORO

Sal 2011, heyv tebax
Oçax kor kirin bombeyên giran
Li wêlatê KURDISTAN karesatî zor seyr e ax!
Îxanet bi xwezayê kirin, şewitîn daristan
Navnîşanên li Qendîlê bê şemal e ax!

Oçax kor kirin teyrên hesinî
Sal 2011, heyv tebax, rojeke pereng
Kitim hiştin gund, mirov parçeparî
Akrostîşa heft kuştiyan, şîlaqa MODERN
Raboriya Helebçeyê aqûbeta tarî

Sal 2011, heyv tebax, kêliyên herî dijwar
Oçax kor kirin gefên nîjadî
Navnîşanên li Qendîlê bê cih û war
Yezdan şaş, mirov şaş e ezbenî
Akrostîşa heft kuştiyan, zarokên bêdiyar

Zar û zêç, dê û bav
Azad û mazat tev goşt û çav
Navnîşanên li Qendîlê bê ser û pa
Akrostîşa heft kuştiyan, fediya EWRÛPAYê

Raboriya Helebçeyê, bavkuştîyên weke Saddam
Êşa Elî Hawarî, pitika li pey
Zar û zêç, dê û bav û hemû zilam
Akrostîşa heft kuştiyan, li eniya TIRKIYEyê
Navnîşanên Qendîlê bê stran û kilam

Mer Hacî keça Mamo
Erçena wê li rêça çiya
Raboriya Helebçeyê dahatûya do
Hergîz ji bîr nebû hergîz Guernica
Akrostîşa heft kuştiyan, şîlaqa NATOyê
Can û cesed, barûyên cêwî û yafta USAyê
Îxanet bi xwezayê kirin, nehiştin indeko

HEWA kone bû; li ku derê ma
ADEM kawik bû; bi ku ve lezand
Sal 2011, heyv tebax, ronahî nema
Akrostîşa heft kuştiyan dafika ÎNGILÎSTANê
Navnîşanên Qendîlê, zêrevan in gerilla

Solîn bû, şeş mehî bû, ji bo wan gerîllayek bû
Oskar bû, deh salî bû, ji bo wan şervanek bû
Sonya bû, çar salî bû, ji bo wan dijminek bû
Zana bû, yazdeh salî bû, ji bo wan hedefek bû
Rêzan bû, sih û çar salî bû, ji bo wan dijberê bû
Merhacî bû, dêyek bû, ji bo wan marê mezin bû
Hasan bû, bavek bû, ji bo wan serê kunêrê bû

Li KURDISTANê heft jiyan tefandin
Çar werz ji ferhenga te dûr ketin ey ŞÊRKO

Xaçepirsa romana kurdî Amadekar: Omer Faruk BARAN

1. Romana yekem a Mehmed Uzun, Tu, li bin dara kîjan nivîskarî de hatiye nivîsîn?

- A. Franz Kafka B. T.S. Eliot
C. Balzac D. Albert Camus

2. Kîjan nivîskarî roman nenivîsandiye?

- A. Adil Zozanî B. Mihemed Ronahî
C. Selahaddîn Bulut D. Enwer Karahan

3. – Badîn te Jale ji bîr kiriye?!!

– na... ma birîn xençerê ji bîr dike!!!

Ev diyaloga ji kîjan berhema Jan Dost hatiye girtin?

- A. 3 Gav û 3darek B. Mîrname
C. Mijabad D. Mistek Ax

4. Kîjan berhema ne ya Erebe Şemo ye?

- A. Kenê Parsek B. Jiyana Bextewar
C. Dimdim D. Hopo

5. “Gîtara Bê Têl”, “Bilîcan”, “Girê Şêran” di nav van de romana kê tine?

- A. Perwîz Cîhanî B. Cîhan Roj
C. Şener Ozmen E. Menaf Osman

6. Kîjan ne romana Omer Dilsoz e?

- A. Neynika Dilî B. Wêneyên Keserê
C. Bêhna Axê D. Hêviyên Birîndar

7. Romana ku li ser tirsê ava bûye û bi hevoka “eger rojekê kesek ji we li tirsê rast hat, jê bipirsîn bê li ku ji dayik bûye, wê ji we re bêje li wê çargoşeya ku di navbera, sûrî, tirkîye, îran û iraqê de” navdar romana kê ye?

- A. Helîm Yûsiv B. Sebrî Silêvanî
C. Firat Cewerî D. Hesenê Metê

8. Li ser çîroka bi navê “Meha Sêzdehan” û romana “Ez ê Yekî Bikujim” di mabeyna kîjan nivîskaran de li ser întihalê nîqaş çêbûye?

- A. Hesenê Metê-Helîm Yûsiv
B. Jan Dost-Firat Cewerî
C. Helîm Yûsiv-Firat Cewerî
D. Hesenê Metê-Jan Dost

9. Kîjan berhem ne roman e?

- A. Saturn – Remezan Alan
B. Parîsabad – Fawaz Husên
C. Kakil – Dilawer Zeraq
D. Gava Heyatê – Lokman Ayebe

10. Kîjan roman wekî film hatiye kişandin?

- A. Şivanê Kurd – Erebe Şemo
B. Jana Gel – Îbrahîm Ehmed
C. Ay Dayê – Mehdî Zana
D. Xaltika Zeyno – Medenî Ferho

11. Nivîskarê ku di pexşaneke xwe de “klîşeyên romana kurdî” nivîsiye û dibêje “kêm-zêde di romanên kurdî gişan de leheng bi nivîsînê têkildar in, giş pîr dixwînin, ji wêjeyê baş fahm dikin û hetta gelekên wan bi xwe ji helbestan ji dinivîsin. Ango gellekî zahmet e ku mirov li romaneke ku tê de helbest tune be rast bê!” kî ye?

- A. Remezan Alan B. Rênas Jiyar
C. Menaf Osman D. Bavê Nazê

12. Kîjan berhemên li ber hev ne yên heman nivîskarî ne?

- A. Reş û Sipî – Leyla Fîgaro
B. Rojnivîska Spînoza – Otobês
C. Dara Pelweşiyayî-Miriyê Heram
D. Tofan – Gotinên Gunehkar

13. “Sêbareya Mêrdînê” ya Yaqob Tilermenî ji sê kitêban pêk hatiye. Kîjan pirtûka ne ji vê sêbareyê ye?

- A. Kitim B. Mendik
C. Qerebafon D. Bavfileh

14. “..Lê ev metoda, mirov keçeke kurd têke hem-bêza efsereke dagirker, ne metodeke baş e? Ev li hemû şervanan û jinên kurd heqaretkirine!”... Ev hevoka ji kîjan kitêbê hatiye girtin û ji bo kîjan kitêbê rexneyek e?

- A. Siya Dema Borî – Ronî Mîna Evînê
Tarî Mîna Mirînê
B. Siya Dema Borî – Siya Evînê
C. Reş û Sipî – Ez ê Yekî Bikujim
D. Ez ê Yekî Bikujim – Siya Evînê

15. Kîjan berhem ne roman e?

- A. Labîrenta Cinan – Hesenê Metê
B. Sorê Gulê – Silêman Demir
C. Bendname – Remezan Alan
D. Gardiyan – Bûbê Eser

Bersivên xaçepirsa sînemayê (hejmara borî, hj.38):

1-C, 2-D, 3-A, 4-B, 5-D, 6-B, 7-A, 8-D, 9-C, 10-B, 11-D, 12-B, 13-A, 14-C